# ANTOLOJIYA HELBESTA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR

**Amadekar:**
**Xelîl Duhokî**

# ANTOLOJIYA HELBESTA NÛ YA KURMANCÊN BAŞÛR

# NAVEROK

**PÊŞGOTIN** .......... 6
**Helbestvan û nivîskar: Xelîl Duhokî** .......... 8
Bedirxan Sindî (1943) .......... 11
Abdulrehman Mizûrî (1946) .......... 29
Xelîl Duhokî (1951) .......... 58
Mueyed Teyib (1957) .......... 71
Mihsin Qoçan (1954) .......... 82
Mehfoz Mayî (1957) .......... 96
Vehêl Amêdî (1951-1982) .......... 113
Remezan Îsa (1953) .......... 126
Idrîs Çelkî (1957) .......... 150
Ehmed Qerenî (1955) .......... 174
Necîb Balayî (1962) .......... 191
Jaro Duhokî (1959) .......... 204
S. Diljan (1960-1988) .......... 222
Seîd Dêreşî (1955) .......... 231
Qadir Qeçax (1962) .......... 247
Hizirvan Ebdulla (1962) .......... 255
Îsmaîl Hacanî (1963) .......... 268
Beyar Bavî (1967) .......... 272
Arif Hîto (1968) .......... 276
Mesûd Sernî (1957) .......... 282
Hesen Nûrî (1967) .......... 287
Cîhad Amêdî (1967) .......... 291
Kirmanc Hekarî (1965) .......... 296
Tehsîn Navişkî (1968) .......... 301
Ebdulezîz Hacanî (1962-1989) .......... 306
Beşîr Mizûrî (1968) .......... 311
Serbest Nalbend (1964) .......... 317
Şemal Akreyî (1967) .......... 321
Luqman Asîhî (1971) .......... 325
Hîvî Berwarî (1963) .......... 329
Rêkêş Amêdî (1956) .......... 337
Selman Kovilî (1953-2002) .......... 353
Ehmed Ebdulla Zero (1944) .......... 366
Segvan Ebdulhekîm (1948- 2010) .......... 380
Rastî Hirorî (1957) .......... 385
Kovan (1953) .......... 397
Pêzanê Alîxanî (1966-1990) .......... 408
Îsmaîl Badî (1963) .......... 419
Simko Amêdî (1951-1988) .......... 428

Silêman Amêdî (1953) .......... 440
Hişyar Rêkanî (1961) .......... 455
Hesen Silêvanî (1957) .......... 468
Behcet Mehemed Hirorî (1962) .......... 478
Hemîd Emîn Mûsa (1966-1988) .......... 483
Nacî Taha Berwarî (1963) .......... 495
Xalid Husên (1945) .......... 505
Feysel Mistafa Hecî (1946) .......... 510
Sediq Hamîd Halid (1950) .......... 518
Museddeq Tovî (1954) .......... 523
Sebriye Hekarî (1948) .......... 530
Nezîre Ehmed (Deyka Dalyayê) (1955) .......... 535
Bilind Mehemed (1968) .......... 539
Şukrî Şehbaz (1962) .......... 544
Hikmet Mehemed Hirorî (1963) .......... 551
Kamîran Reşîd Berwarî (1964) .......... 557
Mehemedemîn Doskî (1957) .......... 562
Salim Mustefa Ebdulezîz (1957) .......... 568
Mehemed Ebdula (1964) .......... 573
Hikmet Yasîn Akreyî (1955) .......... 580
Mistefa Selim Akreyî (1958) .......... 585
Xedice Kitanî (1959) .......... 594
Elind Akreyî (1962) .......... 598
Seîd Şerîf Akreyî (1964) .......... 605
Selam Balayî (1965) .......... 611
Selwa Gulî (1966) .......... 619
Dirbas Mistefa Silêman (1969) .......... 625
Aştî Germavî (1969) .......... 636
Ebdulrehman Bamernî (1970) .......... 645
Kemal Silêvanî (1971) .......... 653
Sabir Sindî (1971) .......... 661
Beyar Zawîteyî (1973) .......... 668
Gulnar Elî Baleteyî (1974) .......... 680
Tirîfe Doskî (1974) .......... 693
Cule Hacî Omer (1974) .......... 701
Layiq Kurêmeyî (1974) .......... 709
Qedrî Osman Şêro (1974) .......... 717
Şehab Akreyî (1976) .......... 727
Xalib Cemîl (1976) .......... 733
Xalid Elî Slêvanî (1976) .......... 742
Dilbirîn Halo (1977) .......... 747
Amîna Zikrî Seîd (1979) .......... 755
**FERHENGOK** .......... 767

# PÊŞGOTIN

Her ji berê de, helbestên folklorî yên Kurdî hebûne. Dev bo devî û dem bo demî hatîne vegêran û ji windabûn û mirinê rizgar bûne. Lê yên ku ji layê nivîskarên nas ve dihatine nivîsîn, wek dîroknivîsên Kurd xuya dikin, serekaniyên wan dizivirine sedsala yazdehan “Babe Tahirê Uryan” (935-1010) ku bi zaravayê Lurî nivîsîne (1). Helbest li ber destên feqe û melayan hatine nivîsîn, çinku her ew bûn xwendevanên wê serdemê. Wan helbest divehandin û belav dikirin. Mîna Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî û heta digehêje Cegerxwîn. Piraniya helbestên wan li ser meseleyên tesewuf û evîniyê bûn, lê hindekan ji wan karî ji wî qalibî derkevin û yên siyasî û civakî jî bivehînin. Helbet dezgehên belavkirinê wek rojname, kovar û çapxane tunebûn. Lê dest bo destî diçûn û dema yekem rojnameya Kurdî “Kurdistan” di sala 1898’an de derketî, hîngê wê şiya helbestên hinekan, di nav rûpelên xwe de belav kir. Piştî Cenga Cîhanî ya yekemîn, çend kovarên din peyda bûn û li ser meseleyên, siyasî, edebî û çandî nivîsîn.

Hîngê çend helbestvan, mîna Cegerxwîn, Osman Sebrî, Qedrî Can û Ehmedê Nalbend ji dayîk bûn. Pirraniya helbestên wan li ser meseleyên neteweyî û hişyarbûna xelkê bûn. Herwisa Qedrî Can helbesta Kurdî ji qalibê kilasîkî derkir û ya nû anî nav edebiyata Kurdî. Wan şairan xizmeteke hêja ji bo edebiyata Kurdî kirin û ber bi pêş de birin. Lê piştî sala 1960’î û bi vir de, çend helbestvanên hevçerx peyda bûn û helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirin, hindekan jî çendîn dîwan çap kirin. Wan helbestvanan roleke giring dîtin û qonaxên serketî borîn.

Dema mirov pirsyara helbesta Kurdî, zaravayê Kurmancî, li Kurdistana Başûr dike, yekser navên çendîn helbestvanan rêz dibin. Piştî xebateke germ, milletê Kurd di sala 1970’yî de, şiya hindek mafên xwe yên giring misoger bike. Lewre dergehên çand û belavkirinê mişe bûn.

Hîngê xwendina Kurdî li devera Behdînan dest pê kir -berî hîngê bi Erebî bû-. Ev jî, bo sedemê peydabûna bizaveke edebî ya mezin. Hîngê, bo cara yekê li deverê, helbestvanên mîna Bedirxan Sindî, Ebdulrehman Mizûrî, Xelîl Duhokî bi helbestên xwe yên hevçerx, hatine meydanê û di mîhrecanên edebî de, helbestên xwe xwendin.

Piştî şoreşa Kurdî, ya di sala 1975’an de, bi pîlanên dijminan şkestî, zulm û sitemeka mezin li ser gelê Kurd hate kirin. Girtin û êşkence, kuştin, mişextkirin bo deverên Ereban, wêrankirina gundan, sotina daristanan, kêmkirina xwendina Kurdî û çendîn karên hovane yên din jî, li Kurdistana Başûr, ji layê faşîstên Bexdayê ve hatine kirin. Eve hemî bûne sedemê hişyarbûna xelkê me û li rêkên rizgarkirinê digeran. Li çiya û nihalên welatî,

pêşmergeyên qehreman peyda bûn û li vî alî jî, helbestvanên ku me berê bi nav kirin û çendîn xurtên din jî, mîna Mihsin Qoçan, Vehêl Amêdî, Mueyed Teyib, Mehfoz Mayî, bi helbestên xwe yên bilind û serkeftî hatine qadê. Di gel van jî, hindek helbestvanên din wek Remezan Îsa, Îdrîs Çelkî, Ehmed Qerenî, milên xwe dane yên din û di mîhercanan de, helbestên xwe xwendin û helbesta Kurdî ya hevçerx, ber bi pêş de birin.

Herwesa mirov dikare vê jî bibêje, ku helbesta hevçerx ya Kurdî, ya bi hêz û bi serketî, di salên 1970'yî de ji dayîk bûye, çinku ji layê naverok û formê ve jî, guherîn bi ser de hatiye û pêş de çûye.

Me ev helbestana, ji dîwanên wan, rojname û kovaran, ji hevalan, kes û karên şehîdan wergirtîne û yên bi hêz helbijartine. Dîsan pirraniya van helbestan bi tîpên Erebî hatîne belav kirin û negehiştîne xwendevanên parçên din yên Kurdistana dagîrkirî -hindek tê nebin-. Lewre me bi fer zanî, li ser jiyan û berhemên wan binvîsîn û ji her helbestvanekî, çend helbestan veguhêzîn ser tîpên Latînî. Em bawer dikîn ku dê sûd û mifayê bigehînin û dilê xwendevanan jî xweş kin.

Ev ne vekolîneke li ser helbesta hevçerx a Kurdî (Kurmancî) li Kurdistana Başûr, belku; antolojî û pênasîneke biçûk e. Lê dîsan berhemeke giring e li ber destên rexnegir û bisporên edebiyatê, ku wek serekanî ji bo vekolînê li ber dest bît. Em hêvîdar în, ku li dûrewelatî jî, bêne wergerandin bo zimanên biyanî.


Min dest nedaye devoka helbestan û rêbaza nivîsandina wan û me peyv neguherandine. Ji ber hindê jî, me li dawiyê ferhengokek berhev kiriye ku peyvên giran û herêmî hêsan bike. Herwisa dibe ku pirr xeletî di meseleyên kêş û xalenîşanên hin helbestvanan de hebin. Min berê, bergê yekê, ji wan helbestavanan xemlandibû, yên ku senga xwe di qada hunerî de heyî û navûdeng, ji xwe re peyda kirî. Lê paşî, li ser daxwaza gelek dost û hevalan, min yên çendinên din jî, civandin û ev pirtûk pê xemiland. Êdî, rexnegir û bisporên helbestê, dikarin wan ji hev vavarên û her yekê li cihê wî yê hunerî deynin.

Helbestvanên ku min di vê pirtûkê de rêz kirin, her hemî cihê rêzê ne û dengên wan di esmanê Kurdistanê de, di bilind in. Kovar û rojnameyên Kurdî jî, ji berhemên wan di pirr in. Li gor dîfçûn û xebata min, ez tenê karim van berdest bikim û danime ber destên xwendevanan. Min vê dawiyê şiya hin helbestvanên din jî bicivînim û vê çapa duyê, pê bixemlînim. Lê mixabin, dîsan jî, berhemên hin helbestvanên jêhatî, neketine ber destên min. Hêviya min ew e, ku qulaçeka vala tijî kin. (Swêd 2013)

---

1. Elaedîn Sicadî; Mêjûy Edebî Kurdî, Bexda-1952, rûp 147. Çapa duyê, Serdeşt. Îran.

# Helbestvan û nivîskar Xelîl Duhokî



Di sala 1951'ê de, li bajarê Duhokê, li Kurdistana başûr ji dayik bûye. Di sala 1970'yî de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û ya yekê di sala 1972  ê de, di rojnama Hewkarî de, belav kiriye. Kurteçîrok û vekolînên edebî jî nivîsîne. Di piraniya aheng û fêstîvalan de, helbest pêşkêş kirîne û di rojname û kovarên Kurdî de, çi li nav Kurdistanê û çi li derveyî Kurdistanê belav kirine. Di sala 1973'yan de, bûye endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd. Endamê desteka rêvebera (redaksyon) çendîn kovarên Kurdî bûye. Ji bo demekê, sernivîskarê kovara Berbangê û çend sala, serokê Komela Nivîskarên Kurd bûye li Swêdê. Endamê Yeketiya Nivîskarên Swêdê ye. Endamê Sendîka Rojnamevanên Kurdistanê ye.

Di salên 1974 -1975'an di radyoya şoreşê de, kar kiriye. Sala 1982'an ji ber zulim û stema dijminî. Dîsan kehiştiye şoreşa Kurdî. Lê piştî Enfalên Reş, neçar bûye xwe bigehîne welatê xerîbiyê, Swêdê. Niha jî dîsan vegeryaye welatî û li wezareta roşinbîrî şareza ye.

Heta niha ev pirtûkên jêrî çapkirine:

1. Te çi viya û min neanî. Dîwana helbestan, Kurdistana başûr 1982. Bi tîpên Erebî.
2. Leheng. Li ser nivîsîn û wergerandina çîrokên Kurdên Bakur, ji tîpên Latînî bo yên Erebî. Kurdistana başûr, 1983. Bi tîpên Erebî.
3. Osman Sebrî, helbestvan û şoreşger. Kurdistana başûr, 1983. Bi tîpên Erebî.
4. Gaziyek ji cerigê asiya. Dîwana helbestan, Swêd1989. Bi tîpên Latînî.
5. Min digot û te vedigêra. Dîwana helbestan, Swêd 1990. Bi tîpên Latînî.
6. Ragirtin. Dîwana helbestan, bi Swêdî û Kurdî, Swêd 1990.
7. Helbesta hevçerx ya Kurdî. Bergê I, antolojî, Swêd 1992.Bi tîpên Latînî.
8. Helbesta hevçerx ya Kurdî. Bergê II, antolojî, Swêd 1994. Bi tîpên Latînî.

9. Helbesta hevçerx ya Kurdî. Bergê III, antolojî, Swêd 1995. Bi tîpên Latînî.
10. Antolojiya çîroka nû ya Kurmancên başûr. Swêd 1995. Bi tîpên Latînî.
11. Mirov û welat di helbestên Refîq Sabirî de. Swêd 1996. Bi tîpên Latînî.
12. Peyv û tablo daxivin. Swêd 1997. Bi tîpên Latînî.
13. Helbestvanê tepeser û hejaran, Letîf Helmet. Swêd 1998. Bi tîpên Latînî.
14. Qertelê ji bilindahiyê ditirsiya. Laş Kilîntîng. Çîrok ji bo zarokan. Werger ji zimanê  Swêdî, 1999. Bi tîpên Latînî.
15. Lêopold. Laş Kilîntîng. Çîrok ji bo zarokan. Werger ji zimanê Swêdî, 2000. Bi tîpên Latînî.
16. Du patolên befrê. Çîrok ji bo zarokan. Hîwa Qadir. Ji Kurmanciya jêrî bo Kurmanciya jorî. Swêd 2001. Bi tîpên Latînî.
17. Mereqa li ser Zirafê. Îngegird û Sven Zetterlund. Çîrok ji bo zarokan. Werger ji zimanê Swêdî, 2001. Bi tîpên Latînî.
18. Mereqa li ser Fîlî. Îngegird û Sven Zetterlund. Çîrok ji bo zarokan. Werger ji zmanê Swêdî, 2001. Bi tîpên Latînî.
19. Doktorê hemû tiştan dizane. Matis Rehnman. Çîrok ji bo zarokan. Werger ji zimanê Swêdî, 2001. Bi tîpên Latînî.
20. Mereqa li ser Zirafê û Fîlî. Îngegird û Sven Zetterlund. Çîrok ji bo zarokan. Werger ji zimanê Swêdî, 2007. Bi tîpên Erebî.
21. Helbesta hevçerx ya Kurdî. Çapa duyê. Weşanên Deng. Amed 2007. Bi tîpên Latînî.
22. Mem û Zîn ya ku Mela Mehmûdê Bazîdî, wek cîrok, di sala 1856'an de, nivîsî. Ji tîpên Erebî veguhaztiye yên Latînî. Weşanxaneya Lîs ê, 2007 Amed. Bi tîpên Latînî.
23. Çend stêrên geş di esmana helbesta nû ya Kurdî de. Duhok 2008. Bi tîpên Erebî.
24. Qefteka gulan, ji baxçê peyv û dahînana Kurdan. Hewlêr 2010. Bi tîpên Erebî.
25. Hejarino. Dîwana helbestan. 2012 Lîs. Diyarbekir.
26. Antolojiya Çîrokên Kurmancên Başûr. 2012 Avesta, istanbul.
27. Çendîn pirtûkên din jî, li ber çapê hene.

# Bedirxan Sindî

Di sala 1943'yan de, li bajarê Zaxoyê ji dayîk bûye. Di sala 1966'an de, li Iraqê zanîngeh bi dawî aniye û di sala 1979'an de, li Înglistanê doktora wergirtiye. Her ji sala 1960'î, dest bi nivîsîna helbestan kiriye.

Mişe gotar, vekolîn û helbest bi Kurdî û Erebî jî, di kovar û rojnameyan de belav kirine. Wî ji destpêkê helbest li ser qalibê klasîkî divehandin û gelekî tê de biserkeftî bû, paşê yên serbest jî nivîsîn. Gelek helbestên wî bûne sitran. Çend pirtûkên wî bi zimanê Kurdî û Erebî çap bûne. Dîvaneke helbestan bi navê "Zêmarên Çiya" çap kiriye. Lê ev helbestên wî me ji kovar, rojname û pirtûkan derxistîne. Niha jî li Bexdayê dijî.

**Ev pirtûkên li jêrî gehandîne çapê:**

1. Civata Kurdî di edeba wê de.
2. Sadiq Behaeddîn Amêdî, nivîskarekî Kurd e, 1983.
3. Memê Alan- ji Kurdî wergerandiye Erebî.
4. Zêmarên Çiyayî, Hozan

# BÛKA KURDAN

Ey felek bo te dinalim, bo çi nêrgiz çirmisîn?
Ew çima bextê me wa ye, em bê dost û bê kes in?

Qet dê hêt ew roja me divêt, kehniya warî bizêt
Jê vexwîn destan bihelînîn, jê vexwîn çend me bivêt

Agirê sar û vemirî, çav me lê ye geş bibit
Ew bihara têhnê kuştî, hîvîdar im xoş bibit

Kurdino rabin bibînin, berxekê jar û zeîf
Dane ber pal û kêşana, xencerek dijwar li dîf

Ew werîsê tê alandî, her ji hirya berxî ye
Pê dikêşin ser birînê, bi wî werîsê noxî ye

Mezinan ji mêje wa gotî, dijminê serê xo kew
Dar bi darê têt birînê, destikê bivrî dar e lew

Nê me nalîne ji bivrî, sed hizar cara hewar
Em bi wî bivrî ketîne, hind ne sax û birîndar

Nê me nalîne ji mêje, bo hetavek rohin û geş
Dawetî rabin semayê, pîç biken berperêt reş

Evro kanê li min wê rojê, pir ji xoşî û rengereng?
Vebguhêzin bûka Kurdan, ew torina şox û şeng.

Kanê kew bo çi naxwînin, kanê warê gulgulî?
Lê diçerînin gurg û rîvî, boş e lê mar û kulî

Kanê mizgefta me tê de, sed nivêj rojê kirî?
Kanê dargwîza tê de, şîn gwîze ter me jê kirî?

Kanê rîbara pir bizav, kanê pêlên hêviyê?
Kanê bêrî, ka şivan, geş biken Kurdîniyê?

Ka gelavêja me dîtî, wextekê zêrîn bijar?
Lew me gotî hinde êdî, her dê mînît ew bihar

Baxçeyê vîna nemay, kê we kir kavil bibit!
Torina bextê me evro, kê we kir zîz û sil bibit?!

Evro kanê li min wê rojê, pir ji xoşî û rengereng?
Vebguhêzin bûka Kurdan, ew torina şox û şeng?

Da bibînin kiç û lawan, mil bi mil bêne şahiyê
Bijikînin kul û êşa, li ber hetava sahiyê

Da bihelînim ji Kurdan ala, ser çiyayêt pir ji xwîn
Da hewar kem ji dilek sotî, her bijît serbest û jîn

Ne guneh û ne şerm e jîk, ger me jî ala hebit
Ne omêdek kwîr û dwîr e, bawerî bi sala hebit

Dê ji kiloxêt wan şehîdan, stînekê dirêj vedim
Pêvekim alayê Kurdan, da bigehit tava gerim

Bêjme xelkêt vê cîhanê, navê Kurdan jî heye
Kî dê şêt navê me têk det, hindî ku rêber heye

Evro kanê li min wê rojê, pir ji xoşî û rengereng?
Vebguhêzin bûka Kurdan, ew torina şox û şeng

Bigirnijînin beçkeşêran, ew helal û ew rihan
Biz û zarokêt şehîdan, ew kulîlkêt çi nezan

Bêne hêzkê li nav çinaran, xefk û davêt xo veden
kêl û vêla biçiklînin, bêjneyekdu xo veden

Bêjne şalîl û tivîrka, werne hêlînêt berê
Werne ser gulb û çeqêt xo, bixwînin vê berperê

Berpera jîna me ya nû, ew jiyana dîr ji jan
Dîr ji saliskî û rîmetî, serferazî bo jiyan

Kutrîno daden ji dadê, bo Xudê dadê nekin
Ahremen evroke pîç bî, sed tilîlî bo veden

# WERÎS

Ey werîsê hişk û zivir û lwîl û şûr û daketî
Qet te zanî evroke û bo nêr û mê sewdaketî?

Yan te zanî ho werîso bi gerdena kê ve nîsyay?
Marekê dijwar û reş bûy te vegest û pê ve may

Te şivan girt û pê ve da û bûrebûra pezî ye
Kehrikayek salî kuştin Xudêyo hêşta zwî ye

Ho bilindo ser sêdarê tu di mirina xo bilindî
Ho ye tuxmê serfirazan zwî dibînin roj elindî

Çeng bi balindan neman û sosinan rengê xo berda
Dil gemî bo şev ribatê xwîne derya me ji derdan

Te çi haj eşqa kewan e çi dixwînin şev û roj
Çi dinalin çi dikalin xemgir û kovan û soj

Xem ji tembûrê dibarin ax û ox zirnan dibê
Dil ji zêmarên bilîlan şirke xwîn û zox jê tê

Xo te baş dît ey werîso ka çewan wî ser heland
Hîngê hatî bo semayê dar sema xo li ber hejand

Ho ye ger aşiq sema kir dîn û dunya dê binyek
Kew ji bo eşqa nêrgizê bi werîs pîvane rêk

Lew me narîn û serxoş în, şahid î tu ey werîs
Lew me dîlan e ji mêje bo hetavek geş û sîs

**Ger Melê hîngê bimaba yan jî Xanî hîngê sax**
**Ew ji peyvan da vehînin ji kewê nêr rez û bax**

**Da Melê carek dîtiba li rezî Selwa ciwan**
**Yan jî Xanî dîtibaye Zîn ji Mem re bû mêvan**

**Lê werîs qet tênagehî ah û fîxana Xecû**
**Ku Xecê hate miradê lê mirad ji wêrê çû**

**Lew min jî îro bizav e ez biçînim vê gulê**
**Gerçî nabim xo şagirt jî ez ji Xanî yan Melê**

**Ey werîso pêdivî bû tu bizanî çend ji mêj**
**ew bi niklan ve dizelînin ta bi ta bendkên dirêj**

## DERGEHÊ JÎN Û HÊVIYAN

Dergehê jîn û hêviyan girtî ye dîsan çima?
Ma ji jîna kurtejîn bît, ma ji emrê me çima?

Spêdeya bêtin çi lê bikem, ger di gencî de nehat
Nêrgiza warê me werya û xunavek pê de nehat

Taqeta çerx û sema , me nema yarê bizan
Şînî û girîn bo me man, şerbeta ah û xeman

Lew dinalim, lew dikalim, bilbilo hêlîn herift
Sed hizar hêlîn heriftin, dijmino te heq kerift

Bilbilê bêkes mişext e, kavil e rezê gulan
Agirek berbû hinava û talan e li cerg û dilan

Canêkêt kimêdan revîn, ketine nav çol û çiyan
Rewîna gurgan li nîv şevan, piçandin cerg û siyan

Agirek kete dilê me û çirîskek jê vebey
Kete esmanan û nivîsî, Kurdo tu hebî û hey

Dergehê jîn û hêviyan, girtî ye dîsan çima?
Ma ji jîna kurtejîn bît, ma ji emrê me çima?

Te divêtin ez bimînin, ketiyê barê xo bim
Ez mêhvanê warê xo bim, derozê malê xo bim

Barekêyekcar giran e û pesar e rêka me jî
Şêx 'Ubeyd û şex Seîd in, rohn e rêka wa li me jî

Fenerêt tarîxê di geşin, rohniya çav û dilan
Dê çi xwînin berperan, avrûyê û êş û kulan

Taziya Qazî ji bîr nekin, bo bikin şînî her sal
Kuzirîn gulêt çiyayan, nêrgizêt şeng û şepal

**Ristikêt şenqê bo vedan, canfîdayêt rastiyê**
**Çûne ser sêdar û qinaran, hewar e li Kurdîniyê**

**'Izet û Xeyrî û Qudsî û Mistefa ew çar bira**
**Rohniya çav û dilan, meşxel in ew çar çira**

**Ew çirayê milletî ne, şewq vedan bo me lewa**
**Bilbilên şermîn dixwînin, Kurdo dê rabe ji xewa**

**Dergehê jîn û hêviyan, girtî ye dîsan çima?**
**Ma ji jîna kurtejîn bit, ma ji emrê me çima?**

**Zana û nezan her yek in, Kurdino nabit eve**
**Lew ji êşa em dinalîn, her li me dinya şev e**

**Karwanêt şeva dibûrin, lawik û heyran xoş in**
**Ristikêt stêra disojin, bo me har in lew geş in**

**Guh biden dengê bilûlan, ew çewan bo me distirin**
**Xoş e lê dengê narînan, dilê me tijî kul in**

**Xewneke bişêm bibînin, deverê dilê min xwast**
**Nabitin bo me bibînîn, jêr û jora, çep û rast**

**Nabitin bo me tewafa, ew cihê lê Mem û Zîn**
**Yan biramûsin ew cihê, lê jiyay Ferhad û Şirîn**

**Nabitin biçim nik Xanî, bo vekem dilê bixwîn**
**Yan biçim Dêrsimê, bikelêşim dilê bievîn**

**Dergehê jîn û hêviyan, girtî ye dîsan çima?**
**Ma ji jîna kurtejîn bit, ma ji emrê me çima?**

# MÎRÊ PEYVAN

*Ji seydayê Sadiq Behaedîn re pêşkêş e.*

**Erê sîlav çima evro melîl û hişk û zuha yî**
**Kelê bo çi tu bêreng û ne geşdar û verêl hayî**
**Çira dil tu wesa evro ji kakil re yê arhayî**
**Gotin yaro nê kew rabî sefer kêşa û zava ye**

**Te de rê ey mîrê peyvan, bê saz û maz li pêş te biçin**
**Şagirtên te heq e çûban, bi mewkib ew cilik reş bin**
**Heta peyvên te jî seyda, di vê şi'irê de jî geş bin**
**Xerîbê vê jiyanê bûy, şeva mirinê jî ho maye**

**Ji warê bêkesan kes bû, li baxê xirş ew pir ber bû**
**Çi çaxek bû wî dest pê kir, ku Kurdî hîngê bê ser bû**
**Kewek bû lê neçû ravê, ji kewgeran ne kew ger bû**
**Bi rastî Sadiqî lewre, di dil navê te ava ye**

**Te sîng da ber reşebayan, bi xizmet çûye esmanî**
**Meholên tîj çi car neşyan, bikulin ber derê Xanî**
**Ji torî re tu dergeh bûy, bi sozî xoş zîrevan î**
**Bi bîrî jî qelem geş bû, ewî xizmet neberdaye**

**Çi tavek bû gelo ya geş, li çaxê karî û şevreş**
**Çira bû ew li ber çavan, helat û got ez im ateş**
**Bi kurmancî gemî da rê, li deryayê zimanê xweş**
**Ji pêş leilan wî peyv girtin, niqovanê me Kurda ye**

**Mirîdê vîna Zînî bû, nesaxê derdê Memê bû**
**Rondika Tac û Sityê bû, fîxana Siyo Xecê bû**
**Xoştviyê tav û mijê bû, evdal bû çav her li rê bû**
**Gelo lewre disojit dil, ku cih kew evro vala ye**

# KURDISTAN ROJNAMA MAK

*Pêşkêş e bo rojnama Kurdistan (1898) û sernivîsevanê wê Miqdad Midhad Beg...*

**Kurdistan**
**Rojnama mak**
**Dayka reben**
**Berperên te hêşta di mişext in**
**Peyvên te hêşta di xewna xo de mest in**
**Hijmarên te, kit kit perîşan in**
**Pir jan in**
**Hijmarên te,**
**Rêvîngên paytexta bîn**
**Mêvan bîn û hêşta mêvan in**
**Koçer in. Bêkes in**
**Ketiyên bextan in**
**Hêşta li qonaxeka hêmin**
**Li warekê bêtirs**
**Bi tirs digerin**
**Lê mixabin, çend nêzîk dibin**
**Qonax wê ve direvin**
**War dwîr dikevin**
**...**
**Kurdistan rojnama mak**
**Dayka reben**
**Rêzên berperên te, yek yek**
**Di dilê kewekê kwîvî de veşartî ne**
**Kew têne kehî kirin**
**Xodan kirin**
**Ser jêkirin**
**Têne firotin**
**Lê delala min, dilên kewa kehî nabin**
**Kehî nabin...**
**Çend kewgirên vê dinê**
**Bênê, rojekê bişênê**
**Dilê kewî kehî biken**
**şirîna min neşênê**
**Lewa diyê, Kurdistan**

**Rojnama mak**
**Kew bi dilekê sotî**
**Peyv peyv, her sihar**
**Hemî rêzên te**
**Hemî peyvên te**
**Pêk ve dixwînin**
**Pêk ve dixwînin**
**...**
**Kurdistan, rojnama mak**
**deyka reben**
**Tembûrvanê te, til pê ve neman**
**şev û roja nû davên te dijenî**
**Li hêvyê bû, strana negotî**
**Tu jê ra bijenî**
**Lê şirîna min**
**Miqdad çû,**
**Lawê Bedirxan, til pê ve neman**
**Ji gerhana, pê ve neman**
**Hemî hibrê vê dinê vexwar**
**Lê strana hîviya her nehat**
**Peyvên wê stranê**
**Hêşta di sîngê Xudê de asê ne**
**Înis Pêxamber,**
**Ji binê heft behran hate der**
**Hwîtî berda ji zîndana xo derket**
**Welê strana lawê Bedirxan**
**Hêşta li çi erda diyar nîne**
**Xurto. Miqdado**
**Aşiqê tembîrvan**
**Birawo…Seydayê nivîsevan**
**Çima…?!**
**Çima ava xurtan, serhevraz neket!?**
**Serhevraz neket!?**

# HERSÊ LÊDANÊT DILÊ MIN

*Lêdana yekê*

**Min gote biçîkekê**
**Bikene…**
**Girî**
**Bike girî**
**Kenî**
**Ketim hizra**
**Ev e min çi got û wî çi kir**
**Diyar e biçîke… lewa**
**Biçîk in evan mêjî xava**
**Lê kevokek ji dûr, ji hindava**
**Xwend… Strand…**
**Got şairo!**
**Hizrêt xo neke**
**Ew rast e**
**Keniya bi ferman bit**
**Girî ye**
**Giriya bi ferman bit**
**Kenî ye**
**Dirust e biçîkê sava**
**Çav rohn e, mêjî ter e**
**Hêşta yê pak e, biçîkê sava**

*Lêdana duyê*

**Min gote siwarekê**
**Peya nebe. Raneweste**
**Min hîvî ji te heye**
**Neweste**
**Van du qisêt min**
**Bigehîne dilbera min**
**Dilber sil e**
**Sil e ji min**
**Siwaro dizanim**
**Tu û hesp dê têhnî bin**
**Rê dûr e…**

**Evrazî û nişîv in**
**Hesp kenî**
**Got: Eve stûyê min**
**Bila suyar vexutin**
**Ger têhnî bî**
**Xwîna min**
**Dil xoş be, kaxeza te dê gehit**
**Ger ez û suyar negehiştîn**
**Dilbera te...**
**Dê herdu qesêt te, xwînitin**
**Li ser kevlê min**
**Li ser zîna girêdayî**
**Ser pişta canîka min**

*Lêdana siyê*

**Min gote pîremêrekê**
**Pîr nebe**
**Rawiste**
**Min hîvî ji te heye**
**Nemire**
**Tijî destê neviya û nevîçirka**
**Nêrgiz in**
**Dinya ji nêrgiza mişt e**
**Ha...Ha dê hêt**
**Bibîne berî çûna xo**
**Bibîne kakila jîna xo**
**Got... Mamo**
**Min ji mêje wê dîtî**
**Min xewnek wê dîtî**
**Salek dê hêt**
**Navê cîhana me dê bite...**
**Nêrgiz**
**Peyvên ezmanê me dê bine...**
**Nêrgiz**
**Nivêja xo em dê kîn...**
**Lê li ser şemilkeka pir nêrgiz...**

## DILO MIN Û TE... ME DERSOKA ŞIRÎNÊ RIST

Me rist û me rist û me rist...
Ji davên dilan...
Ji rengê gulan...
Ji rihên bab û bapîran û
Mijîlankên...
Zarokên li ser milan...
Me rist...
Lê mixabin... Sed mixabin
Ser û bin...
Tevna me hat, ne dirust
Tevna me hat, ne dirust!!

* * *

Me rist û me rist û me rist...
Ji pirça Selwayê
Ber kevrê Melê pişta xo didayê
Me rist... Ji nivêjan
Ji semayê...
Lê mixabin... Sed mixabin
Girkên gir...
Ketin nav liban
Li yên jêk fir...
Lew ser û bin,
Tevna me hat, xar û sist
Tevna me hat, xar û sist

* * *

Me rist û me rist û me rist
Me bo şirînê teşya xo rist
Me bada û bada û bada…
Wefaiyê derwêş
Kewê şemzînan, yê sewda û gêj
Li ber teşya me sema kir
Lê mixabin… Sed mixabin
Derwêş beyî…
Teşî şikest û dav verist

* * *

Me rist û me rist û me rist
Bi şaxên kîviyan
Ji kerba Siyabendî
Ji hewarên Xecê
Xo li ser kelexî weşandî
Ji hemî çîrokên evîniyan
Evîniya bitirs
Me rist
Lê mixabin, tevna me hat helweşan
Kesê nekir lê çi pirs
Ne Xudê û…
Ne xorist û…!
Me rist û me rist û me rist
Ji davên birîsiya
Davên zêrîn…
Li esmanên fireh…
Li nîvên şeva diteyisîn
Gilola avirmîşî, me hilkir
Li nav dilan

**Li nav cerg û siyan…**
**Lê mixabin… Sed mixabin**
**Mîrê tevne rêsa**
**Ber berê siharê**
**Ji bê xewî, ji pê ve nivist…**
**Ji pê ve nivist**
**Me rist û me rist û me rist**
**Dersoka şirînê**
**Dilo me rist**
**Ji homêdên birîndar**
**Ji kizgiryokan**
**Bo delalê**
**Bo kewê,**
**Li hişyarî li xewê**
**Te rist û min vehand**
**Lê dilo**
**Pir jan û tijî kulo**
**Dersoka şirînê**
**Ne ya hejî bû**
**Havêt û êxist!!**
**Havêt û êxist!!**

# EYAZ

Çoxê mino…
Çoxê Eyazî
Ji hirya beranan
Beranêt zozanan
Zeriyan… Esmeran… Periyan vehandin
Davên wê ristin
Rondikên xo, zîvavê lê riştin
Bi beybînan… Bi nêrgizan
Bi xîna bihareka vekuştî
Xemlandin
Te pîroz bît, çoxê te Eyazo
Hejarê vê dinê, çima evro…!?
şehlîl li bajêrê xerîbiyê
Ji têhna dimirin. Dimirin
Gelek zû dimirin. Dimirin
Zû ava bî dinya reş e!
Bêsoz e
şehlîlêt vê dinê, li vê sibê
Rabîn xandin
Çoxê mino…
Çoxê Eyazî divehejand
Ji perêt kewan
Ji bêhna binêt sêvan
Ku gul dan
Li bihareka nehatî
Dilan vehand
Ji pisyarêt ser lêvan
Bo çi…?
Kengî…?

Çima...?
Te bar kir bê xatirxwazî
Ji nişkekê ve!
Di rojekê de!
Dilo... Hewar
Me kir gazî
Tembîr şikest
Bilîl têk bîn marê reş
Bo çi...?
Bûka homêda me
Bi strana hêş nehatî
Bi strana di nav cergê sibê
Gest... Gest
Çoxê mino...
Strana te bî, dengzêrîno
Xonalîno
Dilê milletî tembîra te bî
Eyazo...
Hîvîxwazo...
Lê çi bikem bira,
Çoxik teng e
Dil pir peng e
Rohniya çavêt te Eyazo
Dizên şevan birin, birin
Gelek zwî birin, birin
Çoxê mino...
Çoxê Eyazî li ber me ye
Me hemiya stranêt te li ber me ne
Me hemiya dav, dav ezîz in

**Peyv, peyv dixwînîn**
**Dengê te hevalo pir zêrîn e**
**Rengîn e**
**Lê çi bikem suyaro**
**Roj li dîdara te gotin...**
**Kanî Eyaz?**
**Ka dengê bi saz?**
**Çima...?**
**Ji xew ranebî**
**Lê Eyaz çû**
**Eyaz taqek bî**
**Ava bî**
**Xewnek bî**
**Ji xewnan bî**
**Eyaz nivist**
**Nerabî...**
**Zwî zwî nivist û nerabî...**

# Ebdulrehman Mizûrî

Di sala 1946'an de, li gundê Êtotê, li bajarê Duhokê, ji dayîk bûye. Xwendina xwe li Duhokê dest pê kiriye û di sala 1969'an de, li zanîngeha Bexdayê bi dawî aniye. Yekem helbesta xwe di sala 1967'an de, di rojnameya "Birayetî" de belav kiriye, lê ew dibêje: "Sala 1970'î, destpêka rast ya helbestvehandinê ye li cem min."

Mizûrî, di destpêkê de, hozanên klasîkî divehandin. Paşî karî rêya xwe ya taybetî bigire û dest bi nivîsîna helbestên bi kêşa serbest bike.

Wî bi dehan gotarên edebî jî di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Di pirraniya mîhrecanên edebî de beşdarî kiriye. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Heta niha du dîwanên helbestan bi pîtên Erebî çap kirîne:

1. Ji Evîna Çirayên Kevin, 1980.
2. Li Xelkê Tehlê, Li Min şirînê, 1987.
   Ev jî amade ye ji bo çapê.
3. Twêjandina dîwana şêx Nûredîn Birîfkanî.
   Niha jî li Elmanya ye.

# DAYKA ME BARAN DIVÊ

**Dadê, dadê**
**Ez dizanim**
**Dilê te derya êşan e**
**Kuçkê tijî,**
**Pel û jan e**
**Qonaxa dîmahiya karwanê...**
**Derd û xeman e**
**Benderê gemiyên pirî,**
**Ah û kovan e**
**Ez dizanim**
**Hizreta zaroka nan e û ...**
**Bihara te zivistan e**
**Zivistan e**
**Dadê, dadê**
**-Pisyar dikin**
**Ji te re em goftar dikin**
**Te çi divê?!**
**Lezê bike,**
**Bide destê me bersivê**
**-Ho lawên min**
**Dil û mêlak û çavên min**
**Naveşêrim**
**Dayka hewe, evîndar e**
**Evîndar e**
**Derman divê**
**Baran divê**
**Binaxkirina maran divê**
**Vemirîna emrê çewt û...**
**Xwaran divê**
**Ji dil revîn û şikestina,**

**şev û qeyd û hewran divê**
**Wê “lawik” û “heyran” divê**
**Girnijîna yaran divê**
**Baran divê**
**Baran divê**
**Dadê, dadê**
**Peyman bîtin careka dî**
**Xoliya koçkên vemirî...**
**Bikeme agir**
**Hespê min ê bîr û bawer**
**Sîngê xo, bo hejar û pepûkan...**
**Danim çadir**
**Di rêka te de**
**Di rêka serkeftina te de**
**Xo bikeme mûm,**
**Bikeme kavir**
**Xo venedem**
**Rêka karwanî bernedem**
**Hesp û keêlên şikakan...**
**Li gola Wanê av bidem**
**Ne, nerînim**
**Zêriyan ji avê birevînim**
**Bo deyka xo, careka dî**
**Tevên baranê ez bînim**
**Erê bînim**

*22.4.1973*

# BERPERÊ YEKÊ JI DEFTERA XEMÊN MIN

1

Hey yara min
Ez nizanim
Çewan ketme bin perên...
Tarî şevan
Çewan wekî kengir peran...
Keftime ber,
Hinga teva
Çewan zemanê xar û vîç...
Heyva ûmêdên min reva
masiya jînê kete nav
Giriyên kirêtên nehingan...
Nav gerî û devan
Tivîrkan baxê min hêla
Êş û axînk û kovanan...
Zevîka xoşiyan kêla
Herift hêlîna hîviya û
Herift bêla.
Jaro dil
Ma heta kengî dê kevye...
Xefk û têla?!
Xefk û têla?!

2

Hey yara min
Ez melevanê behran bûm
Xendiqandim
Behran pir kwîra çavên te
Sivorê darên gwîzan bûm
Keftime xefk û ...

**Davên te**
**Befra hejaran keviyên zozonan bûm**
**Helandim wê,**
**Tîrojka rû xunavên te**
**Bilbilekê nivistî bûm**
**Hişyar kirim girnijîna şirînan,**
**Wan bîtanokên lêvên te**
**Bêhna rihan û beybwînan...**
**Min nedizanî**
**Heta min hilkêşa bêhna,**
**Biskên ta belavên te**
**Xwezî bes carekê yarê**
**Berî belgên min biweryên...**
**Bigehne min,**
**Silavên te**
**Silavên te**

**3**
**Hey yara min**
**Ma gulê... Çi biha heye**
**Bêyî bilbilî?!**
**Çavî... Ma çi biha heye**
**Bêyî evîna,**
**Reş kilî?!**
**Xunavê... Çi biha heye**
**Ger nekevîte ser rûyên**
**şengekulîlkên mexmelî?!**
**Bûkê... Ma çi biha heye**
**Eger zavayekê şeyda...**
**Destî nedanite ser milî?!**

**Hey yara min**
**Ma Memoyekê wekî min biha heye**
**Eger Zîneka weke te,**
**Palnede te textê dilî?!**
**Eger Zîneka weke te,**
**Palnede te textê dilî?!**

**4**
**Hey yara min**
**Kî stranên evînê...**
**Ji dil bo te xwînît**
**Ez nebim**
**Kî dê herdem**
**Bo te ji stêrên esmanan...**
**Ristika vehînît?!**
**Ez nebim**
**Kî dê qeftên sîsinokan...**
**Kete gilwaz,**
**Di stûyê te alînît?!**
**Ez nebim**
**Kî dê bo te toq û berbenan...**
**Gula çemînît?!**
**Ez nebim**
**Kî dê bo mêrgên jîna te**
**Bo çîmenên evîna te**
**Teva barînît?!**
**Ez nebim**
**Hey yara min**
**Kî dê rast bê peşîmanî**
**Li ser deftera,**

**Dil û canî**
**Wek rezvanî**
**Navê te çînît?!**
**Ez nebim**
**Navê te çînît?!**
**Ez nebim**

**5**
**Hey yara min**
**Xwedana wan çavên wekî,**
**Kaniyên zelal**
**Xwedana wê pirça wekî,**
**Tavgeh û celal**
**Dê were dê:**
**Bibe peyv bo rêzên…**
**Deftera min**
**Bibe bişkojeka vebî…**
**Bo jîna pir kesera min**
**Bibe perdaxeka pir mey…**
**Bo hişkelêvên têhniyên,**
**Cegera min**
**Tên… Bo zevera min**
**Gemî… Bo wexera min**
**Çirîsk… Bo fenera min**
**Dê were dê,**
**Bibe heyveka çardeh şevî û…**
**Silava bike pencera min**
**Hey yara min**
**Hey yara min**

*18.8.1975*

# EGER EZ

**1**

**Eger ez koçerek bûma û ...**
**Gotibana min:**
**Kewalên xo,**
**Bibe behiştê biçerîne**
**Behişt cihê giyayê şîn e**
**Da bêjim ne**
**Berê pezî**
**Dê dem zozan û kêriyan**
**Warê nefel û tevriyan**
**Bo nav govend û şergehan…**
**şengebiyan**
**Da nebêjin**
**Çi warekê bêxudan e**
**Xudanên wê ji xo nagirin,**
**Bixo bikene**
**Hevşî û koz û çerwane**

**2**

**Eger ez çîçikek bûma û ...**
**Gotibana min:**
**Here hêlînekê dane**
**Her da zivirim**
**Li giş qolaçên dinê çewrim**
**Dîmahiyê…**
**Darmaziyeka**
**Serbilind a betenokên te welat û,**
**Bo hêlînê**
**Bo tozgevizka vê jînê**
**Da helbijêrim**
**Helbijêrim**

**3**

**Eger ez nêrgizek bûma û…**
**Gotibana min:**
**Here binve di qafkekê de**
**Xo bihejîne û vira dane,**
**Di nav dîwan û …**
**Koçkekê de**
**Da bêjim ne**
**Mala min ji wê derê bar kin**
**Bejna min ya şeng û zirav…**
**Di ber toq û biska bêriya,**
**Vî gundî re**
**Xwîl û xar kin**
**Ger şivan hat**
**Da bileyzît ji keyfa de**
**Ev sed cara xoştir e…**
**Ji dîtina tilgeniyên,**
**Di text û telar û koçka de**

**4**

**Eger ez şairek bûma û …**
**Gotibana min:**
**Here hozanekê birêse**
**Bistire mîna Bilêse**
**Da ez çikek?!**
**Da qebqeba kewan berdem**
**Direwên darkokan birim**
**Wekî bazirganê dilsoj…**
**Gulan kirim**
**Serhevraz, berif jêhel**
**Bo gopîtka jêhatiyan…**

**Rastiyê firim**
**Eve ye ristika hozanan**
**Eve ye tîra kivanan**
**Da bizanin**
**Bo hetavê**
**Bo ewê bîka çiravê**
**Çitov dildarekê çirim**
**Çendî çirim**

**5**
**Eger ez rîbarek bûma û ...**
**Gotibane min:**
**Ka navê xo bo me bîne**
**Ka hewiya xo**
**Ji me re bixwîne**
**Da bêjim ez**
**Rîbarekê xudan pêl im**
**Qira ku ava min bidizît...**
**Bo nahêlim**
**Tu bizane:**
**Her hîviyeka xelkê firot**
**Her Memoyê di gel Zîna xo...**
**Nebûye cot**
**Her Huseynê di Kerbelayê de...**
**Av negehiştiyê vexot**
**Her birsiyê Qoçaliyê...**
**Tibla dimêjît, nav mişot**
**Her sêwiya li qesra axay**
**Neşêt kaşî û ...**
**Cilka bişot**
**Li kenarên xo ez av didem**
**Bo maçîkirina rojeka,**

**Pir ron û geş...**
**Ez pal didem**
**Ez pal didem**

**6**
**Eger ez Derwêşek bame û ...**
**Gotibane min:**
**Wekî teyrê,**
**Mest û serxoşê nav refê**
**Hilo pilavêje defê**
**Da bêjim ne**
**Me jî veda ew berperê**
**Qirşû kefê**
**Ez ê rabim**
**Lawkekê nû, ji we re xwînim**
**Keziyên Xecoka Silîvî...**
**Ji dil vehînim**
**Tembûra Feqiyê Teyran...**
**Bo pizokan**
**Bo bîtanok û kevokan**
**Çak şarînim**
**Wekî xurta**
**Ava vî gundî serhevraz,**
**Bo serekaniyê zivirînim**
**Zevîkan ade kem, şe kem**
**Tev dergehên daêxistî...**
**Bo xatwîn tîrojkê vekem**
**Ew landika nav daye min**
**Ew dara sîtav daye min**
**Dar û bera,**
**Têwer nekem**
**Têwer nekem**

7
Eger ez kaşoyek bûma û ...
Gotibane min:
Bo çi te pişt,
Ya çemyaye xaro ve?!
Pişta xo rast ke hilo ve
Da bêjim ez
Bo çi xemên pirteqalên,
Cinîka Mehmûd Derwêşî...
Bûne gilwaz û tilove?!
Bo çi werzê
Xanî ji dil perçan kirî...
Herê bê dan û bê tov e?!
Ew bihara Nîrodayî pal daye nav,
Xert û şov e
Xanima dilbera Lorkayî...
Ji nav deftera şi'irên wî,
Rabû çûve
Lewre pişta mina qof e û
Rast venakem
Yan dê mirim
Yan lîsekê,
Bo dîkilên bangên spêdan...
Dê ava kem
Dê ava kem

8
Eger ez şahînek bûma û ...
Gotibane min:
Lo şahîno
Xemkomkero, xemrevîno

**Çima dengê te nahêtin?!**
**Takê ku te, dadaye ser**
**Nabilind bît û hejyêtin**
**Da bêjim ez**
**Teva barana dengê min,**
**Çik nebûye û ...**
**Her dê hêtin**
**Ji mêj ve bapîrê min gotî:**
**Coka av lê çûyî carekê,**
**Dê her lê çît û ...**
**Dê zêtin**
**Evîna cama dilê me mişt kirî,**
**Ne xar dibe û ...**
**Ne tê rêtin**
**Ew Mîhrebana Berwarî...**
**Hindî şeva dirêj bîtin,**
**Spêdê meşka xo dê kêtin**
**Nebêje min**
**Mêw êdî nadetin tirî**
**Nebêje min**
**Bazê ji hêlînê firî**
**Nebêje min Derwêşê Evdiyê mirî**
**Êdî şepal e Edlayê...**
**Narevêtin**
**Nebêje min**
**Nebêje min**

*20.5.1977*

## STRANEKA NÛ YA KAWIS AXAYÎ

**1**
**Lo Xalo**
**Sahî nema**
**Payîz hat û...**
**Dada çema**
**Kirosk ji bo spêda naxwînin...**
**Ji ber xeman**
**Xalo çima?!**
**Mêwa tirî**
**Ne bêsîre da û ne tirî**
**Tenûra sewkan ya mirî**
**Kûza mamê Xemo...**
**Barovê xwar û vedurî**
**Sumên hespê xo biçîne,**
**Li serê girî**
**Paşî temaşa ke Xalo**
**Hêza şevê**
**Hêza xemsarî û nelivê**
**Wa çi li me kirî!**

**2**
**Lo Xalo**
**Siyar ji kimêdan direvin**
**Nîşanên evroke di geş...**
**Zik û devin**
**Tîrên berwar**
**Rêka dîwana rastiyê...**
**Vênakevin**
**şalok û das...**
**Bo maçîkirina guliyên şenggenimî,**
**Qet nalivin**
**Vede bi xo kêleka nû...**
**Kêla berê,**
**Bo beroka pêla kevin**
**Hîviya me**

**Bo bûka nedîtî xena**
**Bo terzina kezî zerbûy…**
**Li ber betena**
**şêlkên baranê ne û tev in**
**Xalo tev in**

**3**
**Lo Xalo**
**Dinya dihijyêt, xirab nabît**
**Befir xatwîneka sar e û …**
**Lê venabît**
**Ew siyarê…**
**Jor de nehêt û nekevît**
**Li ser pişta**
**Canî û keêlên ku wekî,**
**Bayê bezê**
**Duta nabît**
**Roja bête,**
**Hindavî axa welatî…**
**Xort û sîpe,**
**Ger lê hestin**
**Dest û piyan lê bibestin**
**Ava nabît**
**Tîra şeyda û sotiya…**
**Du belek çavên nîşanê**
**Gazî diket,**
**Ka ew kivanê nivistî?!**
**Bila rabît**
**Bêje qolqolên tariyê…**
**Sîbera dara gwîza me,**
**Hemî gava bo te nabît**
**Bo te nabît**

**4**
**Lo Xalo**
**Benda Romiya bendeka dirêje Xalo**
**Hat leşkerê şepola reş…**

**Wekî belgên daran e Xalo**
**Evro li bêdera xwast û hîviyên…**
**Xanê Lepzêrîn,**
**Talan e Xalo**
**şûrelewendiyên kevokan birîn,**
**Neke tirane Xalo**
**Gurzên me bo pencên tariyê…**
**Find û çira ne Xalo**
**Kê gotiye me berên sengers xarîne Xalo**
**Kê gotiye me xewnên dilbera**
**Sotîne Xalo**
**Me ji van**
**Berdî qareman e Xalo**
**Me ji van**
**Berdî qareman e Xalo**

**5**
**Lo Xalo**
**Ewrên me, direwan naken**
**Dê baran hên**
**Bihar ji zomên me bar naken**
**Dê kanî zên**
**Dê bîte barbara karan**
**Hey heya xurt û siyaran**
**Dengê stran û xoşî û…**
**Serniqaran**
**Dê gehîte**
**Hemî xîvetên koçeran …**
**Hemî waran**
**Straneke bo te dibêjim**
**Lo Xalo**
**Belkî tu biye ji guhdaran**
**Tu ji guhdaran**

*23.6.1977*

## ÇEND WÊNEYÊN SAVA

**1**
**Ronahiyê carekê gote tariyê**
**Were, bo te du çavên geş**
**Têr binêre,**
**Bejnên keleş**
**Tarî tirsinok e, revî**
**Wekî qolên çekçekîlan…**
**Kete şikefta û dar û devî**
**Min wê gavê**
**Zanî eger**
**Zilkek tinê**
**Xo bisojîtin bo rastiyê**
**Milletek dê pê bît xinê**
**Tarî dê ji ber,**
**Mişext bîtin**
**êdî naket ripinê!**

**2**
**Mêwa tirî**
**Carekê gote histirî**
**Ger tu nanê jaran nebî**
**Fêqiyê rêbaran nebî**
**Sîbera şengebêriyên…**
**Waran nebî**
**Meya lêvên hevrî û…**
**Dildaran nebî**
**Baran nebî**
**Baştir ew e, her tu nemînî û …**
**Tu nebî**
**Her tu nebî**

3

**Spêdeyekê**
**Rîbarî gote aqarî**
**Piştî êşim**
**Natebitim**
**Hevsara cokan dikêşim**
**Ewrên esmanî digivêşim**
**Da baran bêt û av bidem,**
**... Zevî û axan**
**Da şîn bikem**
**... Hîvî û daxan**
**Tu çi nakey**
**Lewren her pîş û pelexî**
**Bo sum û solên biyaniyan ...**
**Her kelexî**

4

**Ciwan kevokan**
**Carekê gote çeqokan**
**Bo we şerim û fihêtî ye**
**Hemî gava,**
**Bîsta we li ser me ketiye**
**Ya çûy çû**
**Ji evro pê ve:**
**Yê ava gundî şêlîket**
**Yan zêlîket**
**Weku kelem û dasiyan...**
**Bidîf êlî ket**
**Ger diwêrin**
**Herin navê wê veşêrin**
**Yan bes hwîn bo**
**Ciwan kevokan,**
**Xort û mêr in?!**
**Xort û mêr in?!**

**23.10.1978**

## HEYRANOK...

Keçkê dînê
Kê gotiye
Tu li ber çavêd min
Ya ketî yan dê kevî... ?!
Kê gotiye
Dê carekê masî sil bît,
Ji ava şetî... ?!
Her evîndarê caran im
Evroke tu
Li evê deşta pan û berîna dilê min
Tinê, tinê
Xudan reşkon û ...
Xîvetî!

Kurko dîno
Perîşan im min xew nayê
Leylîxana çilkezî me...
Keftî me ber, hinga tayê
Dê were destê xo
Di gerdenoka min werîne
Berî mercank û moriya...
Rarevên dwîlkê dunyayê

Keçkê dînê
Çenda dûrî, ya nêzîkî
Te bi awirên xo vekujtin,
şikak û Millî û Kîkî
Ez ê xewnekê dibînim:
Zavakê barovê ez im

**Tu jî ciwanê,**
**Li textê azadiyê bûk î**

**Kurko dîno**
**Yê min dixwazin**
**şuwa nakem**
**Dest û berîkêd bavê min**
**Pir gotin û jivan biken...**
**Bi ya wa nakem**
**Piştî bejna ter û tola,**
**Siyabendî û Memê Alan...**
**Jehremar bît,**
**Mêran nakem**

**Kiçkê dînê**
**Evroke aşiq neêk e,**
**Ew tijî ne**
**Ez im, Cizîrî û Xanî ye û ...**
**Cegerxwîn e**
**Bawer bike ciwana min ê**
**Peyva ji bîrkirina navê te**
**Di defterkêd me de nîne**
**Di defterkêd me de nîne!**

*29.8.1982*

# HEYV

Dengekî got:
-Bo çi dema heyv dihelêtin
Tu berê xo,
Jê werdigêrî û...
Te nevêtin?!
-Min nevêtin:
Çunku herro têt û meşka,
Dînekê taze dikêtin
Car xo dikete
Naneka gerim û qelandî...
Bo birsiyan
Car xo zirav û dirêj diket,
Wek qamçiyan
Careka din
şîr û şalok e di destê,
Tev Ejdehak û tajiyan
Heyveka sara wek twîla...
Herro xo di axekê vedet,
Min nevêtin
Xo ew bibîte ciwaneka kenîtera
Çardeh salî û ...
Dergehê dilkê min biqutît
Ez dergehî lê venakem
Bila zîz bît û nehêtin
Min nevêtin!

*1982*

## LAWIK

Kekê min o
Çerxa van rojan û şevan…
Çenda xar e
Ne şilqek bi vê gomê dikevît
Ne pêlêd rûbarê zuha,
Têne xar e
Eve serê hinde salan û mehan e…
Dibizivim
Xo dihavême gera mirinê
Di nav agirî de dinivim
Da lîsekê,
Bo zarokên xo binijînim
… Çû ne diyar e!
Kekê min o
Xemêd min naçine nav,
Çû deftera
Kulî beşkî…
Xerzê xo rête zeviyan
Sîbera xo,
Kêşa hindavî geliyan û…
Çi tişqilî di va deveran… ?!
Dê rabe kekê min rabe
Hespê xo têz ke
Rima xo gerim ke
Çavekê li dûr û piştêd gundê me bigêre
Vî derdî ji canê wî bişû…
Vavêre keseran
Kekê min o
Çi dareka rihdirêj im,
Di vî warî de
Ba û bahozêd payîzê,
Belg werandin…
Ta qirandin…

**Çi bêbext in di vî karî de... ?!**
**Belê keko**
**Hemî bihareka taze**
**Êşa dikujim**
**şaka dihavêm**
**Kesk dikem xemlê**
**Wekî xortezavayekê...**
**Di jiyê çardeh salî de!**
**Kekê min o**
**Ava vî rûbarî çima,**
**şêl û bêl e... ?!**
**Bo hindeka**
**Qend û hingivînê mêşan e û...**
**Bo me jara hemîşeyan,**
**Xar û xêl e**
**Ez ê rabim berê vî rûbarî rast kem**
**Serhevraz kem**
**Da bigehîte,**
**Com û omêdêd têniya û ...**
**Gişt nihêle**
**Kekê min o**
**Eve hateve û xerzê,**
**Qelereşka**
**Xewin sotin...**
**Hîvî dotin...**
**Mirandin miştaxên tirî û ...**
**Xêrêd meşkan**
**Dê rabe destêd xo helke û ...**
**Hêrişeka mêrane kel ke û...**
**Bihêle tu teşmokê wan**
**Careka dî,**
**Bikevît teşkan**
**Kekê min o**

**Hayê hayê**
**Min û te û evê êşê û ...**
**Vê belayê**
**Xo berdaye şar û gundan û ...**
**Dar û beran û ...**
**Zevîk û bêderêd kayê**
**Dê rabe kekê min rabe**
**Xo bike teveka baranê û ...**
**Gurmêneka**
**Heyva gulanê û ...**
**Bişû kolanêd gundê me,**
**Ji vê tayê**
**Kekê min o**
**Ez dizanim bi kul û janî**
**Ne ev şeva tehil û giran...**
**Rihêd xo ji nav me dikêşît,**
**... Diçît bi ciwanî!**
**Ne ji evan tarî ewirkan...**
**Têt baranek,**
**Bizêt kanî!**
**Ka baxve**
**Çitov teyrî...Çi siwarî**
**Di ser sînorêd sê dewleta re difirî,**
**Xir dikey danî... ?!**
**Kekê min o**
**Siyabendê Silîvî me**
**şeva dibirim**
**Li ser banêd ewran difirim**
**Perdaxeka azadiyê min divêtin,**
**... Pêdivî me**
**Hindî reş çavêd Xecokê...**
**Biteyisin...**
**Bilqan biden**

**Wekî steyrokêd esmanan…**
**şilqan biden**
**Li ser evîna xo yê riştim**
**Lê venabim,**
**Bi hîvî me**
**Kekê min o**
**Di nav çeperan de omêd bûyîn**
**Di nav çepera de dê mirîn**
**Em ê çavêd ronahiyê û …**
**şengesolavêd rastiyê**
**Bi cana dikirîn**
**Roj bo rojê bilind dibîn**
**Berfstêra**
**Berferşê gurd û mêran**
**Bo serbanê rojê,**
**Difirîn**
**Kekê min o**
**Evî kewî çi qebqeb e… ?!**
**Nêçîrvano**
**Hey tajî yê ravêd xelkê û …**
**Serşûrvano**
**Di nav rikê de**
**Di nav berfê de**
**Di nav agirê dozexê de**
**Ez namirim**
**Li hîviya mirina min,**
**Qet nebe!**

*28.6.1984*

## XEM KEÇEKA KURD E

**Em û ew di şevekê de,
Xudê dane
Vêkra em mazin bûyîn... Rabûyîn
Ew bû bok û ...
Em zavay ne
Di gel rûbarêd me dizêtin
Di gel zarokêd me şîrî dixut
Li ser textekî... Li ser cihekî
Em û ew pêk ve dirazayne
Heçiyê xem nediye
Xem kiçeka Kurdî ye
Hera bi kiras û kurtek û ...
Guharêd Heyderanî ye
Sola di lingê wê de jî,
Ji çêkirina hostayekê Babanî ye
Xoş xoş diçîte govendê û ...
Keyfa wê li ser şêxanî ye
Ev xema he
Di gel koçerêd me yêd dêrîn...
Herdem dihate zozanan
Hay jê hebû
Bigire û bikêşa şivana
Li ser çerwana
Bi çavêd serê xo dîtiye:
Demê Xecoka çav belek...
Siyabend kujtî,
Bi kovanan
Ev xema he
Di gel birsî û zîvarêd me,
Diçû aqara...
Komir dibirî... çulî dikêşa
Kezî-biskêd xo girê didan
Zend û baskêd xo heldikirin
Bivbiva wê bû ji tiraşê bo tiraşê
Nola mêşan**

**Êvarî jî diziviri kulk û zincêd me,**
**Fire westiyayî û kerixî…**
**Can lê têşa**
**Ev xema he**
**Li mala Cizîrî dinivist…**
**Hevgura wî û Selma yê bû**
**Ne ji wêrê diçû… Ne jî dimir!**
**Hestîgiran…**
**Wek tayê bû**
**Di ser hindê re jî sil nedibûn**
**Hersêya ji qazanekê dixwar**
**Bo wan ew şûna dayê bû**
**Ev xema he**
**Carna difirî**
**Diçû dadida Burca Belek,**
**Li dîwana Bedirxanî…**
**Di nav qehwa wî de digerya**
**Di bin kurkê wî ve diçû lîsî û …**
**Mîna peloxêd agirî,**
**Li ser qelona wî didanî**
**Heta li serî befrê spî kir**
**Bextê wî rekir, vajî kir…**
**Heraftin lê nav û xanî!**
**Ev xema he**
**Salekê tev çûl û çiya…**
**Bitinê birîn,**
**Çû def qazî**
**Her weku têşka roviyan,**
**… Bi fêlbazî**
**Rabû kopalê wî şikand,**
**Li wî hevrazî**
**Qazî jî pîrekê kalê bargiran bû**
**Rahejya û ket**
**Hemî şadî û xoşiyêd wî…**
**Bonef tazî!**

**Ev xema he**
**Birastî diya bavê min bû**
**Lew digotnê Salihê Xemê**
**Xemêd wî jî gelek hebûn**
**Dibarîn mîna keserêd,**
**... Zînê û Memê**
**Ketiya wî,**
**Zevreka xar û werpêça...**
**Rêya wî di nîvê re tor bû...**
**Ev xema he**
**Vê êvarê li mala şêx Mûsa,**
**Distirî**
**Gûmêd coşa wî şilqandin...**
**Sikrêd soza wî peqandin...**
**Pawanê hîviya lê durî**
**Bi carekê**
**Cegerê têk perityê wî,**
**Bo derd û xon û...**
**Kuzirî**
**Ev xema he**
**Hindek şeva lebleban e...**
**Dergeh-dergeh malan diqutît**
**Diçîte jor**
**Dileyzîtin**
**Saz û awazan gerim diket,**
**... Dijenît bilûr**
**Pis û zarok...**
**Jê ditirsin... Xo vedişêrin**
**Nifrîna bi zarê xo dibênê û ...**
**Naçine dûr**
**Ev xema he**
**Heyamekê...**
**Desgirtiya hevalekê,**
**Hêjay min ê bi zend û mil bû**
**Herro destê xo di stoy diwerand**

**Xo têvedida...**
**Di gel di lorî...**
**Dizanî hêlê dil kul bû**
**Roj ava bûn...**
**Hevalê min, çûl bi çûl, berî bi berî**
**Xo jê qetand û teriqî**
**Hind nema bû**
**Hemî bûna wî ji ber wê,**
**Tev de helyêt**
**Wesa pil bû!**
**Kiçê xemê,**
**Xapînokê**
**Aşiqa lawik û beten û ...**
**Çiyakêd me**
**Wek tevrî û batînokê**
**Dê carekê:**
**Ji ser mijganêd me yêd çemyay...**
**Were xarê û dakeve**
**Ji nav nivînkêd me,**
**Derkeve.**
**Hema bihostekê xanim**
**Ji kincirekon û reşmalêd me,**
**Dûr keve**
**Te mala bavê şewitiyê**
**şev û rojan...**
**Me ji ber te her xar û rev e**
**Em ji dijwar e tîrêd te qurtal nabîn**
**Tu bi Xudê key bes ke,**
**Bi dûf me nekeve!**
**Bes ke,**
**Bi dûf me nekeve!**

*14.12.1985*

# Xelîl Duhokî

Di sala 1951'ê de, li bajêrê Duhokê hatiye dinyayê. Heta bi berheviyê xwendiye. Ji sala 1970'yî û pê de dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Çendîn çîrok jî nivîsîne û belav kirine. Di piraniya rojname û kovarên Kurdî de, helbest û vekolîn belav kirine. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd û niha jî endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêdê ye. Di pirraniya mîhrecanên edebî de helbest xwendine. Jimareka wan jî wergerayne ser zimanê Erebî û Swêdî. Di sala 1982'an de, ji ber terora rijêma faşîst ya Iraqê reviye û gihaye rêzên şoreşa Kurdî. Niha jî li Kurdistanê ye.

Heta niha ev pirtûkên jêrîn û mişe pirtûk bi tîpên Erebî û Latînî gehandine çapê:

1. Te çi viya û min neanî- dîwana helbestan, 1982.
2. Gaziyek ji cergê Asya- dîwana helbestan, 1989.
3. Min digot û te vedigêra- dîwana helbesta, 1990.
4. Ragirtin- dîwana helbestan, bi Kurdî û Swêdî, 1990.
5. Leheng- vekolînek li ser çîroka kurt ya Kurdî, 1983.

   Heta niha 25 pirtûk, li ser helbest, kurteçîrok û vekolînên edebî, çap kirîne.

## KELEKVANO

**Kelekvano!**
**Aveke bûş e pir pêl e.**
**Me nehêle.**
**Evî qîtê me komkirî, wî lê bike.**
**Derbaz bike.**
**Ji destên dijminê neyar.**
**Bê birîn û paş bê hewar.**
**Kelekvano!**
**Were bibîne zarokê day lê mirî.**
**Gorî kirî.**
**Vê bîjina mêr lê nemay,**
**Şehîdkirî.**
**Birîndarê birîn evro lê kul kirî.**
**Kê sax bikem!**
**Kê ji pencên van dirindan rizgar bikem!**
**Lê nêzîk e difna dijminan bikem bêder,**
**Ji dil cencerê li ser bikem…**
**Kelekvano!**
**Kavlekê hey li ber girî,**
**Bê dergeh e, ew yê me ye.**
**Hindek zarok tê de dijîn,**
**Şepirze ne!**
**Hêj biçûk in, çi nezan in, ew yên me ne!**
**Zûbe vî qîtî bigehîne.**
**Ji destên xwînmêjan derîne.**
**Hêj nû mal în…**
**Kêm heval în…**
**Li cem dijminan em çi nîn în.**
**Ya ji wan ve, em qaçax în…**
**Yan rêgir în…**
**Em karwanan dişelînîn.**
**Yan zarokan diqelînîn.**
**Ne we nîne…**
**Ne bi gorên tev şehîdan, ne we wenîne…**
**Belê me divêt em jî bijîn**
**Wek milletan.**
**Bes bimînîn li bin destan.**
**Kelekvano!**

**Bîstanên me hişik kirin…**
**Av jê birin.**
**Zarokên me ser jê kirin.**
**Ev sorgulên bi xwîna me hatîn çandin,**
**Ji nav birin.**
**Di ser hindê re we dibêjin!**
**Lê ya me divêt rojek nû ye.**
**Buhareka xemlandî ye.**
**Gulên weryay sera rakin.**
**Ev hejare kolkên herriftî ava kin.**
**Me ev divêt, lew dibêjin**
**Kurd qaçax in… Kurd rêgir in…**
**Kurd karwanan dişelînin…**
**Kurd zarokan diqelînin…**
**Kelekvano!**
**Hindî kulyên xore hebin**
**Li nav genimî dirrinde bin**
**Dê carna em jî birsî bîn…**
**Xudan kelem û stirî bîn…**
**Welê bila ew her hebin**
**Her mişe bin**
**Ew bi tinê dê rûreş bin**
**Demê rojeka nû dihêtin.**
**Zû dihelêtin.**
**Dê her êtin.**
**Kelekvano!**
**Rabûre bêje cîhanê**
**Bêje cîhanê rastiyê.**
**Kî ne hevalên aştiyê û tenahiyê?**
**Bêje çi ne?**
**Kurd çi tuxm in?**
**Rast qaçax in!**
**Rast rêgir in?**
**Yan divên mafan wergirin…**
**Dê wergirin… Dê wergirin…**

*Duhok, 1973*

# GAZIYEK JI CERGÊ ASYA

**Ho birano**
**Rêvîng in em her bê çira!**
**Erê çirra!**
**Li nîva şeva reş û tarî.**
**Ne heval û hogir hene,**
**Hilgirin harî me barî!**
**Ma dibîtin**
**Kotirkên me mişext bibin!**
**Hêlîna bihêlin derbibin.**
**Werin evroke bibînin**
**Kelexên çîçik û poran,**
**Li çal û koran, îro rizîn.**
**Kevokên me, li hemî nizaran qirrqiçîn.**
**Masî hatine daîran yan xendiqîn.**
**Lê birano**
**Her çend kelek, dar belav e.**
**Rûbarek pirr tor û dav e.**
**Lê me xebat û bizav e.**
**Çinku gelo**
**Kewên me her yê diqeb in...**
**Mahînên me hemî sihara dişih in...**
**Gulên me çandîn namirin,**
**Her digeh in...**
**Bawer biken, dê rojek hêt**
**Her çar qulaçên dilê me,**
**Geş bin, vebin.**
**We diyar e tev dijminan ne li bîr e**
**Yê ku evro şehîd dibît**
**Gorî axa pîroz dibît**
**Bi serferazî... Bi şanazî...**
**Gencekê dî**
**Bi tiveng û rextan radibît**
**Çinku birano ew bêhna,**
**Paşerojeka geş û nû**
**Dihelkêşît... Dihelkêşît...**

*Duhok, 1974*

## AGEHDARIYEK
## JI BO CIVATA MILLETÊN YEKGIRTÎ

"Piştî pezî ser jê dikin,
Digurên û kevil dikin.
Lê evroke li welatê min,
Berî mirovî bikujin,
Di zîndanan de kevil dikin... " (1)
Erê gelî daxazkerên serbestiyê
Yên aştiyê û tenahiyê
We dîtiye?
Dîroka milletê me jî bihîstiye!
Li welatê min, ker û gulkan,
Gêrê dikirin.
Niha dizirin.
Li geliyê Zîlan(2) û Çarçira(3)
Hizaran xelk, bin ax kirin.
Li Sorya(4) û Dekan (5) sotin.
Gulebaran kirin.
Zîndan di pirr in.
Lê xelkê me,
Şengedoza xwe bernedan,
Xendek, çeper çol nekirin.
Pa dê werin!
Hûn li çi digerin!
Xwîn ya pengî.
Li kî derê û kengî,
Zikê jina avis bi şert
Dihêt dirandin!? (6)
Li kî derê û kengî,
Mirov bi saxî dihêt veşartin!? (7)
Li kî derê û kengî,
Li şûna diyariyên sersalan,
Napalm û top,

**Ji bo zarokan dihên hinartin!?**
**Lewre gelo**
**Di nav kelexên mirovan da...**
**Di nav darristanên sotî da...**
**Di nav xanîkên herraftî da...**
**Ez li azadiyê digerim...**
**Her ya fere pêş de herrim.**
**Bawer dikim.**
**Rojeka nû wê ji me re bêt.**
**Buharek û kanî bizêt.**
**Li serê gir û kopêt çiyan**
**Li serên riyan**
**Agirekê geş hil bikîn...**
**Kurdistanê bixemlînîn, himbêz bikîn...**
**Newrozekê ji dil bikîn...**
**Cejna we û xelkê jêrdest,**
**Pîroz bikîn...**
**Pîroz bikîn...**

*Duhok, 1974*

1. Ji helbestvanê Ereb, Ebdulwehab Beyatî hatiye wergirtin.
2. Piştî şoreşa Kurdî di sala 1928'an de têk çûyî, humuketa Turkiyeyê, hizaran xelkên çendîn gundên Kurdistanê, di geliyê Zîlan de, dane ber topan û piranî şehîd kirin. Dibêjin: Rûbarê di gelî de diçû, ji xwînî sor bibû.
3. Di roja 23.1.1947-an de, di qada Çarçira de , serokê Komara Kurdistanê li Mehabadê, Qazî Mehemed û hevalên wî, bi destên rijêma şahê gorbigor hatine bidardakirin.
4. Sorya, gundek e dikevîte devera Behdînan, nêzîk bajêrê Zaxoyê. Di sala 1963'yan de, hukumeta faşîst ya Iraqê, gişt xelkê gundî ku ji fileh û musilmanên Kurd pêk hatibû, hemî gulebaran kirin.
5. Dekan, navê gundekî û herwisa yê şkeftekê ye, dikevîte devera Behdînan, nêzîk bajêrê Êsifnê. Gişt xelkê gundî. Ji ber top û firokên rijêma Iraqê, reviyabûn û çûbûne di şkeftê de. Lê kirê girte û leşkerê Holakoyê Bexdayê, agir berdane şkeftê û hemî tê de şewitandin.
6. Di sala 1963ê de, jineka Kurd kete destên leşkerê hov yê Iraqê. Ji ber ku jin ya ducanî bû, lewre şertanê kirin, da ku bizanin, ka jinê kur heye yan jî keç!! Bi hovane zikê jinê dirandin...
7. Di sala 1963ê de, li bajêrê Silêmaniyê, ji heştê kesî pêtir, bi destên faşîstên Iraqê, bi saxî hatine bin ax kirin.

## DASTANA PALEYEKE KURD

Ho birawo.
Sîng pîlawo.
Weku niha, bîra min dihêt,
Dema tu hatiye karxanê,
Bi zikê vala û zaro di birsî.
Li te jî dixurrîn, here, here,
Kî dizanît tu çi kes î!?
Hîngê kekê jar min zanî,
Tu jî mîna min bê kes î!
Tu çi dixwazî, tu li çi dipirsî!
Erê ma te ne li bîr bû,
Demê volkana Bêkesî (1)
Peqî û digotî bê tirsî:
"Bîst û hewt sale min rêncberî tom
Be nan û aw û cil û bergî xom
Xizmetim kirdî le Îran û Rom
Le pênawî tu Şikawe estom…"
Lê birawo, sîngpîlawo.
Weku niha bîra min dihêt
Gava te çav bûne du stêr.
Te deng bûye hurmênek û tu bûye şêr.
Rast te gotî:
Ez pale me.
Barê min tev cara xem e.
Merra min bo zileçavên tev dijminan,
Kêr û çeqok û kelem e.
Bizava min ya herdem e.
Her ya fer e xwe hişyar kîn.

**Zulm û sitemkaryê rakîn.**
**Lewre min divêt**
**Gurg û rîviya rateqînim.**
**Şêr û pilingêt meydanan,**
**Vezivrrînim gêrê dîsan.**
**Kew û kevok û mirîşkan,**
**Ji mişextbûnê vegerînim,**
**Carek dî hêlîn û lîsan.**
**Ji tev kaniyan,**
**Ramalim kirim û zêriyan.**
**Gewriyên jar û têhniyan,**
**Ji qirrqiçînê. Ji hişikbînê.**
**Av bidem carek dî, dîsan.**
**Bipeqînim, bidirînim.**
**Genîzikên, noker û xwînmêj û pîsan.**
**Lê birawo.**
**Sîngpîlawo.**
**Taca serê tev jarawo.**
**Min hind dît tu li min berze bûy.**
**Lê kerr nebûy.**
**Bêdeng nebûy.**
**Li hemî layên esmanî dengê te veda,**
**Gelê bêdeng û kerr û lal,**
**Neken zaro bimînin birsî...**
**Ne çi jîn e ya ku dibûrît bi tirsî...**
**Ne çi jîn e... Ne çi jîn e...**

*Duhok, 1975*

1. Helbestvanekî bi navûdeng yê Kurdistana Başûr e.

## MIN DIGOT Û TE VEDIGÊRA!

Narîna min
Min digot û te vedigêra!
Min digotî:
Jiyana min, biyabaneka têhnî ye
Qirrqiçî û hişk û bê av e!
Te digotî: Min xwîn av e!
Min digotî: Esmanê min,
Ji mij û moranê girtî ye û bê hetav e.
Te digotî: Çavê min roja li hindav e!
Min digotî: Sorgula min,
Çirmisiye û bê xunav e.
Li nexşeya şenge buharê, ya bê nav e.
Te digotî: Ez im nexşey divehînim
Wê ji te re ev silav e.
Min digotî: Qonaxa min,
Rêkeka pirr stirî û dav e.
Te digotî: Min ji bo hindê bizav e!
Hey narînê!!
Pa ka dilê lîsê caran?
Ka ew sîngê derya mezina
Dildar û evîndaran?
Ka ew axiftinên şirîn,

**Te vedigêran, bo me êxsîr û hejaran?**
**Kanê? Kanê?**
**Her ho zûka,**
**Te armancên xwe ji bîr kirin!!**
**Te tev hîvî û omêdên min, ser jêkirin!**
**Erê nayête bîra te, wek te digot:**
**Payîza te, dê kem buhar û xemlînin!**
**Sed hezar dermanên bijar,**
**Dê li birînên te werînim!**
**Dê te ji derya kovanan,**
**Qurtal kem û zû derînim!**
**Pa te bo çi ev agira berda dilî!!**
**Ew buhara te digotî nexemilî!!**
**Lê narînê**
**Ger careka dî tu hatî**
**Dîsan te viya evînê bikey.**
**Haj xwe hebe, kurkê nezanîn û fêlan,**
**Nekey ber xwe û dilîn nazik**
**Pirr kovan û axînk nekey!**
**Baxê Êrem kavil nekey!**
**Da navê te li ser dilê min bêt çap kirin...**
**Sexmeret hîvî û armancan,**
**Xwe bideme gorî kirin...**
**Gorî kirin...**

*Duhok, 1976*

## DEREBEG

**Derebegan li ser rûbarê,**
**Gundê min sikir çêkirin.**
**Hizir kirin.**
**Tev cinîk dê ji têhnê mirin.**
**Lê ji bîr kirin.**
**Ku li dûrên şenge gundî.**
**Kanî di pirr in...**
**Kanî di pirr in...**

*Duhok, 1977*

## RAGIRTIN

**Erê bira te zaniye,**
**Li hindek qulaçên cîhanê,**
**Qazanên xwarna zarokan**
**Di tijî ber in!**
**Li zîr û giran,**
**Giya bijare û buhar e,**
**Lê kar û berxên hejaran,**
**Lê naçêrin!**
**Li cih û dira,**
**Demê xanya bi xuha enya xwe çêdiken,**
**Biyanî dibêne xudana,**
**We bo me yên ava kirin,**
**Hilon herrin!**
**Lê di gel hemî**
**Birsatiyê...**
**Hejariyê...**
**Zordariyê...**
**Xwe radigirin...**
**Xwe radigirin...**

*Duhok, 1978*

## NOBEDARÊ MEH Û SALÊ

*Bo raperînên milletê Filistînî yê xwe ragir...*

**Filistînê**
**Ay li min û vî agirî**
**Ay li te wê kûrbirînê.**
**Piştî ezyet û lêdanan,**
**Ya fer ew e her biazirî.**
**Alay nedanî, helgirî.**
**Bawer bike û şoreşgerên te dizanin.**
**Ger nobedarê şevê bî,**
**Yê şev û meh û salê me!**
**Ger birîndarê gulê bî,**
**Ez hogirê,**
**Êş û axînk û kulê me!**
**Ger esmanê te tarî bît.**
**Yê min li taryê top dibarin!**
**Ger rûbarê şenge jîna te şêlî bît.**
**Yê min pirrî dirrinde û neheng û mar in!**
**Ger li paryê keda te har in.**
**Parî û tev hîvî li min xwar in!**
**Zarokên min di bêwar in...**
**Gişt zordar û kirêgirteyên cîhanê**
**Li min neyar in...**
**Lê tev milletên bindest û azadîxwaz**
**Li min heval in.**
**Evca hevala dil birîn...**
**Dibên çira li me û li te jî vemirîn...**
**Nexêr... Nexêr... Nevemirîn...**
**Bi hezaran me şehîdên,**
**Di vê rê de gorî kirîn...**
**Şoreşger alahilgir e,**
**Kî dibêtin em dê revîn!**
**Li hemî tengavyan dibêjîn:**
**Dê serkevîn û pêşkevîn...**
**Dê serkevîn û pêşkevîn...**

*Duhok, 1979*

# HEJARÎNO!

Ey hejarên vî welatî
Pirr dirinde û çi gundek lê,
Nemay ava...
Sedan sal e û ta ku niha,
Rojê bi dehan bin ax dibin,
Ji pîr û genc û keç û savan.
Ne dijminên we dirawistin.
Ne hûn dikarin xwe rizgar kin,
Ji tor û davan!
Hejarîno!
Koçerên bêwargeh û kon!
Vî dijminî deşt û zozan wêran kirin,
Dê kî ve zaroka hajon!
Dawiya çerxê bîstê ye û hêşta,
Jin û dayîkên we, ji şêxan re,
Nanî dipêjin. Cilka dişûn...
Hêşta keda destên hewe,
Derebeg û axa dixwin!!
Hejarîno!
Heta kengî, dê xaniya ava ken û
Qet nagehin tê de rûnin!
Qurbaniya den û dê her
Hejar bimînin!
Rêkê bibînin!
Şax û daxên welatê me,
Bi hizir û bîrên,
Rast û dirust bixemlînin.
Bawer biken,
Paşeroja geş bo we ye,
Dê her bînin...
Dê her bînin...

*Duhok, 1983*

# Mueyed Teyib

Di sala 1957'an de, li bajêrê Duhokê ji dayîk bûye. Her li Duhokê xwendiye û paşî di sala 1982'an de, ji ber terora rijêma faşîst ya Bexdayê, nekariye zanîngeha Bexdayê bi dawî bîne û gihaye şoreşa Kurdî. Her ji sala 1974'an û pê dê, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Helbest û berhemên edebî jî di piraniya rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Di piraniya mîhrecanên edebî de beşdarî kiriye. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd li Kurdistana Başûr niha jî endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêdê ye. Di sala 1983'an de, gihaye welatê Swêdê. Niha jî li Kurdistanê ye. Dîwaneka helbestan çap kiriye.

## FIRREKA BAY

**Kurdistanê!**
**Firreka bay**
**Ji çiyayekê befir lê may**
**Evroke çavbeleka min ya girêday**
**Li bin kûnekekê reş û diryay**
**Li nav deşteka bê bav û day**
**Roja aryay**
**Xîzê şaryay**
**Zerya min ya di xuhê re may**
**Ez ê ditirsim**
**Ji dilbera dêmbefir û xwîn**
**Ji enya kever**
**Ji bejna şirîn**
**Ji dilê evîn...**
**Lê bûy birîn**
**Ji cergê zozan...**
**Lê bûy kovan**
**Ezê ditirsim...**
**Roja aryay...**
**Kirêt biket**
**Hizar deqan li enyê biket**
**Rengê çiyan ji dêmî bibet!**

*Besra, 1975*

## GULYA GENIMÎ

**Heta serê gulya genimî nebirin.**
**Cencer nekin.**
**Ducarkî li aşê hûr nekin.**
**Hevîr nekin**
**Li bin sêla reş,**
**Agirekê sor helnekin…**
**Nabîte nan!**
**Ewir heta nepeqîtin**
**Gurrî û agir jê neçîtin**
**Nabît baran!**
**Dilê min jî heta destê xem û janan,**
**Negivêşît,**
**Nabîte "Lawik" û "Heyran" !**

*Bexda, 1978*

## EW ÇIYAYÊ BÛYE GIR

**Hebû, nebû**
**Li pala gundê me yê biçûk**
**Çiyayekê bilind hebû.**
**Spêdeyekê, riya xezalekê vêket.**
**Êdî ji eşqa wê xezalê**
**Çiya şîn bû…**
**Têk de bû gul.**
**Xezal di himbêza wî de ma.**
**Êvaryekê, nêçîrvanek hat û**
**Xezal ji çiyayê me vebû.**
**Spêdê gundê me hişyar bû**
**Ew çiyayê ho yê bilind**
**Ji xerîbiyên xezala xo…**
**Yê bûye girkekê biçûk!**
**Ax gundîno!**
**Ew çiyayê bilind ez bûm!**
**Ew xezal jî yara min bû!!**

*Duhok, 1979*

# STRAN Û BEFIR Û AGIR

**1)**
**Ne ez benî!**
**Neke kenî!**
**Welatê min, befr e... Befr e**
**Kengî befir bûye tenî!?**

**2)**
**Ne ez benî!**
**Neke kenî!**
**Welatê min, ne rûbar e**
**Li nav deryayê berze bît.**
**Welatê min, ne buhar e**
**Havîn dê hêt û çirmisît.**
**Ne. Welatê min çiya ye û**
**Çiya ji cihê xo nalivît.**
**Befra me jî hera ketî û**
**Her dê kevit.**

**3)**
**Welatê min!**
**Hey befir û xwîn!**
**Tu ne bax î, da ez bêjim!**
**Ew baxê garan tê çerîn,**
**Min nevêtin!**
**Tu ne Lelîxanî û ez Hesem axa me,**
**Da ez bêjim:**
**"Ew sîngê hatiye perxîn**
**Min jê nevêt maç û evîn. "**
**Ne. Tu behr î û**
**"Behir bi devê sa pîs nabît"**
**Dil ji eşqa te rîs nabît!**

**4)**
**Welatê min!**
**Hey befir û xwîn!**
**Demê şev û tarî direvîn**
**Rojê hêdî**
**Tîrojên xo belav dikirin**
**Min çavêt xo jêk vedikirin**
**Da hêv keme...**
**Çiya û dol û nihalên te**
**Min digotî:**
**"Hewar tu çendê mezin î**
**Tu behrek î û ya bêbinî!"**
**Lê rojekê...**
**Birînek di sîngê min çê bû**
**Derê birînê her vebû**
**Heta ku bûye pencerek**
**Min tê re dît:**
**Te bi çend çiyan û dolêt xo ve**
**Dilê min yê kirye hêlîn.**
**Hîngê min zanî sîngê min**
**Ji çiya pir e!**
**Tu yê biçîkî û dilê min**
**Ji te mezintir e!**

**5)**
**Welatê min!**
**Xwîn û kevî!**
**Kê gotiye?**
**"Tu yê ketî yan dê kevî"**
**Ger tu ketbay...**

**Çewan gemî da bi rûbaran de hêne xar?**
**Çewan roja me da helêt û ava bît...**
**bîte spêde...**
**bîte nîvro...**
**bîte êvar?**
**Çewan şivan da bilûrêt xo helgirin?**
**Çewan şêrêt te da xurin?**
**Çewan perasî da dilê min vegirin?**

**6)**
**Welatê min!**
**Çend du çavêt reş û belek**
**Dikevne serêk,**
**Du nêrgizêt şeng û şepal...**
**Dikevne berêk.**
**Ûhosa, dê rojek hêtin**
**Dê biye mêrgeka xemlîn**
**Stirî nabin**
**Dest û tilêt zarokêt me xwîneloken**
**Evca demê êvariyan**
**Ji aqarî tên**
**Dê sirûda aştiyê bên**
**Bêrîvanêt gundê me jî**
**şûna şkeftan**
**Dê li derê xanîkê ava**
**meşkêt xo kin!**

*Duhok, 1979*

## SIBE NEKE GIRÎ DAYÊ!

**Sibe dayê!**
**Hêşta tarî…**
**Berî roj bête vî warî…**
**Berî hêlîn vala bibin**
**Berî pale hişyar bibin**
**Min û sêdarê jivane!**
*** ***
**Sibe dayê!**
**Kevir û tiraş û befr û xwîn**
**Ew dilbera min ya torîn**
**Dê dest di stoyê min werînît**
**Dê firîn çîne esmanan,**
**Hemî çiya**
**Hemî derya**
**Serevraz dê destêt xo bo me ragirin**
**Gazî me ken**
**Dê hêyne xar**
**Roj û buhar**
**Tavyeka barana pîroz**
**Bo çend mêrgêt napaliman**
**Kirîne qêr, hêlayn beyar.**
*** * ***
**Sibe dayê!**
**Pêlava min…**
**ji taca mîrî bilindtir e**
**Daweta min**
**ji hemî govendan xoştir e**
**Bejn û bala min**
**ji buharê bi xemiltir e**
**Evca çewan dê key girî?**
**Sîngê xo yê temet derya…**
**dê vequtî?**

**Pirça xo ya wekî befrê...**
**dê veçirî?**
**Ne dayê! Ne**
**Nekey! Nekey!**
**Cil û bergêt xo reş bikey...**
**Dergehê kolkê me yê xoş...**
**bo xem û nîharan vekey!**
*** ***
**Sibe dayê!**
**Xanî dê "serkê zavay" bo me bêjît û**
**tu vegêre.**
**Sibe dayê! Neke girî!**
**Hemî zeryêt gundê me dê hêne vêre.**
**Ger du rondik ji bêdestî,**
**Ji herdu çavêt te ketin**
**Tu Xudê key zû veşêre!**
**Da yara min, nebêjîtin:**
**"Lawê min mir**
**Ew tivenga di destan da**
**Mizgînî di lûlyê re jenî...**
**Dîsan li koçka Sultanî**
**Dê bîte êxsîr û benî"**
**Ev da rabît...**
**Ew kirasê ji serê kopan**
**Ji davêt rojê.**
**Min bo înay**
**Di şevê vedet**
**Bikete tenî**
**Ne dayê ne!**
**Ne yarê ne!**

*Bexda, 1979*

## EW KAXEZA NAKEVÎTE DI POSTÊ MIN DE...

**Wek dayîka ji bêrê dizivirît...**
**Yan balavê bi nîvê dihêlît,**
**Landika kurê xo vediketin.**
**Wesa bi germî...**
**Ez têm û postê xo vedikem.**
**Lê postê min...**
**Wekî rextê pêşmergekî yê vala ye û**
**Çi nakeftê.**
**Ho yara min!**
**Ez ê li hîvî ya kaxeza te,**
**Kaxeza te jî bilbilekê kîvî ye**
**Awazêt xo li çiya dixwînît**
**Ne di qefesa postê min de.**

* * *

**Kaxeza te,**
**Dastana eşqa Zînê ye**
**Ji Memê Alan re dişînît**
**Posteçî jî Bekirok e.**

*Stokholm, 1983*

## BOYAXÇÎ

**Ne kurê min ne!**
**Nekey... Nekey!**
**Firçê xo ji axê ranekey!**
**Ew postala di koşa te de,**
**Mejiyê babê te yê pê ve,**
**Boyax nekey!**

*Stokholm, 1983*

## XEWNEK

**Şevê dî da!**
**Min xewnek dît.**
**-Xewna te xêr e kurê min,**
**Hêdî bêje, dîwar bi guh in.**
**-Yadê! Min dît,**
**Goya zemîn dibû mehfûrek.**
**Xudê ji esmanan hate xar,**
**Wî serek girt**
**Min serek girt**
**Me daquta. Me daquta. Me daquta.**
**Paş em firrîn**
**Çûyne ser stêreka bilind**
**Hemî çiya û bajêr û gund**
**Bûne zeryek nivistî û rîs**
**Şane şane me hêv kirê,**
**Ne tac mayne**
**Ne postal mayne û ne polîs.**

*Stokholm, 1984*

## SÎNG Û POSTAL

Ew sîng berî çardeh salan…
Çîmeneka zozanan bû,
Helalên sor
Li herdu milan sema dikir.
Ew sîng berî çardeh salan…
Zinareka Laleşê bû,
Hemî çava,
Di gel rojhelat û rojava
Tewaf dikir.
Ew sîng berî çardeh salan
Rûmeta mala giran bû
Sîng û dilê heft biran jê re perjan bû.
Ew sîng berî çardeh salan
Lawekê Kurd pawan kir û
Dilê xo li ser kire ala.
Ew sîng piştî çardeh salan…
Du keviya li ser dada,
Bayê kela eşqê lê da û
Heft zarokan jîn jê vexwar.
Ew sîng piştî çardeh salan…
Çardeh cara reş û şîn bû.
Çardeh caran lê bû nîhar
Çardeh terim, himbêz kirin.
bahoza reva reş hat
li cergê Kurdistanê…
Ew cergê evroke bûye…
Berderazînka cîhanê…
Ew sîng û çîmen û zinar û rûmet û
Pawan û kevî û goristan…
Kete jêr pistala cendirmeyekê Tirk.
Oh agirî!
Ey beriztirîn çiyayê Kurd…
Te çav lê ye… Raneweste!
Yan bipeqe û
Kevrêt xo ji xwînê sor bike!
Yan jî heta ber pêt xo
Serê xo şor bike!

*Katrînaholm, 1991*

# Mihsin Qoçan

Di sala 1954'ân de, li gundê Bamernê, nêzîkî bajêrê Amêdiyê, ji dayîk bûye. Li Duhok û Mûsilê xwendiye û di sala 1976'an de, zanîngeh bi dawî aniye. Her ji sala 1970'yî û pê de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Di piraniya kovar û rojnamên Kurdî de, helbest û berhemên xwe belav kirine. Di piraniya mîhrecanên edebî de beşdarî kiriye.

Heta niha, dîwanek bi navê "Befra li vêre" li Kurdistana Başûr, bi tîpên Erebî çap kiriye. Dîwaneke din jî, bi navê "Wêne ji filmekî pirçiyayî" ji bo çapê amade kiriye.

Niha jî li Kurdistana Başûr e.

## BEFIR YA LI VÊRE

**Helo…**
**Li nik me befir wa dibarît**
**Li ba hewe jî befir dikevît?**
**Mitayê me… Erê… Erê**
**Yê li kolanan**
**Yê hewe jî**
**Li kolanan e?**
**Yan jî avahî bi dest dikevît**
**Helo…**
**Esmanê me yê azirî**
**Car yê qêriya radihêlît**
**Ji helma wê diçîtin gurî**
**Hindek diket girî**
**Heku li birîna xo dinêrît**
**Ew birîna…**
**Çavêt stêra bo derkirî**
**Befrê nihal yêt pir kirin**
**Dawetêt me yêt bir kirin**
**Rêkêt li gundê me birin**
**Helo…**
**Seh kene me…**
**Em yê li nav derya befrê de**
**Li kolanêt me**
**li ser banêt me**
**Li ser mijîlankêt çavêt me**
**Befr e… Befr e**
**Li derazînka**
**Li nav zevîka**
**Li ser mil û pirçên biçwîka**
**Befr e… Befr e**
**Evê befrê…**
**Rûyêt keçêt me sor kirin**
**Maçî kirin**
**Li pêş çavêt me negot şerm e**
**Helo…**
**Dar û barêt me dil mazîn e**
**Hemî tîşt li ba me ditezîne**
**Ji bilî xwîna dilê me…**
**Tinê germ e…**
**Tinê germ e…**

*Amêdî, 9.12.1977*

## LI TE DIGERHAM

**Kulan... Kulan**
**Koz û kotan**
**Min têkvedan**
**Derzêt berî**
**Derî... Derî**
**Min têkşêlan**
**Teraş... Teraş**
**Pîş û helaş**
**Min dane bay û min hêlan**
**Paniyêt pêt min bûne çam**
**Li te geryam**

* * *

**Piştî li ba me ...**
**Bûye temar... Mij û kadî**
**Hat û li min bûrî revendî**
**Sivik silav kire gundî**
**Ne weku xelkê jê digotin**
**Ne ya kwîvî**
**Ya di dilê xo de ava bû...**
**Pirî hîvî**
**Hat sîtavek**
**Bûrî perî,**
**Ne gehiştim biçime serî**
**Ne şiyam ji ber zêrevana...**
**Hişyar bikem**
**Bêjim şirîn**
**Koremar e di rêka te de**
**Bûye gerî**

* * *

**şirîna ciwan**
**Evcar were bibine cihî**
**Ne bi serdan.**
**Bi ramûsanan...**
**Herdu rûyêt min bikole**
**Bike nîşan.**
**Viyana te...**
**Wa di dilê min de bûr dibîtin**
**şaka dihavêtin**
**Kesk dibîtin**
**Mezin dibîtin**
**şenge kulîlkêt xemla wê**
**Xwîna min in**
**Belgêt wê**
**Ji keskatiya...**
**Herdu çavêt**
**Kevne... Kevne yara min in.**
**Li hemî payîza dierinin.**
**Ne zer dibin û ne dikevin**
**Bêhna evîna me şirîn**
**Bêwîjan e**
**Mar jê direvin û**
**Dwîr dikevin**

*Bamernê, 17.8.1978*

## MIN ÇEND TU DIVÊY?

**Ez aloz dibim**
**Çend carekê pisyar bikey**
**Te çend ez divêm?**
**Lewenda min…**
**Viyana te ne hozan e**
**Birgeyên wê bihên kêşan.**
**Ne reşatya pirça te ye**
**Da davêt wê ez bihejmêrim**
**Dirêjahî bihêt pîvan.**
**Ne keseke ez bibînim…**
**Da carekê lê bim mêvan**
**Ku bizanim min çend tu divêy**
**Lê bizane…**
**Ew sîbera dar û baran**
**Hemî berî û çinaran**
**Lêv û rûyêt te digezin…**
**Maçî diken.**
**Ji tîrojka rojê diparêzin**
**Ne ku rûyêt te birevên…**
**dax biken.**
**Hemî xewnêt…**
**Li pêş çavêt te dibine îşî.**
**Ew bayê ku tu hildikêşî.**
**Rûbarê rêka kadiza**
**Ku nizanî…**
**Dwîmahî li kwîrê dipengîtin**
**Û ne ji kwîrê têtin pêşî.**
**Hemî çipkêt peritîne**
**Bi weraz in…**
**Ne di akincî ne**
**Peşkên evîna min in.**

*Bamernê, 18.10.1978*

## REWÎNA SA...MIZGÎNÎ YE

**A... Xanima şevêt giran**
**Torina min**
**Tu dizanî...**
**Çend xem û jan**
**Te yêt kirine dilê min**
**Bawer bike...**
**Her careka şev dibîtin mar**
**Marekê reş yê ejdehar**
**Xo li dûr gundê me dialînît**
**Tîrojkêt rojê dadirît**
**Gêriyêt xo yêt reş û giran**
**Li ser dilê min dinihînît.**
**Ronahiyêt mala ditemirin.**
**Xelk dinivin**
**Çavêt min dibine perwane**
**Dwîr difirin.**
**Li beyaran**
**Li dûr agiran dizivirin.**
**Da pasiyêt hemî karwanan**
**Hemî rêvîng û şivanan**
**Yek... Yek bixwînin.**
**Da mizgînyê bo min bînin**
**Guhêt min diveçinîne**
**Li hîviya rewîna Sa**
**Pêjna pêt te**
**Dê kengî dergê me vebît?**
**Ku ez dizanim**
**Her tinê yara min nebît.**
**Sotiya dîtina min nebît.**
**Kesê dîtir...**
**Li tariya**
**şevêt ho yêt bi sehim naderkevît**
**Se narewît.**

*Qediş, 24.1.1979*

## WELATÊ MIN

**Welatê min…
Ne te viyan serece ye
Da li dîf rihêt wê biçim û
Yek… Yek ji dilê xo bibirim.
Ne karîş e…
Da ji nav baxçê xo ade kem û bidirim.
Viyana te…
Di hizrêt min de
Periyeka şeper spî ye
Vebizivîne… Hîvî ye
Ger bizanim…
Ku viyana te sotine…
Ser birîne û girtine.
Yan egera…
Dîmahîka jîna min e.
Heta dimirim…
Wek "Heme Korî" û "Sînemê"
Dê bi şoxî û şengiya te xurim.**

*Qediş, 17.2.1979*

## GERIM Û SERMA

**Gerim û serma ger bigehinyek**
**Dê xo kujin**
**Ala rojeka hîn raken.**
**Eger kulî**
**Li kulîlka bîn mêvan.**
**Dê xemla wan ya şox û kin**
**Lê xirab ken.**
**Perwane jî...**
**Her carekê,**
**Bigehin çavên yara xo**
**Dê bejnêt ter**
**Di guryê raken.**
**Bes lêvêt min**
**Eger bigehin lêvên te**
**Ez bawer dikem...**
**Beheşteka nû ya mezin,**
**Dê ava ken.**

*Qediş, 2.1.1980*

## BÎRHATINÊT...ZAROKÎNYÊ Û EVROKE

1)
Ji biçîkatî ez têr dikenîm
Dixurîqêna de dixendiqîm
Heku digotin:
"Di demekî de...
Diviya nêçîra heyvê biken
şiva Dokanê li ber veda"
Paşî ez bi xo
Bûm nêçîrvanê yarekê
Sîtaveke difirît... Difirît
Bo min nadadet carekê
Xerîbiya wê nişterek e
Cerg û hinavêt min dibirît
Xewê ji çavêt min didizît
Ji ber tena nabim şevekê
Li vî zemanê ho neliv
Min hizra xo dikir Dokan e û
Tîrojka çavêt xo kir şiv
Belku bikevîtê carekê.

2)
Ji biçûkatî li nav rezî
Heku şev têk diçû û ditezî
Dibin berêve...
Da ez li komêt stêra nêrim
Min hewil da ku bihijmêrim
Da esmanî weku rezê me
Keme lat
Hemyê da parçe parçe kem
Da hejmêrim heta sedê û
Da hejmara xo berze kem

**Evroke jî**
**Heku min divêt**
**Xem û janêt xo bizanim**
**Dê seh kem xo**
**Her ji serî...**
**Heta ku neynokêt piya,**
**Xem û jan im**
**Lê ka çend in?**
**Ez nizanim...**
**Ez nizanim.**

**3)**
**Her ji hingî**
**Min dizanî**
**Ku ev çiya ye dayka min**
**Tavyeka barana bûş e...**
**Hevala min**
**Min gelek... Gelek hez dikir**
**Heku baran dihat ya tena**
**Pirça serê min ter dikir**
**Tilêt min ji keyfa digirnijîn**
**Heku mûy, mû maçî dikir**
**Evroke jî...**
**Ez her kurê wê dayê me**
**Aşiqê tavyeka bûş ya**
**Baranê me.**

**4)**
**Hingî dayka min digote min**
**Evrêt dihên...**
**Biçîka ji dayîkêt wan didizin**
**Di nav bendêt xo de diveşêrin**
**Naberden heta ku dirizin**

*Duhok, 6.3.1980*

## HETA KENGÎ

Ez nizanim ...
Heta kengî dozexa he,
Pîşê ji yara min dê sojît ?
Heta kengî... Dê mînît
Ho helkirî?
Ez ditirsim...
Ji dîtina te
Ji çavêt te û xerîbiya te
Di dilê min de sax diketeve
Viyana girî.
Herro... Herro...
Hezar reşa didene ber min
Dibêjin... Dibêjin:
Evê zerya nazik û kin
Heçî kesê hejêkirî
Xudê eşqê jê sil dibît
Çavêt wî kil didet bi agirî.
Hemî şevan...
Li serêt riya dihelawîsît
Da pîrhevok...
Xwîna leşê wî bialîsît
Û di gel spêdê... Dadihavêtin,

**Zîndaneka teng û tarî... Tarî**
**Pir î stirî**
**Dibêjin... Dibêjin**
**Evê zerya nazik û kin**
**Viyana wê nihêniyek e**
**Ne çi ser e û ne çi bin e.**
**Heçî kesê çav lê niqand**
**Lê dibin dijmin...**
**Hemî Efrît û Ecn e.**
**Di ser hindê re...**
**Hezkirineka gelek dijwar**
**Min pal didetin**
**Serê xo bi sîngê te venim.**
**Peyvêt straneka eşqê...**
**Ji xunava lêvêt te bijenim.**
**Hezkirnek e min pal didetin**
**Li ser sîngê te bimirim**
**Di nav destên te de bibuhijim**
**Bibim çine.**

*15.2.1985*

## TINÊ EZMAN E BO MIN MAY!

Entîke ye...
Her ev... Her ev
Weku periya,
Ji pêlêt nebûnê dizêtin.
Derya çava buharek e
Strana rûbarî dibêtin.
Ji kwîr ve dihêtin. Ji kwîr ve dihêtin
Aya....?
Ji nav perêt deftera min?
Ji gêleşoka hizra min?
Ez nizanim...
Lê pa her şev li min mêvan e û
Çak dizanît...
Li pirça mêvanî aşiq im
Keskatiya çavêt delal
Pêtir şi'ra xo min divêtin

* * *

Her şev dihêt rûy weku sêvan
Ji viyana dijwar...
Girya li lêvan.
Weku guryan...
Rûyê helaşî dihilmêsît

**Xo dihavêt ser û stuyêt min**
**Dikenît… Digirît**
**Maçî diket min,**
**Kezî kurê nizanîtin…**
**Ji barê xemêt viyanek dî**
**Jiyana min kengirper e**
**Li berê bay.**
**Nizanîtin…**
**Ku dilê min**
**Tevinpîrkê tevin dabû**
**Nazdarekê…**
**Ji hingî were…**
**Ez bê dil im**
**Dilê min yê bi destan ve may.**
**Nizanîtin…**
**Hemî egerêt bûna min,**
**Mişxanen e**
**Tinê ezmane bo min may.**

*22.4.1985*

# Mehfoz Mayî

Di sala 1957'an de, li gundê Mayê, ser bi qeza Amêdiyê, ji diya xwe bûye. Li Mayê û Duhokê xwendiye û di sala 1983'yan de, ji ber terora faşîstên Bexdayê reviye û peymangeh bi dawî neaniye. Her ji sala 1975'an û pê de dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di piraniya rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Di çendîn mîhrecanên edebî de beşdar bûye. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd bû li Kurdistana Başûr û niha jî endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Swêdê ye. Her di sala 1984'an de çûye nav rêzên şoreşa Kurdî. Heta niha dîwanek bi navê "Ez û şev û Bêdengî" (1987) çap kiriye.

Di sala 1986'an de, hatiye welatê Siwêdê. Niha jî li Kurdistanê ye.

## BILBILO...

**Bilbilo xêr e binêre**
**Bilbilo, li halim binêre**
**Ew çi narîn e... Stran e?**
**Ev çi şehyan e li vêre?**
**...**
**Were binêre bilbilo**
**Girî û nalîna van dilan**
**Qehr û kovanêt van gulan!**
**Ew çi xêr e?!**
**Bifre were def min rûne**
**Awazêt xwe hema bîne**
**Bilbilo ev çi narîn e?**
**Bes veşêre!!**
**Binêre xêr e binêre**
**Bilbilo li halim binêre**
**Ew çi narîn e... Stran e?**
**Ev çi şehyane li vê re?**
**...**
**Bilbilo bi wan peran**
**Lez be bifire**
**Were dade ser milê min**
**Bi wî niklê wek xenceran**
**Hêdî kun kun ke sîngê min**
**Pîç bibre**
**Suhbeta bike bo dilê min**
**Wan hemî awaza bêje**
**Lê dilê min evîndar e...**
**Bêje bi awazêt evînê**

**Hişyar be dil birîndar e...**
**Ne êşînî wê birînê!**
**Belê bêje:**
**Hilo ey dil**
**Rabe ey dil**
**Dilbera me her mave sil!**
**Bilbilo bêje her bêje...**
**Wan gotina hema bêjê**
**Suhbeta bo bike hêjê**
**Ne tirse bilbil biwêre!**
**Binêre xêr e binêre...**
**Bilbilo li halim binêre**
**Ew çi narîn e... Stran e!?**
**Ev çi şehyan e li vêre?**
**Aveka boş ez yê birîm!**
**Warekê dûr ez yê dizîm!**
**Axînêt min hemî rijyan**
**Ketine nav dehl û diran**
**... Û berze bûn!**
**Stirya dil yê tazî kirî**
**Nalînêt min...**
**Ez yê kuştim ji ber kulan**
**Taryatiyê ez yê girtim bilbilo**
**... Te nabînim!**
**Bes e, tu bes xwe veşêre!**
**Li min vegêre**
**Li min vegêre**
**Binêre xêr e binêre**
**Bilbilo li halim binêre**
**Ew çi narîn e... Stran e!?**

**Ev çi şehyan e li vê re!?**
**Mim nevên dawet û şahî…**
**Ger dilê min zava nebît!**
**Nagirim gerya govendê**
**Bilbil li ser çemkî nebît!**
**Heku guhêt min têr vexwar**
**Ji heyranok û awazêt te**
**Herdu çavêt xwe kil da…**
**Bi rûmet û dîtinên te…**
**Hîngê gelo, dê dil vebît**
**Dayka şirîn**
**Hinde sala hatî dizîn**
**Li bin xîvetêt reş girê day**
**Dê zivirît û dê derkevît**
**Dê şîr înît**
**Bo zarokê têhnî vemay**
**Day dê kenît**
**Dayîka ji zaroy xerîb bûy**
**Lêva ji bêşîrî hişk bûy**
**Dê gehneyek û jîneve**
**Hîngê dilo dê kem gazî:**
**Dilê min evroke şêr e!**
**Binêre xêr e binêre**
**Bilbilo li halim binêre**
**Ew çi narîn e… Stran e?**
**Ev çi şehyan e li vê re?!**

*Duhok, 1976*

# ÇEND PIRSYAR JI RÊVÎNGÎ

Ho rêvîngo…
Dilê min pawanê çiyan
Şehmizarê kovana te
Çav dizilin bo hatina te
Da bêjiyê:
Bo çî şev e û roj nehilat?!
Ezmanê min…
Têhniyê xuhdana te ye
Çipik, çipik ji te malît
Kuçik û tenûrêt hîviya,
Pê bihunît…
Pê bihunît…
Min ji mêje guh helanin!
Kuzriyêt gotina te ne
Were bêje:
Erê we ye?
Babelîska riya kevin,
Rabûyeve?
Yan jî dîsan…
Roja zelal hindayeve?!
Erê we ye?
Parzûnê bêrya me kun e?
Şîr meşka tê de bê bin e?
Kevne bîrhatin rêtin e?
Erê we ye?
Kevir jenî?
Dengê birûsya jiyarê
Tîrojêt geş…
Li rojeka xweş
Ewir ji esmanan verenî?
Ka bêje min…
Te nedît e, pîkê buharan carekê,
Xuh day enî?

**Çiyayekê gelek mezin,
Bo te kenî?
Tu çûy esmana bapîran
Te kir hewar?
Ho xudano ger mezin î,
Bo seh nakey vî rebenî?
Boçi te got:
Ez bilind û
Hûn jî hemî wek yek benî!
Paşî ho zû
Gotina mêran te sot û te kir tenî!!
...
Ho rêvîngo…
Bor li çi kar e?
Her şêlî ye û pir sîpel e?
Peya darê rêya giran
Her sotî ye û hinav pel e?
Erê we ye?
Rezê babê me çêkirî…
Bûye bîş û pir dehbe ye?
Kolkê me tê de rakirî…
Mezin kirî hîvya mirî!!
Evro kavil e û xirabe ye?
...
Erê we ye?
Gelî ji kovana xwe peqîn…
Çiya hejîn…
Birînêt Mem Ebasîkê
Sax bûneve, êdî vejîn?
Yan jî şûna Eyşê û dayê,
Kinêr û tevrî bo girîn?
...**

**Ho rêvîngo bextê te me…**
**Rext û şiroxa bişidîne**
**Xwe bi esmanan re bigehîne**
**Ewir û birîsyan bijene…**
**Av û baranan jê bîne…**
**Çend têhnî ye ev reben e?!**
**…**
**Were… Were…**
**Eger baran e, tûfan e…**
**Bila çiya pira te bin.**
**Eger tav û kelîjan e,**
**Mazî û kevot…**
**Dê sîbera hindav te bin.**
**Eger mij û tarîstan e…**
**Bila nalînêt kewekî,**
**Stêrka pêhingava te bin.**
**Eger birsî û ne te nane.**
**Xwîn û goştê nav leşê min,**
**Bila zad û ava te bin.**
**Were… Were…**
**Heta kengî**
**Çav dê li serê riya te bin?!**
**Were… Were…**
**Bila hindî stirî hebin!**
**bêje zinar û kêriyan:**
**Zû bixinzirin wekî şêrî…**
**Evro pezê me li mexel e û**
**Çaverê ye…**
**Bihêt berî…**
**Bihêt berî…**

*Duhok, 1978*

## DERSA NÛ

**Seydayê min**
**Hîvîdar im**
**Derseka nû bo min bêje**
**Nîşa min bide**
**Ka ce çewan**
**Ji davêt rojê**
**Pêstureka mukum çêkem?**
**Da ku biste lê ser kevim**
**Maçî bikem devê rojê**
**Dêmê omêdeka nemir?!**
**Nîşa min bide**
**Ka ce çewan**
**Di tarîstanêt zîndanande**
**Ji enya min dê çît gurrî**
**Dê çît agir?**
**Hîvîdar im seydayê min**
**Derseka nû bo min bêje**
**Gurgan dilê dayka me xwar!**
**Hirçan tiryê rezê me xwar!**
**Ne bêje min:**
**Du cara du, dê bîte çar!!**
**Seydayê min**
**Giryê min têt demê dibînim**
**Evî warî...**
**Hemî kavil û xwelî tê ve!**
**Demê dibînim**
**Zûrê can û mêrg lê beyîn**
**Buharekê hêla bi rê ve!**
**Tu hizir ke seydayê min**
**Girya min têt**
**Demê dibînim**
**Rihêt şenge darberûyê gurr yê pê ve!**
**...**

**Tu xwedê key ho seydayo**
**Pisyar ji min nekey bêjî:**
**Bo xemxorî?**
**Rojek e… Carek e bûrî!!**
**Ne… Nebêje çû!**
**Baş bizane serjinûka**
**Li dilê Xanî agir hilbû**
**Dilê Le'lîxan a reben**
**Ji nû çar ker bû…**
**Cergê Xec û Siyamend a**
**Xwîn lê der bû…**
**…**
**Seydayê min…**
**Ji kûratiyêt vê birînê**
**Dil dikuzirît**
**Sed hezar ahîn û nalîn,**
**Min dikelojin**
**Qêjî û dengê qamçiyan**
**Hinavên min pir disojin**
**Pidî û didanêt sêwiyan**
**Ji tirsa memkê dayîka me**
**Yê hestiyên min diverojin!**
**…**
**Tu hizir ke seydayê min**
**Xirîqênk û kelêt giryan**
**Li tarîstanêt şevêt çiryan**
**Dikevin derê gewriya min!**
**Da hewarekê nekem!**
**Memê ji zîndanê dernekem!**
**Da nehêlin…**
**Biçim Sîpanê Xelatê**
**Ji kele evîna Xecokê**
**Ravekê ji kûviyan rakem**
**Siyamendê evîndijwar**

**Bo wê Xeca ho dîn û har**
**Ji sirt û zinara peya kem!**
**Da nehêlin…**
**Bibim siwarê hespekî**
**Xwe li Dimdimê bihejînim**
**Ji nû Xanê Lepzêrîn rakem**
**Dalehêt koçerêt warî**
**Li dirêjiya sal û meha bo xweya kem!**
**Da nehêlin…**
**Biçim nav kavle warêt Mehabadê**
**Ji dil û hinavêt dotî de**
**Bikem qêrî**
**Bikem gazî**
**Da ji dengê min**
**Ji gorî rabîteve Qazî**
**Seydayê min**
**Wan nehêla, welê neşyan**
**Girî hemî bûne stran,**
**Narîn pê re.**
**Car car, ji devê min dibarin,**
**Dibin hozan, awazeka sivik jê re.**
**Direşin ser landika savay**
**Yê ku çû car nedîtî day**
**Ne narînek û ne layelay**
**Direşin dudka şivanekî**
**Li kêvî û nihalêt Mêrdînê**
**Ji kele vîna Mem û Zînê**
**Jê dijenît nirêna şêran**
**Wî her got û**
**Sêwî û hejarêt vî warî**
**Lê vegêra…**
**Lê vegêra…**

*Duhok, 1979*

## XWEZÎ XWEZÎ

**Herê xwezî...**
**Kirmê dilan...**
**Xwezî tu di sîngan de nebay!**
**Te koçerê xwe bar kiriba...**
**Ji nav dila derketibay!**
**Ber av bibay!**
**Xendiqî bay!**
**Di hizra mirinan de mirî bay!**
**Xwezî tu kar û biryar bay!**
**Yan jîyekcar her tu nebay!**
**Qet tu nebay!**
**Xwezî xwezî...**
**Pîrejinêt gundê me da**
**Li ber berojka xir biban û**
**Nifrîn hemî**
**Kirban barban**
**Bi ser te de baran diban...**
**Bi ser te de baran diban...**

*Silêmanî, 1981*

# EZ Û ŞEV Û BÊDENGÎ

**1)**
**Li vêre şev e!**
**Hûtî roj ya lê da'îray**
**Taryê gundê me yê pêçay**
**Bêdengiyê**
**Stran hemî yêt vexwarin**
**Her mitî ya may!**
**...**
**Li pişta çiyakê nepenî**
**Befra dibarît**
**Dibît renî**
**Baran ya dibarîtin befir**
**Befir... Befir!!**
**Rûbarêt me yêt qerisîn**
**Bûne helan**
**Bûne kevir**
**Serma her ma, nemir...**
**Nemir...**
**Germa nema**
**Havîna me jî sirê bir!!**
**Esman ji hindav me berze bû,**
**Çiya man şûr!!**
**Ew yalêna ji dûr dihat**
**Ne dawet bû!**
**Tev bû behî!!**
**Ew strana,**
**Dayîka min li şevbêriya digot,**
**Di sîngê min de**
**Lawaz bû ve û bû dalehî!**
**...**
**Mitî ye...**
**Bêdengî ye...**
**Ne bankek têt e hildêran!**

**Ne çû deng tên,**
**Ji zengilên banê dêran!**
**Ne stêr li esmanan dileyzin!**
**Ne ewrêt hindav me bi lez in!**
**Ne huşêna belgan têtin!**
**Ne dengê rûbarê mezin!**
**Ne giryê zaroyekê têt!**
**Ne biçûk li kolanan dibezin!**
**Ez û şev û bêdengî**
**Li kolanêt gundî mêhvan in…**
**Bo dengê dîkilê spêdê…**
**Guhêt vî gundî yêt gez in.**
**…**
**Ji bêdengiyê**
**Ji ber mitiyê**
**Mirov neman. !**
**Hind ser nişîv…**
**Hind ser evraz…**
**Hind çep hatin…**
**Hind rast de çûn…**
**Rev e…**
**Rev e…**
**Hemî yê direvin!!**
**Biskêt dayîka min spî kirin**
**Xemêt befrê û xemêt kevin!!**
**Di çavêt min de bûne tevin,**
**Min kir hewar:**
**Çî ye eve?!**
**Di guhêt min de**
**Dengê dayîka min deng veda!**
**Heku ez yê biçûk da bêt:**
**Hişşş…!**
**Hiş kurê min nederkeve,**

**"Şev e… Şev e…**
**Gurgê di dev e…**
**Dê me bete di kunca xwe ve!!" (1)**
**Hinde cara…**
**Deng da li serê min deng veden:**
**- Hilo… Here…**
**Tu jî bireve…**
**Hemî kesa…**
**Hemî tişta li vî gundî**
**Rev e… Rev e!!**
**Ez jî da bêm:**
**-Ne, narevim**
**Vî gundî jê dernakevim**
**Min di gel tarî û bedengiyê**
**Rik e… şer e**
**Min guh lêye**
**Mitiya kerr e**
**Min çavêt heyn,**
**Tarya kore ye her e**
**Bila … Bila…**
**Hindî şeva dirêj bîtin**
**Spêde dê hêt taryê mêjît**
**Hindî zivistana sar bît**
**Dê buhar hêt germê rêjît**
**Hîngî gelo**
**Dilê min jî**
**Dê qîr kete stranekê û**
**Lawkekî nû ji wera bêjît.**
**Min li ber difna mitiyê qîrand**
**Min kir hewar**
**Guhêt min pêjnek nebihîst**
**Min her xwe dît**
**Bo kevrekê mirî dev in!!**

**Min di gel tariyê kir şerenîx**
**Min diviya**
**şevê bikeme roj**
**Bibim siwarê hetavê**
**Wekî xurt e lawekî zîx**
**Min hind xwe dît...**
**Hizir û bîrêt serê min de**
**Ez bi xwe têk da,**
**Hemî şev im!!**
**Lewma gelo**
**Min jî bes e şerê şevê**
**Mejyê min jî di gel xwe revand**
**Koçer û karwanê revê**
**Hosan ez jî**
**Gundê hero**
**Dawetêt wî dibin zêmar**
**Dê jê çim jê derkev im**
**Dê bi dûr kev im**
**Da ji dûr... Ji dûr**
**Herdu guhêt min têr vexwin**
**Deng û awazêt vê defê**
**Ji mêje bapîrêt me gotî:**
**"Ji dûr xweş e dengê defê... " (2)**
**Ji dûr xweş e dengê defê...**

*Kurdistan, Buhara 1984 - Payîza 1985*

1. Gotineka folkilorî ye da ku zû zaro bêne mal û ta direng li derve nebin.
2. Gotineka mezinan e.

# ZEKIYA

*Ez vê helbestê diyarî giyanê keça Kurd Zekiya Alkan dikem.*

**Min ji darê pirsî:**
**Tu ji çi ditirsî?**
**Darê got:**
**Ew bivrê ku destê wî her ji darê ye.**
**Birîna wî pir diêşît.**
**Min ji rihyan dibirît û dikelêşît.**
**Dihincinît, diket parî bo êtûnê.**

*** * ***

**Min ji sindanekê pirsî:**
**Kîj çekoçî**
**Hêza wî ya girantir e?**
**Sindan her ma**
**Li du zendên Kawey nêrî**
**Paşî gotî:**
**Serê zordaran bişkênît**
**Ji nav kuloxê Sultanî**
**Bipeqînit mejî û xwînê…**

*** * ***

**Min carekê ji Ehmedê Xanî pirsî:**
**Kîj helbestê**
**Ji hemyan gelek pitir**
**Cerg û dilê te hijande?**
**Xanî ferhenga helbestan**
**Ser û bin kir, hemî xwendin.**
**Paşî ji dil**
**Axînek hilkêşa û got:**
**Ew helbesta min vehandî**
**Ji lêdana dilê Memê û**
**Denda davên zulfa Zînê**

*** * ***

**Min ji Zînê pisyarek kir:**
**Kîjan agir**
**Ji hemiyan gelek pitir**
**Pirî gerim û têhintir e?**
**Zînê hûrik li mabeyna**
**Herdu çavêt Memoy nêrî**
**Axînek jê hat û gotî:**
**Ax... ! Şewitîm**
**Bi pêt û gurriya evînê.**

* * *

**Dûmahiyê**
**Min agir dît û jê pirsîm:**
**Hinde sal in**
**Kurdan tu kirye nîşan û**
**Hemî sersal û Newrozan**
**Te diperêsin**
**Tu nabêjî:**
**Li nav hemî Kurdistanê**
**Di nav perestgeha te de**
**Ji nav Kurdan**
**Kî mirad e?**
**Agir gerya**
**Li kavil û xweliya gundan**
**Gerya... Gerya...**
**Seranserî Kurdistanê**
**Gerya ... Gerya...**
**Heta gehişte Diyarbekrê**
**Li ber derê**
**Danîşgeha pizîşkî da**
**Ji dil qîjand û hewar kir:**
**Ax...Zekiya**
**Zekiya...**
**Zekiya...**

*1990*

# Vehêl Amêdî

Di sala 1951'ê de, li bajêrê Amêdiyê ji diya xwe bûye. Her li wêrê xwendiye û di sala 1979'an de, amadekariya çandiniyê li bajêrê Zaxoyê bi dawî aniye. Di sala 1968'an de, dest bi vehandina helbestan kiriye. Lê destpêka wî ya dirust ji sala 1974'an û pê de ye. Helbestên xwe di kovar û rojnameyên Kurdî de belav kiriye. Endamê Yekîtiya Nivîskarê Kurd bû. Di çendîn mîhrecanê edebî de beşdarî kiriye. Cihê daxê bû ku di roja 17.4.1982'yan de, bi lêkdana du tirumbêlan şehîd bû. Ew hêşta xort bû û dibe helbestvanekê mezin jê derketiba. Mixabin negehişt dîwana xwe çap biket û me jî di rêya binemala wî, karî çend helbestên wî peyda kîn. Hêviya me ew e, ku dilê xwendevanan xweş kin.

## ÇI LÊ BIKEM

Kanîka ava şirîn çi lê bikem
Ger neşêm avê jê vexwim!
Giyanê pir êş û derd bît
Xanîkê banê wî keft bît
Bo çi ye?
Ger neşêm tê de bijîm!
Çi lê bikem
Bo çi ye zerî bi perçan!
Ger ez ê bê yar bim ji berê
Bo çi ye pezê bêxudan
Ger neşêm bidoşim?
Çi lê bikem
Sorgula belgêt wê weryayî?
Baxçeyê bêbêhin û bêgul?
Bilbilê bêdeng û yê mit
Bo çi ye ... Hebît yan nebît!!
Çi lê bikem!
Erê gelo
Kanîka ava min e
Giyanî min e
Yê birîndar û tijî rondikxwîn
Çi lê bikem
Ez neşêm derman bikem
Xanîkê min e

**Banê lê keftî**
**Yê kavil bûy**
**Çi lê bikem**
**Ger neşêm ava bikem!**
**Erê gelo rezê min e**
**Yê bê perçan û …**
**Bo hemya çerwanê pezî…**
**Pezê min e**
**Yê bê şivan û bê xudan**
**Bêrî û şivanan biyaniyan**
**Bo xo didoşin û dixwin!**
**Li pêş çavêt min**
**Çi lê bikem**
**Erê gelo**
**Bilbilê bêdeng û mit jî**
**Her ez im!**
**Naxwînim**
**Çinku awazêt min,**
**Digel yarê firîn…**

*Amêdî, 1975*

## LANDIK

Landika şêr û pilingan
Derya moxan û nehingan
Dêdîka Mem û Zînan
Colana kul û kovanan
Kes nîne evro bihejînît!!
Bileqînît!
Kela Dimdim
Kela Narîn
Kes nîne ava biket!
Kes nîne Xanê Lepzêrîn
Ji xewê hişyar biket!
Sengerê papora Nohî
Kanîka jîna zemînê
Dayîk û dara jiyanê
Bîka narîna cîhanê
Ya digirîtin...
Dibêjît bê kes im...
Xencera Seîdê Pîran
Ya dinirît...
Dibêjît ax...
Kes nîne min bihelgirît
Da li ser gora Bedirxanî
Zêrevaniyê bigirît...
Çeperê Simkoyê şikak
Komara Kurdistana pak

**Bîr diket li qazî Mehemed**
**Dibêjît ax bo te xak…**
**Hespê şêx Mehmîdê nemir**
**Dişihît…**
**Pêkolê li erdî diket**
**Gazî diket**
**Ka siwarê lixavêt min bigirît!**
**Da rêka xebatê bibirîn**
**Da bigehîn ava jiyanê**
**Bo vî milletî bînîn…**
**şêr û şimşîrê şeran**
**Kanê tu!?**
**Siwarê hespê hewaran**
**Bigehe me…**
**Me ji destêt,**
**Mejîxor û Ejdehakan**
**Bîne der…**

*1976*

# DIJMINÊ MIN

Dijminê min
Dijminê mirovayetiyê
Dijminê aştî û serbestiyê
Têhniyê xwîna min
Hindî xo reng reng bidey
Hindî peymana bidey
Tu neşêy
Dîmenê min ji te helgirtî
Li pêş çavêt min bibey
Dijminê min
Têhniyê xwîna min
Goristana Gawirbaxî
şînewarêt bomba fosforî
Rondika pîre dayekan
Kurêyekane lê çûy
Giryana zarokekê sêwî
Yê bab lê çûy
Li rojeka cejin
Hemî pesin
Çaroka mirovatya te ya direw
Li ser çavêt te veden.
Dijminê min
Têhniyê xwîna min
Sêpêk û kinifêt Bexdayê
Hêşta divenayne
Bêhna Leylê(1) jê neçûye
Hêşta kinif nebizdiyaye

şeqam û pira Duhokê
Hêşta yêt sor in
Bi çipka xwîna Kurdistanê(2)
Ava baranan
Dil nehêlaye
Wê xwînê
Bişût û di gel xo bibet bê tol
Dijminê min
Têhniyê xwîna min
Kavile warêt Qeladizê(3)
Damay û xodîk
Hêşta helnedayne
Hêşta kelexêt pîr û zarok û cihêlan
Yê di bin kavilêt wêran ve mayn
Dijminê min
Dijminê mirovayetiyê
Dijminê azadî û serbestiyê
Têhniyê xwîna min
Hindî xo reng reng bidey
Tu neşêy
Dîmenê min ji te helgirtî...
Li pêş çavêt min bibey...

*1976*

1. Leyla Qasim di sala 1974-an de, bi destên celadên rijêma faşîst ya Iraqê hate li sêdare dan.
2. Kurdistan, keçeka Kurd ya xwendekar bû. Di sala 1974-an de, li ser pira Duhokê hate gullebarankirin.
3. Di sala 1974-an de, zanîngeha Kurdî li bajêrê Qeladizê hate bombebarankirin û bi sedan xwendekar şehîd bûn.(Xelîl Duhokî)

## NARÎNA MIN

**Çirakê şev û tariyê**
**Hizra nav balgêt xoşiyê**
**Xeleka xewnêt hîviyê**
**Narîna min**
**Bûka hîvya bi tinê hêlam**
**Bo kovan û janan**
**Bo ax û axînka**
**Bo dilekê pir hîvî û keser**
**Narîna min**
**Te ez hêlam…**
**Narîna min**
**Vemiriya çirakê jîna min**
**Herift dîwarê hizrêt min**
**Bizdiya xeleka xewêt min**
**Bone hîvî**
**Hîvî di dil de mane keser…**
**Narîna min**
**Te ez hêlam**
**Demê can bedenê min**
**Ji dil tu di parastî**
**Te ez hêlam**
**Demê di dil de min bi xo**
**Tu vediguhastî**
**Te ez hêlam**
**Demê min bi xo**
**Tu ji xudayê dildara dixwastî**
**Ji çavêt neyar û dijminan**
**Min bi xo tu diparastî**
**Te ez hêlam**
**Yar te hêlam**
**Narîna min**

**Buhar bû demê te hêlaym**
**Borîn dîf te re du buhar**
**Felek zivrî**
**Careka dî ya hat buhar**
**Paşê te hêlam**
**Narîna min**
**Karwanê dost û hevalan jî ez hêlam**
**Narîna min**
**Hindî gazî te dikem**
**Hîvî ji ba û hira dikem**
**Min di gel pêlêt xo birevînin**
**Bi karwanê dost û hevalan**
**Yan bi yarê re bigehînin**
**Dengê min**
**Bi şax û çiyan dikevît**
**Bê bersiv**
**Li cotê guhên min dizivrît**
**Narîna min**
**Dengê şivan û bêriyan**
**Di gel dengê pezî**
**Mangekê têkel dibît**
**Qebqeba xurte kewan**
**Şirşira tavgeh û rîbaran**
**Kengê ma têkel dibît**
**Di gel dengê bilbilan**
**Dengê te narîna min**
**Dê kengî li min zivirît?**
**Da di gel dengê dildaran û**
**Min têkel bît...**

*Zaxo, 1977*

## MIN SWÎND E

Min swînd e
Dê min swînd bît in
Te nehêlim yarê
Min swînd e bi du çavêt damay û xod îk
Min swînd e bi wê poşya pirî belbîk
Bi wî dêm durê hemî dema bo min xod îk
Min swînd e
Dê min swînd bît in
Bo kesê
Ji bil î min û te, tu nebiye bîk
Swînde mi bi wê bejna nazdar û nazenîn
Swînde mi bi vî dilê pir keser û birîn
Swînde mi bi nîşan û navêt te yêt şirîn
Swînde min
Dê min swînd bît in
Ji bil î Memê
Bo kesê tu nebiye Zîn
Min swînd e yarê
Bi wî agirî
Min û te pêk ve helkirî
Min swînd e bi wê gula
Av lê çik bûy, ne bişkurî
Bi wê barovê
Xoşê û seyran ji me kirî
Min swînd e
Dê min swînd bît in
Nehêlim te
Heta şil îta serê min
Tu di dirî
Min swînd e yarê
Bêy te seyranan ez nekem
şahî û dehwetan nekem
Bo te nebît

**Destî li govend û dîlanan nehijînim**
**Min swînd e**
**Dê min swînd bîtin**
**Nerînim ez**
**Heta dergehê evînan**
**Min û te ez venekem**
**Min swînd e yarê**
**Jê bibem sorava ser lêv û riyan**
**Jê bibem**
**Wan xalan ji gerden û eniyan**
**Bişkênim**
**Bazin û xilxalêt piyan**
**Xizêmê ji difna te bikem**
**Boyaxê ji dêmê te bibem**
**Min swînd e**
**Dê min swînd bîtin**
**ew kirasê ne ji dil kirye ber te**
**Ji ber te bikem…**
**Çirçir bikem…**
**Ew kirasê min divêt yarê**
**Peyman bîtin**
**Bo te bikem**
**Min swînd e**
**şenge pirça te**
**Can şe bikem**
**Spî dave miyan…**
**Helkêşim berze bikem**
**Vehînim…**
**Pirçê bikem bisk û kezî…**
**Bisk û kezî…**

*Zaxo, 1977*

## HO YARA MIN

Ho yara min
Nêrgiza lata dilê min
Bilbilê baxê jîna min
Dê bifire
Were ser takê dilê min
Bo min awazekê bixwîne
Torîna min
Stranbêjekê şeyda me
Stranên min
Gul in ji kakilka dilê min dimêjin
Awazêt min
Hemî zîmara sêwiyekê sava ye
Tembîra min
Dengê giryana dildarekê dil maye
Tomar dikem
Da bo te yara min bibîte diyarî
Şirîna min
Rewşena cotê çavêt min
Xwîna demarêt leşê min
Nê palekê hejar im ez
Tevrê min e
Wekî xencerekê dilê min dikulît
Merbêla min
Gêsineke, kovana tê de dikêlît
Xuha min
Wek tavekê bîrhatinêt me dişêlît
Axîna min

**Serkêşa hizir û xemêt min**
**Hîviya paşeroja min**
**Şivanekê bêheval im**
**Parzînkê min**
**Yê vala ye çi xwarin tê de nemaye**
**Şimşala min**
**Ya berze bûy, lewma pezê min mit maye**
**Bêriya min**
**Dê were tu meşka dilê min bikêve**
**Xatîna min**
**Kil îla kulêt dilê min**
**Tîrojka xewnêt şevêt min**
**Nê hozanvanê te me ez**
**Pênivîsê min**
**Moyeke can ji wê pirça te ya belav**
**Kaxeza min**
**Per ke dilê min yê pir êş û edav**
**Peyvêt min yar**
**Ket ket hemî bo te dibine nîşan û nav**
**Serbinêt min**
**Hemî gul in ji baxçekê bêhin û xunav**
**Ji baxê evîna xo jê dikem…**
**ji dil de pêşkêşî te bikem…**

# Remezan Îsa

Di sala 1953'yan de, li bajêrê Duhokê ji diya xwe bûye. Li wê derê xwendiye û di sala 1974'an de, bûye mamoste. Her ji sala 1975'an û pê de dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di piraniya rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Di çendîn mîhrecanên edebî de beşdarî kiriye. Jimareka helbestên wî wergeriyane ser zimanê Erebî. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Her di sala 1986'an de çûye nav rêzên şoreşa Kurdî.

Heta niha du dîwanên helbestan çap kirîne.

1. Dastana işqa nemir, 1990.
2. Kelîna hestan, 1991.

Niha jî li Kurdistana Başûr e.

## BENDA VÎNÊ

**Meya min di kaxa jînê**
**Jehremar e**
**Dilê bi kovan ji benda vînê**
**Bendewar e**
**Halê ho ye di gel dînê**
**Lewanê dil giriftar e... !**
**Erê yarê:**
**Çend te dibînim**
**Ya xemgîn î**
**Her ya bi kîn î**
**Ew geşrûyê mîna heyvê**
**Her yê bi mij e**
**Tu bi xo dizanî**
**Vexwarina wexma mijê**
**Xudan kuj e**
**Vêca zwî be**
**Mijê vede û bigirnije**
**Dilê reben**
**Di mîhraba wan lêva de**
**Hew bisoje**
**Yan jî ciwanê**
**Bikêşe dava hevbendê û**
**Bihilçine**
**Hemî gulên te li mêrga**
**Xewna çandîn**
**Hemya biçine**
**Ji bê avî yêd çirmisîn**
**Bêhn û beden**
**Yêd jê firîn**
**Êdî bêbext ma bo çi ne**
**Ew bo çi ne...**

*Duhok, 1976*

# HOZANÊD MIN

Her careka radibûn Monxol
Ser welatî de digirtin û
Dikirine çûl
Her careka
Weku qira milletê me
Diînan û serêd Kurdan
Li ber sersimêd pistalan
Di bûne hûl
Li tev carên her carekê
Sed kulav diçûne serekî
Tazî û şînî
Dikete ber her derekî
Her carekê
Min her dikirine hozan û
Belav dikirin li her derekî
Lew Monxolan dîwanêd min
Havêtin nav ava Dîcley
Ho bi berekî
Lê nedizanî
Hozanêd min
Mişêna sîpelêd xwîna
Çend salan e
Deng vedidetin
Ji ber her kevir û berekî
Ma nedizanî
Hozanêd min
Nalînên gişt rwîs û xwas û
Belengazên xelkê ye li her

**Kîşwerekî**
**Das û mer in**
**Li ser milê her cotyar û rêncberekî**
**Hozanêd min**
**Li şwînwarên hatîn sotin**
**Li berê spêda**
**Li ser sîvandên kavile gundan**
**Di gel qebîna ciwan kewan**
**Her diêne vegêran û**
**Dihêne gotin**
**Hozanêd min**
**Her hozanek**
**Peyame wek**
**Peyam û gaziya her pêxemberekî**
**Ji mêje ye**
**Wêd belav bûyin**
**Li mêjûyê li berperekî**
**Lewa hêşta**
**Heta êsta**
**Li ser minara azadiyê**
**Herê berze**
**Bang û kibara şairekî**
**Ya...şairekî**

*Duhok, 1978*

## HEYVA AŞIQ

Heyva geşa
Şeva dirêj ya aşiqan
Ji kwîratiya tarîstana evî çerxî
Wê serî hilda û
Li dûr kwînên taryatiyê
Ho çerixî
Ji nîva şevreşê wê ve
Wê tava xwe jor de ber da
Beref hê ve
Heyv aşiqe û aşiqa rind
Hilda warê kevne işqê û
Çû tewafa kopên bilind
Kevir kevir,
Sehek lê kir
Xatwîn befir,
Kevî kevî
Xo tê werkir
Ji dil mêtin lêvêd şevî
Şewqa şepal
Da zozan û fereşîna
Arama xir kehnî û rûbara îna

**Hêwiryek da daristanan**
**Gîz û kezan û maziyan**
**Her di gavê de**
**Govend di nav de girêdan**
**Kew û bilbil û bazî ya**
**Çitov heyv e we xemilî**
**Mîna bûka**
**Hêdî hêdî bi wê xemlê ve**
**Meya nav bax û cinîkan**
**Hêj ji dwîr ve bo girnijîn**
**Sêve sorên mayin bi binê ve**
**Ewey hingê ji nû rohin bû**
**Rêya wî aşiqê bi rê ve**
**Yê ku qesta yarê diketin**
**Da ku zwîka bigehîtê û**
**Di gel elindê**
**Sîng û berî bikete xêve**

*Duhok, 1980*

## DASTANA IŞQA NEMIR

Her weku roj
Di gel bangê
Mizgîniya berê spêdê
Spêdeya rind ya çi rojan
Ji bîsa êlçiyêd şevê
Beref kinarê omêdê
Divejîtin
Her weku roj
Bo maçîkirina gerdena spêdeya nû
Digirnijîtin
Bo xatira ewê gavê
Li wê gavê
Ser dinyayê de dihelêtin
Li wî demî
Li wê derê
Meşka evînê dihejîtin
Jîneka nû... Ya pir xweşî
Dest pê diketin
Ew dikêt û her dikêtin

* * *

Û mîna heyv
Ji rewşa kenya zinciyekî
Kilî dihavête reş çavan
Demê ku ev
Di wê şevê de
Ser periya hemî şevan
Şeva...Bûkînya befrê
Xatwîna rewşa deverê
Demê ku heyv
Ji telara refa ya xo
Hêdî hêdî dihête derê
Li dehwata şenge çiyay
Dibît mêvan

**Pîroz diketin işqa kevrê**
**Nexrî û xoşdiviyê diyê**
**Û ya bejin kezîzerê**
**Dar berûyê**
**Û ji dil bo roja qiral**
**Di hinêrîtin silavan**
**Ji xwazgîniyêd işqê re**
**Bo çî yê bûye işiqvan**
**Da ku jêra bibît jivan**
**Bibît jivan**

***  *  ***

**Ka çawan kela Dimdimê**
**Kela mêran**
**Ew kovana li dinê geryay**
**Ser û berê hilgomînî**
**Di gişt dilan de deng veday**
**Demê kaniyan**
**Xilwedara cergê çiyay**
**Lihiya bêbextiyê lê day**
**şirîn ava pak û dilsoz**
**Xwîna mirar têk de şêlay**
**Û bi tev nivêj û dua**
**Derya mezin ya esmanî**
**Mîrat bîtin**
**Hwîr baranek jê re nezay**
**Jê re nezay**
**Kela Dimdimê**
**Ferşek mukum**
**Ji dîwarê kelê mabû**
**Ew e yê may**
**Hûn binêrin**
**Ji hingê were**
**Ferşê bûye kêlya kelê**

Li ber serê Xanê Xan
Ewî Xanê hindê aryay
Yê ta kuştîn
Li ber dirba negotî ay
Ji bilî çerxa felekê
Çi şahan lê nekirî ray
Ferşê hêja
Bilind kêlî
Ew kêliya hinde sal e
Ne livlivî... May çikilî
Li ber gefêd
Giregir û birîsiyên reşe şewran
Nerahijyay
Li ber Sultanê barovan
Qet neçemyay
Ku evroke
Bo canê kel yê Iwîliyê
Wê Iwîliya
Hîvî û mafên derbederan
Çak rapêçay
Sebetanan
Ji derdê işqa fîşekê
Her nehewyay
Çawan kêlî
Lê bûn xudan
Bûye çeper
Bo lêdana lêvebûna
Soz û peymana kevlê gay

* * *

Iha wesa ciwana nazdar
Pêjna te jî
Ji karwanê daxwaza re
Wa bûy rûbar

**Xemla te ya xemla peryan
Bo çerîna şirîn xewnan
Wa bûy aqar
Belê ciwanê
Kengî hat û
Ew herdu çavên bêkinar
Kengî ew bi rengê kilê
Kovanêd min
Xemilîn û ketine kar
Û kengî yar
Geşedêmê dibêjite stêran
Wêve herin
Li ber wexma kela rondikan
Ew germixî û têna gerim
Da seqaman
Tê de dijîtin dilê jar
Û kengî dil
Dilê te yê ji vê wexerê
Herê heyran û bendewar
Bo vegêrana stranan
Işqa nemir
Bibîte tembûreka har
Iha hingî
Dilê min dê bîte hozan
Helbestek û
Di nav davên pirça te de
Dê bît teşî û ji hingê re
Çaxê govend dihêt gêran
Dê xo badet
Danît viran
Kezyên dirêj dê det rêsan
Iha hingî
Ji devera hindabûnê**

**Dê vegerim**
**Ûli qonaxa tarî şevê**
**Dê bime şevgêrê şevê**
**Û dê bim hevgurê heyvê**
**Û dê bime**
**Serkêşê dehwata befrê**
**Û dê ta roja gerim**
**Li spêdeya bi dîv de dihelêt**
**Çaverê bim**
**Sîng berfireh**
**Hema biherim**
**Da di rê de**
**Silavekê bidem kelhê**
**Silaveka ho ya bi şerim**
**Ser ji nû**
**Bo dîrokê**
**Saloxên derbederya xo**
**Hwîr vegêrim…Hwîr vegêrim**
**Hingî yarê**
**Li ser sîngê evê jîna**
**Hîviya me**
**Dê bît buharek mîrnişîn**
**Dehwata şoxe işqa me**
**Dê li wêrê bît**
**Dê li wêrê bît**

*Duhok, 1983*

## BÛKA PERÎ

**Li wê şevê, rewşa şevan
Bûka perî...Ji bin peryê
Ew bû... Reva
Derdê zavayê perîşan
Vêca yê bûye vecwîna
Hemî devan
Hindî dihênê li ser çi hizra
Dev û ezman nabin teva
Hin dibêjin:
Dêwê mezin ew ya birî
Li pişt çiyayê Qafê ya
Asê kirî
Hin dibêjin:
Dêwê navê
Yan yê pê de
Ew in bi şevê diçine ravê
Hin dibêjin:
Marê çiarserî
Li danga kehniya gundî
Hwîn bi xo dizanin
Her carekê
Bi yê bûkekê
Gundiya diêxîte lavelavê
Hê binêrin
Berêd aşan avê birin
Pa ji kî ve hat lihiya avê
Pîrejin jî herê dibêjin
Dê jê vebin
Ecna reva
Derdêd xudê divêt hebin
Iha hosa hemî pêk ve
Herê dibêjin û vedigêrin
Lê ji dil kes dîv de naçît
Naket pêkol û bizavê
Lew bûka bêseraşîn e
Ta vê gavê...Ta vê gavê**

*Duhok, 1984*

## ÇIRAYÊ HER HIL

Hir û bayê
Feleka tim li me bêbext
Li vê şeva
Hêj ji warê rojê mişext
Li pêşiya rêbaza sext
Rêya dirêj ya Kurd tê de
Dîsan rabû û çirayek dî
Da ber çerxa û çerxek lê da
Hey felekê
Çima wesa dîsan aryay
Bi çi dil te wesa dil da
Geşe çiray
Bideye ber çerxa reşbay
Ûkarwanê
Xebata li ber dihajotin
Ew hind qonax
Hêjta jê may
Lê felekê
Vê carê jî tu qet nayay
Bîr û baweryên mukum bi ronahiyê
şaş bikey û
Ji rêbaza wa ya rewa
Bihêlî vemay
Bîr û bawer nê felekê
Ji terha bejna çirayî
Li qonaxêd hemî şevê

**Wêd ava bûyin telar û kel**
**Bîr û bawer**
**Ji gurya sora çirayê**
**Li ser her kêr û kumtekê**
**Wêd bilind bûyin mişe mexel**
**Bîr û bawer**
**Ji tênan hulma çirayî**
**Li nav lihya**
**Sir û seqema befrê**
**Serê xo dixwin bizot û pel**
**Bi tinê evro dîtina çiray**
**Xerîbî ye û xerîbiyê jî**
**Behî ya xo di tev dilan de**
**Rast û çep ya gerim kirî û**
**Ji çavêd me**
**Ya dibarîtin rondikêd kel**
**Lew felekê**
**Çirayê me nevemiriye û**
**Her û her dê mînîtin hel**
**Dê mînît hel**
**Dê mînît hel**

*Zêweşikan, 1987*

## MIROV LI VÎ DEMÎ

**Li vî demî**
**Demê xewn dibin hizir**
**Hiziryekser dibin şi'r**
**şi'ryekser dibin xewn**
**Xewnêd bêper**
**Lewa gava**
**Çi helbesta**
**Çi çirîska ronahiyê**
**Biket wexer**
**Berî kinarê tariyê bikete der**
**Dikevît û dibîte kelex**
**Devên dehba li ser kelexî**
**Dibin xencer**
**Dibin cencer**
**Li vî demî**
**Bizava mana mirovî û jiyan hemî**
**Hat û bat e**
**Ger kê dîtiye û guh lê bûye**
**Giya...Li ser binê xo**
**Kulb lê rabûye û bi derdê**
**Birsê mirî**
**Berê bestê**
**Li ber sîngê şeh rûbarî**
**Têhnê birî**
**Kê dîtiye û guh lê bûye**
**Werîs...Pitir ji marî**
**Rengê marî bidet**
**Mexela komêd kelexan**
**Bibîte govend û dawet**
**Çewan çê dibît**
**Çiwar nîv mirov**
**Bi çiwar rojan**
**Bibin dewlet**

**Ûçil milyonêd mirovan**
**Li ser bextê xir cîhanê**
**Her bimînin çiwar ker xîvet**
**Ma kê dîtiye û guh lê bûye**
**Bi hizaran zarok û jin**
**Di gerewa**
**Pêngaveka revînê de**
**Sax bisojin**
**Û di gerewa talanê de**
**Rondik birijin**
**Çewan çê dibît**
**Rondik bibin bela vegêr**
**Bibin tola gulêd xwînê û**
**Dil û wijdan qet nehejin**
**Pêpkêd kursiya nebijin**
**Li vî demî**
**Rondkêd giryê û rondkêd kenyê**
**Di têkel in**
**Wek hev dikelin**
**Jîn û mirin**
**Êk hizr in**
**Hêj guman e ku zor caran**
**Jîn mirin e û mirin jîn e**
**Gelek caran**
**Jîna ji bîr e û**
**Mirin jîneka bijwîn e**
**Li vî demî**
**Pitir ji berê**
**Çi paryê bêt daîran**
**Diviya ji gerya jarekê**
**Birsiyekê**
**Bête derê**
**Çi sorava**
**Rwî û lêvên xanimekê**
**Bixemlînît**
**Diviya gulên buharekê**
**Xira biçinin**

**Diviya davên taveheyvê**
**Bo bihilçinin**
**Çi sopera**
**Her qeşmerek bihajotin**
**Diviya gundek**
**Bête sotin**
**Diviya guhanêd xîretê**
**Bi yekcarî bêne dotin**
**Li vî demî**
**Dest bo destî**
**Neviyan û dijya mirovî**
**Bo mirovî**
**Ya digehîte nîva hestî**
**Kulavê ciwanê rastiyê**
**Wê şepiliye**
**Hêjê xiwar e û siûdşikestî**
**Yê dî... Wek xo**
**Herê li kar e û**
**Serpê direfane bi serbestî**
**Ser...Li vî demî**
**Yêd bûyne pê**
**Yêd bûyne pêlav**
**Pê...**
**Yêd bûyne ser**
**Serêd çiwar çav**
**Lenger... Bo xardanê bilezin**
**Beref jêhel**
**Ew sernişîf herê dibezin**
**Mafê jînê û yê nejînî**
**Kor e bo me yêd nivîsin**
**Paşerojê**
**Sernişîf yêd hilawîsin**
**Bîr û bawer**
**Li kolanêd mirovayetiyê dirwîsin**
**Gemîvanêd**
**Mirovayetiyê mîrin**
**Bîr û bawer bo mîra jî**

**Tenha lîs in**
**Li vî demî**
**Li nav bera gelî û mîrî**
**Herçende bi çavan çepek e**
**Lê li çûnê**
**Hizar qonaxa tu ji wî wêvetir î**
**Çi qonaxa jê bi qebr î**
**Pitir dwîr î**
**Yê bivêtin zwî bigehîtê**
**Divêtin ew bibîte se**
**Yan jî twîr î**
**Ger dê çewan**
**Mirov li ber derazînka**
**Hizir û bîr û mafêd xo yêd**
**Rast û rewa**
**Her mişext bît**
**Hindî li bîr bît**
**Vehewyayê**
**Birîna kevna bêbext bît**
**Çewan çê dibît**
**Mirovêd jînê bi vejînin**
**Tenha ew bo jînê bijîn**
**Tenha jî jîn**
**Bi jîna wan bijîtin**
**Bo wan jîn hera sext bît**
**Lew ez dibêjim:**
**Mêjûya nû**
**Ji ya kevin, kevintir e**
**Heke bo çi**
**Nav ji nav berperan direvin?**
**Peyv ji ristên xo dikevin?**
**Rwîdan û hevbend û rêçûn,**
**Têkde evro penc û dev in?**
**Penc û dev in?**

*Îran, 1988*

# BIRÎNEKA DÎ

**Weku ferman**
**Careka dî li me rabûy**
**Çaxê hovey**
**Birandin û tera û bera kirina Kurdan**
**Bi xerdelê û siyanîdê**
**Mîrat bibin**
**Dayin mor kirin**
**Weku çeper**
**Hatîn berdan**
**Liwîliyên kelên**
**Tivengan hatîn şûr kirin**
**Qewil û qerar**
**Vêkre hatîn çirçir kirin**
**şoreşa man û nemanê**
**Bo cara dehê hatiye**
**Serbûr kirin**
**Doza mezin**
**Tî û tî hatî bergor kirin**
**Simkuy...**
**Şêrê garey**
**Yê Metînî**
**Hevgurê Zêy û Rwîşîn î**
**Aşiqê gerdena rind ya**
**Sebetanê**
**Jê şaş nebûy û ma li meydanê**
**Berdana Kurdistana xo**
**Ji ber fermanê**
**Nekir eger**
**Cerg û zever**
**Ji revînê rizgar kirin**

**Kirine dever**
**Bîş û kinarên hevguran**
**Qonaxa pir sexta nû ya**
**Kurdîniyê**
**Kirine wexer**
**Li xopana wa şwînwarên**
**Xerîb û posîde û damay**
**Simkuy...**
**Sefera dwîr**
**Hajot û zwî lê kire der**
**Û li ber soyê**
**Çeperê bêdeng û pêjin**
**Êkser**
**Tuxîbên sîtafka bejna**
**Xo ya bilind**
**Li wê derê kirine çeper**
**ji çeperî nehate der**
**Nehata der**
**Ji çeperî nehate der**
**Jê derneket**
**Çinku neviya ne li warê xo**
**Xo bivêtin**
**Çinku neşiya**
**Xir welatî**
**Xir milletî**
**Xir şerefê**
**Ewan soz û ewan swîndan**
**Bi kaçkekê xwînê bidet**
**Çinku neşiya**
**Hevalîniya Mihemed Salihê Botî**

**Û Burhanî**
**Ya Xisroy û her çiwar kurêd Helîmayê**
**Ji bîr biketin**
**Nexêr neşiya**
**Helîniyê ji berik bibet**
**Hindî hatinê**
**Hûn binêrin çitov hîmet**
**Hindî hatinê... Birîn**
**Birîna xo ya kwîr û dwîr**
**Neda bi xîvet**
**Neda bi Rajan**
**Neda bi Kereç**
**Neda bi Nemsa û neda bi Swêd**
**Mirin...**
**Neda bi xiyanet**
**Vêca Kurdo**
**Vêca millet**
**Kê dî heye wek te hosa**
**Sergêrekê**
**Bi carekê wefa û xîret**
**Wefa û xîret**

* * *

**Hê... Hevalo**
**Silav li te bin**
**Hindî silav li dinyayê hebin**
**Silavan jî tu bi Xudê key**
**Bigehîne**
**Her hevkêşê li wêderê hey**
**Xirê dibêjin**
**Te rwî spî bin**

**Çend wexerê dwîrtir bibey**
**Li bîra te ye**
**Weku me digot**
**Mirov... Berî bimirît**
**Diviya bizanît**
**Piştî mirinê ka dê çi ket**
**Te baş zanî**
**Ka dê çi key**
**Vê gavê jî birîna xo**
**Bi dinyayê xirê nadey**
**Dinya hemî hîviya dixwazin**
**Birîneka wesa hebît**
**Tê ve bijîn**
**Da ku çi caran nemirin**
**Da nemirin**
**Kore bin jî**
**Heçî çavên**
**Xulkê çavên te ji bîr biken**
**Û di xewna xerîbiyê de**
**Ger awirya jê re neden**
**Binbir bibin**
**Ew axînk û ew hîviyên**
**Mizgînya serketinê**
**Bo kurê te eger neben**
**Eger neben**

*Îran, 1989*

## ÇITOV ŞOREŞ

**Helperist û**
**Bazirganên Kurdîniyê**
**Ji ser û bina**
**Li dîmahiya her şoreşekê**
**Wê şoreşê**
**Text diken.**
**Di gel netevên şoreşê**
**Bi tevayî**
**Wê rewacê cext diken.**
**Her delîveka dirust ya**
**Liberxwedanê sext diken.**
**Hîviya paşerojê**
**Ji vê jînê xir yê mişext diken.**
**We dizanin**
**Bizava wan**
**Sergêra yekaneya**
**şoreşê ye!**
**Eger bi ser ket,**
**Alaya serxwebûnê bilind…**
**Li ser koxa bilinda dîrokê**
**Bi destên xwe,**
**Wan çikland**
**Ger jî bi ber ket, birevin.**
**Teqeza welê hat û hind!!**
**Evên henê hosa di şoreşa û**
**şoreşgêriyê digehin…**

**Êdî çewan**
**Bizav û hizirdana wan**
**Li ser sinûrê dîrokê nabehin!!**
**Rastiya bêxiş jî,**
**Hindî şoreş hatîn û**
**Welê hatîn…**
**Hemî reh in.**
**Terhên nû şînên şoreşê ne**
**Maka wan**
**şoreş e û ew şoreş jî**
**Hêş ne li pêşçav e…**
**Di şkêrekê………**
**Ketye rikê**
**şkêr jî bênav e.**
**Dibêjin:**
**Eve şoreşa çilê ye,**
**Kurd digêrin!!!**
**Lê kîja Kurd in**
**Ew jî dibêjin:**
**Aşvanyê diken û kîşk in jî**
**Hevranê wa şoreşa dihêrin… !!**

*1990*

# Idrîs Çelkî

Di sala 1957'an de, li gundê Çelkê ser bi qeza Amêdiyê, ji diya xwe bûye. Li Amêdî û Duhokê xwendiye û di sala 1982'an de, zanîngeha Bexda bi dawî aniye. Her ji sala 1978'an û pê de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di piraniya rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Di sala 1982'an de, ji ber terora rijêma faşîst ya Iraqê, gehaye rêzên şoreşa Kurdî. Heta niha şiyaye dîwaneka helbestan bi navê “şevstranêt zêy” çap biket.

Vekolînek li ser jiyan û helbestvaniya nemir Qedrî Canî nivîsiye û ji bo çapê amade kiriye.

Niha jî li Elmanya ye.

## DENGÊ MIN

**1)**
**Dengê min hewrekê reş e**
**Tijî birîsî û baran e**
**Diyarî ne…**
**Birîsî… Ji bo zincîr û dîwaran**
**Baran hemî… Bo cinînkêd evîndaran!**

**2)**
**Dengê min îro çirîsk e,**
**Çirîsk e ji kwîra Kawe ye**
**Ji gurya agirê Newrozê**
**Ji kadî û dwîkêla çeperêd**
**Emê Gozê!**
**Ji birînêd Ferhad û Memê**
**Vîna şirînê û Zînê ye**
**Axînkeka…**
**Kwîr û dwîr e**
**Dengê Derwêşê Evdî ye**
**Ceng e li ser yasayêd kevin**
**Ji sîngekê tijî kovan e û**
**Pir birîn e**
**Gazî û nalêna "Xanî" ye û**
**Cegerxwîn e!**
**Hişyarî ye ji xewa giran**
**Rêya azadiyê û jînê**
**Ron diketin**
**Geş diketin!**

*Bexda, Payîza 1979-an*

## PEYVÊT TE HEVAL

*Bo Mueyed Teyibî*

**Heval peyvêd te bûn kaniyek**
**Tijî viyan**
**Dilêd hizar genc û lawan**
**Li hev kom kirin!**
**Bûne ewrek tijî baran**
**Zevyêd hizar rêncber û cotyaran îro**
**Têr av kirin!**
**Bûne gurzek pir seng û jan**
**Malêd gelek sitemkaran**
**Xopan kirin**
**Bûne stranekê xemgîn**
**Awazekê tijî kovan**
**Serhatiya birîna me...**
**Tê de hate tomar kirin!**
**Bûne gemiyek dirêj û pan**
**Deryayê xebatê şeqand**
**Dengê "Xanî" û**
**Ringêna çekoçê Kaweyî**
**Li cîhana me belav kirin!**
**Peyvêd te...**

**Dergehê xem û kovana yê vekirî**
**Agirekê li nav sîngê me hilkiri**
**Cerg û hinav kirine gurrî!**
**Lewa heval**
**Dilê min jî wek dilê te**
**Îro bûye meşka giryê kovanêt dikên!**
**Her şilqekê sed awaz in**
**Stran wekî rûbara dizên!**
**Rast e we ye…**
**Evro bekrok gelek hene**
**Lê ew neşên**
**Çirakê viyan û jiyanê vemirînin**
**Stranên me…**
**Dê xelkê kêşne govenda Mem û Zînan**
**Zerî dê hên kene dawet!**
**"Xanî" bi çavêd xo dê bînît**
**Çewan roja… Tacdîn û Sitiyê zwî helat**
**Herwesa bejna Zînê jî**
**Dê bo Memê keyne xelat!**

*Bexda, 6.5.1980*

## JI RAZÊD ÇIYA

Piştî yarê...
Rondikêd me berdayin hizar
Heyranok û stranêd me
Kirîn zêmar!
Gurrya kevne bîrhatinan
Ser bijand û cergê me xwar
Xewê reşmalêd xo birin
Nivînêd xo...
Sivik pêçan û kirine bar!
Ji germa eşqa çav marê
Mam çaverê...
Mame hişyar!
Belkî qela mizgîniya
Rojekê silav kete me
Dermanket dilê birîndar!
* * *
Êvariyekê...
Li perê gundî rwînîştî me,
Pêlêd derya kwîr ya hizran...
Veşartî me
Bayek hat û di gel xo birim
Bilin kirim...
Heta geham rasta çiyan
Rasta zozan û kwîriyan
Min hewar kir ji dilek sotî:

**-Ho çiyao!**
**Bo çi serê te yê spî ye û**
**Rondikêd te xoş dibarin**
**Dikeye girî?**
**Diyar e nîşanêd pîryêne û**
**Evro, sibe**
**Tu dê mirî?**
**-Ji tirs û sehma dêwêd mezin**
**Çavêd hewe dixapandî ne**
**Ji hizir û bîrêd jengî û kevin**
**Hişêd hewe dinivandî ne?**
**Ew spiyatiya bi serê min ve**
**Kulavê minê befrê ye,**
**Ew rondikêd tu jî dibêjî**
**Avebefr e**
**Bo tevriyan**
**Bo hevala te û kwîviyan!**
**Tu çi dibêjî û çewan diaxvî**
**Girî... Bi vêre nakevît**
**Pîrî... Bejna rind û bilind, nagirît û**
**Naêxîtin**
**Ev çiya ye her tolaz e û**
**Çi car... Çi car**
**Nakevît û namirîtin!!**

*Duhok, Payîza 1980-yî*

# EŞQA MIN Û ZÊY

**Herê "Zê"-wo**
**Zêyê mezin**
**Şehmarê pirr sehmê kevin**
**Pêlêd te diên û xoş dibezin**
**Wişên û deng û awaz û swîlavêd te**
**Her dibistirin!**
**Ew kefên dikevin swîpelan**
**Dîmen spî ne û têr digirnijin**
**Birinciyêd rijd û dijwar**
**Sîngê xo vediken û dikenin!**
**Eve çend sal û zeman e**
**Ez û tu vêkre heval în**
**Pisyar nakey ji halê min**
**Evro li min şînî û behî ye**
**Van stranan... Bo kê dibêjî**
**Nabêjye min!**
**-Berahya te Feqiyê Teyran**
**Pisyarek ho ya ji min kirî**
**Ez çawan bersiva te bidem**
**Van nihêniyêd têkwerkirî!**
**Kovana bo te vekolim**
**Birînêd tijî ji agirî**
**Kî dibêjîtin**
**Ev stran e...**
**Laqirdî û girnijîna he...**
**Nahên ji xem û kovanan,**
**Nahên ji girî?!**
**-Rûbarê pir raz û evîn**
**Were... Were**
**Tu guhdêre derdê eşqê**
**Derdê xeman**

**Derdê evînya dilberan**
**Gerden şema**
**Keyf û kenî pêk ve firîn**
**Xoşî nema**
**Ez bûme evdal û gûyên**
**Li dûrêd çema!**
**Kovana... Sîngê min hinî**
**Birîna kenyê min çinî**
**Eşiq û evîna dilberê...**
**Dil girt û têk de hincinî!**
**Lewa ez bo te vedigêrim çîroka xo**
**Dimdima "Xanê Lepzêrîn" keft û herift**
**Berê serî hate binî**
**Rista xwazgîna evro hate bizdandin**
**Yara min sil bû û arinî!**
**Belkî barê min sivik key...**
**Hindek xema ji min bihelgirî**
**Tu ji mêje hehalê minî!**
**-Barê te pêş barê min ve**
**Ka û pembî ye.**
**Evînya te...**
**Ya bê qorban û bê hewar û gazî ye!**
**Kengî welat...**
**Te hêla ye ji ber dêmdirê?**
**Kinarê çepê ji govenda azadiyê**
**Te berda ye...**
**Bo tewafa lêv şekirî?**
**Dergehê bîr û baweran ... Pê ve daye**
**Ser xatira çavêd dilberê**
**Eger tu qorbanyê nedey**
**Viyan nabêjîtin erê,**
**Tu li buhara sîngê yarê**
**Çi cara nakevye çerê!**

**Eve çend sal û zeman e...**
**Ezê keftîm**
**Gazî û hewar û heyhayê**
**Sotim... Sotim**
**Evî derdî û evê tayê!**
**Nav dengên eşqa min ya bê dwîmahî**
**Bijyane hemî dinyayê**
**Pişta min kefte welatî...**
**Evro min ji warê xo bar kir**
**Ser xatira...**
**Eşiq û evîna dilkewîna deryayê!!**
**-Eger dilê min di eşqa yarê de bibezît**
**Welate hêza jiyanê,**
**Eger dilber evro dixwîna xo bigevizît**
**Dê bi çepî rêsim hozanê!**
**Ew kesê hate govendê û li kinarê me**
**Neleyizît...**
**Rwîreş e li gera dîlanê!**
**Ew kî ye dê bîr û bawerêd min dizît**
**Nû hizrêd min...**
**Bet û kujît?**
**Efsanêd Dêw û Sîmûrxa**
**Ya barkirî ji vê cîhanê**
**Piştî min roj maçî kirî**
**Çavêd xo li jînê zil kirî**
**Çewan Ehrîmenperês im**
**Çewan nehême meydanê?**
**Hindî rojek...**
**Li jiyana min mabît "Gelo"**
**Ez hevalê soza xo me û**
**Naşkênim evê peymanê!!**

*4.7.1981*

## PEYV DÎWARA DISIMIN

Li pişta dîwarêd kerr û lal
li pişta heft dergehêd pîla
Li kwîratiya serdavêd tarî,
Çavêd girtî...
Destêd di zincîra de arî,
Qamçiyêd reş
Wekî marî...
Kevlê jeniy, leşê xwarî
Heta çûka “pê” di avê de û
Serma ji her çar dîwara dibarî!
Dengekî pîs û peritî
Hat gote me:
-Eger tu giya bî li binê derya şîn bibî
Evro tu çûy
Eger wekî Eskenderî
Tu li ava jiyanê bigerî
Divêt evro...
Destêd xo li jiyanê bişûy!
Hindî peyvêd te xencer bin bo sîngê me
Herdem dê vê paşîvê xoy
Ji evro pê ve...
Tu hespê xo li mêrga jiyana hajoy!
-”Qutan birincî spî diket” û
Dikete befir

**Dengê kirêtî êlçiya**
**Ringêna qeyd û qamçiya**
**Bawerya min…**
**Dikete befir!**
**Bazinkêd we bûne kilîl…**
**Derê xanyê peyva vekir!**
**Wî çaxiyê…**
**Peyva Kurdî ya berhingar**
**Serdavêd tarî ron diket û**
**Li reşekêd we…**
**Dixurît… Dinirît**
**Girtîxane tev de dihijît**
**Peyva şerker digel tivengê**
**Li dirêjahiya Kurdistanê**
**Çeperêd Faşîzmê disimît**
**Sengerêd swîxura disojît!!**

*Çelkê, 2.9.1982*

## JI BÎRHATINÊD PÊŞMERGEYEKÊ

Pêla germa evîniyê
Wekî tolazêd gundê me
Ez danabûme nav derya!
Dava eşqê…
Ez girtim û di pêd min aliya,
Çingeçinga bazinkêd zer
Dêmê xir û enya kever
Ez kirbûme…
Zêrevan û şanê zerya!
Di wî çaxî de…
Gurrya eşqa dilbera min
Mewter bû ji gurrya welatî û
Ji hemî gurrya!
Min hizir dikir
Mirov hemî… Li ser vê yasayê diçin û
Mest û serxoş in bo periyan!

* * *

Spêdehyekê
Hêş tarî bû
Hêta roja… Di nav pirasiyêd şevê re
Li pişta çiyan…
Nivistî bû
Herçar kinarêd gundê me…
Hatine girtin!
Reşek û rêgirêd şevan
Çeperêd xo li hawîr bestin!

**Wek swîxuran…**
**Berê stiryêd xo dan gundî û**
**… Pêk ve hatin!**
**Du evîndarêd bin peryê**
**Li paşya xanî derêxistin!**
**Êlçiyekê…**
**Piştî hizar kirêtiya**
**Ser û çav lê bi tifê şiştin!**
**Gotê çima…**
**Dihî nîvşev**
**Borya sopa evê malê**
**Di çirîska re hera sor bû**
**"Se" yêd gundî nedinivistin?!**

*** * ***

**Ji hînge were minê zanî**
**Li sîbera koçka siltanî**
**Evîn xew e**
**Hindî qamçî neyên sotin**
**Jîn direw e!**
**Ji hîngê were…**
**Enî û dêm û bazinêd zer**
**Bûn bîrhatin,**
**Kevalê kotir û periyan**
**Bî… Perestgeha dilê min!…**

*Komate, 24.2.1983*

## HERANEKA KOÇER

-Kurko dîno
Hey lolo li min heyrano
Kê dîtiye...
Ji heft dewrên heft zemanan
Li nav warê xo
Li nav gundê xo
Li nav mala xo
Mirov bikevîte zîndanan?
Kê dîtiye...
Sal û zeman
... Warê mirov perçan ketin
Gundê mirov pawan ketin
Xanyê mirov ava ketin
Bo mirovî bibîte zîndan?
Kurko dîno
Heyranê min...
Evro li dwîr û deraziyan
Li koçeriyê
Çi bikem ez... Destêd kurt in
Sikrêd jengî...
Hêta hêza may û dixurtin
Hîviya mina li rûbarê Zê
Di gel stran û sîpelêd şoreşgêrêd xo
Bigehînte min...
Silavêd agirînêd min
Silavêd min!
-Kiçkê dînê

**Hey lêlê li min heyranê**
**Evîna te...**
**Dîwarêd kiriye çar keval**
**Nexşê çar kinarêd "Mîdya"**
**... Tê ra dibînim!**
**Du çavêd te**
**Yêd bûyne kunzirî û metal**
**Lewa ji bendê 200'î ya yasaya rêlî**
**Bê bakim û di xemê nînim!**
**Kiçkê dînê...**
**Te çav marê heyrana min**
**Piştî zivistanê buhar e!**
**Rûbarê Zê**
**Herdem xurt û wefadar e**
**Demê hat û**
**Telya evînya min û te**
**Rwîvî girtin û şireqî**
**Nihala Geverê peqî**
**Ew çi qirş û çi dîwar in**
**Dê şergeh û pêla birrin!**
**Yan jî çi sikrêd kevnar in**
**Xo li ber sîngê...**
**Lehî û lêsera ragirin**
**Xo ragirin?!**

*Loristan Buhara 1984-an*

# ÇEND NIVÊJEK
# DI PERESTGEHA WELATÎ DA

*Bo zarokêd Q. Q*

**1)**
**Peyva yekê...**
**Zarok bi xo digirît "da" ye**
**Peyva yekê...**
**Sofî diperêsin"Xuda" ye**
**Aşiq pîroz diken"wefa" ye**
**"Welat" jî peyva yekê ye**
**Di nav ferhenga ramyarî de**
**Min helbijartiye û viyaye!**

*Bo Nûrî Şawîsê nemir*

**(2)**
**Ji mêje were hatiye gotin...**
**Demê ez nivîsînê dikem**
**Hestê dikem... Ku ez yê hey**
**Bizavê dikem... Pa ez yê hey**
**Ez diaxvim... Pa ez yê hey!**
**Welatê min**
**Herwesan î...**
**Demê rûbarê evînya te yê pir mey**
**Bi ser dilê min de dihête xarê**
**Zistanê lê dikete buhar**
**Hîngê ji kwîratiya dilê xo**
**Ez jî hestê dikem ez yê hey!**

*Bo dastana qehremanêd Ebû Xerîb*

**3)**
**Di pêlêd rejiyêd taryê dê**
**Di nav pirasyêd bêgengiya pir sehim de**
**Bazinkêd polîsî destêd min radimîsan**
**Mîdalyêd zerêd Siltanî**
**Li ser leşê min...**

**Belave hatibûne çap dan**
**Leşkerêd şevê di davêd xo yêd aloz de**
**... Ez werpêçam**
**Hêdî di dilê xo de min got:**
**Çend nexoş e**
**Çend xopan e...**
**Dil... Hêlîna kovanan bît...**
**Qamçî, marek û çar dîwar**
**Li mirovî bibine zêrevan!**
**Lê ya xopantirê ewe...**
**Şirîn welatê mirovî**
**Li nav çar dîwarêd mezintir de**
**Binalît û hawar biket...**
**Ka serxwebûn**
**Kanê jiyan?!**

*Bo şehîd Cotyar Amêdî. Memo*

**4)**

**Temet hîviyêd zarokan**
**Min tu divêy**
**Temet ciwaniya kevokan**
**Min tu divêy**
**Temet xurtiya çevokan**
**Min tu divêy**
**Welatê min...**
**Min tu divêy**
**Temet kêliyêd şehîdan**
**Min tu divêy...**
**Temet dalxên penehendan**
**Min tu divêy...**
**Temet serhildanêd Kurdan!**

*Tehran Havîna 1984-an*

## ŞEVISTAN

Ev cîhan e…
Hemî evîndaran rojê ye… Ez nebim!
Ez heyv im û min şev divêt
Çunke tinê…
Di nav pêlêd reşêd şevê de
Ez dişêm yara xo maçî kem!
Tinê… Tinê…
Di nav pirasyêd şevê re
Ez dişêm dijminê xo bigirim… Helawîsim!
Ez heyv im û min şev divêt…
Çunke kirasê min şev e… Çiya û berrî ne
Min bawer e…
Nîva dastana jiyanê
Di paşya şkeftan ve binvîsim!
Min şev divêt…
Çunke di şevê de cejna me dest pê diketin
"Biromîsyos" her sal buhar
Hêdî… Hêdî…
Bi dizî ve…
Ji çiyayêd "Qewqas" dihête xar
Destê Zerdeştî digirîtin
Ji dil dibêjîtin…
Cejin pîroz,
Di şevê de ciwaniya agirî xuya dibît
Sitayiş bît ev agire
Herdem sitayiş bît Newroz!
Lewre… Lewre
Demê roj rojê dihêlît û

**Kezya şûr dikete nihalan,**
**Demê li ser kaniya gundê me**
**Hirkêd şivan û gavanan**
**Têkhel dibin…**
**Di gel dengê çavrî û kewalan!**
**Demê vala dibin hêlînêd çekçekîlan**
**Hêlînêd din ava dibin…**
**Bi zivirîna çîçik û tewalan!**
**Lewre… Lewre**
**Demê ji ber wîrwîra beqan**
**Hêr dibin zevî!**
**Demê li ser gopîtkêd çiyan**
**Diqerisîtin befr û kevî!**
**Demê silav dikete çeman**
**Tirîfa heyva kewçera çardeh şevî!**
**Lewre… Lewre…**
**Demê li nav şîv û percanan**
**Dibîte firtêna çirkunan,**
**Li nav aqara…**
**Xo dibît kibara Gûhînan!**
**Demê esman…**
**Dibîte peraşûteka reş**
**Vedigirîtin…**
**Şax û nihal û betenan!**
**Lewre… Demê…**
**Demê… Demê,**
**Hingî gava xoşya min e**
**Xozya min şeveka dirêj û bê bine,**
**Çunke hingî…**
**Pêngav dibezin bo jivanan**

**Tibil û dev hêdî digezîtin**
**Pirç û stivank û kivanan**
**Hingî barût...**
**Eşqa azadiyê dihelgirît**
**Semfoniya aştiyê dibîjît,**
**Hingî hêlînêd zarokyê**
**Geş diken derazînkêd xewnan**
**Dil radiçinît...**
**Hizar parzînkêd hîviya û hizar tevnan!**
**Hingê dihête pêş çavêd min**
**"Zîna" bi dîwarêd xo dikenît**
**Hinde nêzîk e, çi nema...**
**"Şîrîn" dê bêstonî simît!**
**"Direfşa" her ya bilind e û**
**"Nahîd" ya awaza dijenît!**
**Hingê "Celwa" dibêjîte min...**
**Şeve şahiya perî û horiyan!**
**Şev e beheşt û Yotobiya,**
**Li evî warî...**
**Şevistan e**
**Bendera paporêd xozyan**
**Êzga xewnan û hemî xoşyan!**
*Tehran, 22.6.1984*

* Nahîd yan Anahîta di Avêstayê de hatiye mîna Xudêya zaxiyê Elxusobe û evîniyê, beranber Vînosê, Efrodotê û Semîremîsê di efsanêd Romanî û Yonanî û Aşûrî da.

* Celwa... Pirtûkeka pîroz ya Êzidiyan e.

* Yotobiya... Bajêrê kamîraniyê. Şarê bexteweryê. El-medîne El-fadile.

## SÊZDEH SIWARÊD BEHDÎNAN

Dem êvar bû...
Rojê kezyêd xo divehînan
Tavyêd reş warê me dinixavt!
Salê kirasê stwîr dihavêt
Balava xo...
Danabî ser kanî buharyeka bihelim
Çermê Efrîtê sermayê
Eyhot û Zengel û Enter
Li ser pişta xo radikirin û
Kepenê barova digivaşt!
Ji nişkekê ve...
Şirîqên kefte welatî
Gul û xencer ji binî hijyan!
Herçar çiya, xo çemand û
Ji kwîratiya birînê giryan,
Roj bî rejo
Stêr ji esmanê bala rijyan!
Avêstayê per reş kirin...
Darberûyan... Ta... Lê qiryan!
Revde... Revde kotir firîn
Bêdengiyê vegirt cîhan!
Rondikêd germêd Gîvara
Li cengelêd Bolîvya
Wek baranê hatine xarê!
Birincê Viyetnamê belgêd xo werandin

**Spartakûs kefte nîharê,**
**Hingê min zanî karwanê... Faris-Cengo**
**Her sêzdeh siwarêd Behdînan**
**Çû mêvandariya dîrokê**
**Çû wexerê**

***  *  ***

**Heyv û roj û yazdeh stêran**
**Evê carê...**
**Ne ji bo Yosif,**
**Bo çiyayê spî... Bo berê spî**
**Ji bo "Lale" sucde birin!**
**Sêzdeh siwarêd Kurdistanê**
**Faris... Diwazdeh siwarêd Merîwan**
**Cengo... Hemî siwarêd Germiyan**
**Her sêzdeh siwarêd Behdînan**
**We çend rûbar û tixobêd direw birîn**
**Bûsêd dijminan şeq kirin!**
**Rêl û rewal**
**Têlbend, sîrme... We bir kirin**
**Pêk ve hwîn hatin welatî**
**Da careka dî...**
**Hîviya li nav xewnêd zarokan biçînin!**
**Kevne tevnêd Saykis-Lozan**
**Helweşînin**
**Stivankê şirîn yara min**
**Bi gullêd tivengan vehînin!**

**S**

**.**

**.**

**.**

**T... !**

Ew bûka perî lêkeftî
Ew kulîlka nebişkiftî
Govenda wê bigirin... Bigirin
Bihijînin!
Lê derebeg û faşîstan
Wesa zanî...
Piştî we dê ... Gernasêd welatî rwînin
Rêncber êdî dê mirin û
Serê xo qet nahelînin!
Ne...Hevalîn...
Nexêr... Nexêr
Xewnêd wan zwî zwî dê firin!
Mîlêd çerxan...
Bo paşiyê nazivirin!
Kaniyêd resen zuha nabin
Rûbarêd xurt û jêhatî
Gelya vediken
Çiya dibirin!
Heyf e, heyf e rojek bêtin
Tivengêt we...
Li koçk û civatêd begleran
Êxsîr bibin
Li nav hizar destan bigerin
Xelk bibêjin...
Eva henê
Kevne tivenga Faris bî

**Kevne tivenga Cengo bî**
**Niho xanêd wan hafirin!**
**Komêd kevzê tê de diçêrin**
**Kurdistan welatê xeman**
**Kevne warê...**
**Birîn û govend û seman**
**Herdem koçk û civatêd wê**
**Ji gencan di pir in!**
**Ber û daran**
**Gund û şaran**
**Evroke di gel we peyman e**
**Tivengêd we zwî helgirin!**
**Hestîkêd we dê bin xencer,**
**Gorêd we dê bine volkaneka,**
**Tijî hizir û bawer**
**Ji bilindahiya...**
**Hêdî... Hêdî**
**Wekî baraneka pilê**
**Dê vegirît hemî waran!**
**Tev giyanewer...**
**Hemî zîwan û xemegor**
**Dê kevne nav şergeha lehî û rûbaran**
**Perêd dîrokê kovan e...**
**Warê me warekê bi zax e**
**Her çipkeka xwînê bikevît**
**Dibîte gaz û**
**Çirayekê nû hel dibît**
**Ron diketin rêka rêncberan**
**Geş diketin rêka hejaran!!**

*Şoşan Zistana 1985-an*

# Ehmed Qerenî

Di sala 1955'an de, li bajêrê Akrêyê ji diya xwe bûye. Li wê derê xwendiye û paşî bûye mamoste. Em nizanîn kengî dest bi nivîsîna helbestan kiriye, lê wek ez agehdar im, ew piştî sala 1974'an hate qada edebiyatê. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd bû li Kurdistana Başûr e. Her wisa di nav rêzên şoreşa Kurdî de, me bi hev re Yekîtiya Nivîskarên Kurdistanê ava kiribû. Ew jî di sala 1983'an de, hate cem me û bû endamê wê û her ji hîngê were pêşmerge ye...

Gotar û vekolînên edebî jî nivîsîne û heta niha pênc dîwanên helbestan çap kirîne:

1. Cokek ji Rûbarê Evîna Min, 1978.
2. Man, 1982.
3. Tulîta, 1986.
4. Şoreşa Evînê, Maka Evîniya Şoreşan, 1989.
5. Bêdengiya Xalên Sor, 1990.
6. Kanî, Folklor, 1984.
7. Şoreşên Bêdeng yên Edebî û Peresendina Îdeolojiya Kurdî, Vekolîn, 1990.

   Mixabin ji her pênc dîwanên wî, tinê du li ber destên me hene, ku ew jî bi tîpên Latînî ne. Ev helbeste ji van dîwanan e:
   "Şoreşa Evînê" û "Bêdengiya Xalên Sor"

Dîsan mixabin dîroka nivîsîna helbestan nehatîne nivîsîn, lewre me jî li gor bihêzbûna wan helbijartîne. Ew niha jî li Kurdistana Başûr e.

# FALIKÊN XAÇA EVÎNÊ

1)
Hindî hebin, rengên mezin.
Dengên mezin.
Bîrên mezin.
Ji evînê meztir nîne…
Lew çaxê min welat viyay,
Bûme dildar…
Pêşmergeyê dostê çiyay…
Wek sîqala
Di nav befrê de jiyan danay
Bo azadiya welatê xo
Emrê gulan minê hêlay…
Weku işqa
Qeqnesekê di nav agirî de
Sotin bênay
Ji evîniya welatê xo
Boxçikeka zer,
Pir maçên ter mina pêçay…
Bi wê evîna hinde sal e
Qonaxa dûr min pê kêlay
Girê-Girê
Fîstana sor, bo welatî
Min yê dirî, min yê pîvay…

2)
Gîvalên esmanê buharê
Xebata gelê min
Ji behra firmêskên sêwiyên
Soryayê der bûye… !?
Sêryana meydana
Wan rêkên bê sinûr

**Ji dengê şivanê**
**Pahîzok hebandin ter bûye...**
**Davdozê "gul sotîn" wextekî**
**Lewendiyên govendan**
**Birîne û kirasek**
**Ji rengê Helgurdî... Berbûye...**
**Xencera şergehan**
**Şevên reş, ji asinê**
**Kûrheka bêagir sor bûye...**
**Jarekê wek min jî**
**Di gundekî winda de**
**Bê kar û bê avrû**
**Maye û xweser bûye...**

**3)**
**Adeya giyayê şîn û rind**
**Ser avê sema kir!!**
**Xwe hejand**
**Her davê awazên**
**Şengiya xo cema kir!!**
**Aviryeka tîja wek tîşkên hetavê**
**Pêporên hestên min**
**Berzandin, lê dûv de rengên wê**
**Deng dave û di gavê de**
**Her derzek bi maçekê**
**Lêk dave û sema kir!!**
**Lê çi bikem**
**Kaniya buhar pê gehiştî**
**Behişt e û nalîna rûbarî**
**Mizgînya şeva reş virê kir!!**
**Şeva reş,**
**Aşekê pir jivan e û jivanan**
**Roja geş pir girê kir!!**

Girêyan warê xo danaye û
Ne sincan hêlînek ava kir!!
Ne rastiyê bingehê xo çê kir!!

4)
Nav bazarê dildariya reş,
Ber nepeniya şeveka geş,
Qehpeka xin
Xwe di nav koşa sinêlekî
Îna û bir…
Her ew şev bû
Hozanvanek… Çûye koçka sultanekî
Peyv û şerab pêk ve mêtin û
Çaxê spêdê
Nîve rêkê… Gehiştîne yek
Hozanvanî lêv gest û got:
Şeva xoş bû
Qehpê çav niqand û got:
Binoşa şairê xwefiroş bû!!

5)
Demê nuhîn
Neşyayin bine sûk û sera
Bazarên me
Bûne nuhîn,
Hetav kutin ber xenceran…!?
Kadî û mêş û çav şûr kirin
Kêşaneve ber terazya
Xêr û şeran… !?
Bikirên reş
Tîvlên gwîzan, yadgarên zer
Bazar kirin…
Her telara "Koçka Mezin"

Mêr û mêrser... Dûv yek rêz bûn
Destê paşay maçî kirin...
Xemla şarî
Rengên vebûy veşartineve
Dengên derbûy vexwarneve û
Ewa gêray,
Dûv xwe hêlay
Sawîlkeyî û kwîrha şêxa û
Mişk û teter... !?
Em hejarên çû bo nemay
Çaverêy ne, sor e dera jaryê avday
Payîza bêt pê ve bihên
Yaxîbûn û hêz û eger...
yaxîbûnê bikîne hêvên
Bo xebata pir hişyarî û maf misoger...

6)
Ev fîstanê reng gulgulî
Yê "helat"-ê li cejnê kirî
Xwînê werbûy, serê darên
Gelyê Hespan hêlayeve... !?
Ne alayê goristana derwêşan e
Ne lewendiyê serê çimkê dîlanan e
Dilê min e bi rista xeman helawîstî ye
Serederka
Rêka azad wek zengilê
Dihijyêteve ... !?
Awazêt nû di vehîniteve...
Belku îro
Hemû zêmar nav xeleka
Daseheyva Kurdistanê
Rûnêneve... !?

**7)**
**Qîzên delal xo xemlandin,**
**Zaroyên xin karê xwe kir… !?**
**Sal nû bûve**
**Xurtan du car agir helkir… !?**
**Agirê pîroz… Bo Newrozê**
**Agirê jînê**
**Ya li jêrdest e Diyarbekir… !?**
**Diyarbekir…**
**Eyhot, eyhot**
**Evro Kurd yê kêka cêjnê bi xwînê dixut…**
**Lew mezlûmê kewê qubad**
**Nav zincîran hesta û qîrand**
**Berşemalkê, dest dane yek**
**Sûnda mezin bo vînê got!!**
**Hemû jivan… Kirne peyv û**
**hemû peyv jî kirne bizot!!**
**Diyarbekir…**
**Eyhot, eyhot**
**Soregula jiyanê çandî**
**Şabaş, şabaş**
**Bo qurbanî û xo bo te sot!!**

**8)**
**Çaxê…**
**Mitewekilî… Dara Zerdeştî birî**
**Hemû daran kire girî… !?**
**Çaxê…**
**Medhet Paşay şûrha Bexdayê xirab kirî**
**Hemû şûnwar… Behîdar bûn**
**Xuha palan lê azirî… !?**
**Çaxê…**
**Naziyên bed… Mûsa kuştin**

**Hemû peyvan,**
**Rondik rêtin bo şairî... !?**
**Ûher ji roja**
**Dagîrkeran Kurdistan jî dabeş kirî...**
**"Vîna mezin"**
**Bumbaxeka reşa xwînday**
**Stûyê xo... Ya girêday**
**Gazî dikete dad agirî... !?**

**9)**
**Erd û panî**
**Bûne kitên aşê vewjêr...**
**Têk de hêran**
**Gule reşên**
**Nûbihara paşayê nêr...**

**10)**
**Min saz divê**
**Lê tiblên xwe**
**Ser wan têlan nahijînim**
**Yên bilbilên ser lêvên te**
**Girê biden... ?**
*** * ***
**Min derya divên**
**Lê çû caran**
**Melevaniya tê de nakem**
**Eger masiyên evîna te**
**Ser pişta min yariyan neken... ?**
*** * ***
**Min çiya divên**
**Lê jiyê xo nakem xurak**
**Bo evrazyan...**
**Eger pirça te ya zêrîn**

**Nebît bax û taykên daran**
**Nevehijyên**
**Ber sîpelên bayê maçan… ?**
**Nav zimanên agirê deman**
**Ava nebin…**
**Xwendegehên gundê jaran…**
*** * ***
**Min gul divên**
**Lê henasa hinavên sotî**
**Di gel bêhna wan têkel nakem**
**Eger rengê hemû gulan**
**Mîna suhna girnijîna rûmetê te**
**Ne geş bîtin… ?**
*** * ***
**Min roj divêt**
**Lê çavên xo**
**Nakem dûrbîn, bo serbestiyê**
**Eger şewqa**
**Bînahya te, nebît tîrek**
**Bo asoyan… ?**
**Di avisbûna hemû werzên**
**Çavên te de**
**Bo biharê nebît nîşan…**
**Stêrên di dêmê te de**
**Ser tîşkên wan,**
**Ava nebin hêlînên xin…**
**Pirr hevpişkî…**
**Pirr ramûsan…**

# JAN

**1)**
**Ma da çi bît…**
**Eger mizê bilîteka wê tirêna**
**Nîva şarê min û yarê, gulek baye… !?**
**Ma da çi bît…**
**Eger hatba û giftûgoya**
**Salta yekê, maçek baye… !?**
**Ma da çi bît…**
**Ger tifengan,**
**Dav û kilîl pê ve heban,**
**Çaxê "hêrîş birinê" biban od û keman**
**Sengera kaxa dîlanê ba û**
**Herdu cînan,**
**Stranek bo evînê, lorandibaye… !?**
*** * ***
**Ne… Ne… We nebêje**
**Ev gotina te xoş xeber e**
**Belê evro dûr bawer e**
**Demê me viyay,**
**Lavjeka çiyay,**
**Bikeyne dîjyarî**
**Bo milletekê xo azad kirî**
**Di jînê de westiyay…**
**Lûlya tifenga xo berev sîngê,**
**Faşîstan wergêray… !?**
**Sed mixabin me kes jê nedît baş**
**Em hemû bê deng**
**Bê kenî û aheng**
**Kevtîne hizran**
**Çû hale milletek,**
**Bê hest hosa may,**

**2)**
**Çaxê… Dostoyevskî wênê**
**Tarye Jura Raskolînkov**
**Bi rondikên rijyay**
**Bi hizrên bijyay**
**Bi berka diryay**
**Bi toza vemay, nexşandiyeve**
**Dilop, dilop**
**Tev kovanên belengazên**
**Vê dinyayê vegirtneve… !?**
**Li Kurdistanê**
**Çen Barabas, jarên nenas**
**Gorvekolên bi mahul û das**
**Li binên çalên winda bûnê…**
**Yêd nalîneve… !?**
**Kanê pira derbasbûnê?**
**Ka pêstirka pêhel çûnê?**
**Omêdeka bi tenê maye…**
**"Evîn" bibîte werîsekê**
**Rizgarbûnê…**
**Yek dûv yekê bi helkêşîteve… !**

**3)**
**Demê"Kake"**
**Di nav ferhenga emekdarya**
**Jîna min de dibîte kulav**
**Hemû dîmen pêş çavên min**
**Dibine pêlav**
**Her pêlavî…**
**Civateka çewsêner ya tê de coşe**
**Heste hejar**
**Têkoşîn rêkeka xoş e**
**Pêlavên xwe bike pê xo û**
**Qeytanên wan tund bikêşe**

**Bila civat şîrê çilka**
**Ji difna te pavêt...**
**Çunkî dibît bihara bêt**
**Kanya omêdên me bizêt...**

**4)**
**Demê şefqa**
**Ber pencerên hizrên min re**
**Dibine kepir...**
**Hemû şûnpên çewsaweyan**
**Di mêşka min de dibine kevir...**
**Û her kevrekî**
**Serbazekê leşkerê reş,**
**Yê pê ve may...**
**Demê spêde**
**Hêşta tavê xemil neday**
**Tev têne xar**
**Weku kulî**
**Şînkatiyê diramalin û**
**Xo tavêne kenya nezay...**

**5)**
**Demê pistal**
**Di nav deryaya çavên min de**
**Dibine belem...**
**Masîzerkên omêdên min**
**Lê dibîte xem...**
**Lew pir ji hêz**
**Xwe datêlne gerên bêbin...**
**Da nîşan ken**
**Asoya geş, ber rêvîngên**
**Berze bûyî**
**Nav aryana birîna min...**

**6)**
**Kanya zera, jarekê Kurd**
**Evîniya xo tê peqandî...**
**Bo awêne...**
**Min tê re dît**
**Kevaleka “qamçiyên reş”**
**Sîng û piştên**
**Zîndaniyekî lê nexşandî...**
**Ev kevala şirîn û xin**
**Mîna ciwanyê**
**Esmanekê bênax û bin... !!?**
**Min tê de xwend... Waneka rind**
**-Li rojên tarî**
**Baxên hizran xemlan naden... !!**
**-Çavên em divên**
**Me nas naken... !!**
**- kotirên aştiyê bo cîhanê**
**Silavên me Kurdan naben... !!**

**7)**
**Dilopeka kanya Sincê gote evrî.**
**Eger ez jî mîna te bam,**
**Şil û mil û hestî sivik û**
**Sema zan bam,**
**Da hewlan dem**
**Ser rûmetê pêşmergekî**
**Helçûbame... !!**
**Di nav çavan de**
**Rûniştbame...**
**Bibam rondik “demê dirijyam”**
**Bo welatî hozan bame... !?**
**Hozan bame...**
**Hozaneka peyv nazik û awaz di nav...**
**Awazeka, mîna kotra dinalîteve**
**Bo hêlîna zilik belav...**

8)
Ho zavayo
Zavayînî di terazyê de û
Jêk nenasîn... Gunah û xêr... !!
Ger ho bimînî
Bo şepalê... Tu nebûy şêr... !!
Sed mixabin... Bêjne te mêr...
Kes bi ciwanyê nebûye têr,
Ji bil î Xudê û
Zavayekê hosa gulêr...

9)
Hilo lawo, dem direng e...
Ev rûniştine
Nîşaneka derav teng e...
Herdu çavên Narîna te
Jivangeha
Omêdeka bi nav û deng e...

## ŞEHÎD

Pêngav dimirin
Rêkên dirêj xuya di bin... !?
Mûmik disojin
Taratyên reş winda di bin... !?
Peyv xwe dikujin
Axiftinên tal û şirîn
Cuda di bin... !?
Çen Pêşmerge
Li Kurdistanê şehîd di bin... !?
Hind bişkujên xunav girtî
Nav çîmenên
Jîneka nû peyda di bin... !?

## NEJAD

**Min nevêtin…
Nejadê min agir bîtin
Car xwe bikujim, car xwe bisojim
Min nevêtin…
Nejadê min befir bîtin
Ber hetavê bihelyên û bêne behran
Xwe biveşêrim
Min nevêtin…
Nejadê min bayek bîtin
Car xwe dîn kem, ber esmanan bikeme girî
Car buf keme pêlên xwîna wîjdan mirî
Min nevêtin…
Nejadê min darek bîtin
Bo zordaran gopale bim
Car bêm hosîn
Bo xatunên soreşevan,
Dêr gulek bim
Min divêtin…
Û her wekî wesa bûye
Nejadê min
Axek bîtin û lê rawistim ser bilind…**

## GEHÎN

**Çen jimara pêngavên min
Pitir lê tê…
Emrê rêkê kurttir dibe… !?
Heta çen rê xilas dibin,
Malavaya,
Dîmahîka emrê min jî,
Nêzîk dibe… !?
Heta çen kesanên weku min jî
Bo armanca asoyekê, dibine gorî…
Qonaxeka pir xebata,
Milletê me tête birî…**

## LI WELATÊ MIN

Li welatê min
Her gundekê, bîstanên xwe
Bi ava kanyên tezî avday
Revda bêryên
Sohin piling tê de heye… !?
Li welatê min
Her bêriya
Bo yarê xwe çaverê may
Evînya wan
Emekdarya desthelînê tê de heye… !?
Li welatê min
Her zozanan
Şev biharan, av lê mehay
Qeqebûya kewên qubad tê de heye… !?
Li welatê min
Her bêdera
Xudanê wê nedaye bay,
Tund e jana jîneka nû tê de heye… !?
Li welatê min
Her tenûra gurrî coş û
Nanê spêdê pê ve nemay,
Têna pêlên
Şaxûnberên pêşmergekî tê de heye… !?
Li welatê min
Her mişextê
Xanyê sotî dûf xwe hêlay,
Zivrîneka pir xebata
Aştîperêst di dil de heye… !?
Li welatê min
Her karkerê
Temet çavên dezgira xwe
Berhemê xwe pir dil viyay
Bizava wî
Demjimêra zîndebûna
Şehîdên me tê de heye… !?
Li welatê min
Her birîna gulley simtî û
Hêşta gerim û xwîn lê nezay,
Cê şîn bûna
Omêdên rind tê de heye… !?

# PÊŞMERGE

Mîna hêza
Spartakûsî yaxî kirî
Ez têniyê xunava gerdena te me...
Hindî pakaneya
Mesîh li sîngê xaça peya kirî
Dêwaneyê ciwanya te me...

* * *

Gerokya min
Xiruskek e
Hewar xurt û tarî bire...
Pêngavên min kirine bang û
Mizgînyeka mezin pê ye...
Dûratya min
Zarokekê ne rehet e
Gulên baxê xizmetya min
Tev jê kirin
Xanîçokên pir pakane pê çêkirin û
Girnijîn
Jîneka nû ser lêvê ye...
Birsatya min
Kevokeka reng şirîn e
Davên taryê, biskên heyvê
Dikete zilik û
Bo danana hêlînekê çaverê ye...
Tifenga min
Bo hinêrya rêveçûnê û veşartinê
Azmûna min
Nîzîk kirye ji xwendinê û
Her delîva ferset geşte desthelînê
Destrêjya min
Mezintir e ji peyv û xalên nivîsînê...

**Xemla biharê kanî ne**
**Lê xwîna min, demê dirijyêt**
**Ji sifreka axayekê**
**Ji hemyan meztir grantir e**
**Xweşya havînê sêber û şevçerîn e**
**Lê geryana bi ser bilindî**
**Li serên çiyayên tijî befir**
**Nav nihalên  bi kend û kevir**
**Ji nihanî û feraşînên**
**Bê serbestî tam xweştir e...**
**Rewşa pahîza çinîne**
**Lê miştaxa kovanên min**
**Ji şeraba hemû began şirîntir e**
**Fêqyê zistanê agir e**
**Lê sîmayê welatê min**
**Ji dîwanên hemû şêxan gerimtir e...**

# Necîb Balayî

Di sala 1962'an de, li gundê Ûre, devera Berwarî Bala, ser bi qeza Amêdiyê, hatiye dinê. Li Kanî Masê, gundê Mayê û Duhokê xwendiye û danîşgeha Bexda bi dawî aniye. Her ji sala 1976'an û vir de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Berhemên xwe di piraniya rojname û kovarên Kurdî de belav kiriye. Di gelek mîhrecanên edebî de beşdarî kiriye. Her wesa helbestên wî yên hatîne wergerandin bo zimanê Erebî û belav bûyne. Dê çend helbestên wî, ji pîtên Erebî wergerînîn yên Latînî. Niha jî li Elmanya ye.

## DERDEKÊ BI VEGIR

**Çima dilo..**
**Hespê Memê**
**Serdana hafirê xemê**
**Ne dikenît... Ne dişihît**
**Lixavê bê hefsar e**
**Zînê zêrîn yê bê siwar e**
**Dil sotiye tev birîn e**
**Çima dilo..**
**Ew kiêla gerden zelal**
**Ho ya delal**
**Ji bêxodanî.. Ji bêçerwanî**
**Evro berdaye revê û ..**
**Xelkê kezî lê birîne!!**
**Çima dilo lê birîne!!**

*Duhok, 1979*

## RENG Û RONAHÎ

**Duhî**
**Xwîna zarokêt gundê me**
**Kolan xemlandin û pêvema**
**Mejyê wan li dûr û rexa**
**Bo şemalk û şema**
**Agirê azadiyê**
**Çirîskeka nîşana geş**
**Xo têwer kir, maçî kirê**
**Da bikete kenî**
**Bikete stran**
**Hemî derd û xema**
**Wekî gilopêt..**
**Stûn û cada**
**Her mane hil gav û dema**
**-Iha ew e ji hîngê were**
**Tariya ji gundê me kûvî bûy**
**Barkir û nema**
**Tarî nema.. Tarî nema**

*Duhok, 1981*

# GUNDIYÊT MIN
# HOSA GOVENDA DIGÊRIN

Gotin sube:
Li nîva gundê me govend e
Gotin sube:
Li gundê me dîlan e.. Zemawend e
Gotin sube:
Serkêş û serçemkê vê govendê
"Mirovekê"hinêr bende
Herdem li hewa digirnijît
Bi darê azadiyê ve dihejît
Yê bilind e û..
Beref bilindiyê revend e
Min ne dizanî gundîn-o
Min ne dizanî
Ew govend xem û tazî ye
Ew hinêr bend jî "Qazî ye"..
* * *
Gotin sube:
Li gundê me
Hezar kulav, dê çine serekî
Hezar pêlav dê çine derekî
Hezar lûlî dê çin devekî
Gotin sube:
Li gundê me talane û..
Berek na mînît li ser berekî
Min ne dizanî gundîn-o..
Min ne dizanî
Wê şev reşê
Zavayê ji bûkê dizî
Min ne dizanî Mihabadê
Min ne dizanî
Ew werîsê girê.. Girê

**Yê li gerdenê alizî**
**Min ne dizanî**
**Hey "Savakî"**
**Min ne dizanî**
**Leşê nazik**
**Yê ji egera**
**Zincîr û qamçiya rizî**
**Dîwarê cergê te**
**Yê ji xema derzî**
**Yê ji xema derzî**

*Bexda, 1985*

---

* Mebest Qazî Mehemed e.

* Savakî: Mebest Komara Mihabadê ye.

## XEW

**Berê xo bidenê**
**Ew çawa dixewin**
**Guh bidenê wan çi ye?**
**Bûçî direwin?!**
**Keko hilo.. Hilo..**
**Binêre**
**Ka karwanê xewê ye**
**Hatiye gundî?**
**Yan jî hef hefeka zêde ye û**
**Zêrevanê bidirewin**
**Zêrevanê bidirewin**

*Duhok, 1986*

# HAVÎBÛN

**(1)**
**Şeveka reş û ristina stêra**
**Kiçeka xudan serbûr**
**Ya hembêzkirî**
**Hezar Efrît xo dihelavêjin**
**Li dûrmandûr**
**Karesatêt gelek mezin**
**Hêrişêt fihêtiyê**
**Xo têwer diken, li jêr û jor**
**Ezê dibînim**
**Bi çavêt xo, gazî min diket**
**Gelek nêzîk, gelek ji dûr**
**Dengê wê şkestineka dî**
**Li bejna xwe ya zirav xuya diket**
**Keftineka dî ji bilindiyê**
**weke pirça wê ya şor**
**Ser û sîmayêt wê**
**Ligel me dipeyvin**
**Bi giryeka ji çavêt reş û**
**Kenyeka ji lêvêt sor**
**Kenyeka ji birîna sor**

**(2)**
**Sîngê wê**
**Sîngê wê yê bûye**
**Axura hespêt Tetera**
**Bejna wê ya nazik**
**Ya bûye qada şûr û şera**
**Wê he cihê şîrê Holakoye**
**Ev e şûn pêt hespê reş in**
**Wa he kevne birîna tepeserî û**
**Xazxazokya li ber dera**

**Wa henê jî**
**Cihê ramosana aşiqê wê ye**
**Derdê wê ye**
**Derdê wê jî mocîze ye**
**Mezintir ji mocîzeya Pêxemberan**

**(3)**
**Mocîzeye ev kiça he**
**Mocîzeye ev derdê he**
**Mocîzeye ev perya he**
**Qelenê wê gelek ji me dixazît**
**Xwîkeka giran e li ser me**
**Ewe nîşana**
**Birsî û xas û rîs û rîta**
**Ezê dibînim**
**Leşekê rîs e**
**Li nav destêt Efrîta**
**Em dihavêyne ber wan**
**Ew dihavêne ber me**
**Çitov karekê bi şerm e**
**Ev kiça he**
**Xudan bira ye**
**Xudan ûcax e**
**Belê bûçî?**
**Û çira!!**
**Çinku li koçka... Bira**
**Bazarê fihêt kirina wê**
**Gelek.. Gelek**
**Gelekî germ e**
**Çitov karekî bi şerm e**
**Çitov xwîkeka giran e**
**Keftiye ser me**

**(4)**
**Ezê ditirs im**
**Ji vê kiça he**
**Li vî çerxê fihêtiyê**
**Li vî çerxê kirêtiyê**
**Bihête kirêt kirin**
**Ezê ditirs im**
**Ji vê kiça he**
**Li vê çerxê fihêtiyê**
**Li vî çerxê kirêtiyê**
**Li malbabê bibîte jin**
**Ezê ditirs im, ji vê tirsê**
**li şeva reş**
**Ji tirsa mirovan**
**Penabirî, xo havêtê**
**Ser bextê hirç û hovan**
**Û bihête ji bîrkirin**
**Paşî ji evro wêve**
**Çi cihê min lê dibînît**
**Melaîketêt ciwanya wê**
**Tif kene min**
**Tif kene min**

*Duhok, 1988*

## HOSA VIYAN

**Berxa minê**
**Jîna bilind**
**Roj yek e û xem hizar in**
**Havîn hat û**
**Têhnê xir zozanî**
**şitlêt baxçê jiyana me**
**Duhî: Di sava bûn**
**Evro: Di pûtîne û kevnar in**
***   *   ***
**Berxa minê**
**Çawa dibitin.. Çawa bûye**
**Pezkê eşqa me sê - Çar birr e**
**"Seyê"nêçîrê ne wek cara**
**Herê xurt û dirr e**
**Gopalê bîst û du girê**
**Min bi qonaxêt eşqa te ve.. Mehand**
**Hêş bihayê guharêt te**
**Xwîn ji birîna min ne zaye**
**Xuha enyê ne werya ye**
**Rista xazgîniya**
**Hêşta kesê**
**Ne hejande û.. Ne hejya ye**
***   *   ***

**Viyana min**
**Berxa min**
**Di nama yekê da**
**Peyvêt te av, dilê min agir**
**Peyvêt te sofî bûn**
**Reng ronahî**
**Min tarî di perast**
**Hîngê ez di mame kafir**
**Di nama duyê da**
**Peyvêt te bûn**
**Karwanî... Hespêt bar giran**
**Ez jê ra dibûme**
**Ka û dan û hafir**
**Car jî dibûne "Elho"**
**Ez her dimame aştîxwaz**
**Belengaz û kutir**
**Piştî roja min û te di xwînê werbûy**
**Di xwînê werkirî**
**Hîngê rastî ket û mir**
**Yara min, li vêre rastî mir!!**

## ŞOREŞ Û ŞEHÎD

**Şer e... Şer e
Şoreş e û lûlî di kel in
Ax û av têk da bûn agir
Çe berhemî, êtwîn û pel in
Rojhelat ya dêm sor e
Min zanî ku
Pêlêt deryayê çavêt wê
Hemî xwîn e
"Şehîd" tê da rêz bi rêz û mexel in
Li asmanê me êvarî
Qaz û qulinga govend best bû
Spêdê nêrayê
Hemî "Vantom" û qunbel in
Hemî "Vantom" û qunbel in**

*** * ***

**Şer e... şer e
Şoreş e û lûlî di kel in
Li her çar tuxûbêt welatî
Awazêt "şeşxana" deng da
Peyvêt wan bizot û meşxel in
Kevya befrê dêm nazik e
Xwîn û befir ho di têkel in
Ho di têkel in
Xwîna germ e û befra sar
Ji birînêt "şehîda" xwîn za
Ji asmana barî befir
Senger hemî
Ne heriftin bûne kevir
Navê şehîdî li ser çeperan
Li ser sengeran
Hat nivîsîn qet ji bîr nekir
Ne şehîd ne,tu na mirî
Tu şoreş î û tu agir î
Tu stêr î û..
Ji hemî stêran geştir î
Tu çiya yî û..
Ji hemî çiya bilindtir î
Tu na mirî.. Tu na mirî.. Tu na mirî**

# MÎR IM HELIZ BEYÎ

**Hayê Mîro hayê**
**Dergeh asine û..**
**Dengê kilîlê nayê**
**Havîna me sirrê bir**
**Zivistana me ji germê mir**
**Payiza dêm kesk e.. Û**
**Hêş zeratî bi lêva da nehate**
**Buhara may rîs û ewar**
**Hewar.. Hewar**
**Mîro hewar**
**Şaloka min êxsîr neke**
**Heliz beyî**
**Neke ji birsê bimirin**
**Berx û kar**
**Neke ji birsê bimirin**
**Zaro, hezar.. Hezar**

*** * ***

**Hey Mîr im sultanî xweş bît**
**Ji xemêt min têr bû zîndan**
**Hey Mîr im**
**Min hîviye û hîvî dikim**
**Xelkê min nehêle bêxudan**
**Min kes nîne**
**Bişkujît baxçê min**
**Solînêt hêlîna min**
**Zarokêt landika min**
**Niho ditêhnîn e**
**Bi xuha enya min têne avdan**
**Hey mîro**
**Yeman.. Yeman**

**Li halê min bipirse**
**Guneha min çi ye!**
**Talanê bi min ketî û**
**Min nebirine çi talan**
**Ne ji cerdê têm**
**Ne ji kuştina xelkê têm**
**Rêncberik im.. Tepeserk im**
**Şaloka min ji xema devlo neke**
**Bo azrokêt min car dibîte nan**
**Car dibîte tembûr**
**Jê dihên jenîn**
**Hezar awaz û sitran**
**Hey Mîr im, min hîviye**
**Hîviya min bi cê bîne**
**Bawer bike, çi demê rêncber**
**Dinîv derzêt betalyê da**
**Bêdadyê da**
**Hatin ji bîrkirin**
**Çi demê hîviyêt wan di cergî da mirin**
**Hîngê dê bînî**
**Cot pêlav**
**Dê li ser sîngê te rûnin sultan**
**Dê li ser sîngê te rûnin sultan**

*** * ***

**Sultanî xweş bît**
**Ev erde**
**Ev goya zemîn û stêrên mezin**
**Şev û rojan**
**Dem û dewran**
**Yê li dûf rojê dibez in**

**Da nemînin çi qulaçên tarî**
**Da rêncberên cergrohin tê da nenalin**
**Da tîrojk bibine gêsik û**
**Nava şkefta, ji tariyê bimalin**
**Da tîrêt tariyê**
**Cerg û çavçira negezin**
**Hey Mîr im lezke**
**Qefta şaloyê û zaro bilez in**
**Ha hinde jivan beyî**
**Jiyan beyî**
**Zivistan beyî û beyî heliz**
**Sultanî xweş bît**
**Li wî demê sakoyê hejara nû bûy**
**Li wî demê kulkê hejara bûy bêla**
**Lê peydabûn**
**Hezar talanker û diz**
**Hoye Mîr im.. Li rojhelat**
**Li vê axê**
**Binêre dîsa**
**Li ser sifra serxwebûnê**
**Ji birsê mir " Bûbî Sandiz"**
**Ji birsê mir "Bûbî Sandiz"**

* Şoreşvanekî Êrlendî ye, di zîndanê da, çû gerewa birsîbûnê û bo 66 roja xwarin nexwar.

# Jaro Duhokî

Di sala 1959'an de, li bajêrê Duhokê ji dayik bûye. Her li Duhokê xwendiye û di sala 1985'an de, zanîngeha Mûsil bi dawî aniye. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî da belav kirine. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Sala 1985'an, ji ber terora faşîstên Bexda reviye û gehaye şoreşa Kurdî. Heta niha jî pêşmerge ye. Du dîwanên helbestan çap kirîne:

1. Sirgûm. 1986.
2. Ragirtin. 1987.

Dê çend helbestên wî, ji tîpên Erebî wergerînîn yên Latînî. Niha jî li Kurdistanê ye.

# SITRANA EHMED Û XEMÊ

**Ehmed:**
**Dayê Xemê**
**Ez ev e me.**
**Çaverêy hatina te me.**
**Birînên min kevn in kûr in**
**Min hêz ne ma,**
**Xwînê bidemê.**
**Hawar dayê tu kanê?**
**Were Kanê?(1)**
**Berî bimirim..**
**Ser û çava bo min bîne**
**Da sê cara tewaf kemê.**
**Min bi sîngê xo ve bişidîne**
**Da bidîmahîk bêhin kemê.**
**Xemê..**
**Ji xema xemên me xema nexo**
**Xem her xema dixun Xemê.**
**Giryê neke.**
**Babê min pîrekî kal e**
**Dil nazik e**
**Qonaxa lê dijît kurt neke.**
**Xemê. Ji derdê çûna me**
**Li ber kulkê me**
**Derê taziya veneke**
**Xwîşka min hêj sinêle ye**
**Rengê geş pêsîde neke.**
**Serî li ser milî xûl neke.**
**Xemê. Jiyê me bûrandî**
**Evro bike yadgar bi xo û**
**Bi cilkêt reş zêmarê neke.**
**Birakê min yê xwîn germ e**
**Tu şaş neke.**
**Şoreş e divêt xo ragirît**
**Raste Xemê her dê mirît**
**Çi evroke yan rojek dî**
**Çi ev sal e yan salek dî**
**Çi bi sêdarê yan bi kuştinê**
**Çi bi lêdanê yan bi girtinê**

**Serî bilindke û mêzeke**
**Dayê Xemê**
**Her kevrekê.**
**Her dareka li vî welatî**
**Gence di bin ve veşartî**
**Lewra Xemê**
**Min hîvî ye giryê nekey!**
**Dergehê me, patekê reş**
**Pê ve nekey!**
**Min azakey. Min azakey.**
*** * ***
**Hayê.**
**Ehmedo day gorî day-o, hayê.**
**Û li kure deyka te hayê..**
**Kanê dûr e..**
**Birîna te kevn e,kûr e û**
**Dengê nalîna te nayê..**
**Bab û bira**
**Evro mişext in li dinyayê..**
**Kes di hewara kure deyka te nayê..**
**Hayê..**
**Şêrê êl û malên dayê..**
**Barê xemên xema deyka te giran e**
**Lewra dayo mam şaş û har..**
**Şax û zinar**
**Çol û beyar**
**Daristan û dirinde û mar**
**Esman û baran û befir**
**Heliz û darberî û kevir**
**Ji ber çûna te Ehmedo,**
**Diken girî..**
**Diken zêmar..**
**Dayo tu aza tu aza..**
**Wekî hemî aştîxaza..**
**Aştîxaza.**

1. Kanê, gundeke nêzîk bajêrê Amêdiyê ye. Heval Ehmed lê şehîd bû.

# EZ Û JIYAR

**Babo jiyar.**
**Dayka te, kiçol û hejar**
**Mane bi rê ve.**
**Bawer nakem em bibînîn**
**Ji evro pê ve.**
**Ez nizanim!**
**Caşa girtin.**
**Gurga xwarin.**
**Avê birin,**
**Yan goristana hingaftin.**
**Bes bike girî.**
**Bes bêje min:**
**Ka dayka min.**
**Ev çend e şîr nedaye min?**
**Ha çi nema em dê gehîne çiyayê şirînê**
**Zom û bayêt feraşînê**
**Derbeder li wêrê di mişe ne**
**Paşî şîr nabîtin xem e**
**Bes bêje min: babo sar e**
**Sireka dijwar û har e**
**Bes bike girî**
**Ew saçima serê min birî**
**Min nakûjit**
**Devî veke**
**Xwîna ji serê min dipeşîtin hêdî fir ke**
**Jê netirse**
**Eve şîrê spî ye sor bûyî**
**Çunkî babo**
**Kawdana sor spî kirin**
**Spî sor kirin.**
**Babo jiyar**
**Hêrişa zilmê hêrişek zor giran e û**
**Miletê me**
**Yê bê kes û bê xudan e.**
**Hawar dikem**
**Mirovnasa kesê hay ji dengê me nîne û**
**Xema me ya kesê nîne.**
**Hawar hawar**

**Kê dîtiye**
**Milletek çend milyon mirov**
**Li çol û çiya bibine hov!**
**Hawar hawar**
**Kê dîtiye**
**Jin û mêr jêk bêne berdan**
**Bê dadgeh û mela û xudan!**
**Hawar hawar**
**Kê dîtiye**
**Zaro bi jehrê xudan bibin!**
**Zerî hêj kiç zikgiran bibin!**
**Hawar hawar**
**Kê dîtiye**
**Pistal biryara biçespînin!**
**Mişk pilingan bixendiqînin!**
**Hawar hawar**
**Kê dîtiye**
**Zava ji birsê, zava ji tirsê**
**Nebît zelam!**
**Û jin ji şermê û rûsatiyê**
**Nebît xanim**
**Nebît medam!**
**Û zehakê çerxê bîstê bibît sedam**
**Binve babo**
**Çinyeka nanî me mabû**
**Ew jî kîfkoyê lê dabû.**
**Binve babo**
**Ha çi nema**
**Em dê gehîne sinûrî.**
**Û ew heftiya li ser me borî**
**Nahête ve.**
**Hosa gelo**
**Jiyar nivist.**
**Binve binve!**
**Bi kizgiryok çû beheştê.**
**Çîroka wî jî eve bû**
**Li heştê û heştê...**

## ŞER E

Şer e. Şer e
Şoreş e û şergeh agir e
Qada şerî
Ji kelexên bêxwîn pir e
Av bûne xwîn
Terim rizîn
Pêk ve peqîn çiya û gelî.
Lîlya tivenga min kelî.
Dilbera min, li şîna cerê,
Ar.Pî.Çî di leyzîtin li ser milî.
Ya sûnd xwarî,
Çava reş neket bi kilî.
Taku kela zulm û zorê bêt rûxandin
Kursiya wan bibite bombe û
Bêt peqandin.
Şer e.şer e..
Şerê man û nemanê ye
Lê jiyan bo gela fere û
Dayka min ji keyfa da
Dersok dirand.
Parzîn qetand.
Şemilk firand.
Têkel kirin kenî û girî û
Xetîra azadîxwaza
Ya rakirî
Rêka me ya reş û tarî
Ya ron kirî
Taku befra, şax û nihala sor kirî
Ji xwîna kedxur û pîsa
Nevyên Zehak û Iblîsan
Nevyên Qe'qai û tuxum perêsa
Şer e... Şer e..

## HELEBÇE

Hatin hatin..
Kom kom hatin..
Çav sotîn e..
Gerî hişk in werimtîn e..
Gore û berpêk pirtikîn e..
Gumlek lêm in
Piştên kêm in
Gotin hewar..
Hewar, hewar..
Kîmya barî
Tîzab barî
Xerdel barî û şehîd bû
Şarê Helebçe..
Ji layekî da
Şenge zerya gundê me ya derbeder e
Kar xastine û diçît biçe
Pismamê wê
Yê li meyxana rûniştiye, pêka lêkdet
Çike , çike
Hevalê wî li bendîxana
Ebo Xirêb
Ser biriye û dest bizîncîr û kelebçe..

## KIRÊSMIS

Evroke ye..
Li çar kinarên cîhanê
Şahî û dîlan û sema ye.
Pêkêt wêskî li ser şeqama,
Zengilêt jiyanê lê diden û
Xem nema ye.
Birakujî li nav nemaye.
Xo firotin, bo karwankuj û dizaye.
Dema fener divemirin.
Xem ji dila da difirin.
Hîvî geş dibin, na mir in.
Gencêt wara
Wekî vara
Maça bi pare na kirin.
Kutirên aştiyê serbest in.
Li ser serê xelkê difir in.
Zerî û tolaz, şaş û mest in.
Li nav lihîzgeha dixur in.
Kirêsmis e.. Kirêsmis e..
Lê birayno
Welatê min birîndar e û bênojdar e!
Kirêsmisa me Nevroze û
Nevroza me jî zêmar e!
Balefir bi bombe û napalim
Li ser gund û şara digerin.
Leş dimînin, ser difir in!
Zaro di parzînê dayka da

**Bi sirrê dimirin!**
**Ji birsê dimirin!!**
**Kutirkêt aştiyê girtîn e..**
**Çav qoqilandî û bê per in.**
**Kirêsmisa**
**Mosko û Berlîn û Sofya**
**Her keniye û kirêsmisa me girî ye!!**
**Esmanê wan,**
**Pirî stêr e û her sahî ye..**
**Esmanê me,**
**Mij û moran û kadî ye!**
**Buhara wan,**
**Ji şenge gula xemlandiye.**
**Buhara me,**
**Her taziye û her malekê şehîdekê,**
**Jê çûyî ye!!**
**Cotyarê wan,**
**Biberheme û pêşkeftiye.**
**Cotyarê me,**
**Tepeser e û dil şikestiye!**
**Ho birayn-o**
**Kirêsmisa welatê min**
**Yê nedîtî û gulê ne bûy,**
**Bi vî rengî ye!!**
**Bi vî rengî ye!!**

# ÇAVERÊ

Demê rondikêt te yarê
Barîn serê vê sharê
Min ne dizanî..
Her rondikek, nalînek bû..
Her nalînek, gazindek bû..
Her gazindek, egerek bû..
Egera jî hîviyek bû..
Ew hîvî jî, paşeroja min û te bû..
Ke roj bêtin
Perya bîkînya xo yarê
Bo min û xo bixemlînî.
Cotê kezya, bi wan desta bivehînî.
Gerdena nazik û nazdar
Bo min bînî.
Lê felekê çerxek lê da û
Gemya me dildara cardî
Di derya da, niqokir û hêla tê da..
Hêla tê da..
Evca yarê
Bi xatra te, ez mişext im.
Mişextekê bê ser û şîn
Ez nizanim
Dê bi çi reng bûrîtin jîn..
Hîvîdar im
Li çaverêya min bimîne..
Rondikêt xwîn, bo çûna min ne barîne..
Dilê min maka xema ye
Mejyê min aşê hizra ye
Cihê xoşiyê tê nîne
Lê ez ez im
Dest çeleng û bi lez im
Min merem şoreş û vîne
Li çaverêya min bimîne..
Li çaverêya min bimîne..

## GELÊ ÇEWSÎ

Li rojhelata navîn.
Li cîhanê, Kurdistan e.
Kêrî û zozan û çiyan e.
Xoristê wê kwîstan e.
Gelek lê di jîtin nezan e.
Hawar birauno hawar e
Çi talan e? Çi xopan e?
Xapandin û kuştina,
Bi dirîşm û direwan e!
Hindek birs î!
Hindek rîs in!
Hindek dewlemend û pîs in.
Kedxor û pare perês in!
Hindek kirêgirtî û hîz in!
Jin firoş û bê namûs in.
Pistalêt sîxur û zala di al îsin.
Rihêt Decala xena diken
Jaran bi Ayin fene diken.
Hindek caş in!
Hindek serve serve baş in!
Bi navê xebatê şaş in!
Hindek ji wan,
Pêşmerge û şoreşvan in.
Komonîst in. Dozevan in.
Pale û cotyar û hejar in.
Sexmeratî serxobûnê,

**Cane merg in.**
**Hindek dî mişext in hosa**
**Li parîs û Enebûlsa**
**Wêskî dirêjin!**
**Lêvêt pirçzera dimêjin!**
**Welatê min mîtîngehe**
**Jêr destê zulm û zorê ye**
**Welatê min**
**Sîngêt rîs in, li hêzgeh in!**
**Cihê dîlan û keyfê ye**
**Hawar birayn-o hawar e**
**Gelek bê hişe nizanît**
**Çi bixazît. Çi bihêlît!**
**Yê bê hest û ne fama ye**
**Li dozê bigerît.**
**Mafî bi xazît.**
**Dîroka xo baş vekolît**
**Ka çend Kawe, tê da rabûn!**
**Ka çend Xanî, li dûf rabûn!**
**Ka çend Simko..!**
**Ka çend Qazî...!**
**Sexmerat dozê bin berbûn..**
**Sexmerat dozê bin berbûn..**

*1983*

## KIRÊGIRTÎ

**Caşo..Caşo.**
**Çav şûro serxoşo şaşo.**
**Ew çi bere di sîngê te da?**
**Ew çi kaye di mejyê te da?**
**Ew çi jehre di gehêt te da?**
**We diyar e, landika te**
**Di bingeh da ya genî bû.**
**Ya rizî bû.**
**Şîrê te xwîna kera bû.**
**Dadoka te, dêhleba bû.**
**Ji ber hindê**
**Sîngê xwîşka te li bajêra**
**Aşkera bû.**
**Bazar li ser kêm biha bû.**
**Moçê te keda pala bû.**
**Hîviya te,**
**Nehêlana pêşmerga bû.**
**Caşo.Caşo.**
**Çavşûro serxoşo şaşo.**

*1984*

## MAN

Hey man û man
Gelî bindestên welatî
We û vê manê
Çerx bûrandin.
Meh û salên,
Şîn û şadiyê şeqandin.
Em dibêjîn, giryê neken.
Xuha enyê erzan neden!
Genmê hejaran nehêlin,
Terşê neyara lê biçerin.
Hûn dibêjin:
(Destê bin bere)ji mêje!
Sitem karî li me xudane
Ji ber hindê me jî mane
Em dibêjîn:
Xo fêr biken nivîsînê
Da ron biken tarî jînê
Hûn dibêjin:
Xandin û roşenbîrî, şanî me nîne!
Lewra mana me ne jîn e.
Em dibêjîn:
Birs û zorê qebûl neken
Rêka dijminî ron neken.
Hûn dibêjin:
Nan xarine. Têr kirine.
Çizî axa her ketine.
Hey man û man..
Gelî bindestên welatî
Ger we man bît
Me jî mane
Lê mana mêra çiyan e
Tifeng û rext bo biran e
Gorî kirina wan sexmerat,
Doza jar û karkeran e..
Doza jar û karkeran e..

*1985*

## GENGEŞEKA BÊÇAVDÊRÎ

**Elo......?**
**Elo......?**
**Aya heval,niho li def we**
**Derya şîne..?**
**Yan lihî mişte û pir xwîn e..?**
**Çiya bi xeml in..?**
**Yan sotîn e.**
**Gundê me hêşta evîn e.**
**Yan jî giyandara ware û**
**Mişk û mara tê da jîne..?**
**Zaro têr û bi cil û berg in..?**
**Yan birsî ne.**
**Xelkê warê pêşkeftî ne..?**
**Yan wek cara**
**Paşverone, maf xarîne..?**
**Belê heval..**
**Hogirê biçîkatîtê**
**Niho lidef me**
**Spêde û êvar**
**Şax û zinar**
**Sema û zêmar**
**Her wek xone.**
**Ne guhrîne.**
**Lê hevalo, buhara me**
**Tazî û şîn e..**
**Aqar reşin, şer e..şer e..**

**Dol pir kelexêt genî ne.**
**Gundê me jî**
**Kavle gunde, kes lê nîne..**
**Jar û zerî, îro mişext in, birsîn e..**
**Erê heval…**
**Welatê me nav welat e û**
**Jiyar tê da, bin destî ye..**
**Xofiroşî karek nû ye..**
**Ejdehaye wek Tenînê,**
**Jê rabiye..**
**Dibêjnê Sedam..**
**Bo xwîna jara têhniye..**
**Belê heval..**
**Niho li def me, pêşkeftine!!**
**Maddek nû derketiye.**
**Ji pîlanî mukimtir e**
**Ji dilovanyê bi hêztir e**
**Ji evînê mezintir e**
**Ji yasa jî bilindtir e**
**Dibêjnê Alton..!!**
**Dibêjnê pare..!!**
**Bi vî maddey**
**Bira li bira nabît xudan..!!**
**Aştî tête kirîn erzan..!!**

*1986*

## SIRGÛM

Me diviya bû
Ya bê jan ba...
Bê nalîn ba...
Li vî çerxî, zik tên dirîn..
Leş tên kirîn..
Dil dibin birîn..
Hîviyêt êtîm û jara
Di bin kevra ve diêne rizîn..
Rastî nema
Mizdamir û Ehrîmena li xo kir sema
Û bi hizir û bîra dixurî
Mîna pezî leş lê gurî
Dil lê sotin
Xwîn jê dotin
Li ser gûma, ho birand jîn
Ho birand jîn
Hosa bira
Li çerxê bîstê
Mirov ji axê mişext e..
Sirgûm kirye
Şaş û mest e
Rastiyê dibînît bi çava
Lê bê dest e..
Evca bira
Ger Faşista û Efleqiya
Kedxur û pîs û geniya
Destê wa li ser serê me bît

**Sirgûm kirine..**
**Zarokêt me, şîr jehir bît**
**Sirgûm kirine..**
**Gerhana me**
**Li welatî bi xîç û xeraş bît**
**Sergom kirine..**
**Evîna me**
**Bi destên şêx û Bega bît**
**Nalîna me, di dil da bît**
**Aştiya me, nihênî bît**
**Çaf pêlya me,**
**Ji şîrê serbirê me bît**
**Sêdara me,**
**Pêş hîvî û armancêt me bît**
**Karwanê me,**
**Dubere bît**
**Dîroka me,**
**Kevin û reş bît**
**Şoreşa me,**
**Rast û çep bît**
**Komonistî qedexe bît**
**Sirgûm kirine..**
**Îro zaroka zêmare**
**Taku şaxa girî kare û**
**Rengê buharê yê reş bît,**
**Sirgûm kirine..**
**Sirgûm kirine..**

*1986*

# S. Diljan

Navê wî yê rast Se'dulla Avdel e. Di sala 1960'î de, li gundekî nêzîkî bajêrê Duhokê ji dayik bûye. Seretayî û navîncî li Duhokê xwendiye, paşî ji ber terora faşîstên Iraqê, neşyaye li ser xwendina xwe berdewam be. Lewra destpêka sala 1980'yî gehaye rêzên şoreşa Kurdî. Di sala 1978'an û vir de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye, di rojname û kovaran de belav kiriye. Di gelek mîhrecanên edebî de beşdarî kiriye. Heta niha dîwanek bi navê (Xwîn û Azadî) bi tîpên Erebî çap kiriye. Sed mixabin hêj xort, di sala 1988'an de, hatiye şehîd kirin.

## AXÎNKÊT COTYAREKÎ

Cotyarê min, bo damayî?
Bo melwîlî?
Bo bêhêz û bo pişt xûlî?
Ji min ra bêje te çi derd e?
Ez çi bêjim?
Bo kê bêjim?
Nojdarekî bo min bîne..
Da bo bêjim!
Jan û axînkêt dilê xo
Bo vehînim.. Bo verêjim.
Bo çi ji hemya
Çemê li ber ava dilê min,
Dê qirqiçît ji têhna da!!
Kitir û firwîz dê bo kete şahî di nav da!?
Min pisyar kir
Ji pîrêt berê
Wan gote min:
Xo lê bigire, dem dirêj e.
Xo lê bigire, dê roj helêt..
Kitir û firwîzî namînît
Dê behîtin..
Gurgeh jî digel kirim û kêza,
Dê rizîtin..
Rast dibêjin
Belê ez jî careka dî,
Dê pisyar kem
Ji dilek sotî,
Ji zarokêt di nav landika da
Yêt nedîtî û ne kenî! Ne girnijînek..
Yê dezbilwînk lê bûyne kêr!
Şîrê deykê nexarî têr!
Belku ew dermanî bêjin
Ne, ne dûr e!
Belku yek ji wan ji ser pêçolkê

**Rabîte ve.. Bibît loqman**
**Dermanê derda bizanît**
**Tîmar biket**
**Êş û janan bingir biket**
**Da gulêt baxê dilê min**
**Bibişkivin.**
**Da cird û cobir û çirçirk,**
**Xir qir bibin**
**Sîsin û beybûn şaka pavên,**
**Kofîka xo bileqînin**
**Govendeka ji dil girêden**
**Mazî û dîndar..**
**Xo bihejînin..**

*** * ***

**Bo çi xelk dê gula,**
**Ji baxê min çinîtin?**
**Rêzik û derîka dê vedet,**
**Kewêt warê me girîtin!?**
**Kezî û biskêt,**
**Şenge yara dê birîtin!?**
**Kete werîsk, bo stûkê van evîndara..**
**Vehînîtin..**
**Ma ne wexte hişyar bibîn!!**
**Dîroka warî bixwînîn!**
**Ka çi bûye!**
**Şîrê şêx Seîdî rakeyn,**
**Bişûyn ji şîlî û jengarê,**
**Seqa bikeyn.**
**Bîra xo û sêdarê bînîn**
**Da ku rabîn, raveka ji dil**
**Bo tepeseryê rakeyn..**
**Dê da rakeyn..**

*1978*

## WARÊ MIN E

**Warê min e,**
**Yê ku hemî berhemêt wî**
**Dihête revandin û dizîn!**
**Yê dar û bar lê dihên sotin!**
**Lê dihên birrîn!**
**Bi devê topa,**
**Dihêne daîran û vecwîn!**
**Li warê min e yê dirinda**
**Deyk û bab û xwîşk û bira..**
**Jêk dûr kirin**
**Li cîhanê belav kirin**
**Sexmeratî evîneka**
**Rast û dirust û bêguneh**
**Ku li warê min nehête dîtin û kirin**
**Serê seda di çirkekê da**
**Dihête birrîn!**
**Lewra welat, min ûmêde**
**Bernedem kuzk û çepera**
**Hindî dilopeka xwînê**
**Birijit ji vê birînê**
**Ez navê te ji bîr nakem**
**Tijî cergê dijminê xo**
**Dijminê te**
**Agir û pêt û gulle kem**
**Çinku welat min nevêtin**
**Pale û cotyar..**
**Xuha enya xo bimalin**
**Di ser hindêra,**
**Bo kerekê nanî binalin!!**

*1979*

## PÊŞMERGE ME

Ho welato
Pêşmerge me, sîng çeper im
Berevanê navê te me
Lewra dibêjim:
Bême kuştin.. Min ne xem e.
Lê ew xema di dilê min da
Bi tinê welat
Bindestiya axa te ye
Çinkî welat heta niho
Bajêr û gund..
Bi hezara hatine sotin
Xopan kirin
Lewra kêrêt jehirkirî
Cerg û hinav
Li min zivêl- zivêl kirin
Pêşmerge me
Birînêt min nakewyên
Agirê keftiye dilî..
Navemirît!
Ta warê xo ava nekem
Qelereşan û darkokan
Ji baxêt welatî dernekem
Tola şehîdan venekem
Serxwebûnê li vî warî peyda nekem
Kul û kovanêt şehîdan

**Ji dilê daykêt wan der nekem**
**Dastanekê bo şehîdêt azadiyê**
**Ne nivîsim û çap nekem**
**Navêt gernas û mêrçaka**
**Hemya tê da diyar nekem**
**Birînêt min na kewyên!**
**Daxa dilî nojdar nabît**
**Hê welat-o!**
**Pêşmerge me**
**Ez çekoçê navçavêt dijminê te me..**
**Rêvîngê azadya te me**
**Şehîd bibim,**
**Di gorê da pêşmerge me…**
**Pêşmerge me..**

*1980*

## MÊVAN

**Çewan yarê**
**Girya hewra ji bo jiyanê..**
**Dibîte jivan!**
**Min bizave ez bo te bibim pêjan**
**Bawer bike Efyona min**
**Hemî dema.. Li hemî ciha**
**Bi te yê mest im!**
**Navê te yê nazdar û geş**
**Melevan e li derya dilî**
**Di gel xwînê li hemî geha..**
**Dibîte mêhvan**
**Lew te " Biha" di dilê min da**
**Bi çi " Terazya " nahêye kêşan!**
**Bi çi " Pêwera" nahêt pîvan!**
**Ez masîm e.. Tu derya î**
**Li mirin û jînê**
**Tu ya min î, ez yê te me**
**Hevjîna min!**
**Berî çavêt min bibişkirin!**
**Te dilê bi xo pêwan kirî**
**Hemî dema bi te dihizirim!**
**Li tengaviya bi te dixurim!**
**Çinkî dizanî, paş mirinê**
**Di dilê te yê evîndar da,**
**Ez ê sax im û namirim..**

*1982*

## RONDIKÊT YARÊ

Nama yara xo min vekir
Paşî dalehî û hîviya
Ewêt mezin wekî çiya
Li perê duyê
Narîna min...
Wêneyê xo
Digel zêmarê kêşa bû
Rondik ji çava bibûne cok
Li ser lêva bibûn swîlav!
Paşî rûbar
Vî dîmenî ez îname
Axiftinê digel wêneyê yarê kêşay
Tezînkekê leşê min girt!
Min gotê: Oy serbara min
Diyariya te bo minê jar
Cok û sûlav û rûbarêt rondikan e!?
Baş dizanim te jîn bo vînê
pirî jane!
Û min xo havêt rûbarî
Bi melevanya min nekarî..
Xo bigehînme serokanyê
Da dalehyêt wî raçandin
Bikeme werîsk
Vêhel biçim beref esmanê hîviyan
Lew min viya:
Gerdena xo bikem diyarî
Bo kinifkê sêdarê
Yê di gerdena gelek gencêt wekî min
Jar û bê buhar da çûye xwarê
Da ku berî hîviya bimirim
Biyanoya
Bi çerx û feleka negirim.

*1983*

## ŞEMALK

**Peyva ji lêva tore bû**
**Min nevêtin bizivrîte ve.**
**Çinku ew peyv**
**Dema şapera vediketin**
**Dikefte firê**
**Li nav cergê şeva tarî**
**Dibîte şemalk**
**Eve ez heyim**
**Çi cara min ne bihîstiye**
**Hindî şeva tarî bêtin..**
**Ronahiya şemalkekê,**
**Çend kiz bîtin**
**Daîrîtin..**

*1984*

# Seîd Dêreşî

Di sala 1955'an de, li gundê Dêreşê, ser bi qeza Amêdiyê, ji diya xwe bûye. Li Akrê û Duhokê xwendiye û di sala 1982'an de, Zanîngeha Bexda bi dawî aniye. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî da belav kirine. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Heta niha çi dîwan çap nekirîne, lê ev pirtûk çap kirine:

1. Qeftek Ji Hozanên Nalbendî, 1981.
2. Dîwana Feqiyê Teyran. Parça yekê, 1989.

   Her wesa ev pirtûkana jî amade kirîne ji bo çapê.

1. Dîwana Feqiyê Teyran. Parça duyê.
2. Çîroka Bajêrê Xwînê. Helbest.
3. Şanogerya Dayik. Birtol Birîxt. Ji Erebî wergeyandiye.
4. Vekolînek Li Ser Nûbuhara Xanî.

   Dê çend helbestên wî, ji tîpên Erebî wergerînîn yên Latînî.

   Niha jî li Elmanya ye.

# EZ Û NIJDEVAN

-Nijdevano.
Êvareka direng.. Direng
Li çiyayekê mij û moran dapûşay
Bê pêjin û deng
Min dît hespê te yê kimêd
Gel bay dibezî.
Wek agirî..
Çirîsk li bin piya dipeşîn
Ser milê wî, radbûn, dihejyan
Purtik û kezî.
Ji hîngê were.. Ez nizanim
Tu Derwêş û Pêxember î
Yan jî diz î!?
+ Heyho.. Heyho
Tu nizanî..
Ev çend sal û zeman e
Bi şev û roj
Ez û hespê xo bi hevra,
Çiya disimîn.
Rêya dûr e û simên hespî hemî mehîn.
Evîna min jî ya germ e,
Dil û hinav me kuzirîn.
Ez têhniyê,
Fireka ava jînê me.
Memê jar im..
Xendiqyê rondkeka çavêt Zînê me.
Ez ne diz û talanker im
Şeydayê çiyayê mezinê agrînê me.
- Nijdevan-o..
Şev e..şev e
Gurgê bi dev e
Dê te xot û ne te pişt e,
Ne te rev e.

**Befra giran..**
**Dewsa te girtî û hunî..**
**Berahya te barove ne**
**Gelî û dol û nihal hemî**
**Bûyne renî..**
**Tu kîve têy!?**
**Dê kîve çî!?**
**Ha.. Nêzîk e**
**Dê volkan û lehî peqin.**
**Min bo te ye,**
**Ez yê te me û tu yê min î.**
**+ Dilê min behreka pan e.**
**Sed Dîcle û Firat û Nîla**
**Dihewînît.**
**Çavê min dola Zîlane**
**Bi xwînê dinêrît.**
**Bi xwînê rondika dibarînît.**
**Heke hat û gurekê bi dev**
**Rêya min girt.**
**Baroveyên befra giran**
**Çiya dagirt, sirt û sirt.**
**Lehî û volkan tev da peqîn**
**Cîhan bo xwîn**
**Hîngê ez im Xidirê Zînde**
**Dê çim û çim**
**Pişta hemî tarya şkênim**
**Bo fireka ava jîn û azadiyê**
**Sîngê xo deme lehiyan û**
**Befrê birim.**
**Lewa evro ezê diçim û**
**Na zivirim.. Nazivirim.**
**- Nijdevano.. Guh bidêre**
**Tu yê dûr î û ez dûrtir im.**

**Qelemê min yê xendiqî**
**Pêlên ava reş û dijwar**
**Digel xo birim.**
**Di vî bajêrê sernixwîn da,**
**Herro deh car**
**Ezê sax dibim.. Ezê dimirim.**
**Hizar kelexên wekî min**
**Mirî.. Zîndî**
**Di gorrê da tên veşartin**
**Hindavî me, berahya me**
**Tirs û sehm û xem dibarin.**
**Evca çi bikem**
**Destên min ber min da ketin**
**Rist û zincîrên agirî**
**Li ber û piştên min dişarin.**
**+ Hewar.. Hewar..**
**Bo vî agirê ho dijwar!**
**Teniştên te hemî xarin.**
**Sîngê te kir çol û beyar!**
**Ne. Ne ho ye**
**Qelemê te.. Tîrojeka roja germ e.**
**Li ser tîta.. Navçava hespê min diyar e**
**Bajêrê te hingî bajêrekê rind e**
**Dema zozanî ji zozana têne xar e**
**Hingî dê giyan ête ber te**
**Dema kevyên befra sipî**
**Di bin cobare.**
**Rist û zincîrên agirî**
**Hingî dê ji zendên te kevin**
**Dema ji sîngê te tête der**
**Nirrîna şêrekê har e.**
**Evca were, digel min were**
**Dilê min bo te pencere**

Hespê min pêkulê diket
Hewre reşê vê buharê,
Golgolê diket
Wer wer bimeş.
Bi meş. Bi meş.
Piya li rikêba bişidîne
Xo li ser zînî dutake
Mîna Mîrzoy şîrî rîsk e
Daweşîne
Dinya xwîn e!
Dinya jîn e!
Dinya seranser evîn e!.

## KEVALEK

Şev bû dema ji birsa mirî..
Stêrên esmana rêz bi rêz
Li ser termê wî
Di şarand zêmar û girî..
Du - sê belgên darberûyê
Ketbûne ber didanên wî
Pala xo dabû kevirî..
Çavên wî zil.
Rokê wî gul.
Zelal mîna tilya tirî.

## DÎWAR BI GUH IN

**Ne axivin dîwar bi guh in**
**Heke dê bi ser me da kevin**
**Ne axivin çiya bi guh in**
**Heke dê Mambiz û kwîvî**
**Li banê sînga wan revin**
**Rûbaran da.. Serên çiyan..**
**Xîvetên guhan vedayne**
**Rex kinara hemî dev in**
**Şkeftave jî.. Li binbîva..**
**Li xo hişyar bin, tev da penc in**
**Tarî û şev in**
**Neaxivtin xoş derman e**
**Guh mişen e**
**Hemî qulaç û kujîka,**
**Ew vê dikevin**
*** * ***
**Birînêt xo..**
**Li jêr cilkên xo veşêrin**
**Kovanên xo, di sîngê xo da,**
**Vekên.. Bihêrin**
**Gotinkên xo..**
**Bi serên lêva**
**Bo hevdu bêjin, vegêrin**
**Da baş û baş**
**Misoger bît,**
**Hûn tirsinok in, newêrin!!..**

*1984*

## KEKO DAYKA ME!!!

Bira sê teyran
Şeper qutane.
Teyrên kelexa, şeper qutane.
Ser sîngê dayê,
Hewar nihyane.
Keko.. Guştxwar û hestî lê mane.
Keko. Evrok e
Sîngê dayka me,
Bi şevê agir e.
Bi rojê ji hova, yê mend û pir e.
Buhar lê zîz e.
Dûr e payîz e.
Befr e, bahurr e!
* *
Keko hestîkên dayê di belav in.
Li hemî ala,
Çiya li hindav in.
Li dûrên çiyan
Li kumtên bilind
Befir û agir in, xwîn û xunav in.
* *

**Kekê spêdeye,**
**Zaro di birsî ne.**
**Kuçkê bê pele**
**Pirtên nanê req, hemî di sotîne.**
**Çend sal û zeman**
**Bûrîn û hêşta dayka birîndar,**
**Dêmê wê xwîn e.**

*** ***

**Lê dîsa keko**
**Sîngên me pirr in, ji hîvya mezin.**
**Destên me nan in,**
**Pên me rêvîng in, birsê pê dikirin.**
**Hingê vedigerin**
**Teyrên kelexa..**
**Li ser singê dayê**
**Nikla jê bibirin.**

*1984*

# RAMÛSANA MIN KELTIR E JI RONDIKA TE

Min tu divyay..
Hêşta ji nû buhara me
Beref bişkivînê diçû.
Hêşta ji nû
Rûbarê mendê dilê me
Fêrî pêl rijînê bibû.
Ji nû evînê xo di kêşa
Ber sînahya çavên rojê,
Hêdî.. Hêdî mezin dibû.

* *

Paşî ji nişka min didît
Dêmê te yê hindê şirîn
Jê dibarî agir û xwîn
Bihar dibehî...
Ji çavên min ava dibûn.
Roj û evîn.

* *

Sal û zeman...
Wek sîlavên pir hêz û rijd
Ji banê emrê me meşyan
"Dihî" beref bayê xema
Bûrî û çû.
Digel xo birin hemî jivan.
"Evro" hat û ji xo ra zivirand
Evîneka giran.. Giran.

* *

Iha evro evîndar im
Wextê navê te dibînim
Wekî bisteka agirê..
Kel dişar im
Wekî tavyeka baranê
Li ser sîngê te dibarim

Wekî gurekê dev bixwîn
Li gerdena çel û çiya
Herê har im.
* *
Evca were yara minê
Herdu lêvêt xo yêt tenik
Bo min veke
Ewî evrê li ser pora te,
Bûye desmal,
Ji herdu çavêt xo vede û
Bijaleke.
Dilê min jî..
Sêveke di nav lepên te da
Têr bêhinkê,
Lê hişyar be, kerker neke.
* *
Ezê hatim Narîna min
Li jêr çel û kevrên Garey.
Li jêr davên wê heliza
Pirça wê wek dindikên şey.
Hatim bo te xelatekê bikem diyarî,
Ew jî bes ramûsaneke,
Min hey û ney.
* *
Ramûsana min ya kel e
Ji gurya wîjdana min e.
Ji germa tîjka rojê ye
Ji behreka tim bê bin e.
Baş dizanim.. Ger lêvên min
Lêvên te bigirin û bimêjin
Hemî bişkuj dê geş bin û
Esman dê rondika rêjin.

*1986*

# ÇÎROKA BAJÊRÊXEMGÎN

(1)
Heye..Û nîne
Bajêreke.. Ne li vê dinê
Kanîkên wî dizên xwîn e
Hawîr dizin...
Xîvetên wan...
Deşt û çiya dagirtî ne
Hemî xudan şîr û tîr in
Tim ji jehrê darêtî ne
Marê heft ser..
Kanya bajêrî ya girtî
Her rojekê..
Zeryekê jêra bêş diken
Ho bi xurtî, bajêr mirine!!
Bajêr têhne!!
Lew dev û lêv
Ezman dibin pirtî, pirtî
* *
Zemanê me
Rûbarekê pêl dijwar e
Seyekê paşdirr û har e
Tenahîxaz dê xendiqit
Yê şîr di dest
Dostekî pir evîndar e
Lewra ev bajêrê xemgîn
Maye bê şurh û dîwar e

(2)
Li vî bajêrî..
Birca belek,
Qesra Perîzad xatwînê
Ya ketye ber pêlên xwînê
Mîna qesra Penîlopê û

**Zîndana tariya Zînê**
**Mîrzo ji vê wexera dûr ne zivirî.**
**Wî rêka hat û nehatê**
**Hajot, birî**
**Lewra sîngê Perîzadê**
**Ketê agir. Ketê gurrî.**
***     ***
**Dêmê wê ji dêmê rojê dijwartir e.**
**Bejna wê ji gul şilêrê**
**Bi xemil û kar û bartir e**
**Bajêr tev da**
**Ronahya gerdena wê ye**
**Rondikên wê..**
**Ava Dîcle û Firatî ne**
**Ava Zê ye.**
**Eve çend sal û zeman e**
**Sîng û berên xo vekirîn**
**Kezî û biskên xo şekirîn**
**Ji Mîrzoy ra çaverêye.**

**(3)**
**Li jêr şûrha "Tirwade" da**
**Siwar ji hespa ketin xwar.**
**Qêrî û nalîn. Şer û hewar.**
**Devên şêra ji xwînê sor bûn**
**Rima metal kerker kirin,**
**Ketin dîwar.**
**Ûdîsyos û "Hespê Darîn"**
**Bûn melkemot, betal kirin..**
**Mirin û jîn..**
***     ***
**Hosa Ûdîs..**
**Ji babelîskên serketinê.**

Vegerya û ket..
Pêl û zivrok û sîpelên
Behir û rûbarên mirinê.
Bi dehan xudê....
Mîna şêr û pilingên har
Bi penc û neynoka diçinê.
Sîtafkên mirya li "Hîdiz"
Serên xo jê ra çemandin
Xoşmêr û gernasê bi tinê!?

* *

Ûdîs çend car, ket û rabû
Evê carê..
Rabû û neket..
Rojhelat, ne ava bû.
Stêra rêza xo ket bi ket
Li enya wî girêdabû.
Hat û "Îtaka" bo kenî
Li ser sîngê Penîlopê
Rakirin tev çiya û renî
"Mînîrvayê"..
Tenahî û jîn
Nav kolana belav dikir
Şahî li navçava direnî.

(4)
Mîrzo kete jêra dinê û
Kolkê pîrê û
Dest hilandin.
Mîrzo ew pêşîkî pêşîn
Pirasiyên dêwî qirandin
Bi zendên tîn û pîlayîn
Derên zîndan û mixaran

Herişandin.
Gerya li ser pêlên behra
Li ser tîjkên tave heyva
Tev da şev û roj çerandin.

(5)
Îro dehmanên bajêrî
Tev tijî agir û xwînin
Ser û dêm û rû birînin
Mirovên jar û belengaz
Şêt û dîn in.
Li xir ala..
Ejdehak û diz û dêw in,
Ax sitî nin.
* *
Bajêr xwîn e..
Mîrzo ji vê wexera dûr
Hat vegerya
Li ser şaperên Sîmerxê
Pişt heft derya, kete çiya û
Kete deşt û çol û beriya

(6)
Marê heft ser
Xwîna kiçêt me hind vexar
Vexar.. Vexar
Heta pê bûye dîn û har
Kanî hinda şêlî kirî
Kurr û teqna jê tête xar
Agirekê ji devî di peşît
Hindê dijwar û sojeke
Tev rez û bax.. Kirne beyar
Hilo Mîrzo...

**Eve Ûdîs**
**Eve xelkê evî warî**
**Perjan û dava têk biden**
**Dakevin ser serê marî**
**Perîzada li jivana te..**
**Birca belek..**
**Veken xir dergehên şarî**
**Diz her dizin!!!**
**Ji dengê şîrê te dê revin**
**Mîna revdên mêrî reşka**
**Li nav rê panên bajêrî**
**Dê derkevin..**

*Duhok, 1988*

---

* Ûdîsyos: Qehremanê yekê yê çîvanoka Ûdîse û qehremanê duyê yê çîvanoka Elyade ye. Ev herdu çîvanoke, Yonanî ne û ji nivîsîna Homîros ê nimirn.
* Penîlop: Jina Ûdîsyose, kiça Îkaryose. Bi dehan paqijî û wefadarî hatiye nasîn.
* Îtaka: Bajêrê Ûdîsyosî ye.
* Mînirva: Xudêya pend û têgehiştinê ye di mîtologya Girîkî da.
* Hîdiz: Cîhana miriya, roja axretê li bin dinyayê.
* Hespê Darîn: Ew hespe yê Ûdîsyosî ji darî çêkirî û Tirwade pê sitandî.
* Mîrzo. Bi nav û dengtirîn gernasê çîvanokiye li cem Kurda.
* Marê heft ser: Ev mare, serekanya bajêrî dagîr diket. Heta hemî rojê kiçikê jêra bêş neken, ew avê bo xelkê bernadet. Li dawiyê Mîrzo serên marî dibirît û dikujît.
* Sîmerx: Tewalekê çîvanokiye, hevala asteng û tengavyêt giran e, Tim digel layê xêrêye. Ev tewale her bi mê hatiye nasîn.

## GIRÎ

**Du - sê rojan**
**Serêk.. Serêk**
**Giryê min dihat**
**Min xo di quta û**
**Pirça serî vediçirî**
**Piştî heyameke dirêj**
**Ji nû min zanî ka bûçî**
**Min dikir girî!!!**

*1990*

## MAM EHMO

**Mîrzo ji mam Ehmo pirsî:**
**Kengê dê dinya kavil bît?**
**- Berê çavê mamê Ehmo,**
**Rondika sûlî jê çê kirin-**
**"Ma kengî dinya ava ye!!?"**

*1990*

## KÎ DIZANÎT

**Kî dizanît**
**Wextê avê,**
**Diden ber kêr û xenceran,**
**Jê dizêt xwîn!!?**
**Kî di zanît, dema serê**
**Ejdehayekê têt birîn**
**Jê dizêtin rîn!!?**
**Û wextê dêmê yara min**
**Dibît birrîn**
**Ji dinyayê dimirît evîn!!?**

*1990*

# Qadir Qeçax

Di sala 1962'an de, li gundê Kurême, nêzîk bajêrê Mangêşkê, ji dayîk bûye. Li hindek gundên deverê û Duhokê xwendina seretayî û navincî bi dawî aniye, lê ji ber terora faşistên Iraqê, nekariye li ser xwendinê berdewam be. Lewre di sala 1980'ê de, çûye nav rêzên şoreşa Kurdî. Her ji sala 1981'ê û pê de, dest bi vehandina helbestan kiriye û di rojname û kovarên Kurdî de, li nav şoreşê belav kiriye. Di gelek mîhrecanên edebî de, helbest xwendiye. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Heta niha sê dîwanên helbestan çap kiriye.

1. Bizav
2. Çaverê
3. Berxwedan, 1989

   Mixabin me nekarî hemî dîwanên wî peyda kin, lê her tenê "Berxwedan" li ber destên me heye, lewre me helbest ji wê wergerandine ser tîpên Latînî.

   Niha jî li Kurdistana Başûr e.

## MISÛGER

**Ho zaroyên warê şirîn...**
**Ger çax zivirî û pêtivî bû,**
**Bûka baranê siwar biken!!**
**Cade û kolanan pir biken!!**
**Baş hişyar bin??**
**Ger "birîsya girnijînêt lêvêt palan"**
**Dirwîşmê we...**
**Bilind neket ser giştalan??**
**Çû birîskên dî nexwazin... ?**
**Bila serxoş bibin ewir. !!**
**Bila bi hejyên kumtên çiyan,**
**Dar û kevir!!**
**Lê piştrast bin,**
**Bihara we, neberdihavêt,**
**Ne dişêt bimînît stewir!!...**

## AWAZEK NÛ

**Zirnavanan..**
**Dehol qutan…**
**Çerxek bûrî.**
**Sed hizar ser bûne gorî.**
**Hêşta dawet ya bi rastî ye!!**
**Hindek caran… Nîv şikestî ye!!?**

*** * ***

**Bes pof kenê…**
**Xelk dê ji awazên we têr bî!!**
**Hindek dengên dî yê fêr bî!!**

*** * ***

**Lez ken. Lez ken…**
**Wê herayê bê deng biken??**
**Selîqên xo dê bikene yek.**
**Kaşûyên xo dê bikene yek.**
**Da kiç û kur… Mil bidene ber,**
**Bidene yek û du lepî!!**
**Da vê carê**
**Şêxaniyeka reşbelek,**
**Bête şarandin bi çepî… !!**

## BERSIV

Yabo... Yabo
Ez di gel te me
Axînk vekêş!?
Lê bizane, hêşta yên mayn
Hindek dabêş!?
Ne bi tinê terşê taxê me
Pez û zevyên tev gundiyan
Dê têkel keyn û keyne kêş!?

* * *

Bax û pawanêt Sultanî,
Dê çerînîn...
Taca wî jî,
Bi gopalan, dê herişînîn...
Ji ser gîfkê dîrokê,
Rakeyne gilêş!!?
Wekhevî jî dê hête pêş!!?

* * *

Hemî dizanin
Li nêzîk û dûr
Dê pişka kê bin, jan û êş!!?

## SERKÊŞÎ

Tarîstan e û tibil çav e!!
Rêkyek pê ye,
Li herdu rexan jî sîlav e!?
Bila bêjin...
Agirê ji dûr ve
Diçirisîtin, herê sor e!!
* * *
Lê rêvîngên ronahiyê...
Baş bizanin, bi vî rengî
Qonaxeka bê sinûr e!!
Çinku heta evroke jî
Yê bi du çavan!
Tond ya girtî
Pişta yê qermûkî û kor e!!?

## BÊHIJMAR E

Li simînaran
Karxaneka xomal îkirî... !!
Pênivîsê, serdefteryê
Pisyar dikir û di ber re digirî... !!
Erê bo çi!?
Çil û sê sal e dixebitîn
Lê me ziyan, bê hijmar e!!
Ya ji berhemî zêde kirî: : !!
Spanekê genc
Bê tirs û şerim, bi dilekê pak gotî:
Çinku heta evroke jî
Hîvî û ûmêd ne bir bûyne
Ji borxiyêt jengî û silak...?

## PERÊSTIN

**Hey, hey dîrok**
**Dîsan mizgînyeka kirêt,**
**Te ji min-ê mişext re anî!!?**
**Vehirgumand…**
**Bilindtirîn kumtê çiyayê hozanvanyê…**
**Qaremanê…**
**Şanonama Zînê û Memê û**
**Evîndarê niştimanî!?**
**Li şûnê dana**
**Bi çimê nevyê Cengîzxanî!?**
**Ne peyker bû. !**
**Pêxember bû. !**
**Rinde bîra pir bawer bû… !**
**Lê çi bêjim bo nezanî… !!**
**Bila bizanin**
**Hindî Kurd heyn**
**Li cîhanê û**
**Bi milyoneha dost û hevalên biyanî… !**
**Di nav kuncên dilê xo de,**
**Diperêsin Ehmedê Xanî… !!**

## SEROKANÎ

**Çinku bi zorî di rojekê de…**
**Diwazdeh caran,**
**Bax û bîstan,**
**Dihatine mêtin… !!**
**Perwe… Xwîna wan dihat rêtin… !!**
**Ji neçarî, gulan pêk ve**
**Li destpêka gulanekê,**
**Li nav baxçê şîkaxo de**
**Serokanya xwînê ber da…**
**Gul û bişkoj û belk û şak**
**Têk de sor bûn… !!**
**Lewma gelo…**
**Bi hizareha,**
**Stirî û gulmêj û reşeba**
**Hind bin gor bûn… !!**
**Hind serşûr bûn… !!**

## PINYEKA SOR

**Têştegeh bû…**
**Hêş xelkê jar, hind bi rê ve bûn…**
**Hind diçûne jor… !!**
**Aso tem bûn,**
**Esman hijya**
**Hindav deşta Mergeverê**
**Asin rijya û kir porepor… !!**
**Reşebayê, roja Nehê Hizîranê…**
**Heşt dêwêt reş înan bi dor… !!**
**Pinyeka nû ya ewrê sor… !!**
**Bo dîroka Kurdistanê,**
**Kirne serbûr… !!**

## DARBEST

**Qebxwaz im**
**Ji we gelî texên**
**Pale û cotyar û rêncberan...**
**Bê minnet im ji kedxwaryan û tepeseran...**
**Rabin. Rabin.**
**Berê barovê wergêrin,**
**Derav û bender suhirîn,**
**Ji vêra negehiştina gemyan...**
**Xwîna leşan hate mêtin**
**Gulçîsk û mêlak kuzirîn**
**Gêzera piştan jî çemyan...**
**Gora zaroyê ya kola ye**
**Werin darbestê helgirin**
**Rexek li ser milên min bi tinê,**
**Rexek li ser milêt we hemyan e...**

## BES WE NEKEY

**Dîsan aşê evîna me...**
**Li vîna wî bûne benî... !!**
**Ez ê ditirsim...**
**Xodîka hîvî û ûmêdan,**
**Lê lîs bibin... Kadî û tenî... !!?**
**Lew pêdvî ye...**
**Bi şengefirçê mijîlankan**
**Herro carek tu jê birenî... !!**
**Bila pêlêt pîratiyê...**
**Bi ser pirçê de bibin renî... !!**
**Lê we nekey?!**
**Bes we nekey...**
**Belatînka evînya te,**
**Bibîte êxsîr û benî. !!?**
**Da ji pencerên malên hovan...**
**Neçîtin lîq lîq û kenî... !?**

# Hizirvan Ebdulla

Di sala 1962'an de, li gundê Bircînê, bajare Duhokê ji dayik bûye. Zaroktiya xwe bi karên cotkariyê ve bûrandiye û nekariye biçe xwendingehê. Di sala 1978'an de, bi alîkariya hevalê xwe yê xwendevan û karker (Fazil Se'dî) xwe fêrî xwendin û nivîsîna Kurdî kiriye. Di sala 1979'an de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û paşan di mîhrecanên edebî de xwendine û di rojname û kovarên Kurdî de jî belav kirine. Di çend salan de kariye helbestên bi hêz binivîse û cihê xwe di qada edebiyata Kurdî de bike. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Heta niha dîwaneka helbestan bi navê "Ez û Agir" çap kiriye. Dê çend helbestên wî, ji pîtên Erebî wergerînîn yên Latînî. Niha jî li Kurdistana Başûr e.

## BÎRHATINA YAREKÊLI XERÎBIYÊ

**Li xerîbiyê,**
**Xem ji çiyan bilindtir in.**
**Çav ji dîtnê nêzîktir in.**
**Guh ji bîstinê bêdengtir in.**
**Dilber ji man û mirinê şirîntir in.**
**Çavêd min rondika reng û rûbar renîn**
**Gurrî û bizot û agir in.**
**Yêd bûyne hevgur av û xwîn.**
**Koremar û xewnêd şevan.**
**Min tavên nav gurrî û devan.**
**Divên ezmanî bibirin.**
**Li rêya hatinê,**
**Te xo kir sitrî û xurêl.**
**Şûva jînê te kire rêl.**
**Da stiryêd te,**
**Çermê leşê min bidirin.**
**Te xo kire stêra qiro**
**Xo da berê esmanê min**
**Giştkarwan û hîviyêd min**
**Da li taryê bimînin û nezivirin.**
**Min ûmêd e di vê rê de bikem gorî**
**Sed salêd jiyana zivir.**
**Bila di navbera me de,**
**Bihelyên kevir.**
**Bibît agir şengebefir**
**Da kutrêd min nezivirin.**

*Duhok, 1980*

## WÊNÊD BEROVAJÎ

**Li gundê min, şev wek rojê**
**Tîrojkêd germa agirî,**
**Qed nahêlin,**
**Zarokêd gundî binivin.**
**Li gundê min, roj tarî ye.**
**Esmanê hindav gundê min, nîv sahî ye!**
**Stêr lê dihelin û nalivin.**
**Derya çavêt evê yarê,**
**Dibînim sûlav e.**
**Masiyêd jînê ji nav deryayê radibin**
**Jê heldibin,**
**Heta bi esmanan dikevin.**
**Sîngê yarê, yara nazdar**
**Payîz, havîn, zivistan û bihar**
**Mij û ewir bê bawer in, bê bayê sar**
**Dêm dikelin, her wek hev in.**
**Çi toz xulîk jê narevin.**
**Belê yarê.**
**Bilind e li bejna spîndarê.**
**Çend germe toz,**
**Sîngê wê biken, pawan û koz.**
**Bibin bavzîrk, bibin bahoz.**
**Dê her mînît şenge roja,**
**Min peristî, welê pîroz.**
**Pîroztirîn nexş û tevin.**
**Pîroztirîn nexş û tevin.**

*Bircîn, 1981*

## TE JI BÎR NAKEM

**Rojek nîne...**
**Bîrhatinêd evîna te**
**Ez nû nekem.**
**Şevek nîne...**
**Di nav kivanê jîna min de,**
**Rengê leyîzîna lêvêd te**
**Wênekê pir aşûp û dem,**
**Ne nexşîn im, dirust nekem.**
**Gavek nîne...**
**Devê xo yê têhnî ji peyva,**
**Peyvêd peywendî bejna te,**
**Ez ter nekem.**
**Şwîn bîrhatinek ji min naçît**
**Dema diçimê**
**Hozanekê ji axînêd dilê xo,**
**Li ser perêd deftera xo,**
**Ez çê nekem.**
**Nivistinek ji min nabûrît,**
**Hizar çirayêt vemirî.**
**Ez hilnekem.**
**Hizar kulkêt kavilkirî.**
**Ava nekem.**
**Hizar rêkêd wêrankirî.**
**Ez rast û avedan nekem.**

**Hey ax xewin**
**Çima ûmêdêd min ew in?**
**Ger roj helat**
**Min ne çi nojdar û kew in.**
**Tinê, tinê**
**Hinek daxê dî yêd dijwar**
**Li dilê xo zêde nekem.**
**Lê li nik te misûger bît**
**Te nehêlim.**
**Evîna te, wekî mêwê**
**Min ya di nav hemî rihêd leşê xo de,**
**Kûşe kirî.**
**Da çi caran evîna te**
**Ez pîr nekem.**
**Ji bîr nekem…**
**Ez ji bîr nekem…**

*Duhok, 1983*

## BEND Û PAŞBEND

Rengêd berê ji bîra min çûn.
Piştî rojêd min bûrîn û
Xem li dilê min kom bîn û
Co ji ber çûn.
Lê, lê belê!!
Di dilê min de çiya hene.
Gelî û avxurk lê mişe ne.
Hîvî û bawer
Bi şengistêd entîke ne.
Di çeleng in... Dibizivin.
Ji ser xema avê didizin.
Da bikujin.
Kulan bisojin.
Erê heval bawer bike
Çawan roj têt her ya bi hêz e
Tarî difirîtin... Diçîtin...
Dilê min pir bi hêztir e
Ger xem sed caran lê bicivin.
Min dagîr ken
Bi tinê xema te tê nebît
Xemek neşêtin lê bijîtin.

* * *

Min we zanî di gel nama te ya rengîn
Dilê te yê birîndar e
Lê der dibin kanî pir xwîn
................
................
................

**Bawer dikem**
**Şwîna birîna bawer in.**
**Dûryê du jîna xencer in.**
**Pir yê dûr im, tu ya dûr î**
**Lew li pey te bûm Cegerxwîn.**

* * *

**Duhî hatin silavên te**
**Min wergirtin**
**Kevir û birîsî dibarîn**
**Ji esmanan min vegirtin**
**Lê kovanêd xerîbiyê.**
**Stirî û dirkêt,**
**Keftîne nav evîniyê.**
**Rihêd xo li nav dilî çandin**
**Wekî firwîzî vegirtin**
**Şirîna min , were ez û tu bibîn**
**Yek dest.**
**Bilind bibîne esmanan**
**Wekî roja rona serbest**
**Rateriqîn, tarî şeva**
**Hişyar bikîn xelkê ji xew,**
**Gêj û sermest.**
**Gêj û sermest.**

*Duhok, 1984*

## HEVAL GIRÎ

**Torînê dil bi ax û oxî**
**Deryayê... Rûbarê... Pêlê**
**Xelk diçine rêya jînê**
**Yek, Yek ne**
**Birin. Bend in**
**Bi lez û bez in wekî hêlê.**
**Evîna me, ne rengiz e di jînê de**
**Hovatya pir e di rê de**
**Stirî... Bekrok, xoristî ne**
**Ji dûrhêlê...**
**Ji dûrhêlê...**

*Duhok, 1985*

# QONAXEKA NÛ

**Li xerîbiya min neke girî**
**Belê bigrî... Bigrî... Bigrî**
**Bo wî kevrî, ew ê digotin:**
**Şêrek li ber wî xinzirî**
**Ewî kevrê gurrî... Gurrî**
**Birîsyekê kerek mezin jê vekirî**
**Piştî binê wî jêk vebûy**
**Kevir mirî**
**Tê de şîn bûy şengedarek**
**Çiya simtî... Kon, kon kirî**
**Erê çima?**
**Şêrî kevir hêla...**
**Hêj nêçîra xo nekirî...**
**Yara delal ez dizanim**
**Ewan reşedêwêd şevê**
**Pirça te ya têk veçirî**
**Ew koza min ya çerandî**
**Bi van destan pawan kirî**
**Sê lawêd te, sê bira bûn.**
**Sê çira bûn.**
**Sê lewend bûn. Sê zava bûn.**
**Serê her sê şêra birrî.**

***   *   ***

**Îro. Îro ew dar kevr e**
**Ez im ew şêrê inirî**
**Tu jî wek "xaton şepalê"**
**Her dinalî**
**Çinku tu ya bê heval î**
**Aronka tu li min digrî**
**Belê yarê nazivirim... Nazivirim**
**Yan dê bo te rojê girim**
**Yan ger heval, car û baran**
**Bêne seyrana li waran**

**Li ser gora min bêjin:**
**Evî, ya xo gorî bejna şepalan**
**Rind kirî...**
* * *
**Tu piştî min neraweste**
**Xo nehîke**
**Destan çi car nedahêle**
**Xo bo kesê nekehîke**
**Ger te zanî**
**Dê karwan mînît bi rê ve.**
**Hindekêd dî bide berî xo**
**Yarê bizav kirin, ne her berahîk e**
**Ger tu westay**
**Ji karwanê eşqê vemay**
**Yan tu neşyay**
**Were gora min bi herêfe**
**Cardî nû ke**
**Li şûn gora min**
**Dê lê şwîn bin du dar kezwan**
**Yek ji nîşana aşiqan**
**Ya pengiyay**
**Berî bigehin**
**Benda armanc û hîviyan**
**Dibûn qorban**
**Li vê derê**
**Ez û tu jî bibîn gorî**
**Lê li dûf me, dê her mînît**
**Şirîn karwan...**
**Şirîn karwan...**

*Duhok, 1985*

## BENDEK JI GELYÊGOYIYAN

**Şev hindabûn!**
**Ez, senger, mirovêt aloz.**
**Nîvek ji giyanê min hat kişan.**
**Hindî mirovêd min dîtîn**
**Bi tev rengan xir hilweşan.**
**Ax bo eşkencêd mirovî!**
**Çenda çetne ev reva he**
**Hov ji ber hovî birevît!**
**Mirov ji tirsa mirovî,**
**Dîn bibît û bi çolê bikevît!**
**Mala min-o zarokê he**
**Ev çend car, pêd xo yêt rîs**
**Ji stirî û sîxman hilkişan!**

*** * ***

**Gundê me,**
**Kangeha qurbaniyê û mezin e.**
**Çi rûbarê tu çûbay ser,**
**Da bêjîtin:**
**Rûbarekê dî yê li vî gundî**
**Ne carekê,**
**Belkî; heşt car hindî min e.**
**Ev çîrok e, her ji kevin**
**Babê min bo me vedigêra.**
**Noke hindî ez yê lê digerim,**
**Serê wê yê bûye xewin.**
**Dwîmahya li min bûye tevin.**
**Hindî ez mam. !!**
**Ne aştîxwaz hatin daweta Mîr Mihê,**

**Ne Qadirî zirna xo ya kerbê helgirt,**
**Me bi mestî,**
**Bibet bo warê Asihê!!**

*   *   *

**Çadira me û kevya befrê,**
**Du hevswî bûn.**
**Tim hevalêd çîxe bera,**
**Li serê gelyê Bêzenîkê peraswî bûn.**
**Hinde caran da bînî,**
**Ava rabûy, bûye rûbar.**
**Caran yê may bestek berrî.**
**Zarokên wan bûne qurban, bûne serî.**
**Xelkê mişext nerazî bûn...**
**Çûn serokanî vekolan**
**Ne darek û ne jî berek pîroz hêlan**
**Hemî di rûbarî de berdan**
**Roja av dihat, hemî dibirin.**
**Roja neba, ji têhna dimirin.**
**Qesta xudê agirî kirin**
**Li çaxê**
**Agir û aman û befir**
**Bûne heval**
**Giyanê du zarokan, wek sîsinan**
**Li kevya befrê**
**Serî heldan û bûne gulperî.**

*Bileh, 1991*

# ROJHELATA NAVÎN

Min hest bi birsê nekirye,
Ger çi ez zêde birsîme!!
Hemî wênêd ez dibînim,
Ji bo paryek nanî difirin.
Wer lê binêr vê kolanê
Girêd axê.
Ev caldeye he konkon e.
Pencera malan bi tinê,
Ya bûye dêmê Sînemê
Hindek ser û çav diêne pêş
Hindek paşve xo vedigirin
Dwîkêla tîj
Difna min ya werpêç kirî
Barîta reş
Hemî rengêd min yêd vebûy
Tarî kirin.
* * *
Gurg yê har bûy...
Tarî û dûkêl yê esmanî dixendiqînin.
Herdu çavêd zarokê he
Eparekê tê de dilivît.
Bombe dibarin.
Ser dîwarê kavlekê reş
Bilbilek yê vedilorînîn
Awazê wî,
Lerzîna mirnekê dijenît.
Binêrin vê perîzadê,
Ya li hindav
Serê hemî bengiyêd xo
Bi kelexêd wan
Ewêd genî û rizî dikenît!
Mala henê, miryekê wan yê sax bûyeve!
Yê şahî û şînê pêkve diken!
Dirindeyek yê li ber derî
Divêt guştê saxê wan bijenît...

*1991*

# Îsmaîl Hacanî

Di sala 1963'yan de, li gundê Avetehlê, nêzîkî bajarê Zaxoyê ji dayik bûye. Xwendina seretayî, navîn û berhevî li gund û Zaxoyê û bo du sala jî pişka Ingilîzî li zanîngeha Bexdayê xwendiye, lê ji ber terora faşistan ew bi dawî neaniye. Sala 1982'an, dest daye nivîsînê, helbest û gotarên edebî di kovar û rojnamên Kurdî de belav kirine. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistanê ye.

## XANIM TU DIZANÎ

Çavên min çîrokeka hey
Lêvên min dîrokeka hey
Peyvên min dastaneka hey
Dilê min efsaneka hey
Xanim tu dizanî?
Çavên min qewî dişermînin
Lêvên min gelek dibirsînin
Peyvên min, min ditirsînin
Dilê min, hest û bîrên min dikelînin
Xanim tu dizanî?
Di navbera çavên min û çavên te da awurek e
Di navbera lêvên min û lêvên te da hilmek e
Di navbera destên min û rûyê te yê geş
Pora te ya reş da bihostek e
Xanim di navbera dilê min û dilê te da
Şerim û sehim perdek e.

# AŞTÎ XEWNA ROJHELAT

**Gula rojhelat**
**Hey zerya efsana.**
**Ji eşqa te me dastan tomar kirin.**
**Ji eşqa te me û mirinê da berêk**
**Hajot û hajot ev rêk**
**Li şevên reş û tar**
**Zivistanên sar û har**
**Ji eşqa te**
**Me hajot ev rêk**
**Me û mirinê da berêk**
**Bomba.. Napalma**
**Foscîn.. Siyanîd**
**Sîxo û mêk**
**Me hajot ev rêk**
**Me û mirinê da berêk**
**Qorban me dan**
**Milyon qorban**
**Li Agirîdax**
**Li Aleqemşê**
**Li Helebçê**
**Kelex keftin,**
**Hestî û kilox, bone çiya**
**Kevne serêk**
**Ji eşqa te me û mirinê da berêk**
**Hajot û hajot ev rêk**
**Dêw û qirral me qirrandin**
**Geliyên kûr û teng xilas kirin**
**Deryayên bêbin û pan**
**Derbaz kirin**
**Da li adareka hosa**
**Li gel elindê**
**Perdê li ser çavêt te bihelînin**
**Bêjne te spêdebaş**
**Hey aştîxan vexun ji lêvên te**
**Ava heyatêyek pêk..**

## KURDISTAN

**Kurdistan**
**Qelenê te me kom kir**
**Bêş û xîk**
**Asman wê sahî bibît**
**Dê bite xodîk**
**Ala sê reng bi pora te ve kine kofîk**
**Tac û text wê biherrifin**
**Hizar şah û sultan**
**Li ber pêt te wê bine pepîk**
**Li ser suhbeta te**
**Dê stirên çil milyon**
**Saz û bilor û pîk**
**Dê govenda te girêden**
**Kurmanc û Zaza û Lorr û Kîk**
**Û hosa Kurdistan**
**Me li bere nêzîk.. Nêzîk**
**Te bixemlînîn û bikîne bîk..**

# Beyar Bavî

Di sala 1967'an de, li gundê Bavya, nêzîkî bajarê Zaxoyê ji dayik bûye. Xwendina seretayî li gundî, navîn û berhevî li bajarê Sêmêlê û pişka sosyolocî li zanîngeha Mûsilê bi dawî aniye. Di sala 1983'an de dest daye nivîsîna helbest û babetên edebî û di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistanê ye.

## DARMAZÎ

**Darmaziyê**
**Tim dîn û serxoş dimînim**
**Dema dibînim**
**Darîvanêt vî gundê me**
**Ji tirsêt tehra kelhavînê**
**Tên... Tên li bin sîbera**
**Şenge takêt te xatwînê**
**Lêk mexel tên û**
**Gava dibîte êvar**
**Wek seyêt har, bi das û bivra**
**Li dûr bejin û bala te wertên!!**

*1987*

## MIRINA ŞAIRÎ

**Digotin: Kengî şair dimirit?**
**Dema şîrê Cengîzxanî**
**Ezmanî lê dibirit?**
**Yan dema**
**Li hindav her peyveka di serî da**
**Polîsekê qamçî di destî da**
**Bi xurit?**
**Yan jî dema kinifka sêdarê**
**Li dûr gerdena wî bizivirit?**
**Nexêr... Na**
**Dema şair dibîte zirna û**
**Her rojê bi awazekê distirit**
**Hîngê dimirit...**
**Hîngê dimirit...**

*1988*

## AXA

**Pisyarek di serê**
**Çend Axaperêsa da dijenî..**
**Ji Axay pirsîn**
**Ezbenî...**
**Heta kengî dê berê binemala we**
**Beg û Axa bin?**
**Got: Hindî kerêt wek we mabin!!**

*1989*

## LI ŞEVÊT CEJNA

**Li şevêt cejna**
**Şeş, şeş xidam**
**Fîstanê bejna xatwînekê didirîn...**
**Û li şevêt cejna**
**Zarokêt hejara**
**Di xew da**
**Bo cût pêlavekê digirîn...**

*1989*

## FERHENGA ŞOREGÊREKÎ

Li şeve zistaneka tarî
Befir û barov bi hev re dibarî
Rêvîngekî
Ferhenga şoreşgêrekî
Ji min re kire diyarî
Vê ferhengê baş bixwîne
Tev da şoreş û zanîn e..
Pirr dikir behsî pale û cotyara
Xweş, xweş diîna navê
Hoşmin, Maw û Gîvara
Ev ferhenge bibû têşt û şîva min
Li hemî spêde û êvara..
Lê evroke û piştî du buhara
Berperêt ferhengê ve dikem
Temaşe dikem!..
Her li ser wan berpera
Peyvêt mirîn û yêt bûyne
Wênêt Hartop û Sopera
Û her li ser wan berpera
Peyvêt firîn
Yêt xo kirîn
Qesrêt Axa û Beglera
Rêvîngo...
Heyfa min ji xwîn û xebata te ra!!..

*1993*

# Arif Hîto

Di sala 1968'an de, li gundê Balete, nêzîk bajarê Duhokê, ji dayik bûye. Xwendina seretayî, navîn û berhevî li Duhokê û beşê nojdariyê li zanîngeha Mûsilê bi dawî aniye. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî di nexweşxaneka Duhokê de dixtoriyê dike.

## GOZÊ Û EVRO Û MIXABINIYEK

Rojekê Gozê pê zanî
Ku bajar mişt e ji bexçe,
Soperên spî û reş û olî û bêla
Dest da birnoya Emê win
Da veketin dilê derya şarê bêbin
Li Emê bigerit, di meyxana ve
Di gazînoyên bilyardê ve
Li pişt kevrên bi avê ve nûsyay
Li cem eşîr û kûn û êla
Welê Gozê..
Piştî cergê bajêrî şilqandî û şêlay
Ji nişkekê ve soperek reş
Mîna birîsyê bi lez û bez
Li ber rawesta
Bê hizir ket
Ez û soper, soper û ez!!
Herwekî serxoş û wêla
Lê siwar bû!..
Û rojê çavên xo girtin
Soper jî wek bayê bezê
Di nav boriyên xwîna bajêrî da bûrî
Têper bû ji tev rût û rwîsa
Û Emê li pişt kevra hêla
Dengekê pirrî kerbvebûn û tingijî
Gazî kir:
Gozê.. Gozê
Mindaldanê te, hêlîna egîdan e

**Enya te, qîbleya nivêjên hejara hemiyan e**
**Lêvên te, xwîna Emê me yê pê ve**
**Paşeroj e.. Kevn e vîn e.. Nû jiyan e**
**Bizivre ve, nê em yê ditirsîn**
**Navlingên te,**
**Bibît mexelê xofiroş û dizan**
**Gozê.. Gozê..**
**Bizivre ve, nê Em ê me yê birîndar e**
**Li jivanê te nobedar e**
**Welê Gozê..**
**Di da rê wek bayê bezê**
**Û bêzarya bidwîf me ve wek sîtafkê**
**Em yê bidwîf Gozê ve dibezîn**
**Yê dikeyn girî.. Ya dikenîtin**
**Tev bûyn mirî.. Ya divejîtin**
**Ewa difirît û Em ê bi dwîf û**
**Di nav mijê da berze bû**
**Çewa?! Kengî?!**
**Lê berze bû!..**
**Em jî bidwîf ve**
**Çiya çiya.. Lat lat**
**Spêdeyekê me xo dît em penahinda**
**Piştî Gozê bûye winda**
**Me xo dît em penahinda**

*Çelê...*

## NAN

**Li ber dergehê malekê ji bajêrê min**
**Xelk dirêzin**
**Hindek jê dixav in û gêj in**
**Hindek lal in.. Hind pirrbêj in**
**Evê malê ne kiçkeka ciwan heye**
**Da hêv kenê**
**Ne ev şeve, şeva bûka baranê ye**
**Da nuqil û şirînahî bidenê**
**Ne kes avê dirêjin**
**Ne sitranên eşqê dibêjin**
**Bi tinê dirêzin:**
**Û yê lêvên xo dimêjin**
**Ev mala he entîke ye!**
**Ew çi tiştê seyr e tê ve?!**
**Ew çi çêja Xudaî ye pê ve?!**
**Ev mala he, xwîna di tenûra wa digerît**
**Nanî dipêjin**
**Nanî dipêjin**

*Duhok, 1992*

## GUNEHBARÎ

Xema nexo, tena binve
Çi pîlana hemberî te nakem ji bin ve
Mirovekê çep peyrewim
Her ji demê Qeraqoşî
Devê min yê girêdaye û
Gopalê xo alif didey..
Car pişta min
Car çavên min
Car dilê min
Rojê sed cara zikê min
Pê taqî dikey
Ger ez bêjim ku dehbey
Ez dizanim
Hemî hestên te dê livin
Tev hovatiyên te dê nivin
Dê rûbarên dilsoziyê ji çava barin
Ez wek sawîlk
Wek rastîbêjekê kiçkûk
Wek hêtîmên
Tev şehîdên serhildana cadên Duhok
Dê lêvên xo li serêk gezim
Yê gunehbar ne tu yî ez im
Zik û dev yên min bêşerm in
Çend diharin!..

**Xema nexo**
**Dilê xo nehêle ji xo**
**Qet netirse**
**Ne pirse ji êlçiyên xo**
**Kanê çend rûh hilkêşayne**
**Ber berê te**
**Kanê çend pirrbêjên wek min**
**Rakêşayne ber derê te**
**Tena binve**
**Hindî ez ê dev girêday**
**Tu dê mînî, mil û zik zil**
**Ez dê mînim gunehbar û herê çav kul**

*Duhok*, *1992*

# Mesûd Sernî

Di sala 1957'an de, li gundê Sernî, ser bi bajarê Amêdiyê ve, ji dayik bûye. Xwendina seretayî, navî û berheviya pîşesaziyê li Duhokê bi dawî aniye. Sala 1981'ê, ji ber terora faşîstên Iraqê reviye û gehiştiye rêzên şoreşa Kurdî.Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistanê ye.

## GOMANKIRIN

**Hemberî yek keftine davê**
**Çavzilkanê digel hevdu dikir**
**Goman hîngê**
**Kefte lezê û serjêrkirin**
**Derfet nebû**
**Şerma vînê**
**Derbaz bibît ji dava mîrat**
**Lew herduka lêv gezandin**
**Hemî cara di gomanê da**
**Feramoş kir.. Feramoş kir**

# EZMÛNKIRIN

**Piştî dariştina hizreka kwîr**
**Digel hatina çend rûdan û setimîna**
**Şirovekirina rastî bûrî**
**Hêngê civîn danan**
**Serbûr kirin..**
**Bi serede û bêjink kirin**
**Êxistine ber bahînkê**
**Rojhelatî û rojavayê**
**Her newestan**
**Dubare diviyan ezmûn bikin**
**Da ku pêtir ser helbibin**
**Bi parzînkê bişaftina şîrê mehan**
**Taqî kirin**
**Her newestan**
**Mencelên bi derpûş anîn**
**Têkirin û bi pila sedê têr kelandin**
**Ji nûka zanîn**
**Rastiya bûrî çi tê da ye!!**
**Di wê gavê da**
**Gundiyên me vecemyan û**
**Bêder rast kirin..**
**Ewê ji hemyan rêbertir**
**Kire gazî û bi dengê bilind**
**Dîma ezmûn em bi ser helbûn**
**Çi têda ye!!**
**Lê xuya bû**
**Bikene biryar**
**Eva bûrî bi zivrîte ve**
**Şengistê rastiyê her eve ye**
**Eva berçav...**

# ME JÎN LI BER E

Me jîn li ber e..
Bo hîviyeka pirr rûmetsaz
Ji wê vînê ra
Ewa jîn dibîte nezr
Di rêka rêvîngekê jîn ne viyayî û
Jê heram bûy..
Bo wê rojê ku digel hevdu bibine cot
Serferazket bûyera
Wê evînê ya
Bûye hevrrik di jîna me da..
Çarenivîs û xosazdana gêleşûka
Hemî çaxan
Ya xuya ye
Bo gava vîn
Dibîte hîvyên di xoserî ya
Dîma roja wî divêtin
Ne siruşt e û ne yasa û rewa ye
Hin dibêjin
Ka ew mîratgirê bûye semyan
Di malbatê da?
Ka ew koçk û civatên
Mîrê mîra lê dironişt û dikire ferman?
Dikire peyv û şîretgeha evîna rast?!
Ka, ka, ka?
Kî dibêjît ya winda ye

**Ew elinda spêde ziya**
**Digel xandina Endeliyê derdikevîtin!!**
**Aha hîngê û di wê rojê da**
**Pirraniya evê xelkî**
**Di jîna hatûbatê da bûn..**
**Serên rêka jê diberzebûn**
**Çinku hov û pîrheviyên**
**Şevên reşên bê omêdiyê**
**Kêlbên kerba ji navbirinê**
**Lê girr dikirin..**
**Lê girr dikirin..**

# Hesen Nûrî

Di sala 1967'an de, li bajarê Duhokê ji dayik bûye. Xwendina seretayî û navî li wî bajarê bi dawî aniye. Sala 1985'an ji ber terora faşîstên Iraqê reviye û gehiştiye rêzên şoreşa Kurdî. Sala 1989'an, dîwanek helbestan bi navê ( Hinde Axînk Ji Awazên Dilê Min) çap kiriye. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistanê ye.

## XEWNEKA MIN

Direvîm bi lez
Direvîm bi bez
Rûbar û av min derbaz kirin
Evraz birrîn
Direvîm dîsa
Ji dîmenên hemî çiplaq û rwîsa
Ji gefên har û kêlên xar
Hemî birrîn
Paşî xirr sorgul û şirîn
Tev min hêlan
Hemî werçep û xirr asteng
Talî û jehrên ji hemî reng
Li bilindiya şaxekê bi hewar û deng
Ez dibûme gurrî.. Dibûme gulle
Bo rextê wî qaremanê
Bo rizgarî û mirovatiyê
Bûye çeveng
Jiyana wî
Cîhana wî
Bi tinê bûye çiya û tiveng
Çiya û tiveng

## ZIVRÎN

Heku dîsa zivrîmeve!
Zengila pîroz
Helgirim û bileqînmeve
Bo helwêsta û awazên sor
Têlên sazê bişidînim û bilezînmeve
Bo mirova û wê civata dûr
Xo bikeme deng
Bo pêşmerga
Dê sitranekê bêjimeve

## NASNAME

Nasnama min
Li sinûrê bejna te ya sora qaçax
Hate sotin!
Çîroka eşqa min û te
Li koçkên sar
Ji devên xar
Berovajî hate gotin!
Min ya mayî bitinê
Dersokeka sora bixwîn
Careka dî
Bo evîna di dil da zayî
Hîvyeka nû
Bi xwîneka dî baş bişûtin!

# KÊ DIVÊT?

(1)
Min her diviya berzebûyê
Nihêniyên çavên zelalên te bim
Ne dîtiyê
Dunyayeka berdirryayî ya
Aştî lê çûy û nemayî

(2)
Min her diviya vexwandiyê
Awazên ahenga lêvên
Pirr û pirr şirînên te bim
Ne nehişê Fêstîvaleka
Hizar ser di nav da çemyayî

(3)
Min her diviya peyveka
Tolvekera sotinekê bam
Ne gotara tirsinoka li tariyê
Ji nû li ser çirayekê şaryayî

(4)
Min her diviya birîneka
Mezina pirr jan bam
Ya bi guleya bi tinê kewyayî
Ne kaxezên nivîsînên
Xofirotiyên pirr dirryayî

# Cîhad Amêdî

Di sala 1967'an de, li bajarê Amêdiyê, ji dayik bûye. Xwendina seretayî, navîn û berhevî li wî bajarî bi dawî aniye. Di sala 1985'an de, dest daye nivîsîna helbestan û her di wê salê de jî, ji ber terora faşistên Iraqê reviye û gehiştiye rêzên şoreşa Kurdî. Niha jî li Kurdistanê ye.

## LANDIK

Çava sihra kulî darêt
Zavayî ji tirsa Ehrîmenî
Bûka ciwan ji ser textê azadiyê
Firrand havêt
Mirova xwîn ji devî darêt
Çi şîr nema zarok bixun
Lewma lûliya tivengê mêt
Tev gulbuhar ma di jivana bulbulî da
Da awazeka nû bo bibêt
Kotira aştiyê bar kir
Çunke ji mêje postala pîs
Hêlîn divêt
Dêr û mizgeft herifandin
Incîl sotin
Per ji Quranê werandin
Nê şemilka kes dî nevêt
Kura nê ev çende zanî
Da vê xemê û vê gazindê
Biket hozan, bo Xanî bibêt
Baş e gelo landika he ya bi tinê ye
Gazinda xo ew bo kê bibêt
Kî dê pê ket, kî dê pê bêt

## BO DAYIKA MIN

(*Diyari ye ji bo şehîdê nemir Mihsin Ebdulla Amêdî*)

**Hayê dayê li min dayê**
**Hilgira vê xemê û tayê**
**Bextê min û vê belayê**
**Ne birsiyê nanê te me**
**Ne heyranê dîtina çavêt**
**Reş belekêt yara xo me**
**Ne daxaza qesra bilind**
**Bilind, bilind ya bi**
**Soper û Kirole me**
**Belê dayê daxaza min**
**Hîviya min**
**Kutirek e**
**Tenûrek e**
**Lê nanek e**
**Bo tev hejarêt belengaz**
**Bo tev mişextêt bê kiras**
**Bo tev bûka**
**Tev zavayêt di nav kavila da**
**Perî bo hatîn vedan**

## GORRISTAN

Gorristana azadiyê
Çima evroke hewar e
Kurê xalê min yê Reşîd
Yê li Dêreloş diket gazî
Nê jarekê bendewar e
Swînd xwarê doza mezin
Jaro Kurd û Kurdistan e
Li nav peyrewê Kurdîniyê
Li nav yasayê Kurdîniyê
Kê xandiye bendek bêjît
Rêbaza me zêr û dînar û dolar e
Goristana azadiyê
Çima evroke hewar e
Kurê xalê min yê Reşîd
Yê li Dêreloş diket gazî
Çima evroke deyka min
Ya bê kes û bê xudan e
Ji serma da cerg lê sot
Keçekê gazê bo derman e

* * *

Ew buhara me kesk kirî
Ew dara maziya me şîn kirî
Ew şoreşa agirê wê me geş kirî
Evroke jî rakêşana xirr kesan e
Hemî tuxim û xirr nifşan e
Yê ku lîlya tivenga wî

**Silav kiriye kelexê min**
**Yê ku bi destêt xo yêt gemar**
**Li Hevinka agir berdaye zinca min**
**Evroke jî li pişt mêza Mey û Wêskî**
**Di sîngê Sopera giran**
**Ser xatira dînarekê**
**Gelek bi sanahî swînd dixut**
**Bi sûnda mezin**
**Bi kurê min**
**Lewma yarê qewl û qerarêt me sotin**
**Soza me bi çîh neîna**
**Lewma çûk lê şikestin**
**Çinke perêt sê egîda mane vala**
**Bêhna eşqa zavaniyê**
**Ne hilkêşa û ne derîna**
**Lewma Berey**
**Navê mezin**
**Sûnd me xar û soza me bi çîh neîna..**

# Kirmanc Hekarî

Di sala 1965'an de, li bajarê Sêmêlê, ji dayik bûye. Xwendina seretayî, navî her li wî bajarî û peymangeha mamostatiyê li Duhokê bi dawî aniye. Di sala 1985'an de, helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kiriye. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistanê ye.

## HAWAREK JI EMOY RA

**Emo lawo**
**Ne me Xanê lepzêrîn e**
**Şîrî ji kavlanî bikêşît.**
**Ne me Bedirxan e bêjit:**
**Şer dehweta me mêran e û**
**Zikê dijmina biqelêşît.**
**Ev e serê çend salan e**
**Heyî û neyî**
**Bişarê Çeto û desteka xwe ne**
**Hizreta wan**
**Hero korsîk û paren e**
**Çi biyaniyê hat di gund da**
**Bê pis û pisyar**
**Di nêv koçka me pal dida û**
**Dibû muxtar.**
**Lo lo Emo**
**Me hîvi ye ji deryê mîrê mirada ra**
**Berspêdekê Birnoyê rakey**
**Xwe ji beheştê berdeye xar**
**Bizivrînî çerxa felekê û**
**Bikeye buhar..**
**Bikeye buhar..**

*1988*

## DENGÛBAS

**Nîvroyekê li Deştanê**
**Tirs, birs, xem û serma**
**Wek cendirma**
**Rahêlane zarokekê serhildanê**
**Jêvenebûn**
**Ta birîne goristanê**
**Li xirr cîhanê**
**Tinê Koba û Îrisî**
**Di rojname û govarên xwe da**
**Ser zarokî nenivîsî**
**Nenivîsî**

*1991*

## ŞEV Û ŞOREŞ

**Di her şeve reşekê da**
**Ger stawber bigehneyek**
**Agir û ronahî difirîtin.**
**Di her şoreşekê da**
**Ger xame û tiveng**
**Bibine hevalênyek**
**Çawa serbestî ji dayik nabîtin?**
**Welê hey ho**
**Ta ku evro**
**Li warê şemo û Mamend û Simko**
**Tiveng e dixurîtin.**
**Tiveng e dixurîtin.**

*Sêmêl, 1992*

## SEYR NÎN E

**Evro ya dibîtin..**
**Bajêrê me**
**Yê bi serserê xwe**
**Birêve diçîtin**
**Hemî tişt tê da berovajîn e**
**Direw rastîn e**
**Beko Tacdîn e**
**Zelamên rijêmê jî**
**Rêxistinên nihênîn e**
**Lewma birayno**
**Ger xirr şoreşgerên bajêrê me**
**Dîn û har bin**
**Seyr nîn e**
**Ne, ne seyr nîn e.**

*1993*

# Tehsîn Navişkî

Di sala 1968'an de, li gundê Navişkê, nêzîk bajarê Mangêşkê ji dayik bûye. Xwendina seretayî, navî û peymangeha mamostatiyê li gund û Duhokê bi dawî aniye. Di sala 1985'an de, dest daye nivîsîna helbestan û di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Niha ji li Kurdistanê ye.

# DÊ HILO DÊ

**Nabêjye min malkembaxê
Ji kengî were
Leşê te her zibare ye
Kirre kirra bista daxê
Ne dikey bar, ne dikey piştî
Wesa diyar e
Girê hişka tirsa bi dwîlik
Wêrana te ya bi xwe girtî
Hey êxsîrê te çi divêt
Nê evroke
Ziyos bi Ziyosiya xwe
Yê li Piromîsyosê daxvan
Bi pişt rê ketî
Nêçîrê li derfetê bike
Piran kayên bêhodeyê bijikîne
Heke ha ha
" Tiştê bûrî qet guh nedê
Silav li sifra hazira."
Tu hingaftî**

* * *

**Wê hizrê bike
Fihêtiya her û her kîvî
Evro ya li bê livîna te
Têt bi çîvî
Vêca ma roj bo kengî ne?
Dê hilo dê
Topa kurkbî
Ji ber ezmanê kaşûyê te
Bi daweşîne
Di kurê ra werîs bûye mî
Bila bipiçit
şanaziye verêjê te
Besî te ye "Roj hejmêra Berwariya"
Di belek namên qehremaniyê da
Dê nitrînit dastana te.**

*Xaniqîn, 1990*

## BERSIV

Ser serê me û yê babê me
Tuberkê li me biye mêvan
Dîmokrasî
Ji kîs devê distûrê wê bi xwe
Gelek dîr e
Ji kun û çîqên vî kirasî
Rastiya wî
Guh ne simtin
Zal zirrtek e
Heyî û neyê têt e lîsî
Beramberî şîrê dadgehê bi devlobe
Twîxên jenga kevin û nû ra
Yê may keçe lê ne husî

* * *

Seranserî gencîna xêr û xêrata
Xîveta jiyana rojane
Bi axê ve ye nivistiye
Çavlêkirin penceşêran..
Min û te û yê dî û yê dî ye
Her ro.. Her ro
Cejna xwêrkê necax tîj û seqa kiriye
Hêt û pîlkirina pilpilkî
Di sinûrê aşkerayê da
Kiryara bi xwe jî girtiye
Li bere malyê
Hejî nêçîra bav gidî
Bi serûpêkên ademiya
Yê xemlandiye

* * *

**Gelek cara dahînana vê dewletê**
**Rêka hatin û çûna min e**
**Di reftarên Niyandirtala dihelingim**
**Bê hemdî xwe ez deyn dikem**
**Zimandirêjî ne bi min e**
**- Bira, pismam**
**Seyda, qurban**
**Daykê, xuşkê**
**Pizo, pizî, dêm beheştî**
**Xudê kuştî**
**Xarna ademîzada**
**Ne di ferhenga mirovatiyê da ne**
**Ev bazar e**
**Ne ji bazarên bajêryan e**
**Eva henê hilweşyan e**
**Keşefirêtiya**
**Serpişka keşefirêtiyan e**
**Kurt û Kurmanc**
**Bersiva hemya hosan e:**
**- Tu li kêj cîhanê yî rebeno**
**Ber û kevrokên beraşa..**
**Lihiyên avê..**
**Bi hev ra ramalîn û birin**
**Ma te çi ji kengirperrane.**

*Duhok, 1993*

## KEVLOJANK

**Evê henê**
**Evê dibêjnê**
**Heyî û neyê..**
**Gogirandina gerdûnê**
**Ji alê sengiya**
**Teraziya berjewendiya**
**Şepirzeyekê du dil e**
**Birin û nebirina mêtiyê**
**Heta evro..**
**Bi kêşana serê decalî**
**Bi yexnê,**
**Pêr bî me hemya dît çewa**
**Her vî mitay**
**Ev mêtiye**
**Pivda.. Pivda**
**Heta li ser difna hemya**
**Kiriye Izraîlê mirinê?**
**Ser xirrhan û bilind firyê**
**Hevsarê wî şûr kir.. şûr kir**
**Heta biriye**
**Nav pawanê rû reşkirinê**
**Li dîf xalên bernamê taybet**
**Nermijand belîkirina pinîkirinê**
**Xala li dîf ra**
**Kire hirça şemo şemo li temaşxanê**
**Heçku we li min û te kirî**
**Digel simaqa pak û şîştî**
**Kete bazarê rikmanê**
**Vê dwîmahyê**
**Yê kiriye ber bejna şkestî kevlojankê**
**" Kitka mîra**
**Yê bi zincîra**
**Ha min berda.."**
**Kutra spî û**
**Xêvî dara azadiyê û**
**Nerme bayê dîmokrasiyê**
**Li Kurdistanê.**

*Kora, 1993*

# Ebdulezîz Hacanî

Di sala 1962'an de, li gundê Avetehlê, nêzîk bajarê Zaxoyê, ji dayik bûye. Xwendina seretayî, navîn û berhevî li gund û bajarên deverê û pişka qanonê li zanîngeha Bexdayê bi dawî aniye. Di sala 1986'an de, dest daye nivîsîna helbestan û di rojname û kovarên Kurdî de belav kiriye. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd bû.

Dîwaneka wî bi navê Deşta dubanê. Pirtûkek li ser folklora Kurdî. Vekolînek li ser jiyan û berhemên Yeşar Kemal, amaden e ji bo çapê. Mixabin ku di roja 10.12.1989'an de, ji egera lêkdana tirumbêlê wexera dawiyê kiriye.

# BEJNA HEYRAN

Ewe roja min çavêd xwe li vê dinê
Tim vekirîn..
Gotineka sist û bêbin diête gotin..
Û vedgêrît..
Ji hîngê were dilê min
Yê xav û hejar kiriye birîn..
Ew roj ji oxa te ye heyran
Demê dibêjit
Hemî bend û lavje û sitran
Bi bijna te diêne gotin..!!
Lê heyrano..
Qet çu cara bawer neke
Ji wê xelkê
Hemî rojê li pey siha te digerin..
Nê heyrano tu bizane..
Ewin bi xudê her dixun
Ji aqarê te hey heyran
Dan û dikak bi dalehî û Bê zalehî
Kes çu cara nabêjit
Tu mêrçakî.
Çima heyran te wekirî
Bejna te ya şeng û zirav
Ji xelkê re evro bûye
Pêtirrank.
Lê mixabin ew nizanin
Çawa hemî bend û sitran
Pê dê êne vehunandin..

**Bila birînêt heyranê min**
**Hemî kêm û tev edav bin**
**Êş û kul û janêt heyranî**
**Hemî dema di serbar bin**
**Laş û birên heyranê min**
**Ji kêm û kasa tev serrad bin**
**Bese bi tinê hogirên wî**
**Li hemî dira**
**Belengaz û derbederêt bêwar bin..!**
**Vêca çawa ew ezmanên tîj û çepel**
**Dê lê gelo seraf xwer bin..**
**Nê her şeva kewçerînê dê lê têtin**
**Leyl û Mecnûn dê bi hev şa bin..**
**Paş de roja qeşeng dêtin**
**Mem û Zîn dê tê de mar bin**
**Paş dê ew hemî zanin**
**Ewên jiyanê bi heyranê min**
**Taloq bikin dê her û her**
**Di şepirze û şermizar bin..**
**Şermizar bin..!!**

## GÎSÎ

Gêleşok e û tehle jiyar
Ketîm tê da
Serê çendî çend salan e
Dozexek e û ne vemirî..
Birîneka di dilê min da veqelaştin
Wa kûr kirin bi koredirbê
Ji kûr maziya babê min
Roj diên û roj dibûrin
Birîna min her diqebin
Wa goginî..
Ne ji qestî van heyama
Ez pê dihesim
Birîna min kermêlên xwe
Dayne hev û nojdar dibên wa sax bûy
Lê şwînwarê wê diyar e
Wê bûy gîsî
Şûna zaxeka kevnare
Her diyar e
Weke derza li ser hestî..

# JIYAN Û SOZ

Dilbera min
Çi zimane ser me hatî?!
Jîna şirîn li me şêla
Em bûn bendê wê kevnekêra
Riswa kirîn
Wek rebenên li ber dêran
Periya min
Çi zirkêtke li me zêra..?!
Mişext kirîn
Şwînwar ma ji xelkê ra
Ne mêşa hingivînî bû
Da ji me ra dawerînit
Wî hingîvê hoz û mêra
Ji te re dibêjim hevalê qirê
Niklê wê her yê di pîsyê ra
Wekî bêra bizna jî
Dibêjin ne çi bêre..
Torîna min
Çend sala ez bijîm bi hejarî
Nabim xizmetkar û bend
Ji koçk û telarên xelkê ra
Hewce nabim çi lêbûka
Poçek û qelse mêra..
Dê bim bevil
Di nav çavêd taşînbetêd vê dinê ra
Bi karwanî ez dê gerim
Li deşt û şax
Û şarqurnetêd vê dinyayê
Nakim çîre.. Nakim çîre
Ji ber hindê sozê didim
Heta navê welatê min
Tim geş nebit wekî stêra
Tena nabim, tena nabim
Heta ku li ser sîngê min
Bihêt xirêna tevir û bêra
Tevir û bêra..

# Beşîr Mizûrî

Di sala 1968'an de, li bajarê Sêmêlê ji dayik bûye. Serî, navî, berhevî li gund û bajarên Asihê, Batêlê, Sêmêl û Duhokê xwendiye û sala 1992'an pişka endazyariyê li zanîngeha Mûsilê bi dawî aniye. Di sala 1986'an de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye, di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Niha jî li Kurdistanê ye.

# DÎLANA HOVA

**Zivistan e..**
**Befrê kumtên çiya girtin..**
**Gurg yê li zozana diçerin..**
**Goştê leşa direnin..**
**Çavbeleka min**
**Ya ji çerxa felekê dibezit**
**Dêw yê bi keftina wê dikenin..**
**Ji sema dileyizin**
**Dema vê nazikê**
**Bi xemla bûkînyê dibînin..**

* * *

**Sar e û dêm xwîsar e**
**Baş diyar e ya li hîviya zêrevan e**
**Ji ser û bina ya dilerzit**
**Pêlêt bayî û tev barova**
**Pirça dav dava reng şevî**
**Bijale diketin..**
**Evan hovan tev dîlan e**
**Dil ji tirsa**
**Evê bûka ho dêm kevî**
**Hizar awaz yê lê dijenin..**
**Hizar awaz yê lê dijenin..**

*Mûsil, 1988*

## HOVÊ TIRSÊ

Ey welatê
Li aşop û xewna min dijî
Çend ez jiyay..
Ey binyatê kelha omêda min
Li ser avay..
Ey werîs vekêşkê
Bo min û bo te.. Bo te û bo min
Û hêj ez ê mayim û tu her yê may..
- Min yê dîtî
Xwîn û xena
Befr û tenî ya têk şêlay..
Min yê dîtî
Dêm û lêvên zerya mina
Bi xend û kenî
Stêra jenî û ewa damay..
Roja kelî, ewa li bin may..
Bûka bi hîzar
Hovê befrê lêkir nîhar
Tu her yê may..
- Ez ê ditirsim
Tu welatê ji cergê xema
Bi eşkence û jan bo yê zay..
Heta niho xewna min bûy
Demê elinda spêda xewna min
Hatiye pêşçav ji pişta çiyay..

**Gelek xewn min bûne rast**
**Lê gelek rast jî min bûne xewn**
**Ne. Welatê di hestê min da**
**Bi seng û hêjay..**
**Nekey zincîra şanoya xem û jana**
**Ya bêjîna li me nû key**
**- Ez ê ditirsim**
**Bi destê Reşoy**
**Rêdîn Reşoy**
**Bi destê Rîtoy ne helweşyay..**
**Evro bi destê çend ji van serkofîka**
**Reşkey li xemla bûka**
**- Warvanîno hay hay..**
**Neken dexil û danê hinde sala**
**Bi xwînê avday..**
**Bikene pîş û bidene bay..**
**Bikene pîş û bidene bay..**

*Zaxo, 1992*

# ŞANOYA BÊJÎNA

*(Ji şehîdê nemir Ebdulrehman re diyarî ye.)*

**Hêşta birîn sar nebûye..**
**Û hêşta xwîn ji erd neçûye..**
**Hişk nebûye..**
**Heftê û pênc û**
**Heştê û heşt û**
**Nohet û yek**
**Zincîra şanoya**
**Jîna bêjîna hêj berdewam e**
**Jîn xewnek e û rast nebûye.!**
**- Rêvîngê rê ya dûr.**
**Ne ew bi hizir û ne tu bi bîr.**
**Ne weku ji mirovan vexarî şîr.**
**Di mejyê serê te da**
**Agir jenî.. Rejî û qîr..!!**
**- Ji kiloxê serê te**
**Hêşta dibarî mejî û xwîn**
**Sor û kel..**
**Û hêşta rûyê te yê pît û pel..**
**Birîna te ya germ û kel..**
**Hevrêyê te pare dihijmartin**
**Li hindavî serê te..**
**- Erê siwaro**
**Evro li xopanê welatê min**
**Xudê bûye dolar..!**
**Soper bûye narînka dilî û**

**Berdilka nazdar..!**
**Û ji leşê belengazan**
**Xwîna bûye mey**
**Cam pirr dibin**
**Ji min û te yê jar..!**
**Û hêj hevalo**
**" Kew dijminê serê xwe ye.."**
**" Kirmê darê**
**Ew nehiştiyê dara xwe ye.."**
**Nê hêşta dijmin wê he tîse û**
**Welat go ye..!**
**Hêşta dijmin wê he tîse û**
**Welat go ye..!!**

*Sêmêl, 1993*

# Serbest Nalbend

Di sala 1964'an de, li bajarê Amêdiyê ji dayik bûye. Serî, navîn û berhevî her li wî bajarî xwendiye û di sala 1984'an de, peymangeha çandiniyê li Bexdayê bi dawî aniye. Di van salên dawiyê de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Niha jî li Kurdistanê ye.

## ÇI NEMAYE

Mîrê duhî ewê bi xo
Bi gurgînyê biriye serêk
Xo kiriye cangîr û rêk
Hero xo kiş dikir û xo dihavête
Evî û yê he
Zik dirrandin
Pirt pirt kirin
Hestîkên wan
Bi kêlyên kîfkî û jehir kirî
Dihincinîn
Lêv kirrandin
Gelî bira çava veken
Temaşaken
Yê ji gurgînyê evro ketî
Ewê berî noke tu ne diwêray
Xo nêzîk key
Te xo jê diveşart û jê dikirî
Yê ketiye ser kurya xo
Her kesê hat dest lê hejand
Û lê xurî
Çi ne maye ya nêzîk bûy
Bernedanî û jê nerevî
Davêt jînê û azadiyê
Te yêt girtîn
Ya te bivêtin dê pê kevî û
Dê pê kevî.

*Amêdiyê, 1991*

## EZ Û CÎHAN

**Cîhan rabe bira**
**Berê xo bike evê dinê**
**Yêt bûyn mêvan**
**Li kumtikêt pêşkeftinê**
**Li ser banê geşok heyvê**
**Virra li xo diden**
**Xo dihejînin û yê dibêjin**
**Hejî jînê**
**Ez...**
**Rast e.. Rast e**
**Hingin mirov**
**Xudan mejî û hizir û kilox**
**Bawer biken û ji bîr neken**
**Ger hîn li cihê me ban**
**Biban heval digel şera û**
**Digel xwînê**
**Ev qonaxa evro em lê û gehiştînê**
**Ew jî bi dest we ne dikeft**
**Bi dest we ne dikeft..**

*Amêdiyê, 1992*

## HELEBCE NAHÊT JI BÎR KIRIN

Bila gelo hemî zaro
Gorî rengê reş landika Helebce bin
Ewa bi zaro ve
Bûye rejî û hatiye sotin
Bila gelo hemî zerî
Hemî dildar, hemî perî
Gorî bejna zavayekê Helebce bin
Ewê di nav periya da
Mayî û jehrê sotî
Jehrê kuştî
Govend, serkêzavay
Bo nehatiye kirin û gotin
Bila gelo hemî xêzan
Gorî mergê xêzaneka Helebce bin
Ewê hatiye vebirandin û binaxkirin
Bila gelo tev karesat bi semfonî ve
Gorî dengê semfoniya Helebce bin
Ewa bi awazêt qîje qîjê
Nale nalê û bi giryê hatiye tomarkirin
Her dê bêjîn
Helebce.. Helebce
Rast xogeh û sûnda mezin
Ji bîr nakeyn
Çicar nahêt ji bîr kirin..
Ji bîr kirin..

# Şemal Akreyî

Di sala 1967'an de, li bajarê Akrê ji dayik bûye. Serî, navî, berhevî her li wî bajarî xwendiye û di sala 1990' î de, pişka Ingilîziyê li zanîngeha Mûsilê bi dawî aniye. Di van salên dawiyê de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Niha jî li Kurdistanê ye.

# SERHILDAN

**Serhildan bû…**
**Agir û vulkan û dozex**
**Neyar kirine terim û kelex**
**Erd li bin pêt welatgira lerzandî!**
**Serhildan bû…**
**Çavên Ehrîmenî û pirr şer**
**Di serên sîxurên rûreş da rijandî!**
**Serhildan bû…**
**Vî gelê merd**
**Gelê sîng asin û pîla**
**Biyanî û havî**
**Dehbe û hovî**
**Li deverên Kurda**
**Bi hêza mil û zenda**
**Qirrandin û vebirandî!**
**Serhildan bû…**
**Li seranserî Kurdistan**
**Gel kiriye yek hêz û şiyan**
**Cotyar, pale, rêncber, genc û pîr**
**Bi teveng û das û bivra, bi gopala**
**Şagird, fermanber, roşenbîr**
**Bi sirûd û navlêdana**
**Bi yek dil û giyan**
**Bi yek soz û peyman**
**Tev bûne bahoz û gulle û ba**
**Dijmin radan**
**Têkra werkirin û badan**
**Tev rihên wan yên şêrpenceyî**
**Heliqandî!**
**Serhildan bû…**

**Babagurrgurr bi hêrişeka gerim û gurr**
**Li ser bingehên dagîrkera azirandî!**
**Serhildan bû…**
**Tev amîrên gevandinê**
**Ji kêbil û kelbetana**
**Ji zîndan û girtîxana**
**Pirtikandî û bijikandî!**
**Serhildan bû…**
**Mizgîniya serbestiyê**
**Mijdeya serferaziyê**
**Bi gelên bindest ra**
**Gelên azadîxaz ra gehandî!**
**Serhildan bû…**
**Bişkojên gula hîviya**
**Yêt vebûyn**
**Fend û şemalên ronahiyê**
**Yêt helbûyn**
**Ev gelê herdem berxweday**
**Novejandî!**

*Akrê, 22.3.1991*

## SÎXUR

**Sîxur marekê bê kevlojank e**
**Bi ser û sîmaya ve mirov e**
**Lê ji hov û dehba wêvetir e**
**Berovajî..**
**Xo tê digehînît**
**Rewişt û nerîta dipirtikînît**
**Sexmerat ez ezê û**
**Berjewendiya kesatî**
**Alayê ne pakiyê diçiklînît..**

*Akrê, 22.3.1993*

## DÎROK

**Dîrok her çibît**
**Tevnek e pênûsa yê raçandî**
**Çi çak.. Çi xirab**
**Heryek aşê xo digêrît û dibêjît:**
**- Min ya nexşandî**
**- Min ya xemlandî**
**- Min ya vavartî û helsengandî**
**Kes jî nabêjît:**
**- Min ya pîskirî û herimandî**
**Çinku dewê hemya yê şêrîn e !?**

*Akrê, 25.3.1993*

## BÎR Û BAWER

**Ger bîr û bawera..**
**Ramana ferhengî jê firî:**
**Welat…**
**Dê bîte peyveka sakar**
**Pêşmerge…**
**Dê bîte navekê jar**
**Kurdayetî jî…**
**Dê bîte kursîk..**
**Soper û dolar!!**

*Akrê, 25.6.1993*

# Luqman Asîhî

Di sala 197'ê de, li gundê Asîhê, nêzîk bajarê Sêmêlê ji dayik bûye. Serî li gund, navîn û berhevî li Sêmêlê xwendine û di sala 1993'yan de beşê Ingilîziyê li zanîngeha Selahedîn li Hewlêrê bi dawî aniye. Her ji sala 1988'an û vir de, dest daye nivîsînê. Helbest, kurteçîrok û gotarên edebî jî, di rojnamên Kurdî de belav kirine. Niha jî li Kurdistana Başûr e.

# JI LAPERÊT BIRAKUJIYÊ

**(1)**
**Her şev termekê têt**
**Babê min e?**
**Yan termê birayê min e?**
**Yan yê min e…**
**Bi destê xwe hatim kuştin!**

**(2)**
**Her şev**
**Her maleka gundê ez lê**
**Sêdarek nû diçiklîtin**
**Spêdê radibin**
**Malê xirê helawîstî**
**Pê ve dibînin**

**(3)**
**Her şev**
**Tivengeka bi xwînê jengî**
**Di Bemoy re şahî kirî**
**Û di Metînî ra cengî**
**Ya bi destî çend şoreş hatine kirin**
**Duhî li ser milêt du kesa bû**
**Ber bi goristanê dibirin.**

(4)
Digotinê Hogir
Pêşmerg e bû
Çiya bi serê wî sond dixwar
Demê gelî tengav dibû
Gazî dikir, Hogir hewar
Hogir bilind bû, bû esman
Lê ku Sultan
Erşê wî ji binî hijya
Hogir jî mir.

(5)
Yek şehîd
Du şehîd. Sed şehîd
Tabotek
Pateyekê yek reng
Tabot peqî, şehîd hat der
Ûbo debeng.

## ŞEVÊT MIN

Hemî şeva di xewa min da
Ez dixewum û
Tu ya li himbêz min razayî
Tu dibêjî maka te me
Û Xudê ji nû tu ya dayî
Te bi sîngê xwe ve dişidînim
Hind dibînim
Ez şiyarim û tu li wê dinya min nemayî

*1993*

## BO KWÎSTANÊ

Eger min jî wek hemiya
Çavêt Zînê peristiban
Ji kezyêt Xecê
Du-sê hozan min ristiban
Destêt min jî
Di paxlêt herduka da nivistiban
Têr xew biban
Xanima min
Evroke jî
Ne ez dibûm befir û kevî
Ne tu dibûye kwîstan

*1993*

## EVRO SUBE

Dem: şev e
Cih:şarekê bi tirs û rev e
Babet: Termek e li ser milêt çara
Terim: Ez, tu û şarê min e
Darbest: Kevne tuya
Nav rezkokê babê min e
Hizir: Biyaban e
Deryayek bê rex û rû ye
Deng: Dengê dahol û zirna ye
Pêjna serhildanek dî ye
Pêjna serhildanek nû ye

*1994*

# Hîvî Berwarî

Ew di sala 1963'yan de, li Kurdistana Başûr, ji dayîk bûye, lê em nizanîn li çi cihî. Li Duhokê xwendiye û her li wêrê xwendegeha mamostetiyê bi dawî aniye. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Di mîhrecanên edebî de helbest xwendine. Heta niha çi dîwan çap nekirine. Bi tenê çend helbestên wê li ber destên me hene ku, ji xwendenanan re bikine diyarî. Niha jî li Elmanya ye.

## XEWINROŞK

**Dihî gelo**
**Hêj roja bilind, roj nîvro**
**Cîhan dikenî**
**Cot çavêt min**
**Di xew temarekê werbûn.**
**Min dît çiyayêt me ker bûn.**
**Biharê xulkê xo êxist**
**Kanî hişik bûn.**
**Erd kelişt û xurte rûbar**
**Xeware bûn.**
**Zom û zozan têk de hijyan**
**Kuçk û bêla**
**Ser û bin bûn.**
**Li pirêza Xanê Lepzêrîn**
**Hizar birîn pêkve der bûn.**
**Hizar birîn pêkve der bûn.**
**Min dît şenge**
**Bejna zêrîna pir delal**
**Befir lê barî û sirê bir.**
**Roj û şevan**
**Destêt têk da**
**Li hindavî me pêk hatin û**
**Rojê guhdarya şevê kir.**
**Burca Belek**

**Armanca nêçîrvanan e û**
**Tivenga mîrî lê tir kir.**
**Di wî demî de**
**Xabîr hat û bêhin helmay**
**Li aşûpa min bo mêvan û**
**Gazinda xo**
**Ji vî çerxê neliv rakir.**
**Dûr, dûr min dît mêkutran jî**
**Per lê di reş in**
**Kofî bi tenê**
**Nêrgiza mesta Cizîrî**
**Lê hewar e û**
**Ha dê bi ser de hêtin renî**
**Ji niviştoka**
**Bi tenê benda doza Qazî**
**Perîşan e**
**Li jêr sola Ehrîmenî**
**Bihara Pîranî di tev de**
**Kesk û sor, li hindav werîse**
**Bi gerdenêt zelal dikenî.**
**Bo gerdenêt zelal dikenî.**

## DÎSAN PISYARÊT HERRO NE

Erê gelo
Dîsan pisyarêt herro ne
Dubare diken
Berhingarî bersiveka
Bêdeng diken.
Car dê bêjin ma kengî ye
Şehyana te?
Çi ye qelenê giranî
Hejiye bo te?
Kanê hespê zîn kiryê li bin pêt te?
Dê kengî xwîn
Şirînya berhavêşkê te
Lê ev pisyarene gelo
Divêt li hewe bi xo bizivirin.
Kara bersiva wan pir
Li nav kuçk û dîwanêt
Hizra we da vepijikin.
Nê divêt hîn xwazgînî û dawetî bin.
Dîsan hewe çante û xuroçk
Ji diyariya û berhavêşka
Di tijî û di pirin.
Kê gotiye?
Av li devê zuha geryayî
Dirêjerêkî li ber rêvîngî
Xo bo şikandî û pêngavek jî

**Li dwîf berday.**
**Kê dîtiye?**
**Kirêteqiralê şevê**
**Ji hespê xo peyabûy,**
**Bêy weşandina gurzan û kirandina beran**
**Ya kêm li ber xurtemîrê**
**Rojê deynay.**
**Divêt gelo**
**Ji bo kirina van pisyaran**
**Hest û hizrên hewe biêşin.**
**Ji zana wan bersivan**
**Lêvên hewe**
**Tehlatyê fir ken… Bimêjin.**
**Keda xo li ber sîngê tev**
**Nedan û girane mihana**
**Bihelavêjin.**
**Wê gavê ji nûka dê pişt rast**
**Şirînî û berhavêşka hwîn**
**Bi ser serê xo ve havêjin.**
**Dê havêjin…**

## EZ DWÊRIM

**Babo min neveçixîne**
**Rêya min bike**
**Dwêrim min netirsîne…**
**Ji vê wexerê**
**Ne bêje min:**
**Rêka te pir helamet e**
**Babo bo wan…**
**Reşeka nê ez ya fêrim**
**Dê gotgotkêt xelkê nezan,**
**Dem bin piyan**
**Teva hêrim.**
**Ez narînka**
**Xanî ji bûka me re gotî**
**Min ya ji bere dê vegêrim.**
**Nebêje min:**
**Keçê rûne**
**Te hêz nîne**
**Ez Xabîr im pirî pêl im**
**Serevraz û nişîviyan**
**Hemya dem ser û dê hêlim.**
**Hemî şîva**
**Bi gêsinê ûmêda kêlim.**
**Ez dê kêlim.**
**Babo ez jî**
**Wek belatînka pernexşîn**
**Sexmeratî**
**Li ser Memoy dem û xo kujim.**
**Yan jî her carekê felek**
**Dê bi rastî zivirît**
**Wê gavê,**
**Babo ez dê bîra te înim.**
**Serê xo beramberî te,**
**Bilind kem û girnijim.**

## DIHÎ Û EVRO Û SUBE

Dihî hêdî min xo berda
Nav cîhanê û silav lê kir.
Li dîf têhin û germa rojê,
Min serê xo
Bilind rakir.
Ji bo man û têr bişkurîna jînekê,
Min xetîra dozê helkir.
Belê ne cîhanê ji dil
Xoşî û bi xêr hatna min kir.
Ne jiyanê,
Çavê xo ji min re vekir.
Ne rojê
Ji başî û dewlet serê xo
Ber kêleka min gerim kir.
Her li dihî ez bo evro
Digirnijim.
Lê evro jî kirêt hat û
Wek dibînin
Ya xo di karê şevê pêçay.
Kevlojankê pîrhevyeka xapînok jî
Yêt ser serê xo de deynay.
Pirêza bi dest hizar Cengîzan ve berday.
Ew dêmê sipehî yê
Hemî jê diaxiftin
Min dît tev yê nikrandiye
wê kîna reş hemyê kêlay.
Hemyê kêlay.

**Ez dibînim...**
**Evro Kabîs**
**Deng û pejnêt min diqutin**
**Agir û dozexe kenî û**
**Biharêt min hemî sotin**
**Bazirgan e û**
**Kezyêt min dest de mitane**
**Bêbiha û erzan firotin.**
**Lê evro jî**
**Mîna roja goyînê bû**
**Sube dikenim.**
**Asinî bi sarî diçemînim.**
**Min çav lê ye sube bêt û**
**Wî sîngê xo**
**Bo min bikete nermearmîş**
**Da vî serê mest**
**Têr û her li nav bigêrînim.**
**Min çav lê ye sube bêt û**
**Dêmê xo ji min re bikete koz**
**Da van xozyêt xo yêt sava**
**Li nav biçerînim.**
**Eger hat û li min zivrî û**
**Bo min kenî**
**Dê cîhan û jiyan herdu**
**Ji min aşt bin.**
**Pêş min ve hên.**
**Ez ê ji nûka bi tenahî**
**Dê di navbera wan de rûnim...**
**Dê di navbera wan de rûnim...**

# Rêkêş Amêdî

Navê wî yê dirust (Zekî Mehemed Sedulla ye). Di sala 1956'an de, li havîngeha Sîlavê, bajêrê Amêdiyê ji dayîk bûye. Li Amêdiyê xwendiye û li sala 1977'an xwendegeha mamostetiyê li Duhokê bi dawî aniye. Her ji sala 1975'an û pê de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di kovar û rojnamên Kurdî de, belav kirine. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Di sala 1985'an de, yekemîn dîwana xwe bi navê “Lê venabim” çap kiriye.

Dê çend helbestên wî jî, ji tîpên Erebî wergerînîn yên Latînî. Niha jî li Kurdistanê ye.

# XOZÎK

Xozîka min… Ho xemgînê
Îro li kîvey!
Ne kehiyê… Ha kîviyê
Gaziyêt min… Qêriyêt min
Nagehne te
Tu kîve çûy?
Tu li kîve may?
Hêjta min her tu ya di dilday
Çenda ji gundê me dûr bî
Çend vemînî li bajêran li xerîbiyê
Çaverê me, yê bi ûmêd im
Min mirad e
Min ûmêd e
Xozîka min te nebînim
Gazindêt xo
Yêt vî dilî
Ez bo te hemyan vehînim
Qawîşa zêrê ku te viya
Di gel nîşaniyê bo te bînim
Li navtenga te
Soreşalekê bialînim
Wekî bûkan
Ez te bi van destan bixemlînim
Di ber pirça te
Wê pirça reş
Zer nêrgizekê biçiklînim
Çunkî dilber min ûmêd e
Ev sal nebît
Dehêt dî bin
Ez dê her te bi xo bînim
Ez dê her te bi xo înim

*Amêdiye, 12.9.1977*

## LÊ VENABIM

Lê venabim ha torînê
Li ser wê soz û evînê
Soza vîna Mem û Zînê
Ha nêzîk bû dê gehînê
* * *
Zû were hinde buhar e
Nû xemla te taze  kar e
Ku ya bi nav û dengan diyar e
Bûkînya te ya ev car e
* * *
Te nahêlim şirîn canê
An tu an derdê nemanê
Dê av dem bi xwînê viyanê
Tu yî xozîka min li jiyanê
* * *
Berbû yêt bên dê di gel mînin
Em taze dê wê xeml înîn
Dê keyne bûk bo te înîn
Da ji nû jîna xo vejînîn
* * *
Torîn tîrojka van çava
Li min bizîvire eva gava
Da veçemînîn belava
Rizgar keyn wan ji tenge dava
* * *
Dosta jînê xo kar keve
Lez bike tu bizivireve
Çavêt tarî rohin keve
Bêy te cîhan nê li me eve
* * *

*16.11.1977*

## DÊ HÊMEVE

Dê hêmeve yarê dê hêm
Yêt vî dilî hemyan dê bêm
Lezê neke noke neşêm
Bizane ya may demekê kêm

* * *

Jêk dûrbûna me ya fer bû
Me dizanî dê bît û her bû
Piştî bûy ji nû kul li me derb
Û kêma wê kulkê berbû

* * *

Dê hêmeve bi xelatan ve
Ew xelat bo hemyan nav e
Nêzîk bû dê hêt ew gave
Xoşî bizivirine dila ve

* * *

Dê hêm û têr dê min bînî
Bi dil şadî dê di gel min rûnî
Demê dîroka min dixwînî
Dê tu serhatiya jê stînî

* * *

Ez bo dildariyê û evînê
Dê xena kem tibla ji xwînê
Çunkî em dê her gehînê
Ew titê ji xir dilî diçînê

* * *

Dê înim mafê bilbila
Yê sera day xwîna dila
Ji ber paşerojê digot bila
Ku bi mafî bikewînin kula

* * *

**Ev rojêt em herdu jêk dûr**
**Ne bêje çûn deryayeka kûr**
**Dê vebişkivin dilê pîr**
**Demê dibî xatûn û ez mîr**

* * *

**Dê zanî her evîndar im**
**Ez ewê par û pêrar im**
**Qeydî nîne, neyê diyar im**
**Ji evîna te herê bibar im**

* * *

**Ji bîr nakem vîna wan salan**
**Navê me bir hemî alan**
**Bûyn mirada hemî malan**
**Ji genc û ciwan û tefalan**

* * *

**Hemî evîndarêt dinê**
**Bi me hesyan wey xwîna min ê**
**Ku dê her bo min bî bi tinê**
**Gelek hez diken ji vê gotinê**

* * *

**Ciwanê neyarêt me hemî**
**Her dê lê wergeryên gemî**
**Belê heta xoşya demî**
**Vêca çima tu ya bi xem î**

* * *

**Desta berde ji kevne xema**
**Tu ba bawer bike hema**
**Bo daweta me çi nema**
**Xema nexo pîçek vema**

*Bexda, 18.2.1978*

## XOZYA DILAN

Hedara min…
Xozya dilan
Ger bizanim zîndana min
Ji zîndana Memê Alan e.
Ger bizanim…
Nexoşya min
Ji nexoşya Hesem Axa ye.
Ger bizanim…
Bêgara min
Wek Ferhadî
Sumtin û kunkirina çiya ye.
Ger bizanim…
Dûmahya min
Wek Siyamendî
Sera nêçîra kîvya ye
Te na hêlim
Min pê çênabît te pêlim
Xozya dilan
Nê xwîna min û teyeke
Nikarim ku te bihêlim
Hedar çunkî…
Mêşkê me herduwan ji yek e
Hedara min…
Hindî te bivêtin ji xwîna min
Xo nevegire

**Bîne tirarê xo têke**
**Xem revînê**
**Gazya dilan**
**Eger jî tu ya birsî bî**
**Ji min şerim neke**
**Ji cergê min xwarna xo çêke**
**Hedara min, xozya dilan**
**Te nahêlim**
**Rêka çend sal e tu li ser çûy**
**Bi Xudê ya min jî ew rêk e**
**Pêkê meya te vexwarî**
**Bizane yê min jî ew pêk e**
**Vêca çima dê te hêlim**
**Te nahêlim...**
**Te nahêlim...**

*29.5.1978*

# MIN GAZÎ YE

**Îro min ji gencan gazî ye**
**Da bom bêjim**
**Girtina derokêt xeman**
**Pêdivî ye.**
**Bizava pêşveçûnê**
**Ew erkê her kesekî ye.**
**Qed nedanin**
**We nebêjin**
**Yê pê radbît ku ew bo wî şanazî ye.**

* * *

**Bila bigirin derêt**
**Êş û janan...**
**Bila biden**
**Ew çak biden**
**Ji jiyanê re peymanan.**
**Ba derkevin ji taratiyê**
**Xebatê biken**
**Qemî ew jî bigehine zana.**

* * *

**Hemî xelkê**
**Gehiştiye stêrêt asmanan.**
**Belê hêş em derdeser in**
**Evroke me kulke xanî.**
**Bizavê biken**
**Ez bi Xudê kem**
**Ya bê wuce pêşemanî.**
**Min ji mêje swînda xwarî...**
**Ez bo mirovayetiyê**
**Binax kem evî giyanî.**
**Vêca bira...**
**Tu bo tembeliyê xudanî**
**Tu bo tembeliyê xudan**

*Amêdiye, 13.8.1978*

## EZ JI BÎR NAKEM

**1**

**Te ji bîr nakem**
**Lawê min o te ji bîr nakem**
**Te xatir xwast**
**Xatira dirêj**
**Evro ji min xwast**
**Tu çûye ewê rêka rast**
**Te xatir xawst**
**Ji hemî kesan**
**Ji ewa dilan**
**Yêt te hwî kirîne vînê**
**Ez jî yek im ji wan dildaran**
**Heta dimirim**
**Dê ez navê te perêsim**
**Şeydayê rêka te bûm**
**Min ê gotî**
**Ez dê bêm hemî caran**
**Navê te bû**
**Rengê te bû**
**Yê ku pê pêşkeftî vara**
**Dengê te bû**
**Yê deng veday li dar û baran**
**Yê bûye rêkeke bi rewneq**
**Bo hemî sêwî û hejaran**

**2**
**Dê bîra min li te hêteve**
**Demê çîçik li spêdehyan**
**Awazêt azadiyê dixwînin**
**Demê ew tolazêt girtî**
**Deybabêt wa ji xerîbiya de**
**Ji kerbêt wan rojêt nexoşî**
**Her ji dûr ve ji dilekê xerîb**
**Xo di cegera xo diwerînin**

**3**
**Dê bîra min li te hêteve**
**Demê şivan...**
**Stran û lavjêt xoşiyê**
**Dubare diket û dibêteve**
**Demê bêrîk...**
**Kevne meşka xo dikêteve**
**Demê zarokêt me Kurdan**
**Alayê ciwan**
**Nû alayê azadiyê**
**Bilind diken**
**Dikene gazî**
**Dibêjin gelo**
**Agadar bin li mizgîniya me**
**Dê bîra min li te hêteve**
**Demê cotyar...**
**Posîde dibît û ditingijît**
**Radibîte talba dijminan**
**Bi dengekê xurt**
**Dikete gazî**

**Dijmino erdê min bideve**
**Ronahî dikete hewar**
**Ya dibête şevreşê bireve**
**Azadiya...**
**Dibêjîte zordariyê**
**Rabe bes e**
**Tu mala xo ji vêre bibeve**

**4**
**Çavêt milletî di kore bûn**
**Tu bûy te lê rohin kirîn**
**Milletê me**
**Milletê jar**
**Çend bû di xeweka kûr de bû**
**Tu bûy ku te**
**Ji xew rakirîn**
**Te viyan nîşa hemyan da**
**Bo welatê me yê şirîn**
**Te diyar kir û gote me**
**Divêtin gulê av bidet xwîn**
**Eger em berhev nekeyn**
**Bo astenga**
**Stiryan di rêka xo venedeyn**
**Dê patka xo dete me jîn**

*Yekmale Berwarî,*
*25 26.3.1979*

# SED MIXABIN

*Diyarî bo giyanê Vehêl Amêdî*

**Sed mixabin**
**Ji bêdereka pirî dan**
**Hureba bêt û bibijînît**
**Bi herwe biçît**
**Ew cotyarê belengaz**
**Çi danî jê nehelînît**
**Lewma li ser me pêdivî ye**
**Xo bikeyne dan**
**Da ku cotyar**
**Zarokêt xo pê xodan ket û vejînît**
**Mêhvan û rêvîngêt rêka**
**Çendika wa bê nan nemînît**
**Sed mixabin**
**Ji kanyeka bûş**
**Dijminek bêt û bipeqînît**
**Ava wê biçîte bin erdî**
**Kesek mifay jê nestînît**
**Hişik bibît**
**Rezê li ber kaniyê**
**Xudanê wî**
**Çi berî jê nehelînît**
**Ew qanebir**
**Beyar bimînît**

* * *

**Sed mixabin**
**Stêreka geş birijîtin**
**Li esmanekê tarî û reş**
**Ew karwanê**

**Li ber kewçerê**
**Rê û rê diçît û diçerîtin**
**Bi serê wan werbît xolî û heş**
**Dê bila şwîna wê stêrê**
**Sikitî ban sed rû reş**
*** * ***
**Sed mixabin**
**Parkerê nû ku bişkêtin**
**Berî ku ew**
**Xwîna leş û demarêt xo**
**Ji bo vî milletî birêtin**
**Êş û azarêt bêkesan**
**Bo binvîsît û vekêtin.**
**Sed mixabin**
**Kewrubadê**
**Li serê çiyayekê dixwînît**
**Nêçîrvanekê biyanî**
**Ji wêve bêt tivenga xo**
**Lê bişeqînît**
**Deng û awazêt wî kewî**
**Ew li me hemyan bibirîtin...**

*Amêdiye, 16.6.1982*

## KIRISMIS

**Belê belê**
**Ev şeve ye li tim bajarêt**
**Vê cîhanê**
**Kirismis e**
**Hemyan dawet û şahî ne**
**Guhê hemyan yê li wê gavê**
**Zengila diwazdehê**
**Deng vedet**
**Wa di gel jivan û evîn e**
**Çingçinga pêkêt meyê**
**Û dengê dehol û zirnan**
**Û bistirîna stranbêjan**
**Hemî dîwan vegirtîne**
**Hemî serbesta li cîhanê**
**Xatir ji nexoşya xwastîne**
**Belê ka hink**
**Werin gelo…**
**Me bibînin**
**Di vî çerxî de, çerxê bîstê**
**Her di gel nexoşya evîn e**
**Nê şwîna misk û emberan**
**Were binêrê**
**Hemî kevir û çiyayêt me**
**Evroke baran e, xwîn e**
**Ne ku salê**
**Bes carekê**
**Ne rojekê… Ne heyvekê**

**Sê sed û şêst û pênc rojan**
**Her ewa tazî û şîn e**
**Li hemî bajêrêt cîhanê**
**Salê carekê şevbêrîn e**
**Zarokêt me**
**Hemî şeva ji bilî rojê**
**Şevbêrîn e**
**Belê mixabin ho gelo**
**Ew kesê têr**
**Hîç hay ji yê birsî nîne**
**Her kesê azadiyê dixwazît**
**Sêpêk û zîndan û kuştin**
**Hemî xwînxwar**
**Bê goman dijminên wî ne**
**Deh kes xanyekê ava ken**
**Panzdeh Bekrok biherifînin**
**Nê çi cara ewî xanî**
**Çi dûmahîk nabît, nîne**
**Min hîvî ye ji çend hejaran**
**Ji tim bêkes û bendewaran**
**Ji hemî...**
**Li vêre bin anku li çi waran**
**Hemî rabin**
**Bibine yek dil**
**Tembeliyê çi wuc tê nîne**
**Kerb û kîn û xwîndariyê**
**Çi pêşkeftin tê de nîne**
**Hizra xo biken**
**Nê hindî...... li cîhanê**
**Ez bi Xudê hemî Arî ne**

**Vêca bes e, bila bes bît**
**Eger hemî**
**Em hemî ku nebîne yek**
**Me Kirismis**
**Xwîn riştine**
**Xoşî û lezeta ji warê me**
**Herdem ji me xatir xwastine**
**Ne bîne yek**
**Nê me çi rêka dî nîne**
**Hindî zikreşek hebîtin**
**Yê tembel bîtin**
**Nelivîtin**
**Nexoşiya nehewînîtin**
**Dê azadî berpêkêt xo baş girêdet**
**Dê kete xwar**
**Ji ber revîtin**
**Hindî ku ew bêhna xo bidet**
**Ku hevalêt xo bînîtin**
**Hevalê wî jî ew kes e**
**Ku sêdarê dihebînîtin**
**Dergehê xo**
**Ji bo nexoşî û xebatê**
**Taq têlîtin**
**Da azadî biçîte jor**
**Wê nexoşyê derêxîtin**
**Ger xebat dît**
**Dê ji dil xo tê werînîtin…**

# Selman Kovilî

Di sala 1953'yan de, li gundê Rûstînkê ji dayîk bûye, lê ew xelkê gundê Kovilî ye. Li Zaxo û Duhokê xwendina seretayî û navincî xwendiye. Ji sala 1973'yan de, xwe bi nivîsîna helbestan ve mijol kiriye. Di sala 1984'an de, helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Heta niha dîwanek bi navê “Werne Evînê” çap kiriye. Mixabin ku sala 2002-ê wexer kiriye.

## BO KÊ BIQEBÎT EV MÊKEWE?

Nebêje min…
Ez ê çûm û te divê newe
Çirayê min çirîskeke
Ne roj roj e
Ne şev şev e
Hêlîna min ya vala ye
Xwarina min tehl e û dira ye û
Kutil, dew e
Bo çi bimînim!?
Xo li çi bigirim!?
Ne teşî ye ez werbadem
Ne distar e… Bi xo badem
Ne pirêz e, melok hebin
Ne cinîk e, avdan hebin
Besê ye û her wê çewçew e
Teto ye û şûla wî xew e
Bo kê bixwînît
Bo kê biqebît, ev mêkewe!?

* * *

Nebêje min xo nedade
Xo nebade
Sor û şîna bi xo re nerade
Teqteqa şimka vê Zînê
Bîthovine…
Xunava li ser rîkê Zînê

**Miskê Diyarbekir û Sine...**
**Golalyê di berdayn Zînê**
**Merezê Zaxo û Şermine...**
**Xelkê diêt û fîtya didetê**
**Zîna li ber te, bûye çin e...**
**Çi peymana bo te bidem,**
**Te domîne mal û jin e...**

*** * ***

**Nebêje min, te bîr têtin?**
**Xuzya berê**
**Bo çi ye şîrê bi kelem ve?**
**Bo çiye, navê bi Etem ve?**
**Vê pepokê tu nabînî**
**Nizanît rengê defterê**
**Tu nabînî xêliya min**
**Xelkê çûye ser Qemerê**
**Nabînî çitov bihar e!!**
**Sêran e xelkê deverê**
**Ka çi bêje min...**
**Çi pê ve têt**
**Hinde sal e**
**Te çi xwar ji berê bêderê!?**

*1984*

# GAZIYEK

Canê guharan biavêje
Ne ji reng te ne
Nizanî mîna guharan
Bilbil û kew, çend pê ve ne
Dê biavêje binê dolan
Binê solan
Mixabin va nêrgiza, ter û tolan
Nê xunava ketî rûyan
Pê ve behî şirîn gezo
Kuştim û sotim bişkojan
Çi di xoşînkin jaro ez-o
Zava ne û nabine zava
Tevinpîrk in, neşên davan
Yarêd binefş û gulolan
Pîkê xweşkin û deholan
Bihar hat û li zivistan û li havînan
Veken tolan
Veken tolan
* * *
Canê dewat nebî çi ne!
Bila bes bin
Parîxwerê bi çav şûreyê
Ew parî bi reş û heş bin
Ev rûkêd ho zer û lawaz
Avê bidê... Bila geş bin
Û pavêje wan bazinan
Ne ji reng te ne
Biavê binê derya xeman
Ne hejî govenda me ne
Bi avê li enya agir bide
Bêjê nerimtî gor bide
Mixabin va nêrgiza, di bê xame ne
Mixabin evîna Memê
Rêka pir mar û dehbe ne
Bihar hat û hêj zistan û

**Hêj havîn û**
**Guhar û bazin yêd te ne.**
**Guhar û bazin yêd te ne.**

*** * ***

**Cana minê...**
**Çend keser û xem me xwarin**
**Hêjta bi paşîv û fitar in**
**Ma nizanî?**
**Seyran û sema divê hebin**
**Di hejî te ne**
**Çendî nêrgiz û bîtanok**
**Şirîn û xelatê te ne**
**Çend Mem hene, Wek vî Memî**
**Xwazgînî û dewatiyêt te ne**
**Xenayê bîne bide kiçkan**
**Dewatî ne**
**Berdeqanya bide zirkuran**
**Nêçîrvanêt bijartî ne**
**Xetîra bide dest pîran**
**Çira bide dest feqîran**
**Û pêl bide**
**Qêrya vede**
**Sîrya vede**
**Xo biavê kakilka dilî**
**Xo biavê bîbîka min de**
**Bihar hat û**
**Şûla bêrîk û şivanan**
**Gidegid e**
**Bihar hat û**
**Rwîkê zistan û havînan**
**Rengê biharê tê bide.**
**Rengê biharê tê bide.**

*1984*

## ÇAVÊN TE

Çavên te mîna mizgeftê
Hindî nivêja lê bikem
Ez ê sofî her dê êmê
Mîna sûlav û cocelan
Evê tehrê…
Ez ê tênî her dê êmê
Mîna perdaxeka pir mey
Evî dilê maka xeman
Dê bi ser de kem
Hindî hişyar ez neşêmê
Mîna stêra gelavêjê
Ez ê serkêşê karwanê evîniyê
Li dû davêt ronahiyê neçim
Dê berze bim
Li tarîstana vê herêmê
Mîna çiray li tarîstanê
Yêd çirisin
Ez ê mirîdê ronahiyê
Nabêjiye min
Çewa nebim beletînkek
Xo bihavêmê!?

* * *

**Çavê te maka pêlan e û**
**Ne melevan,**
**Zivrokek dê niqo ketin**
**Bi ser êxît û binve ketin**
**Ta ku yekcar berze diketin**
**Bi şûka, naête derê**
**Dibê meyav in…**
**Xudêyo ma eve çav in!?**
**Tîra tavêt**
**Mêlaka di cih de kun diketin**
**Cobarêt xwînê ji ber dibetin**
**Çend baştir e…**
**Kilçîvî pitir tê didetin**
**Da nêçîra baştir biketin**
**Çî yê kete xefk û davan**
**Ji qurtalyê…**
**Bê bar biketin**
**Bê bar bikeitn**

*1985*

## VELORÎN

Eza rabim
Sivik çime ser sêryanê
Gozkekê ava tezî bem
Bo rêvînga, li bên vedanê
Heçyê hat û dê bêjimê
Tu bi Xudê kî
Te pismamê min nedîte
korê ez-ê, karwanî ye
Çaverê me bêt ji Wanê
Heçyê bûrî, dê bêjimê
Demê lawkê min bibînî
Bêjê zû be
Here hewara dotmamê
Herro bira yê didene şwî
Xwazgînî di zor in vê canê

* * *

Lawê min-o me kes nîne
Xwazgînyêd min, jarê ez-ê
Hatin ji Şamê
Bazirganê danay gundî
Vêca qîza, ya lê bûye tivtivanê
Yê dixazin û vediguhêzin
Li kolanê
Kekêt min, herro yêd ên û

**Ji min re dibêjin:**
**Sîsebanê. Pismamê te naêteve…**
**Ne wî rave û ne wî reve**
**Û çavêt min,**
**Hinde sal e bi rêka te ve**
**Ne têy tanê**
**Ne têy carek seredanê**
**Heyla li min-ê**
**Bêhewarê, bêxudanê!!**

* * *

**Lo pismamo…**
**Bêriyêt te, çavêt min dotin**
**Ha yekê biyanî verotin**
**Ûkelotin**
**Tirsa min… Zûr gîro bibî**
**Evê canê ji bîr xo bibî**
**Xwozîkêt me, ûmêdêt me**
**Bibine xewin**
**An nehingek bêt û bixotin…**
**Gotina mezinan bi cih bêt**
**"Sotim, sotim, naêt gotin"**

*1985*

## BÊBERSIV

Min divêtin...
Bizanim kengî ez ê bim!
Kî ye ew daya ez jê dibim!
Çewa dê bim?
Dêmê heyvê dê girnijît?!
Çavê rojê dê bi min nijît!?
Ev kelexe. Ev kuloxe
Ev nazik û şeng û şûx e
Vê tariyê dê ve kujît!?
Ev bişkoja her min mêtî
Meya şirîn... Ava manê
Her dê jêbim!
Her dê rijît!!
Ev nijîn û heriftine!
Dê bin çin e!
An careka dî dê vejît!
An ez hebim. Wekî xwe bim
Bi xemsariyê
Rûtiyê û mirûtiyê
Tarî ji kerba dê xo kujît!?
An ez hebim
Davêt rojê jê ve nebim
Livîna min... Danga te bît
Li cihê xwe bim
Her dê rojek êt mêkewê
Ji te re biqebim

*1986*

# XEWNEK YA KURT

**Li gurgeloqê**
**Destek aliya li gerdena zer**
**Destê dî geriya li ser toqê**
**Hate xarê bi vemaliştin**
**Kivan û bişkoj maliştin**
**Yê dî sêran bir bêderê**
**Milhêb da bin**
**Civîn... Civîn...**
**Mîna gokan,**
**Xo hilavêt di nav tila de**
**Lerzîn... Livîn...**
**Lêv di gel lêvan axiftin**
**Vealîstin**
**Wêran bibît**
**Mala cinqa bi min ketî**
**Xewna şirîn... Xewka şirîn**
**Ji çavan birîn**
**Dest bi rûya de înayn xarê**
**Vî dilê jar**
**Xudê bête harîkarê**
**Çewan sed xwuzî rahêlan,**
**Vê êvarê**
**Cara têtin...**
**Lê venebîn...**
**Lê venebîn...**

*1986*

## CEJNA JIDAYÎKBÛNA ŞEMÊ

Şem, wê qîzê
Ewa Şingar di çava de zay.
Destê min yê di paxla wê de, bûy firîzî
Bûye daralînkek alyay.
Li dûr bişkoja,
Şemilkek kesk reng day xîzî
Di nav gelyê miradan de
Guh didete dengê savayê livî,
Li xweday
Awazek sivik û nazik ji tembûrê dihêt
Min tu viyay.
* * *
Şem, ewa bûk
Destê min qet bernadetin
Serê tila dimêjît, dimêjît
Ji çavan, ji guhan... Katan didetin
Ev kate dibine gilyazêt bişkojêt sor
Cîhaneka rengan...
Kevalekê dengan...
Colankeke ben bizot û diavêt gurryê
Reng û dengan tê de didetin
Ev tovê hêkêt kewan e
Ev note... Ji davêt şedan e
Ev mahya serdemekê
Didan tevş û kep û beran
Deryayê şîrî û mastî ye
Ev ji mêlakêt mêjûyê dihêt
Şem û Şengar û destê min
Şûv û tov û
Hincar û aş û rastî ye...
* * *

**Şem, nek tenha qîzeka şûx û delal e.**
**Nek awazekê nazik û**
**Nifşekê pak û xomal e.**
**Şem çîrok e dê ji we re bêm**
**Îro wê bîrî û sersal e.**

*** * ***

**Hebû, nebû**
**Barîn perî... Barîn Narîn**
**Li ser dêmekê nazik û şirîn**
**Li gel xirîqênêt zarokan**
**Li gel rondikêt zava û bûkan**
**Li gel berzebûna pepûkan**
**tov havêtin...**
**Hemî regez û reng çandin**
**Hemî werz kirine zistan û**
**Hemî werz lê bûne havîn**
**Hilandin xem**
**Nû çandin xem**
**Ew jina jin, lê bo bihar**
**Navê savay kire Şem**

*** * ***

**Îro, zeryeka taxê me ye**
**Spêdê û êvarî,**
**Tolaz diçine tewafê**
**Çavan bidîtina wê kil diden**
**Îro, rewşa dehwetan ne**
**Serkêşe alayê di dest**
**Xelk şabaşan, can û dil diden**
**Îro, dindil e... Kimêd e**
**Sîmerxa evî çerxî ye**
**Mizgînî ye**
**Azadîxwaz bejnê hildiden**

*1991*

# Ehmed Ebdulla Zero

Di sala 1944'an de, li bajarê Zaxo hatiye dinê. Her li wî bajêrî xwendiye û li sala 1968'an de, bişka Kurdî li Zanîngeha Bexda bi dawî aniye. Her ji sala 1965'an û vir de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Çîrok, vekolîn li ser folkilor û zimanî nivîsîne û di rojname û kovarên Kurdî da belav kirine. Di vîstîval û korangehêt edebî û şiirî da beşdarî kiriye. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr.

Heta niha ev pirtûkên jêrî gehandîne çapê:

1. Sitranên şahî û dîlanan, 1980.
2. Mamikên Kurdî.
3. Sitrana lêrîkî "Heyranok".
4. Pirtûka "Kilamê Cimeta Kurdan" ya Haciyê Cindî, wergerandiye tîpên Erebî û jê ra nivîsiye.

Berhemên amade ji bo çapê ev in:

1. Vekolînek dirêj bi navê "Firrinde di Baweryên Çîvanokê Kurdî da û Hevberkirnek."
2. Vekolînek bi navê "Masî û Cwînêt Wan di Xabîrî" da.
3. Dîwaneka helbestan.
4. Pirtûkek li ser folklorî.

Dê çend helbestên wî jî, ji tîpên Erebî, wergerînîn yên Latînî. Niha jî li Kurdistana Başûr ye.

## ME ÇI DIVÊT, WAN NEVÊT !!

**Gelo lo**
**Barova ji reşî gorr**
**Berê rû ji kê ra lo!**
**Dav û torr**
**Ew rûbara pirr gemî**
**Pêl û borr**
**Wan divêt em bijîn**
**Ho lo!!**
**Bê papor**
**Ew buhara pir kulîlk**
**Lawo lo payiz e!**
**Ji şêlka barovê veweşandin**
**Mar û mor**
**Revdeyên Qulinga mişext bûn**
**Kiş dikin Wazka**
**Erê lo! Çal û kûr**
**Me çi divêt, wan nevêt**
**Em bijîn hosa lo**
**Li warê xo**
**Barê xo**
**Hilgirîn hosa lo…**
**Gelo lo Kurdino**
**Tev bibin carekî**
**Vebijêrin nijadî**
**Akincî bin li warekî**
**Baxçeyêt nêrgiza av bidin**
**Dilo lo bi xwînekî**
**Bişkuja geş bikin**
**Xoş bipeyvin bi zarekî**
**Bes e lo ji vî rewşî**

**Her mel îl û kovandar**
**Bi xandinê. Bi çandinê**
**Da ava kin malekî**
**Çiyakên me war in**
**Daykên dilovan**
**Rabîn alayê zer**
**Velerzînîn li gopîtkê**
**Me çi divêt, wan nevêt**
**Em bijîn hosa lo**
**Li warê xo**
**Barê xo**
**Hilgirîn hosa lo..**
**Gelo lo dilsotîno**
**Bo rojeka hilkirî**
**Warê jev şivano**
**Keryê me çar kerî**
**Hilon tev**
**Yasayek rabidin vê jînê**
**Şîtka girêdin**
**Bîr bînin cangorî**
**Van şemalkên sava**
**Lê bikin çavdêrî**
**Welê bikin ji kas bikevît**
**Canîka neyarî**
**Gelo lo Kurdino**
**Bîr bikin Çarçira**
**Dijminêt me zor in**
**Soterêt vî warî**
**Me çi divêt, wan nevêt**
**Em bijîn hosa lo**

**Li warê xo**
**Barê xo**
**Hilgirîn hosa lo..**
**Ey gelî çek hilgira**
**Binexşînin li ser pira**
**Bi xameya. Bi gulleya**
**Vekin bendêt wan dera**
**Paxlêt pirr bidirrînin**
**Nehêlin lo li himbera**
**Kevna bisojin jarîno**
**Kevir û kaşa**
**Bi perêsin**
**Ber reş in, pîroz in**
**Diparêzin lo dilbera**
**Ew sîng û çeper**
**Zêrevanêt welatî**
**Ji Kawey bo Barzanî**
**Rêz bi rêz û her bira**
**Me çi divêt, wan nevêt**
**Em bijîn hosa lo**
**Li warê xo**
**Barê xo**
**Hilgirîn hosa lo..**

*1974*

# SIVYANKÊT SÎVANDA

Derdê me sivyanka, kula heman e
Torbê me rebenka, Miştî xeman e
Emîn sivyankêt sîvanda
Girtiyêt girêk û benda
Ketiyêt nêv çal û kenda
Li navbera agir û birsê da
Herê sivyanko hosa dijîn!?
Lewa sivyankêt wek pepîka
Di girrê biçîka
Bend û girê bîn
Kurê rê bîn
Baz û sîmerxa li ser şerr e
Çirî wirye, ne hêlane, ne sere
Hosa bijîn yan bibîn
Di nav warê bê warî
Digel mafê wan xarî
Ne bînin darzeytûnê
Şarê Qudsa pirrbwînê
Lepêt qirêj ji xwînê
Herê sivyanko hosa dijîn!?
Evro bişkoj bîn, ne vebîn
Xodan ûmêd bîn, ne gehîn
Şîrê miha bîn, ne mehîn
Hey yaro, yaro neyar in
Serêt kanîka di zor in, bi şêl in
Dijminêt zevya min, bi kêl in
Gêrê bikin
Çipkêt ava, nehêlin
Lewa sivyankên derya boş e
Jîna xoş e
Ne bêhoş e
Roja min, vîna min
Ji bo bizava rastiyê
Geşkirina xoşiyê
Ne bi birrînê
Ne bi dirwînê
Bi daqutanê na werînê

**Ey dijminê sivyanka**
**Dê firr im, dê firr im**
**Ne ez, xwîşka min**
**Ne ez, kekê min**
**Ne li vî warî**
**Giş warêt tuxmê min, mîna min**
**Her sîxmeyne li bin piya**
**Dasî û kelemêt rêya**
**Tîr û pencîn bo rûya**
**Çend venoşim derbederî**
**Çend verêjim çipka**
**Çend helperî**
**Bê dermanî tu**
**Herê mirî. Herê mirî**
**Herê sivyanko**
**Sivyankê cîhanê**
**Stêr geşa manê**
**Qêrîna maf nedanê**
**Bibirhin tovê jiyanê**
**Ey zarokê şîr vekirî**
**Ji wî dilê kerker kirî**
**Yan xodanê tu hilkirî**
**Li nav agir û birsê da**
**Hosa dijîn..**
**Erê sivyanko!?**
**Belê sivyank im**
**Bûna min pête**
**Hatina min barûte**
**Bizava min sotina bergê te**
**Hatina min zanîne**
**Çekê dijware**
**Pirr kerb û kîn e**
**Hatina min ey kevnê dîrokê**
**Bûna min mîna tavê û teyrokê**
**Bo nehêlana neyar û hara**
**Dijminêt sivyanka.. Zaroka..**

*Duhok, 1978*

# AŞÊ GUNDÊ MIN

**Hey kalgîrê gundê min**
**Kevne jiyan û jiyara**
**Tev pîr û cindî**
**Îro ji revenda bêkes û bendî!**
**Çima herrifte kulkî?**
**Wargehê kêzan û dopişkî!**
**Buhara warê te hiştin**
**Nefel û renga kovan riştin**
**Solîn û çîçka dîwar keliştin**
**Hey aş-o**
**Kevne pîrê rind warê min!?**
**Çême aşî, aş nikkir e**
**Pirsîm aş-o**
**Ji kas ketî çima kirre?**
**Çi eger e. Çi eger e?**
**Herê aş-o**
**Riha xwînê tev sikkir e**
**Lewa îro dil pirr girr e**
**Dil pir girr e..**
**Herê aş-o**
**Sed bilufta rêz bi rêz e**
**Hevrranê min pişta kêz e**
**Dûrê rêz e. Dûrê rêz e.**
**Hat im aş-o**
**Barê xema ji min ra bihêre**
**Çaxê têm û hinge dinge**
**Ber nikkir e..**
**Çima hoy î?**
**Ber şikestî**
**Têhnê gestî..**

**Aşevan-o!**
**Ji xema bargîra dûr-o**
**Rabe bihêre**
**Gefa nehêre**
**Barê dizî nehêre aş-o.**
**Hat im aş-o**
**Barê min e pirr zîwan e**
**Tal û geze, xurêl dane**
**-Gotî aşbûm**
**Şev û roja**
**Deng bi deng bûm**
**Saza jîna hejara bûm**
**Belê çi bikim, dil derze ye**
**Co ne li rêka dewsa xwe ye..**
**Min got aş-o**
**Berêt pir in**
**Cok û sûlav, bi deng û gurr in**
**Gotî: Ne ho cok û ne ho bere**
**Xwiyêt karwana îro**
**Paxil pir in**
**Ser û kanî wa ji min kirin**
**Wa ji min kirin..**
**-Lo Kurdîn-o**
**Herê aş im**
**Kevr û kaş im**
**Çaxê nojdar rêkê digirît**
**Av dê li dewsa aşî gerrît**
**Her dê gerrît..**

*Duhok, 1979*

## GERROK IM EZ

**Ji bo firrekê digerrim
Çerxa didim
Evraz û nişîviya
Tev lîs û kulkên di pir xoziya
Ji bo qurtekê diperrim
Asteng û kêriya dibirrim
Ho gelîn-o!!
Gerrok im ez
Gerrokê çerxê bîstê me
Ji bo pilekê, dêndikekê
Barê zarowa giran e
Xezane lo
Evîndar im
Evdalê pila dermane
Lew digerrim
Lew dixurrim
Kes im mirovê gemyan im
Dilberê baxê yaran im
Gerrokê barek giran im
Têhniyê qurtekê me
Ho gelîn-o
Lew digerrim
Lew dimeyim..
Ber reşa min !?
Firra ji tirarê te ne bit
Navexom
Nivêja cem te ne bit
Qet we nakim
dîlana li mêrga te ne bit
Helnaperrim
Lew gerrok im
Tirar jeng e
Nivêj leng e
Dîlan bêdeng e
Bêdeng e....**

*Duhok, 1979*

# SITRANA DAYKEKA KURD LI ÇARÇIRAKÊ MEHABADÊ

Dayka mezin
Parzîn bare zaro ez im
Keser ez im
Xwezî ez im
Lewa dayê her mişextî
Her bedbextî
* * *
Dayka min-ê neke girî
Kekê mine li nêv çeperî
Nekey rondika bibarînî
Ber lîlyê ra vewerînî
Neku gulle berovajî
Ber pêya da
Weku terrgê daqutînî
Velerzînî
Neku keçket
Neyar bêjin:
Çi zarok e
Savayekê li ser şîr e
Ne hêjay e
Ne hevber e
Gefa pirrken canê tênî
Nekey dayê nebarînî
* * *
Nekey bavo!!
Cergo mêr e
Dem hêrişa mîna şêr e
Ji bostê ra
Ji mistê ra canbijêr e
Neku bêjin:
Ev kesê he çi gemşû ye

**Ne ji bavekê xodan pêre**
**Naket gêre..**
**Nekey bavo!!**
**Rondika bidey mista şirîn**
**Yan kuzka Emê Gozê**
**Bo neyara bikey war e**
**Nekey bavo nebarînî!**
**Bayê şermê**
**Ji Cergo ra bigehînî**
**Tev fihêt e**
**Nekey bavo.. Nekey dayê**
**War şirîn e…**

***   *   ***

**Herê bavo**
**Herê dayê**
**Rabin îro dîlan germ e**
**Rondika pavên, bi xudê şerm e**
**Bêjne pîr û kalêt warî**
**Xirr dayikêt şev vexarî**
**Bi kovandarî**
**Babelîska bîstê hatî**
**Wek Nevrozê helken çira**
**Tev sinûra biken bira**
**Çar çirayî li hemî dira**
**Veden pira**
**Rih dirêja veçirînin**
**Va dilreşa vebirînin**
**Rûyê şermê**
**Ji dêndika, ji rondika**
**Vewerînin, vemalînin**
**Çunkî dayê**
**Îro şahiya tev lawan e**
**Tev xurtan e…**

# BENDA DILÎ

Erê Heyran
Çaxê delalîkê dilê min
Bertengiya mala min da
Bûye mêvan
Min go: Roj rohniye sube
Dê bistirim ho heyrano
Ber landikê ra
Dê lorînim lo dêrano
Sube xeml e
Paşîn geş e ji bejnê ra
Erê Heyran
Sube çewa girya min tê
Govenda dilê min neken
Çunke li dîlangêra bûye
Tera û gêr e
Çi bikem lawo
Çewa tovê gura têne
Li wêre.. Li wêre
Sûr e. Sûr e
Ber piya da girêl dibin
Wekî renya serêt bilind
Welê têne
Wey gumçika
Bo xopana evî gundî
Cardî lawo
Vîna tewo ketî vêre
Bo te çi bikem
Bo te bêjim
Dilê daykê du ker bûye

**Kerek mal e**
**Ya dî ji te ra heyran e**
**Ho Heyrano**
**Ji dilî têto, kirrên û nal e**
**Gurêt havî**
**Dûr pejana dîlan girtin**
**Çi dîlan e!!**
**Ji rep repê**
**Ji ber hilma kepî lêva**
**Gul weryane**
**Ho Heyrano**
**Dikim nakim**
**Ji malê ra**
**Ji bejnê ra**
**Gorî wezo..**
**Erê Heyran**
**Wezê bendekê darêjim**
**Bavême ber dengbêjekê**
**Belku ji kerema xwe**
**Velorînît**
**Bêjît sube**
**Geş û xoş e**
**Ji daykê ra..**
**Ji daykê ra..**

## ŞÊXÊ MINO

Torbê şêxî
Pîrê Mem û Zîna delal
Mişkek ketê
Jêk hincinî
Bi dava jenî
Mişkê gîvir
Ji tirangeha û kuçka Nesîn
Bi kêlba çûyê
Peyv ketine ber didana
Kirên ketê
Lewa dibînim Zîna delal
Xwîneloye
Car ji vîna xemêt Memê
Belê îro
Ji wî xamê kirêtkerî
Li ser şanoya evê jînê
Peyvêt pîroz
Bîne û bibe
Li ber çekoçê ne zêringer
Peyv herişîn
Mînakê wan
Kire lêhbûk
Dîneka gevî veçirandî..
Şêxê mino
Beko kete gulistanê
Mîna Hirçan
Pejan lê bûye sed derî
Ciwaniya gulan gêre kir û
Bi lepa çûyê
Bi devî çûyê
Ji bo xatira ker şirîfiyekî
Qirêj rêtê..
Qirêj rêtê..

# Segvan Ebdulhekîm

Di sala 1948'an de li bajarê Zaxoyê ji dayik bûye. Seretayî, navincî û berhevî li Zaxo, Duhok û Mûsilê bi dawî aniye. Her ji sala 1971'ê li radyoya Kurdî li Bexdayê kar kiriye. Wek ez agehdar im, wî piştî sala 1965'an dest bi nivîsîna helbestan kiriye û berhemên xwe di pirraniya rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Ew li Kurdistana Başûr endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd û endamê Sendîkaya Rojnamevanên Iraqê ye.

Heta niha ev berhemên wî hatine çapkirin:

1. Heval, hevaloşkê, Sitran û yariyên folkiloriyên zarokan.
2. Sitranbêjê nemir Mehemed Arif Cizîrî, Kewê Ribad.
3. Sitranbêjê nemir Eyas Zaxoyî, jiyan û berhem.
4. Pitûkek li ser Cegerxwîn.

Niha jî li Kurdistanê ye.

## HÊLÎN

Ezê hatîm
Ji bajêrekî sêwî û dêran
Derkeftim
Ji nav rondikeka sahî û wêran
Girêlebûm
Ser kevir û kevî û berêt heyran
Mixabin
Sîngê bajêle lê, nehat seyran
Rast e ezê hatîm û dê qesta
Hêlîna mirina Zîna xo kem
Qunêra jîna xelkê derkem
Birîna ji hemî wara komkem
Jehrê ji rengê desta vedem
Tola ji nav xonê da berdem
Hûn dizanin gelî bira
Îro hîvî bû, ne xefk
Ezman bû, ne defk
Xewna xo kire qafik
Werin xo jarafmen
Kenya bê hîvî û şiyan
Evîna soz û kîşan
Hinav û hizir li me êşan
Daketin xal û nîşan
Ezê hatîm û ger zivirîm
Da bêjme kevne ewir û sîberan
Xo vekêşin ji dilê derze beran
Nan û avê dirusken bo dilberan
Şilqa me da, sed kinar û deveran

# DENGÊ MIN

Dengê min
Gelo kevne deng e
Xewnek şêl û bêle.. Berze ye
Dengê min, tijî tirs û lerz e
Sehma ava har û agirî
Erd şeqand û hejand
Şêlka guryê mest e
Şerenîx û kuştin û man e
Li hemî cîhanê
Hevrrikî ye. Ne.. Dijminî ye
Şîna nan û şîrê zarokan
Gulle û tank û jehr e
Bo.. Hene ji aştiyê ditirsin
Ji navê evînê dirrevin
Bazirganiyê dikin
Yarya bi xewna dikin
Tirrana bi xoziyên me dikin
Dengê min
Nû kirina jînê ye
Vejîna ronahiye hinda
Girêdana dîrokê bi paşerojê
Da hemî kovanêt di dinyayê
Nav dilê aştiyê veşêrim
Hemî gunneha bi bişkurrî daîrim
Da ne bêjin dengek bê soz e
Bila peyv û nêrgiz û kenî
Bizivrrin şîna rojêt genî
Cebilxana ji xandingeha cuda ken
Çavê aştiya reben
Her elind bi tinê maçî ken
ne poşmanîn.. Ne şehmezarîn
Ka tovê bê zîwan
Dê şînkem û çi welata bê behir nakem
Lê aştî hingivînê
Jîn û jiyara me hemyan e
Aştî.. Kehniya vîna pîroz
Aştî.. Mirad e.. Her mirad e...

## GELÎ ZAROKAN

Hozana min.. Hêlîna min
Hey jîna min
Neken girî
Neken gazî
Barova Narîna birî
Ger berzebûm nav vî warî
Li min negirin.. Li min nepirsin
Li nîveka rêkê nezivirrin
Herrin.Herrin kifna bi xo bibirrin
Gir û çiya bikeyne tenîr
Ji bîr nekeyn.. Tolê vekeyn
Birs û xasîn
Em mişextîn
Tirsa me ye gelî bira
Rojekê nehewîn li vara
Ser vê axê bibîne bar
Gunneha me Kurdiye zar

# XEWNEK

**Xewin, Bezî..
Revî.. Çû rateqî
Pêş çav û dila berzebî
Hindeka got: xewin zîz e
Geleka got:
Xewna te rizî
Min qesta çiyayên welatî kir
Bi hewar û qêjiyek dil sotî
Pisyarek min jê kir
Kengî dê bi ezman kevin
Da rastiya xamêt rengî bêjin
Da tabloyêt berovajî rastken
Dîroka min biparêzin
Akincî biken
Pirça ji tîrojkên heyveka kesk
Xewna min bixapîne û lê bialîne
Pêlek lawaze nikarît
Nêçîra xo binijinît
Agirek har û gurêxe
Tavyêt aştiyê zuha naket
Ger agir, agirî ne vemirînît
Ger şehîd mirinê nekujît
Heke qorbanî avekê
Bi vî şerrî da neket
Bawer neke çi cara
Aştî li warê me bibişkurît
Xewna min
Axînek din rahêla
Aviriyek ji kevne roja ve da
Mîna narînêt salê
Demê dizivirrne ser malbabê
Hîngê min zanî
Hozan eşq e
Birîn xelat e
Kuştin vejîne û jiyan pîroz e**

# Rastî Hirorî

Navê wî yê rast Sidqî Ebdulqadir Ebdulrehman e. Di sala 1956'an de, li gundê Hirorê, devera Berwarî Bala, ji dayîk bûye. Li bajêrê Mîsilê dest bi xwendinê kiriye û her li wêrê amadeyiya çandiniyê bi dawî aniye û niha jî li welatê Polonyayê, li ser xwendina rojnamevaniyê berdewam e. Her ji sala 1970'yî de, dest bi nivîsîna helbestan bi zimanê Erebî kiriye, paşî bi zimanê xwe yê Kurdî. Çîrokên kurt jî nivîsîne. Di sala 1983'yan de, ji ber terora faşîstên Iraqê reviye û gehaye rêzên şoreşa Kurdî.

Heta niha ev berheme gehandîne çapê:

1. Qereç û dilber, helbest
2. Çend hozanekên nenavkirî, helbest
3. Dîmenek ji çîroka jiyana min, çîrok
4. Momkeka nevekirî, kurteçîrok
5. Kurê zinarê serbilind. Roman, sala 2008'ê.
6. Ewîn û şevat. Roman, sala 2008'ê.
7. Ez û delal. Roman, sala 2008'e.

Niha jî li welatê Polonyayê ye.

## BÊ EVÎNÎ

Ey evînî min tu dîtî
Ji çavên zarokan têyî xwarê
Rondikêt sotî.
Min tu dîtî
Qirmiçînek li dêmên kalan
Li nav pîrtî.
Min tu dîtî
Lawek bizever û girgirtî.
Min tu dîtî
Dîrokek kevnare û berper lê şewitî.
Min tu dîtî
Bi gelek rengan
Ji dilek sotî
Ya dikey kenî
Ya dikey girî
Lê nizanim, ey evînî
Te çewa dil li min dîn kir
Hûş winda kir
Yan tu dizanî, ez aşiq im
Evîndarê peyva şirîn
Hezdar im ez
Bo demekê pirî evîn
Bo warekê esman sahî
Lê nebît kîn
Xelk hemî, bê cudahî, wek hev bijîn
Lew evînî, min dixapînî

**Min digirînî û bi çi seran nagehînî**
**Hilawîstî min dinivînî.**
**Bê firt û fêl, were evîn**
**Ne ku êdî min nebînî.**

***

**Êdî îro min nevêtin**
**Ew evîna li pişt dîwaran**
**Min nevêtin**
**Car û baran, bêye waran**
**Paş ava bî, wekî caran**
**Li êvaran.**

***

**Mêzebkeyê**
**Li ser perkên evî dilî**
**Di nava birhên herdu çavan**
**Ey evînî, navê te ma.**
**Bi qamçiyên fêlbazên te**
**Ez kore bûm, min hûş nema**
**Bes e evîn**
**Bes e ji xema**
**Bess e ji gema**
**Were bi hev re, bikujin teman**
**Bikeyn kenî li hemî deman**
**Nebîn mîna serên şeman**
**Were evîn, dil bo te ma.**

*Duhok, 1977*

## AX JI DERDÊ MIN

Îro evîn
Yên jêkvekirî û belav in
Lew yêt xav în
Lew pişta li me şkestî û qop e
Lew bê tav in
Lew her rav in
Lew noke jî, wekî berê
Xirabtir jî
Reşekên Sultanê caran
Dimêjin xwîna tev hejaran
Li deşt û çiyayên welatî
Diçînin giryan û zêmaran

* * *

Çunkî dûrî warê xwe me
Çunkî dûrî xelkê xwe me
Lew min xem e
Lew berze me.
Mirovê me dibêjîtin:
Bo çi heme û ne yê xwe me?!
Çima li min tehl e jiyan
Tarî û teme?!
Bo çi yê ho me?!
Çunkî ta noke jî
Ya gelekan got û deve û

**Reşekên bi dûf min û te ve.**
**Şereşev e**
**Hinda şer e û hinda rev e.**
**Çunkî li çar kinaran**
**Di gel agirî, em dileyîzîn**
**Neyek dav e, şêlî av e**
**Tarî gav e**
**Çi di peyvîn...**
**Ê li alê din, leşkerê reş**
**Yê tarîxwaz**
**Nêçîrvanê tava me ye**
**Da tîrojka wê nehelêt**
**Da nerabît ji xewa salan**
**Leşkerê cotyar û palan**

*1979*

# ŞOXA KELHÊ

Şoxa kelhê, gote Mîrî:
Lo, lo Mîro
Li kelha me, tav neava dibû
Ez perî bûm
Hêja bûm. Xewna çavan bûm.
Berdilkê hemî lawan bûm
Dildaran bûm.
Lo, lo Mîro
Rast e noke bi zûrdariya xwe
Te ez birim û li pey min man
Rondik û xwîn
Gelek birîn
Zûr xendiqîn.
Rast e noke, ha ev ez im
Li jêr simbêlên te Mîro
Lê bi canê xwe
Bi sor dilê xwe
Bi gişt hizra xwe
Ne bo te me. Ne di gel te me
Her ez şoxa kelha xwe me.
Befir û tav im
Buhar nav im
Li ser dila ez xunav im
Reng vebîme, tarîkuj im
Lewendiyên kirasê xwe
Dê girêdem
Bi lewendiyên hevalê xwe
Ber bi heyva lêvbişkurî
Dê em firin
Bi hev re herin.
* * *
Lawê Mîdya
Yê dibêjîtin:
Şoxa min-ê, evîndarê te yê ji dil im

**Lê ji te dûr im.**
**Tembûrvan im**
**Aşiqê çar biskên te me**
**Tembûr dil e,**
**Nîvek eşq e û nîvek xem e.**
**Şoxa min-ê**
**Nê kavil e kela me lo**
**Ger canê te lê nebîtin**
**Li nav govendê**
**Di gel kizebayê welatî**
**Bi semayeka kurmancî ya**
**Bejna xwe nehejînîtin**
**Ger dilî neşilqînîtin**
**Şadiyê bo bi ser bêxîtin.**
**Nê kavil e kela me lo**
**Ger yê Qereç**
**Hirçê nerakit semayê**
**Ger yê pêxas**
**Li ser xatra evîna xwe**
**Ger yê bindest**
**Li ser xatra azadiya xwe**
**Pê nedin ser dirk û stiriyan**
**Ger aşiqên peyvên Xanî**
**Dest nedine destên hevdu.**

* * *

**Şoxa min-ê**
**Çîrokbêjê direwînker yê dibêjîtin:**
**Mîr her Mîr e**
**Li hindav serên me her şîr e**
**Şoxa kelê ya êxsîr e**
**Lawê kelê yê newêre**
**Her ho bûye û her dê ho bît**
**Dê şoxê jî bê hîvî bît.**

* * *

Lê zarokek
Ji nevîçirkên kela mayî
Ku di gel şîrî evîn mêtî
Ku li ser keviyan çav zilkirin
Yê diket gazî ji binê piyan:
Rawestînin şînî û giryan
Bêzariyan, milkeçiyan
Ho zordaro
Li me mafxwaro
Dibêjme te, ne Mîrê min î
Sîngê Şoxê te kir genî
Ji rûyên te naçîtin tenî
Min û Şoxê êdî nabînî bi rebenî
Nagehnê destên te yên bi gemar û genî
Ne, ne Mîr êdî nakenî
Ji axa me xoşiya narenî.

* * *

Li şev tarîkê
Li kavlê kelhê
Li ber çavên min
Li bin dîtna min
Tev dibûneyek
Dibistirîn. Digirnijîn
Bilind firîn
Lewendiyên wan dibûne kew
Dibûne ala
Xatra xwe dixwast ji kul û derdan
Ji tema salan
Dibûn elindek
Li ser milên xwe
Bo kelha me
Geş tav anî
Kel ma xwîn û lê nebû şev
Kel ma tav û lê nebû şev.

*Duhok, 1981*

## BEXTÊ REŞ

Ronahiya di sîngê çiyan de nivistî û
Ejdeha jî yê li ser textî.
Lo lo heyran
Were binêre vî bextî.
* * *
Ne ne çima
Her yê reş dê bextê me bit.
Çima kêra kînhelgiran
Dê kujeka min û te bit.
Şevdirêja me lo heyran
Nabarket û ji nav me birevit.
Me bikete du
Me bikete çiwar
Pênc û bêwar
Me ji çiyan û warî bikete der
Me bikete jar.
* * *
Lo lo heyran
Li welatê min
Li ser destên faşîst û çepelan
Li her direkê
Li her rojekê
Li her gavekê
Agirê wan axê disojit,
Gund û şaran dikete kavil

**Jînê dikujit,**
**Bi ser hemî jare Kurdan**
**Mirnê dirêjit,**
**Û hêşta û hêş**
**Mitayê bazaran em în**
**Hin debên agirperês în**
**Hin dibên xewnan dirêsîn,**
**Kes nabêjit mafberze ne**
**Ji serbestiyê û tenahiyê**
**Di bê bahre ne**
**Kes nabêjit**
**Eve ji çendeha sal e**
**Evî gelî**
**Vî milletî**
**Her bindestî û jînek tal e.**

*Dîmeşq, 1986*

## KOÇERÎNO

Koçerîno hûn bi Xudê kin
Karwanê xwe
Li vir ragirin
Yên di vî sîngî de xirve bûyn
Nexêr bawer nekin
Çiya jî bi helgirin.

* * *

Koçerîno li bextê we kim
Dê peya bin
Gund kavil e û war wêran e û
Dil yê bikul e û bi tinê li vir
Ez yê xemgîn im
Li ba mêvan bin.

* * *

Koçerîno
Nizanim bo çaverê me
Nizanim lo li benda çi me
Li hemî diran
Li hemî gavan
Tengezar û li ser pela me
Li bextê we me koçerîno
Ka carekê
Ji vî derdê me
Ka mijdekê ji bo dilê me.

* * *

**Koçerîno dizanim ku**
**Nezanîna min ez kuştim**
**Wek pezeka ji birê vemay**
**Di devê gurgan de ez hiştim**
**Hûn bi Xudê kin koçerîno**
**Hema bîstekê mêvan bin**
**Da xeman bo we xuya kim**
**Da eşqa xwe ji dilek sotî**
**Bo we xelkî aşkera kim.**
**Hûn bi Xudê kin**
**Werin ba min**
**Nê bi mirovan ez mirov im**
**Nê bi mirovan hûn mirov in.**

*** * ***

**Koçerîno**
**Bo xatra min**
**Karwanê xwe li vir ragirin**
**Sîngê xwe da biqelêşim**
**Ez ji we re birayan**
**Li bextê we kim**
**Der û rêkan li min negirin**
**Xo xelk hemî ne rêgir in**
**Ne cergbir in.**
**Li bîra we bit koçerîno**
**Nê bi mirovan ez mirov im**
**Nê bi mirovan hûn mirov in.**

*Swêd, 1988*

# Kovan

Navê wî yê rast (Cefer Ebdulrehman e). Di sala 1953'yan de, li gundê Êmînkê, nêzîk bajêrê Duhokê ji dayîk bûye. Li Gundê Êtwît û Duhokê xwendiye û di sala 1977'an de, pişka qanûnê, li Zanîngeha Bexdayê bi dawî aniye. Her ji sala 1978'an û pê de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Carna di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Herwesa çîrokan jî dinivîse. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd bû li Kurdistana Başûr e. Di sala 1981'ê de, ji ber terora faşistên Iraqê reviye û gehaye şoreşa Kurdî. Di sala 1983'yan de, hatiye welatê Swêdê. Niha jî, li Kurdistanê ye.

Heta niha ev berheme gehandîne çapê:

1. Lehyek ji azirîna dilê min, helbest, 1983
2. Mirov û dozex, çîrok, 1985

## ŞEHÎD

**Ket û rabû
Careka dî li ber çavêt min
Ket nerabû
Negot ne ay...
Ne ay babo.
Li dîlana azadiyê
Ji tok û bendêt...
Vê jiyanê ew aza bû.
Xunavek hîr lê barî bû...
Lê ne ta bû.
Çavêt min bûn li ser barîn
Di gel çavê...
Şenge rojê xuzî xwarin.
Şehîdekê dî bixemlînîn...
Rojeka dî...
Li me ava bû.
Kutirek dî...
Perêt xo lêk dan û firî
Li me winda bû
Li me winda bû.**

## HER JI MÊJ E

**Her ji mêj e**
**Zengilêt hawar û tirsê**
**Li çar kinarêt welatê min…**
**Çireçir e.**
**Ewrên reş…**
**Li hindava welatê min**
**Her ji mêj e**
**Gurregurr e.**
**Her ji mêj e**
**Dengê zincîrêt lêdanê**
**Şev û rojê**
**Li welatê min zirezir e.**
**Dengê tankan**
**Li deşt û çiyayên welatê min**
**Her ji mêj e**
**Nirenir e.**
**Her ji mêj e**
**Dengê napalm û bomban**
**Li gund û şarên welatê min**
**Hurmehurm e.**
**Leyzoka van balefiran**
**Li asmanê welatê min**
**Her ji mêj e miremir e.**
**Kutir û pepîk**
**Lew direvin pirepir e.**

**Her ji mêj e**
**Welatê min yê bûy zîndan**
**Lê diçerin jan**
**Welatê min yê bûy pawan**
**Kanyên zelal lê dişêlin**
**Lê nikarin çavê rojê…**
**Jê veşêrin.**
**Bila aşêt zûrdariyê…**
**Şev û rojê…**
**Leşêt şehîdan bihêrin**
**Bila xwînmêj…**
**Meşkêt xeman jê re bikên**
**Kanyêt xwînê li hindav bizên**
**Bi rengê sor…**
**Welatê min bi nexşînin…**
**Bûk û zava dest û pêt xo…**
**Pê xena ken**
**Zaro rûyên xo yên befrîn**
**Bi çavên xemgîn**
**Xemêt xo tê de winda ken**
**Her nikarin**
**Çavê rojê jê veşêrin…**
**Yan ava ken.**

## SEYDAYÊ MIN

**Seydayê min**
**Min nezanî çi ji te bûrî**
**Bi dil sozî**
**Me tu danayî serê jûrî**
**Lew em ketîn…**
**Evî derdî evî tûrî.**
**Me xebat kir wek tev cîhan**
**Zaro girîn…**
**Bo pirtek nan**
**Ketin şerê man û neman…**
**Ta zarowan…**
**Li ser defterêt xo nivêsî**
**Navê şirîn**
**Navê ciwan**
**Bi dilek pir jan**
**Ax Kurdistan**
**Şwîna dar**
**Şwîna dûrî, nar û norî**
**Me xewin bi balay ve dîtin…**
**Car bi zerî…**
**Car bi sorî**
**Em gehiştîn nîva rêkê…**
**Çend bi zûrî.**
**Dîlan gerim bû**
**Destê dilsozan me berda**
**Me girt destê…**
**Haxam Xûrî**
**Lew em tev de perîşan bûyn**
**Belengaz bûyn**

**Birsî û rîs û di pêxas bûyn**
**Law ji Îran...**
**Zivrîneve lûrî lûrî**
**Zivrîneve bi çavşûrî**
**Careka dî**
**Serê me ket ber cihûrî**
**Seyda çûne taxa jûrî**
**Wekî her car**
**Zivrîne ser kevne tûrî**
**Zivrîneve bi çavkorî**
**Xwîna lawan...**
**Teva firot kire Dolar**
**Li swîkêt Ewropa û Amrîka**
**Dane bi mercan...**
**Dane bi morî**
**Pê leyîzîn perî û hûrî**
**Bi navê şoreşa li Kurdistanê**
**Seydayêt min...**
**Xo pêşkêş dikir...**
**Ji dêhil û pîçan re digotin:**
**Rojê deh car...**
**Hey ez gûrî!!**
**Seydayê min**
**Şoreş bûrî...**
**Ê min nezanî çi ji te bûrî.**

## RIYA MIN

**Riya min e…**
**Ew rûbarê jîna min e**
**Hemî pêl in**
**Serekanî jan bişêlin**
**Sal jê dibûrin…**
**Tev dihêlin.**

* * *

**Riya min e…**
**Her dibezim**
**Tirs û serma min digezin**
**Dikem nakem…**
**Ez nagehim**
**Herdem yê li dwîmahiyê ez im…**

* * *

**Riya min e…**
**Tev kevir û kaş**
**Ez im yê şaş**
**Çend diçim pêş**
**Hind diçim paş**
**Dilê min e li ber ciwa…**
**Rondikêt rwîs û birsiyan**
**Yê bûye aş.**

* * *

**Riya min e…**
**Çavê rojê ez diperêsim**
**Can pênûsê azadiyê**
**Jê saz dikem…**
**Nama jînê pê dinivêsim**
**Ji perêt wê…**
**Tevnê serbestiyê dirêsim.**

*** * ***

**Riya min e…**
**Rondikêt bindestan kom dikem**
**Dikelînim**
**Bi hîviyên rizgariyê**
**Dimehînim**
**Ez dirêjim**
**Li bin rihêt zûrdariyê**
**Tev stiriyêt wê diwerînim.**

## ÇEND BENDEK JI STRANA EVÎNIYÊ

**Li nav baxa... Te gul çandin**
**Ji heyrana xem revandin**
**Ji ber siliya te...**
**Dara belgêt xo vewerandin**
**Bilbil zîz bûn**
**Awazên cara nexandin**
**Çend aşiqan...**
**Papûra te li derya dilî**
**Sal û mehan...**
**Vehewandin**
**Tevnê evînê raçandin**
**Pêlêt Bekroka ketinê**
**Davêt wa xirk qetandin**
**Çend periyan...**
**Li ber bêhna te...**
**Xemla xo kir**
**Cotê keziyêt xo vehandin**
**Gula evînê... Lê zîz bû**
**Bi rondikan...**
**Li ser swîretên xo nexşandin**
**Çend dildaran**
**Bi navê te peyman dayek**
**Li ser navê te...**
**Herduyan pêk ve sûnd bi vînê**
**Cotê navan... Nivîsandin.**
**Çend kiçikan...**
**Li dîlana te xo xemlandin**
**Gîfyêt poşiyêt xo leqandin**
**Papûra jînê hêlan û**
**Evîndar pê negehandin.**

**Çend aşiqan.**
**Bi xwîna sor ji kanya dil î...**
**Gula evîna xo av dan...**
**Û gulê belgêt xo werandin.**
**Çend dildaran...**
**Baxçên evîna xo çandin û**
**Felek ketê lê çerandin.**
**Çend dildaran...**
**Nama evîna xo virêkirin**
**Hire bayê...**
**Kerb û kînê lê dirandin.**
**Çend dildaran...**
**Her çîroka Mem û Zînan**
**Vedixandin**
**Bo evînê ew pir girîn...**
**Çewan Zîn ji baxçê jînê...**
**Veqetandin...**
**Mem bi sêdara evînê ve...**
**Daleqandin.**
**Çend dildaran.**
**Gilwazêt gulan ji baxçê vînê**
**Li ber dergehê dilbera xo...**
**Spêdê û êvaran reşandin**
**Bekrok çûnê jê revandin**
**Çend dildaran...**
**Lez û bez kir**
**Bi evîndarê re bigehin**
**Li veguhaztinê**
**Lê hespê wan negehandin.**
**Çend dildaran...**

**Goskê evîna wan hilgirt…**
**Li ber çavêt wan…**
**Pelixandin.**
**Li riya evînê can sot û**
**Soza vînê…**
**Wan bizdandin.**
**Çend karkeran…**
**Bi hêza te…**
**Beyar kêlan… Berrî av dan…**
**Asin helandin…**
**Berêt aşan pê şkandin.**
**Çend koreyan…**
**Namên evînê vekirin**
**Bo ronahiyê…**
**Ew pir girîn…**
**Bi çavên te name xwandin.**
**Çend spêdeyan**
**Ji ber bêhna te…**
**Ew nesaxêt li ber mirinê…**
**Çav helandin.**
**Her pêjna te…**
**Bi hezaran dilêt nivistî**
**Ji nişkekê ve**
**Xurt hejandin.**

# Pêzanê Alîxanî

Di sala 1966'an de, li gundê Dêraloşê, nêzîkî Duhokê, ji dayîk bûye. Di sala 1970'yî de, dest bi xwendinê kiriye, lê em nizanin, ta çi qonaxî berdewam bûye. Di sala 1978'an de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û babetên folklorî jî, amade kirine û di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Di gelek mîhrecanên edebî de helbest xwendine.Endamê Yekeyiya nivîskarên Kurd bû li Kurdistana Başûr.

Pirtûkên çapkirî ev in:

1. Du mirarî ji gencîna folkilora Kurdî, 1985
2. Dîwana Feqiyê Teyran, bi pişikdariya Seîd Dêreşî, 1989
3. Nivîserên Kurd. Jîn û berhem. Piştî mirina wî, di sala 1991 ê de, ji layê Îsmaîl Badî ve, hatiye çap kirin.

Berhemên amade ji bo çapê:

1. Sêdara çîçkan, helbest
2. Şêwriya, çîrokeka folklorî
3. Şivanê Kurd. Ji tîpên Latînî wergerandiye yên Erebî.

Sed mixabin, ew di roja 27.8.1990' î de, bi lêkdana tirumbêlê mir û wexera dawiyê kir. Em dê li vir hindek helbestên wî ji tîpên Erebî wergerînîn yên Latînî.

## BEFIR Û EVÎN

**Ho evînê...**
**Her bihara li her ciyekê**
**Agirê Newrozê**
**Serê çiyayên sext û befrîn**
**Hilneketin.**
**Min nevêtin... !!**
**Her axeka ... Dara berî**
**Lê şîn nebûy û nebîtin**
**Min nevêtin... !!**
**Her zivistaneka salê...**
**Li bilindiyan... Li kopên çiyan,**
**Befir serêk nebît kevî**
**Li germegurra havînê jî...**
**Bar biketin**
**Min nevêtin... !!**
**Jîn û mirina min jî evîn**
**Ger di van ciyan de nebitin**
**Bawer bike...**
**Min nevêtin... !!**
**Min nevêtin... !!**

*1982*

## GAZINDEK JI KWÎRATIYA DILÊ MIN... JI WELATÊ MIN

**Welatê min... !!**
**Evro esmanê dilê min...**
**Mêrg û cobarêt xeman e**
**Hejarek e,**
**Xenxendoka lê mêvan e...**
**Gohînek e,**
**Jîn û maf lê berze ne...**
**Tu li kîve yî... ?**
**Ka bihayê ewê soza...**
**Binefşê berrî**
**Nava dilê min îmza kirî**
**Kîve birî... ?**
**Welatê min...**
**Kakila dilê min...**
**Her sozdar im**
**Ne rûbarekê rûsar im**
**Ji te kîvî me...**
**Ne dildarek demdemî me...**
**Bi yara xo nerazî me...**
**Ne mirovekê,**
**Nezan û zordarperês im**
**Ji serbestiyê... Bê hîvî me...**
**Ne... Ne welat ne**
**Rojxwazek im, hejî te me**
**Niha ... Niho**

**Çikeçikêna mêşkê min**
**Dengê napalman rakir**
**Şîfkêt dilê min**
**Wîlewîla vîna te ye**
**Navê Mem û Zîna biha kir**
**Ne bi gotinên kwîxan xoş bibît**
**Ne bi arê pêtî têr dibît**
**Şengên e... Stêr e... Rênas e**
**Vînê dirêsît**
**Niyaz û ûmêd... Kwîstan e...**
**Serbest biket**
**Xwîmên Dimdim... Gêta gotî**
**Dîrokzanê dol û çiyan e...**
**Xoşsemyan e**
**Ne hevalê van kwîxan e...**
**Ne yê axa û began e**

*Duhok, 1982*

## NÎŞAN

**Nîşanên xatwîne befrê**
**Ba û bahoz in.**
**Nîşanên tehle mirinê,**
**Giran tan in.**
**Diyarbûna bihara şeng,**
**Kesk û sor in. An qîvar in.**
**Lê nîşanên mirovê baş,**
**Bergirî û bîr û bawer in.**
**Bergirî û bîr û bawer in.**

*1982*

## NASNAMA MIN

**Ez ne xelkê çi hozan im**
**Çi gund û bajêran im**
**Ne kurê çi dey û baban im**
**Ya ez dizanim…**
**Ez pêzan im**
**Bab Kurd im**
**Dayîk Kurdistan im.**
**Kurdistan im.**

*1982*

## DELÎVE

Nazan neke
Loman neke.
Lavlavê û dilgîriyan neke.
Ger şûla te karwan nebit
Xo nede di gel karwaniyan
Di mala xo de rûne xarê
Mîna xatwîn û zeriyan
Ger guleka bihên xoş û
Xunav girtî û ciwan nebî
Bêhin bidey rex û riyan
Çend aşiq û dil sotiyan
Nebî dirk û nebî kinarî û stirî
Xo neêxî nava riyan
Xwînê neberdey ji çi piyan
Ji nav çavên,
Çi rêbwaran, karwaniyan

* * *

Hevalê min
Divê ewê karwanî bit
Li nik wî hebit,
Serekê sar, dilekê gerim
Sîngekê pan, rûyekê bişerim
Bîr û bawer, di gel bergiriyeka mukum
Di cantika hizra de hebin
Wekî nêçîrê di serî de, bizivirin.
Da bişêtin... Rêka karwanî bibirit

**Da bişêtin... Bo serevraz**
**Bo esmanê tev rastiyê**
**Bilind bifirit**
**Da bişêtin... Da bişêtin**
**Dîsan divê**
**Serkêşê karwanê mezin**
**Siyarekê bêbevil bit**
**Demê delîve bo helket**
**Ji xo neket**
**Bila bizanîn**
**Delîve jî, delîvên hûr**
**Peykê hemî armancên dûr**
**Hespê bayê birîsê ye**
**Ne zîn heye û ne jî lixav.**
**Ne rawestiyane, ne silav.**
**Evroke bit...**
**Çi sibehî û çi dusibe bit...**
**Ew dê gehîte armancê**
**Ewê li vî hespî siwar bit**
**Xo bigehînîtin qonaxê...**
**Wê qonaxê... !!**

*Duhok, 1984*

## RENCBER

**Ho xelkino...**
**Hûn dizanin, diravê min**
**Kanyêt xwîn û xuhê jê dizên. !**
**Zendên min jî, jan û birî**
**Rencî û gurrî**
**Di nîvê de, awazên pir melol dibên. !**
**Dilê minê bûye dareka çar sêriyan**
**Li her çar rexan vekêşane**
**Şilxên xeman, pê ve dihejyên**
**Xwîna min jî ya paqij e**
**Dema ji sirkê dibit dilop**
**Mîna şeydan, xo dihavêtin**
**Dêmê axê û maçî diketin**
**Dihimbêzît**
**Rastî û viyan, jê dibît û**
**Kutirkên aştiyê li ber dihên...**
**Kutirkên aştiyê li ber dihên...**

*1987*

## KEVALÊ JÎNÊ

**Ma jîn çi ye?**
**Jîn evîn e**
**Serxwebûn e, serbestî ye**
**Ji xoristî, ji hêzê dibit**
**Jîn kutreka şaper spî ye**
**Fira didetin**
**Xo ne hesp e, an balgîr e**
**Da bi qamçiyan, bi rê ve biçit**
**Ne zîndan e...**
**Ne Evî e... Ne elîf û bê (1)**
**Her çar rexan**
**Dîwar bit û dirêj tîxên**
**Zeviya reş de**
**Mirov di nîv de**
**Birizit**
**Ne şêrekê devbixwîn e**
**Di şerenîxa evînê de**
**Di şoreşa serbestîyê de**
**Serên bêgunehan, bibirit... !!**
**Serên pirindan bibirit... !!**

*1989*

(1) Elîf û bê: Zîndana Ebû Xirêb li Bexdayê

## XEWN

Her ji dema roj ava bît
Nobedar im li wê gewrîka
Hindav qefesa sîngê te yê şekirî
Dilê min jî dûrbîne ye li ber çavên min
Hêv dikeme, mêwa tirî
Hêv dikeme, wan hêlînên xirabkirî
Wan çîçikên serlêfirî
Wê bihara agir pê ve û
Pê dikenîtin, buharvanekê serserî
Xanima min
Dema dihême ramûsana wê pirçê te
Ev esmanê li hindav me
Esmanekê pir bê bext e
Mar jê dikevin
Mij û mûran jê dizêtin
Ewrên reş û bi gurr detin
Tariyê diketin
Dibit senger
Rêya te li min berze diketin
Dengê birîsya jê dipeşit
Xwîn jê dipeşit
Dibit agir û dihêtin te
Da te bisojit
Şepirze dibim û tengij im
Min divê di hewara te bihêm
Zûka bihêm...
Lê xanimê
Dunya li min zivistan e.
Tarîstan e
Pirî dirinde û dehbe ne
Xelkê rê ve... Dunya şev e
Kifristan e... Kifristan e

* * *

**Di wî demî de**
**Ez û şev û bêdengî jî**
**Di mînîn bi tenê**
**Tarî dihêtin**
**Min diket parî û dadirîtin**
**Heyv jî diçîtin û nazivrîtin**
**Xwe diketin Kêweliyek**
**Xwe di bin dehmanên ewran ve**
**Vedşêrîtin**
**Carna car jî**
**Wîqewîqanê diketin**
**Di wî demî de**
**Tenê, tenê**
**Germatiya wan rûyên te**
**Tîrojkên herdu çavên te**
**Wê tarîstanê dibirin**
**Dihên pêşya min, da li ber bihêm**
**Ew çi hêz e…**
**Xwe li ber xerîbiya te bigirit**
**Bişêt bihêt**
**Ji ber têhna ewê germê**
**Evê eşqê û evê şermê**
**Serxweş dibim û vedhejim**
**Dibim şemalk**
**Di rêya te û çend aşiqan de disojim…**
**Di rêya te û çend aşiqan de disojim…**

# Îsmaîl Badî

Di sala 1963'yan de, li gundê Badê, nêzîkî bajêrê Duhokê, ji dayîk bûye. Di sala 1970'yî de, her li gundê xwe dest bi xwendinê kiriye û di sala 1984'an de, amadeyiya bazirganiya Duhokê bi dawî aniye. Helbest û nivîsîn û vekolînên edebî di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr.

Berhemên amade ji bo çapê ev in:

1. Dîwaneka helbestan bi navê "Rondik û gazî"
2. Komeleka heyranokan bi navê "Bo her dilekê evîndar, nêrgizek"

Niha jî li Kurdistana Başûr ye. Dê çend helbestên wî jî, ji tîpên Erebî wergerînîn yên Latînî.

## EŞQA TE

**Hey welat**
**Ev eşqa te,**
**Te kirye dilê min...**
**Demê zarokînyê ya bûye**
**Deryayeka bê bin...**
**Tevnê xo yê danay,**
**Vê gavê, xem û kovanêt min...**
**Qet neşên ji ber bên û biçin...**
**Nebilivin...**
**Nebilivin...**

*1982*

# STRANA ZAROKEKÊ MEHABADÊ

Ne serdarê min ne.
Dest û piyan li min nebire!
Herdu çavêt şeyda,
Qed li min negire!!
Evro cîhana me şeveka tarî ye,
Roja me ya bi stirî û dur e!!
Ez her dê kevme nav,
Dest û lepêt neyarê şire!!
Ne serdarê min ne...

* *

Zaro me...
Ez hêjta zaro me!!
Şêr im... Pehlewan im...
Her û her dê bêjim serbestî...
Hey ho dayka min-ê... !!
Belê kanê rastî!!
Qed nahête gotin...
Dilê min birîndar e
Ji vê jînê bi hawar e
Bi dozex e
Her bi nalenal e...
Li nav şevêt tarî û dirinde
Bê find û şemal e.
Li rojêt adarokan
Herê bê heval e...
Li ber tîrojkêt êvariyan
Li gel te serdaro bi nalenal e...
Hey serdarê min-o!!
Rastî ye... Rastî ye
Hêşta ya tê re may

Li nîva binê deryê
Çi nema dê kevyê
Dozexêt şevêt reş
Her dê dene bay...
Ji mêje dayka min gotiye:
"Bêder xema ba ye.
Hey da û babê te nemaye...
Hilo, hilo, zwî be
Tola babê veke,
Bêdera xo bide bayî
Çinkî bayê vî mil î
Yê bi seng û hêz e
Li ser vî dil î... "

* *

Ho dayê zarok im... !!
Bextê te me dayê, neke girî. !!
Ger ez hatime kuştin,
Sera babê şirîn
Ne dayê... Nekey...
"Te bi giryê, hîvî birê"
Ceger kuşt û zwî mirî... !!"

* *

Ne dayê ne... Nekey
Ne serdarê min e
Hêşta ser çalepkan
Dergehê kovanan venekey...
Nazdar im neşême kovanan
Hey ho dayka min-ê... !!
Hey serdarê min-o... !!

*1983*

# BARÊ KARWANÎ

**-Xem û kovanan**
**Dê hinêrim bo periyan,**
**Taveheyva zer nedîtî...**
**Rondik û gaziyan,**
**Dê hinêrim bo şenge,**
**Xatwîna kes nedîtî...**
**-Xem û rondik**
**Xem û gazî**
**Evro bar in... Ne xoş şêr in...**
**Karwaniyek hat û**
**Hêlam bi rê ve**
**Barê wî tev,**
**Cihal û têr in...**
**Rêya aşî girt û xalî kirin**
**Welê çi genim e, çi nok in... !!**
**Hemî Ejdehak û mar in**
**Xudanê xo vedikujin**
**Bi rê ve, vedihêrin... !!**
**-Xem û kovanêt wî**
**Rondik û gaziyêt wî**
**Biken cihal û têran**
**Her zwî bo zaroyan**
**Bihinêrin...**
**Bihinêrin...**

*1987*

## AXIFTINA ME BO XO DIBÊJIN... !!

**Şeva me roj e û**
**Hindek dibêjin direw e û**
**Qed we nîne...**
**Ma çi bêjim...**
**Bawerî evro**
**Ya berze ye û hindî digerim,**
**Li vêre nîne...**
*** ***
**Guh bidenê yê çi dibêjin...**
**Har û dîn bûyn**
**Yê nezanît**
**Dê bên eve çi gêj in...**
**Gelek rast e... !!**
**Hindî bêm û biçim**
**Dê bêjin we nîne û...**
**Axiftina me direw tê nîne...**
**Rast e û bo xo dibêjin... !!**

*1988*

## SÊ KEVAL

**1**

**Çûme Bilqê**
**Bo bilqebilqa dilê min…**
**Ji tirse… Ji birse…**
**Yan ji pirse…**
**Şer e û lûliyêt tifenga gazî ye**
**Firêna teyrê kund e**
**Li hindav serê me…**
**Keraxî bizav e û**
**Genim û nokêt li aşê gundî**
**Di vehêrayne û bûne berê min… !!**

**2**

**Çûm bixwînim li nav kevran**
**Li şîva kepran**
**Min nedizanî**
**Kul û derdêt xo ji kêra bêjim… !!**
**Xemêt hemyan**
**Bûne çiyan**
**Dilêt hemyan bûne derya… !!**

**3**

**Ho gundîno bilorînin**
**Destê xo di serê min de bînin**
**Ax û of û giryê**
**Hûn ji min re bînin**
**Rondikêt kel**
**Ji diyariya me**
**Ji "tabîta" me re bînin**
**Rondikêt kel**
**Ji diyariya me**
**Ji "tabîta" me re bînin… !!**

*1989*

## TÎROJKA TAZEHELATÎ... !!

Eza min ya serxor e û
Divêtin min nehêlît...
Eza min Ejdeha ye û
Hindî dihêmê
Rêkekê bibemê
Hera ji xo ye û neşêm
Di ser de,
Dil û mêlakan li min dikêlît...
Hey jaro...
Ev eza he
Hindî bêjî bê bext e...
Ez kirime dêwek û
Berdame nav rêlistanan
Tev serekanî û com û celalan,
Bi min dişêlît... !!
Ezê, ezhilgirê
Bi evê gav û demê
Tu bi Xudê key
Min derîne
Ji mij û mûran û temê...
Hêdî hêdî tu min bilivîne û
Ha nêzîk e wê mirazê
Dê gemê...

* *

**Çi miraz e… Çi daxwaz e**
**Hizar gerdena sêdar e**
**Ji bo maçî kirî…**
**Hizar bejnbilindan…**
**Di kuncêt tarî ve,**
**Dest û pê di zincîrkirî…**
**Ezê… Ezvan im evro…**
**Xemê… Xemvan im evro…**
**Ji bendiyêt welatê min**
**Ta ku nihe**
**Ewan hêşta nedîtî**
**Tîroşka hinde sal e**
**Em li jivan û tazehelatî**
**Ser û ser, ji nû me xo têwer kirî…**
**Ser û ser me ji nû xo têwer kirî…**

*Duhok, 1991*

# Simko Amêdî

Di sala 1951’ê de, li bajêrê Amêdiyê ji dayîk bûye. Her li wêrê xwendiye û di sala 1975’an de, xwendegeha mamostetiyêli bajêrê Mîsilê bi dawî aniye. Em nizanîn kengî dest bi nivîsîna helbestan kiriye, lê di sala 1981’ê de, ji ber terora faşîstên Iraqê, nekarî li ser karê xwe bimîne û geha şoreşa Kurdî. Hîngê wî helbestên xwe dixwendin û di sala 1985’an de, dîwanek bi navê “Ji davên jana” çap kir. Wî bi destekê tifeng û bi yê din jî qelem, bizaveka gerim û berdewam dikir. Lê mixabin piştî xebateka dirêj, di roja 10.4.1988’an de, dema bi karê xwe yê şoreşgeriyê radibû, kete bûseka dijminê çepel û şehîd bû.

Em dê çend helbestên wî, ji tîpên Erebî wergerînîn yên Latînî.

## BI RASTÎ XEMÊ

Hindî tu bêy, min tu divêy
Bes ma çi bikem...
Ew kizotê te û babê xo ji min xwastî
Ji van dest û milan nahêt...
Tu ya dibînî ez pale me
Spêdê heta roj ava dibît
Li ber tîrojka evê tavê ez ê dibezim
Ez nagehim
Xuhê ji enya xo vemalim
Da bes bijîm
Rêtkeka nanî da vecîm
Nîvek şeva ez nanivim
Dest û tiblêt xo xena dikem
Ne ji ber keyf û çi seyranan
Ji ber hindê
Da van avleka tena kem
Vêca kengî
Dêwe çêbît ku ez bişêm
Bi karê merê, yan jî tevrî
Parê kizotey kom bikem
Bi rastî Xemê
Ez we dibînim
Ev mehane, te û babê xo havêt ber me
Da bi vî rengî, xo ji me veken
Xo ji me dûr ken
Hey ho Xemê...
Ji nûka evro pêhesyam
Li nik hindekan
Evîn bes bi tinê pare ye
Mirov li nik wan çi nîne...

*1983*

# RONDIKA MIN

**Rondika min, Sîpeleka aveka bûş e**
**Na şêlî bît. !**
**Bi gevizka cotekê masiyan,**
**Li dûr xerzê xo...**
**Rondika min...**
**Şeperek e, ji kilox û serêt mirovan**
**Di nav de dihelin û bilqêne**
**Çira û şemal û xetîra...**
**Çi rengê renyê bi ser de bêt**
**Ne ev şemalke vedmirît**
**Ne ev çepere diherifît**
**Rondika min...**
**Şev bêrî ye**
**Bi darê tivenga mawîzer!!**
**Ew tivenga heta niho**
**Lûlya wê, ne sar bûy û**
**Hera kel e û dêmînît kel**
**Dest û dilêt minê pêve û**
**Jêvenabin...**
**Hindek rondik, ji evan çavan**
**Ne çik bin û ne zuha bin...**

*1984*

## JIYÊ KURDAN

**Aştî û Helgurd
Herdu Kurd in
Di zîndaneka faşîstan de dijîn…
Ez nizanim, ev zîndan e
Li Kerkîkêye. !
Yan Sinindec yan li Diyarbekrê ye
Ez we dizanim
Li vêjorê ve.
Tibil çavanê ye tê ve!
Ji ber nalînê û dengê qamçiyan
Aştî li ser Helgurdî heldibû
Êkê pisyara yêdî kir
Ka li jiyêxo, çi dîmenê ecêb dîtiye
Aştî gotî:
Kekê Helgurd, jiyê Kurdan
Têde yêpir e ji ecîbiyan!!
Eva dibêjim, yek e ji seda!!
Dema şoreşa Agirî…
Dest pêkirî…
Li wê deverê şerên mezin hatne kirin…
Zûr ziyan bi dijminî keftin
Paşî evê,
Bi agir û asin,
Ev şoreşe bi xwîn vemirî…**

**Ev dîmene yek e ji wêzulma kirî...**
**Li rex gundî...**
**Jineka bihal,**
**Kete di rêya du cendirman de**
**Van cendirman**
**Şert di gel yek û du girêde**
**Li ser pakîteka cigaran...**
**Ka biçîkê di zikê wê de, Kur e yan kiç!!**
**Bi serê sungiyan zikê wê jinê dirandin...**
**Helperixand ev biçîke. !!**
**Ji malbiçîkî de îna der. !!**
**Helgurdî got:**
**Kekê Aştî... Mijî ev dîmenê dîtî**
**Li Xurt û Dekan, li herdu gundêt**
**Bi kom lê şehîd hatîne dan...**
**Ji ber gurriya têhna agirî**
**Zarokek ji nav agirî direvî...**
**Dema wî çav bi faşîstan keftîn**
**Careka dî ev zaroke**
**Bo nav agirî...yekser zivirî... !!**

## KELHA NÊRIYAN

Ho xelkîno! Welatê min!
Evro yê bûye şêva pencan.
Cokêt lê diçin...
Ji xwîna gencan...
Zarokêt di nav de dixendiqin...
Ev çiyayên hinde bilind û ciwan,
Divêtin ku bimehin
Da nemînin kelhêt nêriyan
Bes wekû ez yêli şivanetiyan
Xelkê gundê xo şehreza
Wextê nobê li pezî digirin
Şivanêt wan qet li şevînan naniv in...
Eger hat û yekê biyanî
Kewalê wan bi xurtî çêrand
Bi kom dê xo li ser vebirin
Qet we naken, bihostekê lê biçêrînin
Evcar gelo...
Ez ê bi xelkê xo ûmêd im
Xo xwîn bigehîte kopêt çiyan
Ne çiya dimehin...
Ne nêrî ji kelha xar dikevin...

## ŞIRÎNA MIN

**Şirîna min…**
**Ew derave…**
**Evro tu di ber xo ra biçî…**
**Pirçê şekey.**
**Lêvan sor key.**
**Ewan herdu çavan kil dey.**
**Kiras û kurtekêt nû**
**Li ber bejn û bala xo bikey.**
**Tu nû bûkî…**
**Tu nazikî…**
**Qeçax û rêgir di mişe ne…**
**Li dûrêt te ne.**
**Eger evro tu ho nekey**
**Bi evî rengî tu kar nekey**
**Ev qeçaxe dête gezin**
**Tirsa min bi tinê ew tirs e**
**Weku caran ev qeçax e**
**Te bimezêxin…**
**Te bihingêvin…**
**Em bi mirada xo nekevîn…**
**Em bi mirada xo nekevîn…**

# DÎMENEK JI GUNDEKÎ KURDISTANÊ

**Wesa çêbû...**
**Li jorya welatê xo gelo...**
**Ez li malekê bûme mêvan...**
**Ez hewandim...**
**Cihê ji hemiya xoştir da min...**
**Kevilkekê pezê kîvî,**
**Dana bin min...**
**Bermalkeka mûyê pezî,**
**Dana pal min.**
**Xêrhatineka zûr a ciwan,**
**Hemiya bi min kir.**
**Di gel vêçendê min guh lêbû**
**Dengê distarekê xoş bû**
**Xudana malê bişkurî û gote min:**
**Ma ez çi ji te û xo veşêrim!**
**Ev çend bû**
**Dilê min têk de gilviçî**
**Westiyan û birs!!**
**Her wê gavê, ji bîra min çûn.**
**Rabû ser xo û gote min:**
**Li me negire...**
**Ya me pêçêbît eve ye...**
**Ez lê zivrîm**
**Ya şirîntir, ji deyka min...**
**Ew bişkurîna te bi tinê**
**Bo min bes e...**
**Bawer bike...**
**Ez wek hewe**
**Kurê hejarekê gundî me...**
**Eve ez ji şîr bizokirîm**
**Min nexariye**
**Ji rêtik û şaloyan pêvetir...**
**Ji cilxîska cehî zêdetir...**

## MIN XO DÎTIYE Û HEME

**Eve min xo dîtî û heme...**
**Ho hevalê!**
**Xema min û te yek xem e.**
**Eve min xo dîtî û heme.**
**Her ezê bindest in dilo**
**Renca evan dest û milan**
**Kî diket û kî dixotin bira!!**
**Xuha li ser enya me pengiyay**
**Ya bûye jeng.**
**Toza li ser leşême aryay**
**Ya kirye deng.**
**Ne ku ew e, ez nizanim!!**
**Ne ku ew e, ez êgêjim!!**
**Ne ku ew e, ez nabêjim!!**
**Karwane bihajo... Rê dûr e...**
**Karwane bihajo... Rê dûr e...**

## SEREDANEK BO SER KAVLE GUNDÊMINÊ SOTÎ

**Kavlegundan...**
**Xemhilgira ser bilindan...**
**Qaremanê çîrokêt min?**
**Ezê te dibînim yê damay**
**Xirr û xalî, kes lê nemay**
**Ka bêje min, sîç ya min e**
**Ya canya te ye, evî bayî.**
**Kavlegunda...**
**Xelk zûr yê li ser te axiftî**
**Heryekê weku hez kirî**
**Qise û gotinên bi xo kirin**
**Bi rengê çîrokê**
**Bi rengê hozan û metelokê**
**Bes kela min**
**Bi çi gotinekê ji van neşket!!**
**Lewma min ev rêke şeqand**
**Ez hatim min qesta te kir.**
**Da bi çavêt serê xo bibînim**
**Halê ku tê de dijî**
**Hêşta ezê gelekê ji te dûr**
**Helma pelemûrê li min da**
**Bay, ji kadî û xoliyê**
**Kînek li hindav min ve da**
**Min ji bêhna darêt çinarê**
**Têdiîna der**

**Tu yê bi dar û ber ve disojî!!**
**Hindî ez nêzîkî te dibûm**
**Ev bêhne, dijwar û tîj dibû...**
**Ta ez gehiştîme gelî**
**Çerwanê încey û çilî**
**Ez bi ser koma terman helbûm!!**
**Yêt reş û şîn û helweryay**
**Bi kom yêt mirîn...**
**Bes mirina wan, ne wek kesêt mirî**
**Hîngî min dirust zanî**
**Gelek ji evîndarêt canya te**
**Di gel te yêt hatîne sotin û mirîn**
**Kavlegunda...**
**Zîka bersiva min bide**
**Dîmenê te...**
**Reng û rîbar û halê te...**
**Dilê min yê kiriye serad, mejyê min dot...**
**Ezê bi te serbilind û hebûm**
**Ma piştî te mana min**
**Hebît yan nebît, bo çi ye!!**
**Jîna bi kotkê û derbederiyê**
**Çi bihayê wê heye?**
**Jîna dûrî te ha gundan...**
**Çend şirîn bît**
**Li def min, ya tehl e û zirwend e**
**Nobedarê caniya min**
**Evîndarê rûbar û şax û rezêt min**
**Xema nexo...**

**Ez têk de xirek ser bûm**
**Gelek caran ev kirasê kiriye ber min**
**Belê bi renc û têkoşîna hewe**
**Ez ava bîm, carek dî**
**Ciwantir ji berê**
**Ewir her diêne esmanî**
**Bes diverevin**
**Eger çavêt rojê derkeft**
**Hûn bo min çavêt rojêne**
**Bi davêt hewe dê ava bim**
**Çêtir ji berê**
**Ev kadî û tenya ji min diçît**
**Dêli esmanêt dijminêt me**
**Bine ewir… Û ev ewre**
**Dê bin tofan…**
**Dê bin ber û lêmişt û tengavî**
**Dê li ser serêvan dijmina da hêne xar**
**Dê li ser riyê erdî malin**
**Hîngê nê dêzanin hemî**
**Dîwarêt min yêt helweşyayn**
**Bilindtir in**
**Ji zulm û zordariya faşîstan…**

# Silêman Amêdî

Di sala 1953'yan de, li bajêrê Amêdiyê ji dayîk bûye. Her li wêrê xwendiye û di sala 1976'an de, xwendegeha mamostetiyê li Duhokê bi dawî aniye. Her ji sala 1979'an de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye, lêheta niha dîwanek çap nekiriye. Di sala 1985'an de, ji ber terora faşîstên Iraqê reviye û gehaye rêzên şoreşa Kurdî. Di sala 1988'an de, ji ber çekê kîmyawî, di gel sedan hezaran reviyan û derbazbûne Kurdistana Tirkiyê. Niha jî li Kurdistanê ye.

## NÊRGIZ

**Erê nêrgiz, ma ne zû bû!**
**Tu bişkiftî û bêhna**
**Adarêji te nehat. !**
**Ma ne zû bû**
**Hêçta nêrgiz!!**
**Befreka stîr,**
**Di rê û kolanêt gundê me de**
**Bûye kevir, maye li ser yek…**
**Ne çi sahî. ! Ne çi baran. !**
**Serda nehat. !**
**Bazirganî ye…**
**Gêleşûka xwazgînî ye…**
**Êyara min, tu nexwastî**
**Ku te jêkem. Bo binêrim…**
**Jê re te bikeme xelat**
**Tu nîşana biharan î**
**Rengê te yê zerêciwan**
**Navêt e yê bihagiran**
**Evro çima?!**
**Şêt û nezan**
**Serêt çiyan… Bin kevir û lat**
**Zî têk vedan**
**Ne… Ne nêrgiz**
**Te nakeme diyarî û xelat**
**Te bo yarê nahinêrim**
**Da nebêjin… Xoyî û biyan**
**Nêrgiz ji yara te nedihat**

*** * ***

**Hindî nêrgiz, min guh lê bî**
**Ewan warêt tu lê hebî**
**Çi cihêl û evîndaran,**
**Zî neçinî**
**Heta rengê te zer nebî**
**Têr bilind û ciwan nebî**
**Bihar kesk bin... Sêran xoş bin...**
**Lat û nizar, ji te pir nebin**
**Paşî nêrgiz...**
**Şehreza û lawêt kevin**
**Ketne çiya û li te geryan**
**Tu hînay û kirye xelat**
**Hemya bo yara xo birî**
**Erê lewma nêrgiza wan**
**Heta. Heta, her dimînît**
**Solîn geş û xemla ciwan**
**Li cihêt bilind**
**Hera zer û naçirmisî...**
**Hera zer û naçirmisî...**

*1986*

## DENGÊ DEFÊ JI DÛRÊ XOŞ E

**Min bihîstiye.**
**Dibêjin: Behişt,**
**Warê xirr mirovê çak e...**
**Pirr e ji pesniya xoşiyê**
**Di beryek de diçin**
**Rîbar û co,**
**Mey û hingivîn... Şîrê çak e...**
**Dibêjin yêt lê, zerî û perî**
**Hinde di can in,**
**Kes nizanît, ji bilî Xudê**
**Çav derya ne, pirç armîş in**
**Bejin çinar in, cwanya wesa nîne li dinê**
**Ne Monalîza bo cwanya xo**
**Ne jî cwanya bejna Zînê...**

*** * ***

**Dibêjin... Dibêjin**
**Hindî ez heym**
**Herê dibêjin: Li behiştê**
**Mêrg û çîmen. Deşt û zozan**
**Cinîk di rêz in.**
**Dil jî hindî mereqkêş in**
**Min xewnek dît**
**Min dît du, sêbestêt beran**
**Sêçar rêzêt Pêxemberan**
**Kêşkêşe ye**
**Her çenda rêberek heye**
**Şîna periyan.**

Pîr e reben yê li ber deriyan.
Ez mam û min got:
Herê... Herê, çi behişt e!!
Kanê behişta jê digotin?!
Zanayekî li min vegêra:
Gotî mamo hera ho ye...
Behişt xodîka dinê ye
Ez mam, min bersiva xo da
Min gote xo:
Xoşiya behişta jê digotin
Wek ciwaniya yara min bû
Da bêne min...
Torîneka naz û xin e...
Evîneka xoş û kin e...
Paşî min dît
Dîroka wê zûr aloz bû
Jêk şe nabît, ser û bin e...
Nerên ji erêna pitir e
Rûbarekê zûr yê boş e
Ne qayix e pêderbaz bim
Ne daveriste
Çi şîr nahêt!
Ma gîskênêr her bidoşe!!
Belê dibêjin:
Dengê defê ji dûrê xoş e... !!
Dengê defê ji dûrê xoş e... !!

*1987*

## HIZRAN NEKE

Dêbêjye min,
Hizra neke... Li baxçêt me,
Mêrg û latêt hemî nêrgiz
Şilêr û heliza şeng e
Ker û çavrî yê lê diçerin...
Vêca were û hizran neke!!
Şêr û piling, li ber rîviya
Bo xo direvin
Feqe û reben bîne zirtek
Qeşe û mela li ber çi nînin...
Bi xo çi neken, ew ne diferin...
Û dêbêjin
Dê biaxive û hizran neke...
Vêca were û hizran neke...
Xudan keziya wekî maran
Were bi xurtî, bo pîrekê
Bêhêz û hiş
Hemya şeke
Sîngê xo yê, terr û nazik
Nîva şevê, tu bi xo veke
Û dêbêjin:
Dê bike kenî û hizran neke...
Vêca were û hizran neke...
Dê bêjne min: Hizran neke...
Û li warê min, kavlegunda
Kadî û gurrî ya jê difirîtin
Şkeft û binber

**Pirî zarok, bêxwandin in...**
**Rojê sed li ber bomban dimirin...**
**Û zarokêt, beg û kîxa**
**Şêx û axa**
**Di birca de mendehoş in**
**Bi şevê dizirin...**
**Êdê bêjin, tu bi Xudê key**
**Ka bizivre û hizran neke.**
**Vêca were û hizran neke...**
**Dê bêjne min hizran neke...**
**Êdem biye çerxê bîstê**
**Hemya têr xwand**
**Firrîn çûne banêt stêran**
**Em vemayne, li me direng e**
**Dê xirr ve bîn li koçkêt axa**
**Rîvya berdeyn dewsêt şêran**
**Heya evro, li welatê min**
**Mîr û xwendekar**
**Her şêxan e û têşke axa**
**Eve derdê bê derman e**
**Û dêbêjin: Hizran neke...**
**Vêca were û hizran neke...**

*1987*

## NÛ HATIN KEVIN XELAT IN

Dem payîz e…
Şevreşeka zûr a dirêj
Tarrîstan e… Tibil çav e…
Çi rêyeka bi teqin û stirî
Çirfeçirfa birîsyan e
Dengê rûbarî hirmên e
Nîva şevê, hat guhêt min
Dengekê tîj, zûrê nazik
Min hêz da xo…
Min rêşeqand… Da nav teqnê
Da bigehmê
Dêdengê dilbera min bît
Min guh ne da, tirs û birsê
Min tên neda, reşiya şevê
Şev dêher çît
Roj dê helêt

* * *

Spêda nû hat
Çûme ber qurmê darekê
Mam min berê xo da dinê
Ter û telîs
Min bêhnek ve da gavekê
Min dîtin tev avahî ne
Gov in, kol in, hind reşmal in…
Gundekê rêncber û boş
Hind hejar in
Pale û cotyar… Çîna jêr in
Gel kovana paş xemekê
Min çav kete bêlayekê
Eywaneka pan û fireh

**Li nav borcekê**
**Xudanêt wana tembel in**
**Dewlemend in… Kîxêt wan in…**
**Tev axa û şêx û beg in…**

* * *

**Piştî şerê hizir û bîran**
**Di mêşkê min de**
**Bîra min hat… Gundê caran**
**Demê stîra, zirav dixarin**
**Mukuma bêhêz, dadiîrran**
**Min gote xo: Pa eve bû?**
**Çerxê guhrînê û gundê min**
**Wekî xo ma…**
**Kevin, dirrinde ye dixurît**
**Nû, Ji tirsêbi xo dimirît**
**Pa ne gela? Mezin dibêjin**
**Nû hatin, kevin xelat in…**
**Pa bo kevnê me her ho ma!!**
**Hizir û zanîn, pêşkeftîxwaz**
**Her bindest in**
**Hizir û bîrêt nû û ciwan**
**Li ber gopalî, herê dirrevin.**
**Têne best in**
**Li bin mêşkekê, kevin û genî…**
**Belê kevna, derdê giran**
**Guherîna evî demî, li min vegêra**
**Mîzgîniyek da me hemiyan**
**Çerxê pêşkeftinê bada**
**Xurt û kevin**
**Pêkve hêran… Pêkve hêran…**

*1987*

# SALA WÊRAN

**Sala ev sal, havîna wê,**
**Bila biçît û nehêteve…**
**Ne ji gazinda cotyarê me**
**Ji deramet û kêveçeran…**
**Ne ji kêm ava kaniyêt me,**
**Belê ji bêdesthelatiya gelê me…**
**Neke dijmin, careka dî bi dirrindahî**
**Bomba mezin, jehir û kîmyayê Helebçe**
**Wekî Bircîn, an Sergelo**
**Kaniya Baska, Geliyê Bazê**
**Mêroj û Sêlk, gundê Hêsê**
**Amadiyê, gelyê Zêwe**
**An Avokê, wek Gerego**
**Sînya hejar, Bi bromanê**
**Seranserî Kurdistanê**
**Pavête ve… Pavête ve…**
**An jî roja bîst û pêncê**
**Meha tebaxa heştê û heştê**
**Ku kavilên hezareha**
**Gund û bajêr, li me bête ve…**
**Ew aşême bi xwînê dizivrrand**
**Careka dî, berova jî, bizivrîte ve…**
**Paşî aşevanêt me hemî**
**Li dîr rawistin, hizran biken…**
**Ka dê çewan distarît wî badene ve…**

*** * ***

**Erê… Erê**
**Bila biçît, nehête ve…**
**Da çi car dî Kurdistana xo ya rengîn**
**Warê ava… Gundêt mezin**
**Şehrêt ciwan.**

**Gorristanêt bêmiradan**
**Mişext nebîn, bi hêlîne ve…**
**Neku li şîna bayê tezî,**
**Li hindav welatê me**
**Kadiya bomban, bêhna jehrê**
**Evrêt reş û stêr û tarî çê bikene ve…**
**Paşî ji nû zarokêt me**
**Bi lavje û sirûd**
**Xozî û hîvya rahêlne ve…**
**Ka dê kengî?**
**Karwanê me, xo dirust ket**
**Zû bidet rê, da biçîte ve…**

*** * ***

**Havîna reş… Sala wêran**
**Wesa biçît û nehête ve**
**Çawan dijmin bêhîvî ye ku**
**Mafê me nahêt xwarin**
**Dê rojek hêt, dê wergirîn…**
**Bi xwîna gencan, bivêt, nevêt**
**Bo dîrokê her bêjît û bêjîte ve…**
**Wesa biçît, da carek dî**
**Ne şilqêyn û bijbînne ve**
**Em hind biçin. Turk û îran**
**Hind jî mînin, gîskêt qurban**
**Bo dijminî…**
**Wekî Akrê, wekî Şêxan**
**Demê Garê pirrî terraş**
**Ne hewandîn, jin û zaro**
**Mîna Metîn, tengederya astengêt xo**
**Terxan kirîn**

Pêqurtal bîn hezareha
Da çi car dî Gare û Metîn
Lêk nekevin…
Metîn ji Garey zîz nebît
Eywana ciwan, li day û baban,
Ne hinda bît, bimînît bi tinê…
Berze bibît li çel û çiyan
Têr lêbigerin… Nebîne ve… !!

* * *

An careka dî
Gelî û mêrgêt Kurdistanê
Lê biçît xwîn
Bine miştax, ji zend û tilên zarokan
Teyr û tewal, bir bir bibêhin
Leşêt nazik, jêk bijene ve…
Paşî dijmin, ewên mayî bi tîzabê
Li geliyê Zêwe
Ewî geliyê qehremanan
Xirra kom ket, bisojîte ve
Da dîroka bindestiya me
Û berperê gunehêt xo,
Ser ji nû reş kete ve…

* * *

Sala giran… Herê rast e
Bila biçît û neête ve
Belê gelo
Hîvî û omêdêt me hemyan
Çak mukum in. Nê zûr tund in
Her dêmînin. Namirin
Ku rojekê bi serbilindî,

**Dê çîne ve…**
**Warê sotî… Kavlegunda**
**Ava keyn û nû keyne ve…**
**Aşê hîvyan, careka dî**
**Bi coyêt xwînê danînne ve…**
**Li gund û şaran, li xwendegehan**
**Zarokêt me, bi serkeftinê**
**Gişt sirûdan bêjine ve…**
**Li şûna taziyê**
**Hewar, hewar û gaziyan**
**Dengê giriya zarokan**
**Li gelî û çiyan, li şûna hemyan**
**Bilind bibît… Jê bifirrîtin**
**Awazêt xoş**
**Şalîl û kew, lê bixwînne ve…**
**Û pêşmerge, bi dengê xo yê**
**Bi sehim û pîroz**
**Tirsinoka… Dijminê me**
**Biteqînin û li dîf biçine ve…**
**Kurdistana me ya zêrîn**
**Lê nemînin pîs û çepel**
**Şêx û axa, kwîxêt gavê**
**Ewrê reşê paşerojê**
**Bo bênaviyê, pare û soper**
**Bibin musteşar**
**Kelêt zulmê, biherrifînin û nehêlne ve…**
**Bi aştî dêjîn…**
**Ya me dîtî… Heştêûheştê**
**Çi carêt dî, nehête ve…**
**Nehête ve…**

*Mûş, 1988*

## BES E, BES E

Yara bes e…
Dîroka vîna min û te
Zûr dirêj bû
Xwazgînêt min nehinêre
Bi hêza zendan
Êlçiyêt zordarî tundan
Bi xudan in
Bi dost û yar in
Çi hovetî tên riya te
Çek dijwar in
Ne te xoya… Ne te xudan.
Bi xo bi rêne rêyeka dî
Dijminê me, dirrinde ye
Ne wî hiş e… Yê bêhest e
Li tev dinyayê, mişext kirî
Ku hîvya xo ji min bibirî
Belê evîna te ma sax û nemirî
Dijminê me ma giriftar
Tev rêkirin, stirî û dirî
Nê wira te, roj bo rojê tundtir lêhat
Rişdtir lêhat
Her li evîna min ziviri
Hîna sala heştê û heştê
Çi pênema
Dinya li min û li te kir jehir
Nê yê mayî

**Agirê vîna min û te**

**Lê çû gurî**

**Careka dî li derbederiyê**

**Li warêt xelkî**

**Sêcar da te nanê bi jehir**

**Dijminê me, bêhin nehat**

**Welatê me, warê berdayî**

**Şewitandin çiya û kevir**

**Belê. Belê**

**Evîna me her ma sax**

**Ne. Ne. Nemir**

**Lema yara, dibêjim bes e**

**Tu bi vêrêkê**

**Nikarî me serbest bikî**

**Çerxê bîstê**

**Dijminê te tête guhertin**

**Dê, dê yara, xo biguhire**

**Bi xo tênde, rêyeka dî...**

**Bi xo tênde, rêyeka dî...**

*Mûş, 1989*

# Hişyar Rêkanî

Di sala 1961'ê de, li bajêrê Duhokê ji dayîk bûye. Sereta û navincî li Duhokê xwendiye û amadeyî li Zaxoyê bi dawî aniye. Di sala 1976'an de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Di sala 1983'yan de, kurteçîrok jî nivîsîne. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Di sala 1980'yî de, gehaye rêzên şoreşa Kurdî û di sala 1986'an de, ji layê faşîstan ve hatiye girtin. Bi dirêjiya salekê dane ber mezintirîn eşkence û ezyetdanê û di 1987'an de, bi hukmê hetahetayê hate zîndanî kirin. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Heta niha çi dîwan çap nekirîne, lê ev berhem, ji bo çapê amade kirine:

Berhemên amade ji bo çapê ev in:

1. Dîwar, Helbest.
2. Babelîsk, helbest.
3. Pêla reş, kutreçîrok.

Niha jî li Kurdistana Başûr e.

## TARÎŞEV E

**Tarîşev e…**
**Nizanim dê çi nivîsim**
**Hejar im, birsî me, rwîs im**
**Hozanêd min…**
**Melîl in, pirî girî ne**
**Verêja xamê min xwîn e**
**Hosa dilê xemxor û kul,**
**Hilingift û neşya biçît…**
**Hîvya min ji wê hîviyê heye**
**Mîrê tarrîstanê bimirît.**
**Da reşekêd wî nekarin**
**Hîvya ji dilêmin helînin.**
**Dema tarrîstan, revî…**
**Di gel elinda roja geş,**
**Hozana min,**
**Dêbîte strana eşqê û**
**Dê kovanan ji tev dilan verevînît…**
**Li ber awazêt semfoniya**
**Hêj nelêday**
**Dê birsî û rîsa leyzînît…**
**Ew hozana ji davêt rojê pêkhatî,**
**Kevalêd viyana nekir**
**Li ser dilê tev aşiqan,**
**Dê nexşînît…**
**Dê nexşînît…**

*Tehran, 1981*

# ÇEND DÎTINEK

**Rêya eşqa me asteng e û**
**Jîn aloz e.**
**Lewre çavêd me bûn kanî...**
**Lê çaxê roj ava dibît,**
**Roj di xwînê de digevizît,**
**Aso sor e**
**Ma weha ye rindî û ciwanî?**
**Kilumtêd çiyayêd kevnar**
**Kevir jor de jêveristin**
**Çitov îro posîde ne**
**Mizgîniya eşqa mezin**
**Aşiqan jê re neanî**
**îro şivanê pezê me,**
**Gurgan pezê lê qirkirî.**
**Serê wî li ser gopalî ye û**
**Kepenê li milê xo pêçay**
**Dengê xewê,**
**Yê jê digehîte esmanî.**
**Rezvanî jî...**
**Hirça tevirkê lê şkandî**
**Binêd mêwa lêhelqandin,**
**Bo çi ye çêket percanî.**
**Cotyarî jî...**
**Reşekêd Axayê kedxar**
**Cote gayêt lêvekuştîn**
**Şîv û zevyêd lêstandîn.**
**Ji xema re, yê qurma li qelînê didet,**
**Çîroka xo kire beyta Sîsebanî. Aşvanî jî...**
**Fengenosa, ava li ser aşê wî girtî,**
**Çirîsk ji bin pêd wan peşîn,**
**Cewalêd genmî lê sotin.**
**Dê çewa çêket hevranî.**

*Dîmeşq, 1982*

## BEFRÎK

**Wek xunavê,**
**Befrê enya min dapoşî**
**Lê baran hat,**
**Careka dî kire tenî. !**
**Hizrêt zarokînya berê**
**Di serê min de bizivîn**
**Dema destê befrîka babê min şkestî,**
**Min hîl, hîl pê kire kenî...**
**Dema her şev...**
**Sirêna bagordanê  me,**
**Ji xew dikirim,**
**Ez û xew jî di bûyne hevrik**
**Ez ditirsam,**
**Ji Kabûs û Ehrîmenî...**
**Iha îro...**
**Di nav befrê de radibim... Dinivim...**
**Li ber baranê, dihêm û diçim...**
**Ava baranê bi leşê min ve qerist**
**Ev pêkole û ev bêgare**
**Tinê da xo neçemînim...**
**Da nebêm kesê ezbenî...**

*Gelyê Dihê, 1983*

## GULÊD SOR

*Bo sêzdeh siwarêd Behdînan;*
*Faris, Cengo, Şemo û hevalêd wan*

Hey gulêd sor
Hwîn bi xwînê hatin avdan…
Lewre rengê we tim sor e û
Bi mizgîniya geşbûna we,
Gulistana me xemilî…
Kiçêd gundî…
Çavêd belek,
Bi reng û bêhna hewe kildan,
Heyla mino
Evan çavan û vî kilî…
Hey gulêd sor
Piştî destêd reş û deqday,
Hwîn piçandîn.
Li nav qafkê koçka mîrî,
Sîs kirîn û çirmisandin.
Bo xo kire, filî, filî…
Sêzdeh siwarêd Behdînan.
Têhniyêd ava kaniyan bûn…
Birsiyêd nanê gundan bûn.
Berî bigehne welatî û
Avê vexun… Nanî bixun…
Berî bêhin kene gulêd sor,
Ketin bosa dirrik û stiryan
Girtin… Birin… Helawîstin
Çirakêd jiyê wan, yê genc
Lê vemiryan… Lê vemiryan…

**Dilistana nav û dilê wan,**
**Lê hilhilî... Lê hilhilî...**
**Hey gulêd sor**
**Piştî laşêd we yêd pîroz**
**Min bi tabîta destêd xo**
**Bo bin darêberî û mazyan**
**Veguhastî û**
**Nixaftîn bi belgêd çilî...**
**Kutirka rondik li ser we**
**Her barandin... Her barandin...**
**Kew her qebîn... Qebîn... Qebîn...**
**Vêca gelo**
**Çi nalnal e vî şairî.**
**Çi nalnal e vî bilbilî.**

*Duhok, 1985*

## DENGEK HAT MIN...

*Diyarî bo şehîdênemir Yilmaz Guney*

**Dengek hat min...**
**Ji Ewropa ... Ji rojava**
**Min jî bihîst,**
**Yilmaz Guney**
**Îro mêvanê Domos û Bodlêr e**
**Li gorristana pêşava...**
**Hemî dîmen bûne filmêd sînemayê**
**Filmê "Rêge", rêya jînê,**
**Rêya armanca bigehînê, nîşa me de**
**Da em lê pajoyn pêngavan...**
**Filmê Dijmin**
**Dost û dijmin, jêk vavartin**
**Me zanî kî dostêd me ne û kî ne dijmin.**
**Em bûne zana û şareza**
**Li tev panavan...**
**Filmê "Celeb"**
**Hawara tev hejaran e**
**Yêd evro tevnê wan aloz**
**Û bi wî tevnî ketîn dava...**
**Û hawara axa bindest,**
**Ya tirs û birs, lê bûye mêvan**
**Bêdeng... Bêpirs... Lê bûy xudan...**
**Ya hêj navêwî neketye, nav çi nava...**
**Dengek hat min...**
**Got: Nêzîk e zîndana dûrga Îmralî**

**"Dê şifşêt pencera lê şkên.**
**Balinde wê azad bibin. "**
**Ho xelkîno**
**Li tengaviya, me sînema û ekter divên...**
**Lê li xoşî û berfirehiya,**
**Dema roja nû dihelêt**
**Millet dêjît bi serferazî**
**Hezarêd wekî Yilmazî**
**Serbestî bo bibîte bûk û**
**Kurdistan jî bo bibîte zava...**

*Duhok, 1986*

## KENYA BIŞKOJÊ

**Bişkoja damay.**
**Her girî... Her girî...**
**Hêşta nebûy gul. !**
**Tim dirk û stirî**
**Di pêyan diçeqîn**
**Di çavan diçeqîn**
**Kanîk û zevî**
**Lê mabûn sil.**
**Lê bilbilekî...**
**Dilopêd xwînê jê re baran din...**
**Bişkoj bişkift û**
**Kenî û bişkorî**
**Bi deng û awaz**
**Lê kom bûn bilbil...**

*Zîndana EbûXirêb, 1987*

# ÇEWA HOZANAN BINIVÎSIM?!

*Diyarî bo canemergêd Enfalan*

**1**

**Hey ho... Hey ho...**
**Ew hozana te ji min xwastî**
**Nizanim, çewa binvîsim!?**
**Ne min hizr e. Ne min bîr e.**
**Ne min hoş e. Ne min jîr e.**
**Duhî ho ve...**
**Jiyan revand û bire dûr**
**Viyanê ji dilê min bar kir**
**Ez mam evîndar û bêviyan**
**Ez mam hozanvanê bê hozan**
**Iha bê war û bê lîs im. !!**
**Mijê dol û nihal girtin**
**Kehî û kîvî**
**Her ji şêrî heta rîvî**
**Bêcan kirin**
**Aşiqêt jar û belengaz**
**Bûne mişext, hind jê mirin**
**Hind beref sernişîvî birin... Birin...**
**Çewa hozanan binvîsim: !!**
**Kezyêd bêrîvana min**
**Yêd biyaniyan lê birîn**
**Kirîne ristêd sêdarê**
**Sera hozaneka bitinê**
**Dê xo pê ve helawîsim...**
**Helawîsim...**

**2**

**Hey ho… Hey ho!**
**Ew hozana te ji min xwastî**
**Çewa birêsim?**
**Ne min teşye badem… Badem**
**Ma bêristin,**
**Çewa dê bît tîrojka straneka hel?**
**Çûn binûsim. !?**
**Ne min deng e. Ne min reng e…**
**Ne min çeng e.**
**Ne min xame ye û ne rûpel.**
**Iha îro…**
**Tirsinokêd ji hêlê revîn**
**Li ser serê min bûne Herqel.**
**Ew korsê stran vedgêran**
**Li pişt zîrî, bêcan kirin**
**Bi destêd gemar û çepel.**
**Bi xwîna wan…**
**Mêrg û çîmen tev xena bûn**
**Têhn û germa wêxwîna sor**
**Ev dar û ber**
**Kirne pêht û agir û pel.**
**Bi xwîna wan…**
**Ava rûbarî bo lehî**
**Sor bû… Sor bû…**
**Havêtin pêl,**
**Zivrok. Sîpel…**

**3**

**Hey ho... Hey ho!**
**Xwîşka biçûk...**
**Heval û hev derda minê**
**Rast e teşya min ya şkestî**
**Ez bome qerqodê hestî**
**Ger va ye halê aşiqan**
**Ger kezyêd zerî û bêriyan**
**Birîn... Birîn...**
**Kirine dav û kirine ristik**
**Ez jî pê ve helawîstî.**
**Lê pa îro...**
**Tinê min bawerî maye**
**Her çend kêmhêz û vejen im**
**Lê li pey hêza bawera xo dê bizivim**
**Ger jiyan bibîte agir**
**Dê bim bizot...**
**Her ez dê strana bêjim û vegêrim**
**Dê şwîna kursê xo girim**
**Dê li nav gulistana bê gul,**
**Gulan çînim.**
**Dengan înim.**
**Rengan bînim.**
**Çengan rast kem, dest helînim.**
**Dê li pişt zîrî azirîn.**
**Tu azirî.**
**Ew azirî.**
**Ez azir im.**
**Werin dest pavêjin destî...**
**Werin dest pavêjin destî...**

*Duhok, 1988*

## KOÇKA SPÎ

**Ew kesêd duhî...**
**Me jê re digot: Hovêt mirovxor.**
**Pirr gunah û sitem.**
**Li deravê teng...**
**Roja revîn û awarebûnê**
**Di tana me hatin û ji me re bûn semyan**
**Li ser me xwarin, pirr kovan û xem**
**Kanê dostêd me?**
**Kanê sîstema pişta me pêgerim**
**Îro bircêd wan li Meydana Sor**
**Li meyxana sor**
**Koçka Kirêmlên**
**Heta nav evrî bilind in, bilind**
**Li ber şaşa televizyonê, dema me dibînin**
**Pêkêt "hevpişkî" jin û mêr vedixon**
**Ma çi rûda ye? Kurd aware bûn...**
**Werin hêvkenê...**
**Li dûmahiya sedê bîstemê**
**Berevajî ne rijêm û sîstem.**
**Lê koçka spî û hêzêt hevpeyman...**
**Serdarêd dinê**
**Wan rû spî bin**
**Evroke bûne hevalêd hevdem**
**Lomey min neken. Dostêd hevteor**
**Xelk hawî bûn...**
**Ma em çi li ber çavan dibînîn.**
**Bijlî esmanek pirr mojan û tem.**
**Pirr mojan û tem. !!**

*Xîvetgeha Çelê, 1991*

## RABE BINVÎSE HEY DÎROK!!

**Toz e yan xubar e**
**Bûye tavbir… Bûye navbir…**
**Yasa berevajî kirin**
**Bîrdoz kelaştin û sotin.**
**Neman bîrok…**
**Tariyê perda xo kêşa**
**Ser şanoya bêser û şîn**
**Lêvêd şanovanan, pêlav bûye dikirin**
**Ew navêd navdarêd mezin,**
**Kirne pêtirank û lêvok…**
**Serêd mezin…**
**Mirovan wek maran digezin**
**Hiringên e… Diringên e… Heşamet e…**
**Hawar û qêjî û qêrîn e**
**Ev mirove, çi dixwazin**
**Bêser in**
**Wek lêser in**
**Rabe binvîse hey dîrok…**
**Rabe binvîse hey dîrok…**

*Duhok, 1991*

# Hesen Silêvanî

Di sala 1957'an de, li gundê Tirkija, devera Silêvaneya, nêzîkî bajêrê Zaxoyê, Kurdistana Başûr ji dayîk bûye. Hukumeta faşîst her zû gundên wan wêran kirin û ereb anîne deverê. Lewre çûne bajêrê Mûsilê. Di sala 1975'an de, dest bi nivîsînê kiriye. Çîrok û helbest jî nivîsêne. Berhemên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e li Kurdistana Başûr. Heta niha, dîwaneka helbestan bi navê "Hozanên Sava" di sala 1991'ê de, bi tîpên Erebî çap kiriye. Dê çend helbestên wî jî wergerînîn tîpên Latînî. Niha jî li Kurdistana Başûr e.

## EWRÊ BÊ BARAN

**Hindî tu bikî û bêjî.**
**Hindî tu bigirî û rondika birêjî.**
**Nazivirim bo te û**
**Viyana te ya reş.**
**Hey dilreşê...**
**Çûn û bûrîn,**
**Ew rojên min digote te**
**Tu kulîlka bihara mina geş î.**
**Tu xanima paşeroja min a xweş î.**
**Çûn û bûrîn,**
**Ew xweşiyên min bi xwîna**
**Dil û mêlakên xwe**
**Bo can û çavên te**
**Her berhev dikirin.**
**Çûn û bûrîn,**
**Ew rojên her deh tiliyên min,**
**Pirça te law şeh dikirin.**
**Gul, gul, ji baxçan diçinîn û**
**Gelwazên gula di stûyê te dikirin.**
**Bimrî êdî na zivirrim**
**Nazivirrim bo viyana te ya reş**
**Ey dilrreşê...**
**Tu ewr î bêbaran î**
**Bêbawer î**
**Direwîn î**
**Çi bikî êdî min nabînî...**
**Min nabînî...**

*Kerkûk, 1981*

## EVÎNDARÊ MEHABADÊ

**Hoy Memo, Memê Alan**
**Hevalê evîndaran.**
**Li wê zîndana bi tirs û tarî.**
**Ji bîr nakî,**
**Dêmê Zîna xem xwarî.**
**Êzer hinî...**
**Werin, werin**
**Evîndarên evî warî.**
**Dê zû werin**
**Desta dirêj kin bo cana bi wefa**
**Da bînin derê, lawkê xirr xema.**
**Da geş bin stêrên şevan**
**Da kutirk bigehin refa.**
**Da bizanin ka em hene!**
**Ma em hene!!**
**Ma em hene?!**

*** ***

**Li çarsûya Çar Çira**
**Ew xwîna zelal rija**
**Bi dengê şêra li darristanê**
**Gote gulistanê**
**Ger gotne te:**
**Çû û naête ve.**
**Dêmirî û nabînye ve.**
**Wan peyva bawer neke**

**Pirça bêxena şeke**
**Çavên belek kil de**
**Lewendiyên şûr hilde**
**Di gel kewa bi qeqebe**
**Dê min bînî di nav davên tavê**
**Mîna çulî li çiyayên Kurdistanê**
**Dê min bînî li ber lêvên avê**
**Wek gulek gelek geş li biharê**
**Dê min bînî li hemî cih û waran**
**Mîna siha kevr û dar û baran**
**Dê min bînî li nav rezî**
**Li ber pezî**
**Mîna rezvanekê heyî**
**Şivanekê terş lêzayî û**
**Bilîl li ber devî.**
**Vêca çewa**
**Dê çim û naême ve?**
**Dê mirim û min nabînye ve?**
**Çewa? Çewa?**

*Kerkûk, 1982*

# DENGEKÊTÎJ JI EFRÎQYA

*"Bo Maryam Makîba"*

**Erê canê.**
**Ma tu nizanî,**
**îro li bajêrê janê**
**Xela û cela ye û mirov xwarine?**
**Dê lez bike û**
**Kaxezên xwe kom ke û here.**
**Çi wênan negire ji me re!**
**Qet nebêje evîn çi ye û çi nîne!!**
**Li vêre birs û zikreşî ye.**
**Evîn ji me reviye.**
**Tereqiye.**
**Bûye pezkîvî, nêçîrvana kuştiye.**
**Hizra hizar, hizaran**
**Genim û birinc û goşt e,**
**Sewkeka nanê sotî ye.**
**Dewîneka şeş şevî ye.**
**Saqo û kiras,**
**Derpêyekî dirrandî ye.**
**Ker xespaleka pêlaveka,**
**Pirtpirtî ye**
**Û evîndar**
**Ho peyamnêra reng purteqal**
**Evîndarên ho reng reş û**
**Hizir zelal**
**Bo hîvyekê mayîne!!**
**Nemirîne!!**
**Bo Efrîqya me,**
**Bo me mayîne... Mayîne...**

*1984*

## KÊ GOT CANÊ

**Kê got canê,
Dê te hêlim?
Nê tu erdî û ez cotyar im,
Dê te kêlim.
Vêca çewa dê te hêlim!!
Kê got canê,
Dê te hêlim?
Nê tu rûbarekê bûş î.
Bi rewş î û ez pêl im.
Evîndarê rûyê te me,
Te nahêlim.
Kê got canê,
Dête hêlim?
Nê tu hozan û helbest î û
Ez peyv im.
Bêy te şeveka bêheyv im.
Vêca çewa dê te hêlim?
Kê got canê,
Dê te hêlim?
Nê tu ala Dimdimêyî û
Ez nevyê Xanê Kurd im û
Nahêlim tu bi erdî bikevî û
Te nahêlim...
Te nahêlim...**

*1985*

## BÛKA ÇIYAY

**Dê werin nê li bane Dimdimî,**
**Keyf û govend e.**
**Derwêşê Evdî zavayê serêsalê ye û**
**Edol bûka çiyayî ya kin û rind e.**
**Alek befir û xwîn e,**
**Zêr bi zend e.**
**Perî ye, armîş di ber de.**
**Rabî ser darê herdu piyan**
**Ji çavan firrîn,**
**Çirîskên hîviyan**
**Bi du dengan, qêr kir bendan**
**Dol û nihal û çiya, deng vedan**
**Ger Kurd hemî neên govendê**
**Ne girêden dîlan û dehwetê û**
**Ne şarînin.**
**Bi sitran û seyran û suhbetê û**
**Nebêjin min**
**Li te pîroz bît hey Evdî**
**Xencera babê min.**
**Şeva vê şevê**
**Dê bît mêvan li nîva dilê min.**
**Dê werin Kurdino…**
**Xurtino…**
**Mil bi mil girêden govendê**
**Pêk ve bêjin**
**Hizar hizar caran pîroz bît**
**Li te Evdî…**
**Lawkê Evdî…**

*Neynewa, 1986*

## KULK

**Ew kolkê min e.**
**Ax û dar û teqin û ber e.**
**Dirust e bê serûber e.**
**Belê pa li vê cîhanê,**
**Behişta min e.**
**Çima sotin?**
**Çima herraftin?**
**Li vê havînê,**
**Qêriya zarokên min e... !!**

*Dokan, 1987*

## BAKÊ BÊGOVA

**Demê bakê**
**Hînê çiyayê Hemê**
**Didet rê û dibûrît ser sîpelêt avê**
**Çinar û hinar**
**Xox û sêv û spîndar**
**Ew çiqên li ber lîvên avê**
**Girê didin govendê...**
**Gelek law û lêk day**
**Te dibînim ya ji wê ve diêy**
**Dibezim. Dibezî!**
**Xuh didîn ji lezê**
**Qêr dikim: Dêkevî**
**Bi min dikenin xirr balavî û**
**Esmaya Bêgovê**
**Ji wan re dibêjit:**
**Bela xwe jê vekin**
**Dûr e dildara wî**
**Ez kenîm... Ew kenî**
**Rîbarî dida rê û dikenî**
**Erê Şemê tu jî dikenî??**

*Bêgova, 1988*

# RÊYA ROJÊ

Eve ez ê çim sîngê agirî
Mîna mêrxazên pirr hêz û dil şêr
Da biparêzim
Vî warê dêrîn
Ji dilreşiya dijminê gurrî
Da zarokên me
Her çêkin li ber lêva Xabîrî,
Xanîkên xîzî û bikenin bo me û
Dêmê befra spî.
Ya nivistî li ser çiyayê spî.

* *

Evîndara min,
Soz bît bi ciwanya herdu çavêt te
Û girantir nînin ji çavên te
Welat têne bit û
Rih û giyanê min gurî gerdena welatî
Ger ez sax û serbilind zivirrîm
Bi sitran û serbestî zivirrîm
Ez ê ji te re, ji davên heyvê,
Şalekê rêsim
Li newqa te ya spîndariyan
Têr min nedîtî
Bi van destên bêhna barît û cengê
Jê difirrît,
Bi keyf girêdim...
Ez ê ji te re
Ji tîrojên rojê
Ristekê çêkim.
Di ava gul û rihana helînim
Li gerdena te ya
Ciwanî jê dizêt, şidînim.
Da her bimînî
Xanima evînê û rewşa vêjînê.

## EW BO KÊ DIKENIT PIRÇA TE?

**Ew bo kê dikenit pirça te?**
**Tu bi Xudêkî**
**Ji min re bêje û şerim neke**
**Hey ez gorî giyanê te**
**Bes xwe naz û nazdar ke**
**Bes tila di nav de bibe û bîne**
**Nê ev dile bi xwe dîn e**
**Tu bi Xudêkî**
**Were... Were, tu kehî ke**
**Lê bizane, ev ji mêja**
**Pirr jan e û bê perjan e.**
**Bê derîk e**
**Qulaç qulaç, lê bigere**
**Here, were**
**Ger westay**
**Viyay binvî û neşyay**
**Ji xew rake**
**Helbestên min yên nivistî**
**Bi xwe dake**
**Dê bînî daweta genimî**
**Li deşt û bêderên**
**Reş û rwît û beyar**
**Çenda çake**
**Dê bêje yar**
**Ew bo kê dikenit pirça te??**

*1990*

# Behcet Mehemed Hirorî

Di sala 1962'an de, li gundê Çelkê, devera Berwarî-bala, Parêzgeha Duhokê, ji dayik bêye. Li çend gund, Duhok, Zaxo xwendiye û li sala 1985'an, li Zanîngeha Bexdayê xwendiye. Sala 1977'an û vir de, dest bi nivîsînê kiriye. Vekolîn, kurteçîrok û babetên folklorî jî nivîsîne. Berhemên xwe di kovar û rojnamên Kurdî de belav kirine. Di mîhrecanan de helbest xwendine. Niha jî li Kurdistana Başûr e.

## DEMÊ XWÎN DIBÎTE JENG !

**Di şevekê da**
**Çendeha ben,**
**Bibûn ristik û girdan e**
**Pê hatibûne rapêçan**
**Çendeha stû û gerden**
**Demê bena gerden dixarin**
**Giyan didizîn!**
**Xwîn bo jeng û ew hemî ben,**
**Pê ve rizîn..**

*2.2.1985*

## DEMÊ ŞIIR DIBINE AGIR

**Şairekî şiir bi serbestiyê danan.**
**Bi tenahiyê çêkirin.**
**Gef lê kirin!**
**Dîsa şiir dubare kir.**
**Wana jê bir!**
**Dubare kir.**
**Jê bir.. Jê bir!**
**Dubarekir.**
**Serkê qelemê wî jê kir!**
**Dîsan şiir dubare kir.**
**Vê carê tibla wî jê kir!**
**Dubare kir.**
**Girt û bend kir!**
**Dubare kir.**
**Evê carê sêdare kir!**
**Şair bo şehîdek nemir.**
**Şiira jî tuxîb birrîn û bûne şoreş..**
**Bûne agir. Bûne agir.**

*2.12.1986*

## SÊ PEYV JI ŞIIREKA DIRÊJ

**Li wêrê.. Li vêrê**

**Li wêrê..**

**Zaroka hî diken girrnijînê**

**Xoşî û xandin û zanînê**

**Şahî û govend û yariya, hemî renga!**

**Li vêrê surmê tivenga!!**

**Li wêrê kenî.!**

**Hêşta li vêrê..**

**Ka çewan bêjin ezbenî!!**

*1987.12.10*

## ÇI BIKEN KARÊ, EW TÊXARÊ..

**Di gel dindika genimî..**

**Dê biye çendeha gul î!**

**Di gel ewra..**

**Dê bî befir..**

**Baran.. Şil î..**

**Di gel şaira...**

**Dê keye wargehê xema**

**Yê hîviya.. Hemî dil î!**

**Di gel xovî û derebega**

**Dê bî pêlav û bî xwel î..**

**Dê bî xwel î..**

*1988.21.12*

## EVRO JÎ WEKÎ DUHÎ!!

Peyvên min..
Komeka xemên birsîn e!
Birs.. Xemeka firrake ye
Ya digel refên çîçka
Di valahiya dilê min da,
Bilind difirît.
Dilê min..
Ji bizavên birsatiyê..
Azadiyê.. Tenahiyê..
Bi per dikevît
Di hevşiyê dilekê bê hîvî da
Xo dibizêvît
Ev dile di qirmiçît..
Diçîteyek.. Mezin dibît
Janên nalêneka giran
Hefka min digirît
Henasa mina firrake, lawaz diket.
Sitrana min,
Bêdeng û bêawaz diket
Şoreş bûkek lastîkiye
Ev nalên e
Ev sultan e
Destê xo yê jehrawiyê
Bi hefkê ve dinît
Dixendiqînît..
Ji bizav û serheldana min

**Ji xemên min**
**Zikê esmanê vî dilî**
**Kun tê dibin!**
**Di valahiya esmanekê bê tuxîb da**
**Evraz difirim..**
**Bilind difirim..**
**Sitranên min**
**Deng û nalêna dilê min**
**Xanî ji xew hişyar kirin**
**Li çar kinarîn vê cîhana nivistî**
**Komirr û agir helkirin**
**Lê xelkê min, sed mixabin**
**Pêt û agirê wî dilî**
**Wê nalênê**
**Evroke jî, wek dohiyê!**
**Xudanê ewan hizrane**
**Li ser textê şoreşê,**
**Evroke jî ew sultan e..!!**

*1991.10.1*

# Hemîd Emîn Mûsa

Di sala 1966'an de, li gundê Geverkê, devera Berwarîjêrya, ji dayik bûye. Seretayî li gundî, navincî û amadeyî li Duhokê xwendiye û sala 1987'an, peymangeha teknolocya li bajêrê Mûsil bi dawî aniye. Piştî karesata sala 1975'an, wî jî dest bi nivîsînê kir û carna helbestên xwe di rojnamên Kurdî de belav dikirin. Di sala 1988'an de, hukumeta faşista Iraqê gişt devera Behdînan da ber bombên kîmî, hîngê xelk ji gundên xwe revîn û ber bi sinûrên Kurdistana bakûr çûn, lê sed mixabin ew û 182 hezar Kurdên bêguneh, ketine bosên dijminî û ber bi zîndanan birin. Her ji hîngê û vir de kes nizanît çi hatiye serê wan, lê xuyaye ku yên hatîne şehîd kirin.

Çi pirtûkên wî nebûn, lê di sala 1992'an de, hevalê wî yê dilsoj Mehemed Ebdullay, helbestên wî berhev kirin û dîwanek bi navê (Dastaneka dî) gehande çapê. Me çend helbestên wî ji dîwana navbirî helbijartîne û ji tîpên Erebî wergerandine yên Latînî.

# EVRÊ PÊŞEMANA

**Payiz.. Payiz**
**Te we çavêt reşêt kirêt**
**Li baxçê min kirîne girê**
**Sorgul im ez**
**Li wî baxî te werandin**
**Binber kirin, te rizandin**
**Dê bes e dê**
**Hey bêwijdan**
**Hir û bayê te payizokê**
**We yê digerît**
**Hemî çiya,**
**Yê têt û her dewrana didet**
**Bes bi qirandina takêt min**
**Sorgula reben dikevît**
**Bes e payiz**
**Bes gef û gurra di min werke**
**Wî evrê reş û yê tarî**
**Li hindava min vederke**
**Bi wê gurya kela evrî**
**Hîviyêt min bes bisoje**
**Dê bes e dê**
**Evrê reşê pêşemana**
**Tu bizivrîne**
**Li hindava çend nezana**
**Da bisojin**
**Da rêka rastiyê bigirin..**

*** * ***

**Payiz.. Payiz**
**Tave barana bibarîne**
**Baxçê jîna me pale û cotyara jî**
**Dê av bide, biribsîne**
**Da sêwî û hejarêt me**
**Da pale û cotyarêt me**
**Azadiyê tam biken**
**Gula jînê bên biken..**

*1981*

# KÊŞWERÊN DILÊ MIN

(1)
Di kîşwerên dilê min de
Siruşt, yasa
Rewiştêt xo na guhirin
Çend dirundêt çîhanê hebin
Kanyêt wî bihunît
Warêt wî kavil biket
Kirasê wî yê qayîme, na dirîtin
Havîn bi hewayê zozana
Payiz bi çekê evra
Zivistan bi kevyêt befrê
Dê şerî ken
Bihareka nû peydaken
Li çar qulaçêt vî Kîşwerî
Kanî dê zên..

(2)
Ew mirovêt li vî kîşwerî dijîn
Wekî siruştê
rewişt û yasayêt xo yêt heyin
Xir palen e, xir cotyar in
Xir birsîn e kwêlen e
Çend kawdanêt jiyanê di nexoş bin
Nahêt gihurîn
Ew kulkê tê da mezin bîn
Çend wêran ken
Dê ava ken
Ew koza kewalêt xo lê çerandîn
Bi dest xelkê ve bernaden

(3)
Di kîşwerên dilê min da
Rûbarekê hîvya yê hey
Jîn perês sikrêt xo li ser bigirin
Aşê jînê dê hêt gêran
Hevranê xo
Ji kul û kovana dê hêrin
Nanpêj hevîrê xo
Ji bîr û bawera tirş biken
Li ser sêlka jana
Dê bîte nan

(4)
Kîşwerên dilê min
Nehingekê tê da
Devê wî gelyê Laleş e
Didanêt wî şaxêt Metîn û Gareyn e
Her Dêwekê li dîf masiya
Jînê bigerît
Dê hestîkêt wî hêrîtin
Dê hêrîtin..

*1985*

## GENCÊT BAJÊRÊ MIN

Her roj gencêt bajêrê min
Bi devekê xoş
Vî bajêrî diaxêvin
Heyranoka xema dibêjin
Efsaneyêt jiyana xo
Digel vî bajêrî vedgêrin
Yek û du himbêz diken
Dengek derdikevît
Ewir ji esmanê dilê me reş dibin
Ji gurrya çavêt wî jî
Birîsî vediden
Dibîte baran…
Dibîte baran…

# TAZIYA TE DUHÎ Û EVRO

** Ji mamosta Cegerxwîn re pêşkêş e.*

**(1)**

**Duhî kanîkêt kovana der bûn**
**Bûne rûbar**
**Di nav sîpelêt xo berze kirim**
**Hay felekê**
**Zivrokêt te**
**Gemîvanê me veşart û ji me berze kir**
**Lewa Kurdî şepirze ye û**
**Gemîvanê lê berze ye**
**Lê gundîno**
**Li gundê me, zêmar diza**
**Nihal û kêriya**
**Şîva û rûbara wuşşên bû**
**Sitranêt xemgîn digotin**
**Lew bêriyêt gundê me jî**
**Di şepirzen e**
**Tevkêt rondika dibarin**
**Her heyranok**
**Ji kul û xemêt xo**
**Di vehandin**
**Çima dilê cotyara êtwîne?**
**Pale herro bi tazîn e**
**Lê her bi bawerîne**
**Evro, subahî**
**Ji tevnê te raçandî**
**Vejeneka dî xuya kin**
**Rojeka dî peyda kin**

**(2)**

**Duhî zengila jînê nehat lêdan**
**Jîn perêsêt me di xew da man**
**Têlêt tembûra te qetyan**
**Semaker jî şêt û gêj bûn**
**Dîlankerêt gundê me jî**
**Man bêawaz**
**Dîlana me nehat gêrwn**
**Belê evro û subahî**
**Şagirdêt te**
**Dibêne gizîra li ber pala**
**Gundê me gazîken**
**Hemî hozanêt te**
**Tevnê hizir û bîrêt te raçandî**
**Dê bine bang û bine gazî**
**Rojperês û jînperêsêt**
**Kavle gundêt welatê min**
**Dê rabineve û xirbineve**
**Şagirdêt te**
**Têlêt tembîrê dê nû jenin**
**Lawjebêj jî**
**Dê qîrînin bi helbestêt te**
**Dîlangêr û semakerêt**
**Gundê me jî, bi rengekê ciwan**
**Govendekê dê girêden**
**Dîlana me dê hêt gêran**
**Govenda me dê hêt gêran**

**(3)**

**Gemîvano**

**Gotinêt te**

**Rûbar in bû wan gerêt**

**Hişk û zuha**

**Nan in**

**Di destê hemî zarok û birsiya**

**Girnijîn e li ser lêvêt**

**Hemî hejar û girtiya**

**Kanîkek e bû têhniya..**

**Ho serkêşo**

**Peyv xoşo dilvekero**

**Gula te ya pirr bên û nav**

**Evro payizek bi ser da hat û werand**

**Lê ji tovê gula te**

**Hizar bişkoja**

**Serê xo heland**

*1985*

## JI ELBÛMA XEMÊT MIN

**Rast e.. Rast e
Ger dilê min esmanek hebît
Ewrêt wî jî
Lîsê jan û xemêt te bît
Dê peqîtin
Hizar mêrga dê vegirît
Ew bihara kuzirî jî
Di dilê te da
Dê şîn bîtin.. Dê vejîtin
Rast e.. Rast e
Ger dilê min cihê çend birîna bît
Nalîna wî.. Zêmara wî
Dê dayina hind landika bît
Ger dilê min
Hêlîna xema tê da bît
Janêt wî jî
Dê bine mal bo zîndanêt
Hizar genc
Hizar zaro
Hizar dayik xarîn..
Daîrayin.. Daîrayin..
Rast e.. Rast e
Ev serê min
Eger hizrek tê da bît
Viyanek di nav da bît
Vî leşî jî dê kete pir
Li ser rûbarî
Hizarêt ji min çêtir
Ji min xurttir
Xendiqandin..
Xendiqandin..**

*1986*

## DASTANEKA DÎ

**Zîna minê, dil keserê**
**Pirr birînê.**
**Çemê jînê**
**Yê beyar e, da biçînê.**
**Hincarê me ji kul û xema**
**Seqa kiriye, xudan vînê.**
**Hespê hizrêt me di şembûz in**
**Rewşa jînê.**
**Nîrkê jana ser stûyê wan girê deyin**
**Têna jînê.**
**Zevyê bi kêlîn**
**Duca werdeyin**
**Dexil û danê xo pavênê.**
**Evrê hizirêt me yêt reş bîn**
**Dê baranê her barînê.**

*** * ***

**Memo yê min**
**Hey semyanê ber dilê min**
**Rûbarê hîvyêt dilê me**
**Xudan pêl e**
**Gerra bawerya me ya kwîr e**
**Dê keyin sikir, cuwa jê beyin**
**Çemê jînê dê ava keyin.**

*** * ***

**Zîna minê**
**Xem komkerê, xem cemînê**
**Kî dibêjîtin rêka jînê**
**Ya girtiye?**
**Nijdevana li ber hewe danayî ye**
**Tivenga bawerêt me**
**Ya kel e.. Ya kel e**
**Rextê me tijî gulley e**
**Barîta wan, janêt me ye**
**Evca kî ye**
**Xo li ber sîngê me bi girîtin?**

*** * ***

**Memo yê min**
**Hey stêra geş li esmanê dil min**
**Ger kanî hişik bûn**
**Rûbar neman**
**Ev e dilê min, dilî te ye**
**Du kanîn e**
**Xwîna xo jî dê kîn rûbar**
**Gemya vînê li ser bi leyzît**
**Da bi şergeha azadiyê xo bi gehînîn.**

*1986*

## NE.. DILO NE..

**Xo li dilê min heta heta**
**Xîveteka reş û dirryay ya veday nabît..**
**Xo deng gira dilê min jî**
**Heta heta şirîta kul û kovana**
**Li ser nabît..**
**Xo bêdera hîvyêt min jî**
**Xoziya xirş li ser nabît..**
**Xo masiya rûbarêt min**
**Bi şûk û davêt nêçîrvanî venabît..**
**Xo qulingê zozanêt min**
**Ji ber tivenga nêçîrvanî**
**Hemî gava yê zîz û sil nabît..**
**Xo darberûya çiyayêt min**
**Hemî gava lê payiz nabît..**
**Ne dilo ne. Hosa nabît..**
**Her hîviya melevanî**
**Derya xema nebît,**
**Dê xendiqît û mirît.**
**Her bawerya seqa kiriya**
**Êtwîna zîndan û jana nebît**
**Mukum nabît..**
**Xo ramûsanê Selwa yê**
**Di sîngê Cizîrî da,**
**Kovan nabît..**

*Şingal, 1986*

# Nacî Taha Berwarî

Di sala 1963'yan de, li gundê Yekmale, devera Berwarîbala, parêzgeha Duhokê ji dayik bûye. Seretayî li gundê Hêsê xwendiye û navincî li Kanîmasê. Amadeyî li bajêrê Duhokê û fakulta perwerdê, li Zanîngeha Mûsil bi dawî aniye. Sala 1976'an û vir de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di kovar û rojnamên Kurdî de belav kirine. Heta niha çi pirtûk çap nekirîne. Dê çend helbestên wî jî, ji tîpên Erebî wergerînîn yên Latînî. Niha jî li Kurdistanê ye.

## BILA NEBIM

- Ger destên min
Şeq neket sirr
Bi pêjankirina welatî ve
Tirtir û xînelo nebin
- Ger tiblên min
Nebin xasekê tîj û dirr
Rêbazek nû ne nivêsin
Xebatker bên li ser biçin
- Ger lingên min
Nebin gemî, nebine pir
Li ser rûbarê kul û jana
Hemî rêvîng û karwanî
Bê tirs li ser derbaz bibin
- Hestêkên min
Nebin çiya, nebin kevir
Rêkê li napalma bigirin
Berî rondik bêhne rêtin
- Ger goştê min
Nebîte nanê germ û gurr
Ku birsiyên welatê min
Pê têr bibin
- Ger çavêt min
Nebin rojek ji ronahiyê pirr
Şevên tarî li vî warî
Pê ron bibin
- Ger guhên min
Bo zanînê nebin bikirr

**Hest pê neken**
**Kanê çewa?**
**Pêlên pêşkeftina jînê**
**Li vê cîhanê belav dibin**
**- Ger hizrên min**
**Bi carekê xirr**
**Bo dozeka geş û pîroz**
**Neken bizav, ne livlivin**
**- Ger peyvên min**
**Nebin birwîsî bi girrgirr**
**Li evî esmanî biteqin**
**Paşvemayî û nivistiyên**
**Milletê min hişyar bibin**
**Dilê min jî**
**Nebît serokanyeka hirr**
**Warê sotî paqij neket**
**Zîndana reş, kela zulmê xirab neket**
**Dayik û bab pê bigirrnijin**
**Pê şad bibin**
**Ma bo çi me?**
**Eger hebim, yan jî nebim**
**Baştir ew e hema nebim**
**Hema nebim..**

*1985*

## SITRANEKA AŞTÎMÊJ

Çi sitrane ho bi nermî diête gotin
Ne dawet e, ne dîlan e
Ne seyran e
Da qirêja dila bişûtin
Peyvêt wê pel in, gurrîn e
Xirr bizût in
Buhara pê diête sotin
Awaza wê dirrindek e
Çîçikêt hêlîna dixutin
* * *
Kes neçin lê nevegêrin
Girê neden çi govenda
Xo rapêçin
Jîr û çeleng helden zenda
Naveroka wê bihêrin
Sitraneka aştîmêj e
Ne ya duhî û evroke ye
Ya mişe ye ev e ji mêj e
Hevçerx e, ligel peydabûna nifşê me ye
Emêt kirîn kerr û gêj e
Rêkekê bo nemana wê helbijêrin
Tuxim, rewişt û hêvênî
Li vî awazê
Bê girrnijîn û bê kenî
Ji deverê çak vavêrin
sitranek nû
Pirr bizav û tijî hîvî
Dila geşket
Buhara aştiyê û jînê misogerket
Bangê wê bo me heldêrin
Zû heldêrin..

*1987*

## JI EVÎNA TE TÊR NABIM

Bejna te ya delal û rind
Dîcle û Forat
Hêdî hêdî vê da hatin
Helbijartin navê şîrîn
Li hemî rexa mişt û pirrin
Bajêr û gund
Dîrok û şarristaniya te lê vedgêrin
Ji serdemê dîr û dêrîn
Didanêt te kevrên spî ne
Rêz bi rêz in li herdu milan
xorristîn e
Gelek lêmiş û hirr û ba bi ser da hatin
Nelivandin
Çi car nahêne livlivîn
Du çavên te stêrên geş in
Pêlên şevên reş û tarî
Bi nemerdî xo têwer kirin
Ronahî jê nehat birrîn
Sîngê te zozan e û kevî
Şêr û piling lê diçerin
Li latên bilind
Li ber beleka
Kew û bilbil lê dixwînin
Dikene hêlîn
Li ber da kanî û çîmen in
Dîmenekê ciwan û zêrîn
Rêvîngên rêya rizgariya
Dêm û riya
Dirr û zêr û mirariya
(Cizîrî, Xanî û Cegerxwîn)

**Dilê te Amed e Amed**
**Nadem bi dilên jêgirtiyên vê cîhanê**
**Nadem bi ciwaniya heyvê**
**Li esmanê şîn.**
**Ji evîna têr nabim**
**Dê li rêya ûmêda te çim, nazivirim**
**Hindî min mabin goşt û xwîn**
**Heta tîrojkên roja geş**
**Li ser enya te dernekevin**
**Wekî esmanekê sahî**
**Têr ronahî**
**Ji vî dilê kul**
**Xilas nabin ax û nalîn**
**Min hîvi ye**
**Hîviya min, çiyaye di gerdena te da**
**Çiya çi car naên dizîn.**
**Dê gehînyek bi evînî**
**Di nav pêlên evînê da**
**Hemî bersiv û mizgînî**
**Dê bin derman, bine nojdar**
**Pê sax bin ev derd û birîn**
**Berperên dîraka damay**
**Dê kevin keyf û semayê**
**Hên girrnijîn**
**Nê daxaza min û te ye**
**Bi serbilindî**
**Pêkve bijîn.. pêkve bijîn.**

*1988*

## SERHILDAN

Zîndaneka reş e û
Şeveka bi sehim û xewa giran
Bo derbirrîna peyvekê
Demê dilivin lêv û ezman
Sêdara he amade ye
Li min dixurrîtin
Ewê peyvê
Hizra geşatiya rojê
Maçîkirina rûyê heyvê
Di sîngê xo da bixendiqîne
Davêt vê rista xwînelo
Di kulaven e
Xarina wan goşt û xwîne
Dê li hefka te bine mêvan.

* * *

Berê spêdê
Bo bîvelerz çiya hejyan
Her çiwar dîwarêt zîndanê
Tîk keftinê
Xilole bûn û wergeryan
Tîrojkêt havî têkwer bûn
Li paytextê jêderê wan
Li tariyê bo jan
Ravêt şevê
Bo tîk û kunca ketine rê
Ne tîka destwîrî dayê
Ne kunca gotê keremken

**Werne rayê**
**Ji wera berbest û sengerên**
**Dibîne pîjan.**

* * *

**Zîncîra dest û lingên min**
**Helweriya**
**Rista sêdarê pirçiya**
**Ezmanê min gerya livî**
**Peyva serê min dibirrîtin**
**Azadiyê**
**Xebat jê ra karekê pîroz e, fer e**
**Ji min wêvetir**
**Gorrê şehîdekê vebû**
**Bo gulistan**
**Dîmenek rengîn e, zer e**
**Li ser takê sorgulekê**
**Bang heldêra kutreka spî**
**Bijît aştî**
**Bîr û bawer û serhildan**
**Rewş û nijyar û nû bere.**

*Duhok, 1991.3.10*

## TENGEZARÎ

Her bay e baran e befr e
Rêya me sernişîviye
Firrkey e rizd e kevr e
Goyîna tengezariyê
Li hindav serê me dixwînît
Bi du awazan
Awazekê dil tezîne
Awazê dî deng vedan in
Li ser kêşa vî rivişţîne
Himbêz diken vê romanê
Ewrê reş û keşefirêt
Qêrîne qêrya radihêlît
Geşatiya rûyê rojê
Di helmirîsît
Berberstek e germê dikujît
Ronahiyê na verêjît
Bo hêrana kevrê sirrê
Birrandina tarîstanê
Dayka birsî
Memkê şîr tê da qerisî
Li savay lerze
Neşêt bigirît û bimêjît
Ku maçîket
Rûyê xorristê jiyanê
Evrazyê he li milê dî
Ax û kevrêt wî di kulafe
Dev lê beşe vedimirînit
Van xetîrêt paşerojê
Dadiîrît van gulêt geş e
Jane sexte dijwar e

**Hêbetiye ev mînake**
**Ev hejmare**
**Mildaneyek li goristanê**
**Min gotê ho reşe ewro**
**Evraziyo**
**Hewe çi kerbe çi kîn e?**
**Ewrê reş got**
**Ez rikînê ciwanya rûkê rojê me**
**Da rengê xo pê biguhirim**
**Yan mîna wê xo rû spîkem**
**Bim perristgeh**
**Bên tewafê, heyv û stêr û**
**Evîndarêt vê dastanê**
**Evrazî got**
**Ne sîxurr im**
**Ne dev bi xwînekê har im**
**Berimberî we şermîn im**
**Ez bihayê pîroziya xwîna şîrîn**
**Kelek û komêt hestiya**
**Yêt zarokêt bêgunehêt**
**Mişextiyê û serhildanê**
**Li ber perêt erşa dixwînim**
**Lewa jê ra evîndar im**
**Çava bi kilê sor dinexşînim**
**Li roja kêşan û pîvanê**
**Bo xebata rast û rewa**
**Bibim nîşan û girove**
**Li ser berperêt dîroka merda cîhanê**
**Çinku ez jî xemgîrek im**
**Tepeser im bindestek im**
**Parçek im ji axa zêrîna Kurdistanê..**

*Deştan, 1991.4.8*

# Xalid Husên

Di sala 1945'an de li bajêrê Zaxo ji dayik bûye. Her li wî bajarî seretayî, navîn û berhevî xwendiye û paşî peymangeha mamostatiyê li bajarê Mîsil bi dawî aniye. Di sala 1965'an de, dest daye nivîsîna helbestan û di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Heta niha ev pirtûk gehandîne çapê:

1. Dîwana helbestvanê nemir Ehmedê Nalbend, komkirin û berhevkirin.
   Bergê yekê, sala 1970'î.
   Bergê duyê, sala 1971'ê.
   Bergê sê, sala 1989'an.
2. Sitranên şahî û dîlana, di gel hêja Ehmed Ebdulla Zero.
3. Bo me gotin. Çend çîrokên folklorî.
4. Dergehek bo folklora Kurdî, nivîsîn û li dîfçûn.
5. Silavek bo Delalê, dîwana helbestan.
6. Sube wê bê, dîwana helbestan.
7. Pêla subê, dîwana helbestan.
8. Bo Iraqa xweştivî, sirûd.
   Niha jî li Kurdistanê ye.

## KILOX

**Gelo serê hizir û bîrên şirîn welat**
**Tê de nebin,**
**Tinê kiloxek vala ye.**
**Kulindek e,**
**Ber pên van hevala ye.**
**Gelo dilê vîna welat**
**Tê de nebit,**
**Ma bo çi ye, hebit yan jî nebit**
**Gelo çavê ronahiya serê rêka vî welatî**
**Belav neket**
**Ma bo çi ye**
**Jîn hera lê tarî ye.**
**Gelo guhê navê welat**
**Ji nav hemî evan nava ne bihîsit**
**Ma bo çi ye, hebit yan jî nebit**
**Gelo dilê sube û êvar**
**Bi navê welat bangê nede**
**Şev û roja gazî neke**
**Bijî millet. Bijî welat**
**Ma bo çi ye, hebit yan jî nebit**

## MEZIN E HÊLÎN

**Kewa hêlîn dirust kirin**
**Nêrekewa**
**Davên giyay herro dibirin**
**Va Mêkewa hêk dikirin**
**Dibûn kurk û kitên hêka gerim dikirin**
**Lê Qirrên reş**
**Koremara**
**Rûviyên cara**
**Hêk û çîçik**
**Pêkve dibirin**
**Pêkve dibirin**
**Kewa hêlîn danan kuna**
**Ber berzîva, nava şkefta**
**Ber û pişta**
**Lê her wekî cara berê**
**Ew ne diman yan kitkite diman**
**Kewa her dest jê berneda**
**Roj bo rojê**
**Sal bo salê**
**Dihat û diçû, wek vê salê**
**Geran. Geran**
**Li hemî warî…**
**Dever neman lê neçeran..**
**Latek bilind. Bilind-bilind**

**Berçav kirin**
**Takên dara. Davên giya**
**Kitên gula, cardî lêkdan**
**Qirr pê kenîn**
**Rûvî û torî didan jenîn**
**Buhar hat û Kewa hêlîn**
**Dirust kir û îna berçav**
**Lê vê carê**
**Nek wek her gav**
**Pê nivîsîn, navek ciwan**
**Navê welat li hemî wara**
**Hate dîtin**
**Lewa... Rûvî û qirra**
**Qaçik cîtin**
**Ji nû hema xwe nasîn û baş xwe dîtin..**

## NE KENÎ

**Ne ezbenî
Nabitin her tu bikenî
Ên dî gelo
Ho bimînin, lê dev girtî
Hero her dil
Ho lê bijenî
Ey kuledar
Kesê xwînxwar
Heta kengî ronahiyê
Ber çavên ron dê verrenî
Xwe nas dikî
Subê û êvara kar dikî
Da ku zikî
Her dagirî û her pirr bikî
Bila hizar lawaz û jar
Bikevin çola
Ber van kevra
Her rêka wan evraz û pesar
Serê van çend salên bûrî
We xwe dikire
Zêrevan û ev pasewan
Da ku berî her bidizî
Reke rûvî weke torî
Kesê digot rast ezbenî
Te nas dikir
Te dizanî
Te dilê wî kerker dikir.
Te dilên nazik dihincinî.**

# Feysel Mustefa Hacî

Di sala 1946'an de, li bajarê Amêdiyê ji dayik bûye. Qonaxa sereretayî li gundê Bamernê, navîn û berhevî li bajarê Hewlêrê xwendiye û sala 1969'an, pişka Kurdî li zanîngeha Bexda bi dawî aniye. Di gelek fêstîvalên helbestan de beşdarî kiriye û di rojname û kovaran de jî belav kirine. Pişikdarî di wergerandina çend pirtûkên xwendingehê û di danana hindek pirtûkên ziman û edebî de kiriye. Di sala 1978'an de, dîwaneka helbestan bi navê (Evîn)çap kiriye. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistanê ye.

## TENA

Heyho gurgo..
Xorê merga..
Tu ew nînî
Yê ku [ min zengil dikirine pêy]
Tu ew nînî
Yê ku: Divêt, min her bivêy
Tu ew nînî..
Ji ber ku.. ew mîha ku dibînî,
Ya şîrî didete û tu dimêy,
Te divêt bixoy
Çinku tu yê dev bixwîn î!

* * *

Ne tu ew deng û sitran î
Ew hîvî, an ew viyan î
Ew buharî, ew sêran î
Ew bişkirîna lêvan î..
Ya tu hejî hemî gava
Ewan rondik û xunava
Yê dibarîn ji cotê çava
Wê axwînê
Reng ji xwînê
Ya min radihêla ji hinava..
Tu ev e nebûy çi gava!

* * *

Belê niho mina zanî:
Tu wêranî
Tu talanî
Tu biryanî
Tu tarî, tu tarîstanî
Vekujê cerg û dilan î..

Lew, ma, can e!
Rondikêt min her baran e!?
Ma ya can e?
Kelegirî, kelejan e!!
Nê dê dengê min kevîtin,
Spîlka çava li min sor bîtin.
Te pê xoş e?
Tezink pêyêt me bigirîtin?
Te pê xoş e?
Dilê me ji kula birrizîtin?
Te pê xoş e?
Hîvî ji binî biherrifîtin?
Heke erê jî, xo min: No
Ne ew cih e, ne ew gav e
Dilê min bi van hemya ve
Dê pêşemaniya xo vêdem
Gazî mêrê hewara kem.
Wî dilekê hey yê mezin
Dê cihê me tê da ketin
Dê dile dilê me detin
Dê destêt xo li me werînît
Dê werînît, dê werînît
Dê ew landika sîngê xo
Bo me înît, bo me înît
Vêca bizane:
Li nav vê landika gerim
Li ser evî sîngê nerim
Dê tena bim
Her tê da bim
Ez rana bim

# ŞIVAN: HILO

Gurgê pezê te didizîtin
Şivan: Hilo, rabe tanê.
Dê gezîtin
Dê leşa lê hincinîtin
Sore xwînê jê mêjîtin
Dev bi xwîn e
Kêlbêt wî ditîj û dihusîn e
Gelekê xapvane manê
Xo li ber pezî vedinîsîtin
Dê hestîka lê hêrîtin
Mejî lê helmirîsîtin
Kevilka dadirrînîtin...
Çav û dana helkenîtin
Yê bê cerg e
Rast e "Toba gurgî merg e"
* *
Li karê pezê xo birrêne
Baş devê gurgî lê bibêne
Mixabine
Yê goştine
Bê binase ev birine
* *
Taku ewêt têne û jê ne
Sotî û kuziryêt vê rê ne
* *
Xo li ber dane
Karek e yê bê yemane
Gurzî danê
Termî telaşke li kulanê
Da çi gurg ji niho wê ve
Ji tuxwîbêt çerwanê te
Nehên hêve
Nehên hêve

# KOLK

**Kolko, kolko..**
**Kavile kolko..**
**Axepolko…**
**Bo çî tu ho yê bêdeng î?**
**Ka kotirka hezar rengî?**
**Çawa xirrand çekê cengî?**
**Kanê guldan?**
**Aştiya can?**
**Pişîk, pişîk?**
**Berxa biçûk?**
**Hemî neman!?**
**Kîve teqyan?**
**Çawa biryan?**
**Kê di xankê nanî kirin tîk?**
**Kê pirritandîne xodîk?**
**Wî agirî**
**Mêwa tirî**
**Ya ji navbirî**

*** ***

**Kolko, kolko..**
**Axepolko..**
**Ev e ji kengê?**
**Wêranî hate vî çengî?**
**Merr û gêsin bûne jengî?**
**Tirs û sehim lêre pengî?**
**Boçî tu ho yê bêdeng î?**

*** ***

Te landik jî bûye rejî!?
Çitov kesbûn ho dibê mejî!?
Xodan tol bûn?
An bê ûl bûn?
Manê tol kesê li me nîne
Em ji cîhanê dikehîne
Wan bêbexta
Wan hwî sexta
Ez birime rêza mişexta.

* *

Yê bijikî denê avê
Yê sotî xirr danê karê
Şwînwarê poşî kîvarê
Ferş û şemilkêt nivêja
Bazbend û niviştêt pîroz
Bûne xolî
Dûkêle toz

* *

Nexê, nexê
Ne, min tu ne avakirî
Ku biherrifî.
Çavên zelal bikene girî
Weku yê deybab lê mirî
Cerg û hinav lê kuzirî
Bivî destî
Xuha enyê, ne bo pestî
Ne bo mestî
Ne bo tenyê
Her bo kenyê

**Bişkurrînê**
**Girrnijînê**
**Bom evînê.**
**Lewanîkê:**
**Swînd bi danî**
**Bi wê avê, roj û tavê**
**bi yezdanî..**
**- bila dijmin baş bizanin**
**Gurzêt me ne wek heman in**
**Zor bi jan in**
**Bê yeman in -**
**Dê te avakem vê carê**
**Kelotkeka gelek asê**
**Azirî li nav rwînimexarê**
**Dest bi dasê**
**Bi xencerê**
**Bi bawerê**
**Bi zeverê**
**Berderazînkê keme gurr**
**Pêcanî keme rave torr**
**Çwîçik di ser te ra bifirrin**
**Ku: Dimizirrin**
**Dê hemî perra li xo birrin.**
**Çi çavê bi te ne rabîtin**
**Stirî dê di nîvê çuklîtin**
**Her çî zikreşê tu nevêy**
**Dilî dê bi hizreta lê kêy**
**Kî bo te çêketin zama**
**Dê bi serê wî înim çama**

**Dê paşvebem**
**Dê pêvebem**
**Dê hewarkem wê gaziyê**
**Bilindkeme ber esmanî**
**Ber esmanî**
**Alayê serferaziyê**
**Gurr xetîra sergirtinê**
**Dirwîşmê maf wergirtinê**
**Errinya şepal û şêran**
**Gêrrinim li hemî stêran**
**Da (zwî) bibin**
**Ew (hwî) bibin**
**Bîr (nû) bibin**
**Ku: Kolko tu bûye (xanî)**
**Êdî her bo te ye (manî)**
**Ku (Tu) manî.**

# Sediq Hamîd Halid

Di sala 1950'î de, li gundê Nizarkê, nêzîkî bajarê Duhokê ji dayik bûye. Qonaxa seretayî, navîn û berhevî li bajarê Duhokê û peymangeha mamostatiyê li bajarê Hewlêrê xwendiye. Di dawiya salên şêstan de, dest daye nivîsîna helbestan, di kovar û rojnamên Kurdî de belav kirine û di fêstîvalên edebî de jî beşdarî kiriye. Kurteçîrokan jî dinivîse. Heta niha dîwanek bi navê (Govend û Behî) çap kiriye. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistanê ye.

## ÇEND HINÊREK

(1)
Hinêr nîne devê gurgî
Bi gehte berxekê bi tinê
Dizî bît, yan revandî bît
Ji ber jana zikê birsî.
Belê - pa ew hinêr e wek
Bi bêhna xwîna berxê hêro
Serxoş bibît
Paşî serxoş..
Bi kefte nav koma wan da
Da ku muhra didanêt xo
Li perkê wan - yê sade bidet
(2)
Hinêr nîne devê gurgî
Bi gehte berxekê bi tinê
Bi zûrî raxirînîtin.
Belê - pa ew hinêr e wek, tinê berxek
Bi dîtina wî ve serxoş bît
Édî ew bi xo, bi serxoşî
Bi kefte dîf
Wekî teşyê.. Bi dîf ra biçît.
(3)
Hinêr nîne bi dirêtin
Zikê guştê mirova tê
Belê - pa ew hinêr e wek
Zikê xalî bi dirîtin
(Zikê berxê) bi dirêtin
Ne dînar û derhem tê
Ji bilî çend qeftek û davêt
Giyayê şîn..
Weku ew jî, ji behr û berhemê axa
Evî gundî.

## BIRWÎSÎ

**Birwîsî wek diza têtin**
**Di nav ewrê tarîtir xo di veşêrîtin**
**Bi bêdengî, pêkolê diket**
**Heta digehte,**
**Koz û pawanê gundê me**
**Kela xo dadirêjîte**
**Serê bala û bilindtir lê**
**Mezar û gumbeta kevnar dihingêvît.**
**Nav û dengê**
**Baran û rêjiya têkdet.**
**Dibît hindek ronahiyê bidet**
**Belê ew jî bo hindê ye**
**Çava hêş tarîtir lê biket**
**Rêvînga sînge pêket**
**Rê lê berze biket**
**Édî rêkê nebînîtin**
**Da ku biste..**
**Teve terrga xo jor da**
**Bi ser da ket..**

## AXA ME

Eger sed car û sed car d î
Dînara me,
Di destê xelkê erzan bît
Bawer nakem
Axa vê gulya genimê zer,
Diînte der.
Li ber zêrê ewê xelkê ve erzan bît
Bawer nakem
Gazinda kavir û berxa
Li mergê vê buhara kok
Her zozan bît
Biçîte rojavayê paldet
Bixot û bes her razan bît
Banehya koçerê birsê
Tena û biste
Li derê xaniyê me serzan bît
Berê salê carek d î her
Çêkirî û hilçinê peymana (Lozan) bît.

## BARROVE

Eger hat û buharek zwî
Barroveyek qirş û zilik
Pawan kirin
Li ber dila kirine xuzî
Bi dest û dan dane çwîçka.
Bo avakirina hêlîna
Bi dabêş û lêkvekirinek
..Binve - binve lêk alizî
Nik min we ye
Çwîçka deng xoş û bê dizî
Bi tinê dê mînît bê hêlîn
Çinku ciwanî û çû barrove
Destêt xo hêş têk nagirin.

# Musedeq Tovî

Di sala 1954'an de, li gundê Bamernê, qeza Amêdiyê, ji dayik bûye. Qonaxa seretayî û navîn li bajarê Sulêmaniyê û berheviya çandiniyê li bajarê Zaxoyê bi dawî anîne. Her ji sala 1970'yî, dest bi nivîsîna helbestan kiriye, di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Heta niha çi dîwanên helbestan çap nekirîne. Kurteçîrokan jî dinivîse. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistanê ye.

## SALO NEGRÎ

**Salo negrî..**
**Jaro negrî.. Negrî..**
**Girya te êş û jan e..**
**Zarokên warî hemya giryane**
**Salo dihî êvarî**
**Zarokên warî tev da ew giryan**
**Ji birsa giryan**
**Bo nanî giryan**
**Li ber xîveteka kincir.. Kincir**
**Savayek li ber memkên dayê mir**
**Day û babên jar, wan bi çavên zil**
**dît birîna kul**
**Demê welatiyên me bar kirîn**
**Pîrên gundî ji dil da girîn**
**Gotin:**
**"Dê me li kwîrê veşêrin heke em mirîn."**
**Pêş çar sed sala**
**Feqiyê Teyran bo jara kir girî**
**Mafê wan pirsî**
**Mîrên evroke ne dirazîne**
**Em hejar têr bibîn nanê tirsî**
**Salo negirî**
**Negrî, jarên warê pirr girî**
**Ne bes birsîn e**
**Belkî bê lîs in. Tev bê hêlîn in**
**Ji serma dilerzin, qerisîn e**

**Gundên ber çiya**
**Zarokên wan bo nanî digiryan**
**Ew çima befir ne barî?**
**Ew befir û baranên wan diviyan..**
**Salo, ne bes ez û tu**
**Pîr û zarokên warê me kit kit**
**Pêxas û rîs in**
**Hewar di dilî da pengiya**
**Ew yêt mayne mit**
**Darkevot û berrî bê heval in**
**Îsal dijminê wan hemî al in**
**Lew hemî jar in**
**Ji cîhana vî çerxî bê bar in**
**Mirov gel doza wan kerr û lal in..!!**

*Zaxo, 12.2.1975*

# KÎM E EZ

**Birayno**
**Ger ji min dipirsin kîm e ez**
**Pênasa min**
**Çi cara ne ketiye destên min**
**Ku bêjme hewe ez kîm e**
**Kincirêt min, yê li pişta min**
**Her rojekê**
**Ber sîvandekê, derekê**
**Dikirrînim çinyên nanekê**
**Ji bermayên kuçka sultanekê..**
**Belê ev e pênasa min**
**Deftera bîrhatina min**
**Nê dengê min hozanek e**
**Dilê şairî derdikevît**
**Dest û pê ya dê lê birrin..**
**Sitranek e hemî tuxîb rê lê digirin..**
**Lê serê min kelotkek e maye asê**
**Gelek ji mêj e biryare bêt birrîn..**
**Ger ev sere nehêt birrîn**
**Dê bît dar, mazîçinêt warî dê xemlînin**
**Narînêt xo pê vehînin..**
**Bivrêt dinyayê veçemyên**
**Dê serî li ber qurmêt wê veçemînin..**
**Hestîkên min, ger hemî nehêne hêran**
**Dê bin gelek**

**Jar û birsiyên warî dê pê derbaz bin..**
**Revendek im, karwanê min hîvî û jan in**
**Karwanî, jar û birsiyêt rêka nanin..**
**Rê ya min, percanêt çetoka**
**Telhe û davêt bekroka**
**Kesê nevêt kanî li zozana bizêt**
**Neku konekê li ser vedem**
**Lê biaziryên hemî xem**
**Ez û birs û darêt mazî**
**Ji devê çeqok û bivir bibîn asê**
**Mînîn asê..**
**Ew demê pênasa jara**
**Dibite ala van wara**
**Wî demî ez, dê bêjime we kîm e ez..**
**Rêvîngê kîj rêkê me ez..**

*1980*

## JI ŞÎRETÊN DAPÎRÊ

Min li bîrê
Ji şîretên wê dapîrê
Demê digot
Ev dil disot
Ezîzên min pîrê gorî
Min wê dîtin sed serbûrî
Li vî warî hindek hene
Ew têhniyên xwîna me ne..
Ger dît rezê me hate ber
Hevîşkên sevîka me ne..
Bîra me av lê hate der
Dê hên rêzê ew ji me ne..
Ger dît emên mayne birsî
Bêxudan, bê nanê tirsî
Çeqokên xo her tîj diken
Da tev da me serjê biken
Kuloxkên diyarî bo mîrî biben
Çend derhemeka pê li berîkên xo biken
Erê pîrê, penda min wa li bîrê
Her ew digel gurgî dixun
Digel bizinê jî vedikên
Hergav rengek in.. Dengek in..
Her ew dişên
Li ba wan çûcar ne şerm e
Bilîzin li govenda me

**Bidizin berê dara me**
**Bêşermî ne sed terrz in**
**Tirsa sultanî dilerzin**
**Ger sultan yê jê razî bît**
**Bo kuştina tev Zîn û Mema dibez in**
**Ne pişte û ne pêş, sed rû ne**
**Xoyê kevlê mîha gurgê birsî ne**
**Tevin û rîsa vedihînin**
**Xo dixemlînin**
**Tev belengazên warê me dixapînin**
**Çem çinîn, zevya me dirrî**
**Xuha navçavên me bierzanî kirî**
**Rast e pîrê**
**Xudan pend û eqil û jîrê**
**Kurên pîrê cotê xo kir**
**Yê ne tê û ne jê, bi xo bir**
**Kî bûn qurban**
**Ewên mayne bêxan û man!!**

*Duhok, 1992*

# Sebriye Hekarî

Di sala 1948'an de, li bajarê Duhokê ji dayik bûye. Şeş salan xwendiye û di sêzde saliyê de, mêr kiriye û niha diya neh zarokan e. Di sala 1969'an de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine, di fêstîvalên edebî de jî helbest xwendine. Rijêma faşista Iraqê, di sala 1977'an de zelamê wê li sêdarê dide, lê ew bi wê rewşa aloz û li jêr sitema dijminî, di sala 1989'an de, dîwaneka helbestan bi navê (Parzînkê Hîviya) çap dike û du dîwanên din jî ji bo çapê amade kirine. Endama Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistana Başûr e.

## HILON GELO...

Hilon gelo mitî bes e
Bêhinvedan ne bo me ye
Ma nizanin
Heyva evîna omêda xeware ye!
Tîrojkên roja azadî û serbestiyê
Bijale ye!
Mafê xwîna min berze ye!
Xemxorê tev mafên resen
Di hizra da şepirze ye!
Giriftar e, tengezar û kesîre ye!
Ma nizanin
Stêra Xeca Siyabendî
Li esmanê stêristanê, posîde ye!
Kezî û biskên Zîna Memê
Li Cizîrê, hêşta di destên cendirma da
Dikene xilfa sêdarê
Bo gerdena Mîrê me ye...
Ma nizanin
Axa gora tev şehîdan
Gazî we ye.
Dibêjîtin, hilon hilon
Guh nedene kuledara
Kuledara paşêxistîn
Olperêsa, diravrêsa
Ji zanînê dûrêxistîn
Lewma gelo
Naveroka paşeroja me eve ye!...

## SEREDANEK LI ZÎNDANÊ

Ho kurên min
Demê min hûn hemî dîtîn
Li zîndana
Li pişt hevde dergeha
Hûn dibûne kom, dibûne cot
Gurrî û pêtê xo di min wer dikir
Dil li min ker dikir
Xerîbiya we di hinava da kelî
Cerg li min disot
Çi bikem dayê hedar nema
Du rondik ji bêhişya min
Ji kaniyên herdu çavên min
Hilfirişkîn
Rondikek jê ya xema bû
Xema êş û azara bû
Xema cih û jîna we bû
Rondika dî jî ho day gorî
Ji xoşiya dîndara we bû
Belê dayê her wê demê
Bîra hîviya xo vejenî
Lê bû vulkan, şoreş helbû
Di hizrên min da
Şehîna şêra
Yên qeyd kirîn bi zincîra
Bo mizgînî, bo azadî di çavên min da
Kela evîna lawên min
Fîrya fîrya
Di nav riha, gerya gerya
Zû belav bû

**Pêl gehiştin nav şoreşa vîna min da**
**Rast e dayê hûn dûr kirin**
**Ji ber dilê daykê birin**
**Hûn zû kuştin berze kirin**
**Di îza da hûn dîn kirin**
**Bê dest û çav û pê kirin**
**Hizar gerdenên lawên min**
**Bi xulpên sêdara ve kirin**
**Jîn û evîn lê tal kirin**
**Belê dayê ser hindêra**
**Ne serşûrîn**
**Serbilindîn xudan tûrîn**
**Ez sond dixum bi ewan seran**
**Yên ketine ber çepera**
**Berevanî ji me kirî**
**Bi ewan destên di zîndana da**
**Qeyda cihê xo tê kirî**
**Ez bi gora wan şehîdan**
**Yên mergê xo, gorî axa şirîn kirin**
**Her em ewin, em xudan bîr û bawerin**
**Bîr û bawer qet namirin**
**Her dê gehîn wê armanca di mejyê me da**
**Di berperên dilên me da tomar kirî**
**Lew day gorî**
**Ez karker im. Xebatker im**
**Bi xamê xo ez şerker im**
**Barên hizrên min giran in**
**Xudan kurim ya pişt germ im**
**Tev kurên min pêşmerge ne, şoreşvan in...**
**Berevan in, piştevan in...**

## GOVEND

Digotin govend e
Şahî û sema ye
Şabaş û xelat ji mêje gêra ye
Xelkê gaziye û dîlan vema ye
Ev sed çaxe perya veda ye
Yên çûyne bûkê û hêşta neîna ye!

* * *

Gotin Şoreş e
Şêr in şoreşgêrin
Dijmina digirin hestiyan lê dihêrin
Deştê dikêlin çiya werdigêrin
Lê zana girêdiden
Rûviya radigirin, şêra vedişêrin

* * *

Gotin şîlan e
Şîlana tevaya Kurdan e
Goşt û birinc gele erzan e
Lê feqîr jê di dûr in
Pilîpitka axa û began e
Dîlana xofirûş û xwêriyan e

# Nezîre Ehmed (Deyka Dalyayê)

Di sala 1955'an de, li havîngeha Sersîngê ji dayik bûye. Heta navincî xwendiye. Her ji sala 1978'an û vir de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di fêstîvalên edebî de jî xwendine, lê hêşta çi dîwan çap nekirîne. Niha jî li Kurdistana Başûr e.

## DILÊ BÊZAR

Ew hozana bi xwîna dilê xo
Min bo te vehandî
Ew tevnê
Bi hizir û bîra min raçandî
Hizar çîrok ji eşqa te
Kirine pirtûk
Min çap kirin
Belav kirin
Viyana te di dilê min da
Hêdî hêdî zerdibît û diçirmisît
Bi gotinêt te yêt wekî tîra tijî jehir
Min dikujîtin
Evîna te di dilê min da mişext dibît
Hozanêt min di destên te da êxsîr dibin
Ew tevnê min raçandî
Tevinpîrka tevnê xo li ser raçandî
Ew çîrokêt min nivêsîn
Xêrkê mala xo di nav dana
Di ser hindê ra
Dilê min ê birîndar e.
Dinalîtin. Digêrîtin...

## MIN NE DIZANÎ

**Rojeka ewr û tarî**
**Barana evîna te li ser dilê min bî**
**Tijî kovan, hîr dibarî**
**Viyana te hêdî hêdî**
**Di hizra min da**
**Mişext bo nezivirî**
**Hemî hozan di destêt min da**
**Kerr û gêj bûn û hilweşyan**
**Ji hîngê were viyana te**
**Di dilê min da**
**Bûye xewneka bêhêz û mirî**
**Çawa tu dibêjî min jibîr bike?!**
**Min bihêle**
**Tu çi dibêjî û vedigêrî**
**Ez nahêlim viyana xo**
**Dê kem hewar, dê kem qêjî**
**Hindî direvim, qurtal nabim**
**Roj bo rojê**
**Viyana te di dilê min da**
**Geştir û Şirîntir e**
**Min ne dizanî**
**Viyana te şiyaneka pirr hêz divêt**
**Min ne dizanî, viyana te wek Xerdelî**
**Hêdî hêdî min dikujîtin**
**Min ne dizanî**
**Tu her di hizra xewna xo ya berê dijî...**
**Min dikujî...**
**Min ne dizanî!. Min ne dizanî!.**

## WAR Û DILDAR

**Pêlêt avê jor da birîn
Ketin dava û bûyne nêçîr
Rondik ji çava dibarin
Biçûkêt sava vekuştin û ser lê birîn
Belave ne
Li hemî ciha û xirr derava
Ho hewarêt dilê kîvî
Ew dilê pirr kul û kovan
Pirr yad , soz û peyman
Ez teyrekê bê ezman im
Bê hêlîn û bê semyan im
Ketim rika xefkên wana
Bîrhatin axînk veman
Çima gelî hevalîne
Hemî dema me nalîn e?!
Ne hoye dengê bilbilan
Ya vehandî bi xwîna dilan
Çi helbest nîne bê ezman
Kivanêt tîra her emîn
Ji dil da armanc her emîn
Nêçîrvanêt dilê xoyne
Serbirêt çeqoka xoyne
Ma ne bes e
Dê bila carekê ji caran
Em jî wekî tev milletan
Hizirvanêt hizra xo bayn
Teşîvanêt teşya xo bayn
Bila Kurd hebin carekê
Felek bizivrît salekê
Da gir û çiya çemînîn
Da warî li wan leqînîn
Serê bilind Beref esmanî helînîn
Da ji nû dinya azadiyê bînîn
Dê her bînîn... Dê her bînîn...**

# Bilind Mehemed

Di sala 1968'an de, li bajarê Duhokê ji dayik bûye. Seretayî, navîn û berhevî li wî bajarî û Sêmêlê bi dawî aniye. Di sala 1980'yî de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye, gotarên edebî jî nivîsîne û di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Ji ber xebata xwe ya li dij faşîstên Iraqê, deh salan siza zîndanê wergirtiye. Enadamê Yeketiya Nivîskarîn Kurd e. Niha jî li Kurdistanê ye.

## ÇAR WÊNE

**(1)**
**Di navbera cot memkêt te,**
**Bilind dibît girya zarokekê sava.**
**Dev nagehît serê memka**
**Lewra serî didanîtin**
**Berî roj biçîte ava!**
**(2)**
**Di navbera cotmemkêt te,**
**Kavilên wêran.**
**Kolk û zincên herriftîne**
**Di xuyan e..**
**Zevyên xopan.**
**(3)**
**Di navbera cotmemkên te,**
**Zavayekê bi jivan e**
**Ha ha dê ên bûk û berbûk.**
**Lê mixabin ew nizanin**
**Bihevra êlçî û rêgira**
**Tev bê eger**
**Ew şenge bûk.**
**Ya kiriye xwîk.**
**(4)**
**Di navbera cotmemkên te,**
**Şwîn xencer in, têqotayne.**
**Hemî senger û çeper in**
**Osperên di berdayne.**
**Şwîn postalên di xuyane**
**Termên soto**
**Şwîn simên hesp û kimêda**
**Di diyar in.**
**Kaniyên xwînê**
**Tev li şwîna yên heldayne.**
**Ev rûdane mêjûyê xirr nivîsandin**
**Û mêjû nahêt sorandin.**

*Duhok, 1986*

## RAVÇÎ

**Ho ravçiyo!**
**Bejna Garey**
**Çi bilind û şeng û berz e.**
**Bi rexa da rêk û gir in**
**Kevir û ber in, xemil dar e**
**Bi tîk û derz e.**
**Hemî laya şkeft û der in**
**Ew rêvîngên rê lê berz e.**
**Yê lê tên û lê digerrin**
**Bo xezal û pezkên kîvî**
**Zevî û werz e.**
**Lê diçerin.**
**Ho ravçiyo!**
**Garê mezin ew ne cihê tîl e û san e**
**Ez nizanim ka tu dizanî?**
**Nêçîra li Garey bêt kirin ne asan e.**
**Ha binêre:**
**Li serê komta Kewê diqebin**
**Destên evan nêçîrvana**
**Nagehnê û vêra nagehin**
**Çi car vêra nagehin.**

*1988*

# BÎJIN

**Nîva şevê bayê xerîbiyê lê da.
Til dan pirçê û
Hêdî înan xarê pê da.
Ketin ser gerdena spî
Yarî bi sîng û bera dikirin
Lê nizanît
Ka dikelîtin di agirê kê da.
Ya li hîviyê,
Hîviya mirî sax bîte ve
Mîna roja berê spêda.**

*** * ***

**Xwe li ber çava kirine reş e
Wênêt bê perwaz û çarçûv
Bi xurtî xwe li ber sînga didin
Û cara yêt bine mirov
Herdu lêva lê dinûşin
Bê ax û of xwe dirêj kir
Dehmen rakir
Li cîhana Bûnê nêra
Rondika çav lê ter kirin
Û hizir kir:
Hûr baranekê lê kiriba
Tûr û derpoş
Ketibane ber sîpela.
Eha hîngê da xweş bîtin
Dar mêrgên van mêgela.**

*Duhok, 1989*

## ŞEV Û YADGAR

**Şevtira dî xweş dimeşîn**
**Bazivîrk û barove.**
**Befrê, keviyên spî**
**Li ser mijîlank û birhêt min**
**Kir tilove.**
**Şevtira dî**
**Xweş dibarîn**
**Baran û befr û şilove.**
**Sermayê jin himbêz dikir**
**Befrê zaro himbêz dikir**
**Germatiyê ji hemî leşa bar dikir**
**Tinê tinê hey yara min**
**Min wênê te**
**Dida ber sîngê xwe yarê**
**Hîngê di himbêza te da**
**Serma dimir.. Serma dimir..**

*Hevlêr, 1992*

# Şukrî Şehbaz

Di sala 1962'an de, li bajarê Duhokê ji dayik bûye. Di sala 1984'an de, peymangeha ragehandinê li Bexdayê bi dawî aniye. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine û di fêstîvalên edebî da jî xwendine. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistana Başûr e.

# WÊNEGIREKA BÊ FILAŞ

(1)
Wekî aşiqeke Bozî
Guhêt xo diveçinîn...
Li bin hêvristeka
Dêmê wî bûye dêmê pîrejineka rojhelatî
Li hemî rex û riyan
Deng... Bînîn... Reng
Dibûne orkistirayeka çiyayî û dihate guha
Dizanî ku spêde du destên dirêj in
Ji bo ciwaniya te ya Mîdî û berxodanêt te yêt Kardoxî
Dest bi gerdena (Zinarê Kêste) diwerînin

(2)
Li serê evî çiyayî... Wênekêşekê romansî me û
Berxodanêt min
Dêmê te yê herifandî di nav filmekê sotî da
Ava diketin

(3)
Xanê belatînkeka reng vebû ye
Li ber tîrojka çavêt Xanê
Dem kevyeka befrê ye û dihelîtin

(4)
Tête bîra min ku tiştek nemaye li bîra min
Xanê... Li havînan
Dehmenêt kirasê xo yê sor heldan
Pêt xo yêt rîs bin av dikirin

**Gelek cara Xanê ji bêzarî**
**Li ber dengê diholeka bê selîqe**
**Digel revdeka biçûkêt serhoç dileyizî**
**Dema mijê cîhana Xanê dagîr kirî**
**Xana ciwan bo kotreka çîrokeka xeyalî**

**(5)**
**Tête bîra min ku tiştek nemaye li bîra min**
**Dema rojê xo di nav sakoyê şevê da veşartî**
**Tenayî bo Nûrosekê birîndar**
**Şaperêt xo lêkdan**
**Beref cîhaneka dûr dûr firî**

**(6)**
**Tête bîra min ku tiştek nemaye li bîra min**
**Agir berbû oksicînî**
**Wa he çinarek e û**
**Destêt xo yêt sotî yêt kirîne di bin avê ve û**
**Ha wê he (Beko) ye**
**Li bin dareka dûkêlê yê rûniştî ye**
**Çaverêy (Godo)ye**
**Ji ber hindê evroke mejyê min yê pirre ji serûçavan**
**Ji bilî serûçavêt Xanê**
**Hemî serûçav li ber min**
**Serûçavêt Bekoy ne...**

# EW ZELAMÊ BERÎ DU DEQÎQA LI ÎŞKÊ ZIVIRÎ

**Wêskî, dûkêla cigara û leşê rwîsê vê jinka**
**Sîngê wê bilind.**
**Tiblêt min yêt neşareza, ji şerma da dilerzin**
**Ew zelamê bi rex min ve hîn dibînin**
**Yê rûniştî.**
**Jiber simbêla ronahî ji lêvêt wî nagirît**
**Çavêt wî ewrê ji esmana dizî**
**Leşê jinkêt rwîs di xodîka ra nabînît**
**Pîremêrê he yê biryêt wî sîberê**
**Li mijîlanka diken, bi çava diaxvît**
**Pêna li sîtafka xo didet**
**Heku leşê xo yê bêzar dibînît**
**Li ber çavêt wî**
**Heyv şîşeka şkestiye li hindav ewra**
**Jor da berê xo didet**
**Bilindahî û lixavê devê wî dikevne ber pêya.**
**Ez ne yê tena me li vê kernevalê**
**Di nav hiçkê sakoyê min yê helawîstî ve**
**Rojnamek e**
**Di berîka çepê da paseporteka sexte ye**
**Ez hest pê dikem polîsêt vî bajêrî li min digerin.**
**Ew zelamê berî du deqîqa ji dermanxanê valyom kirîn**
**Di nav kabîna telefonê da nivistî û**
**Berî du deqîqa li îşkê zivirî**
**Li kolana beramber dêrê hatiye kuştin**
**Edrêsê min yê di berîkê da.**
**Cigare li dîf cigarê**
**Li hindav serê min helametêt dûkêlê ne**
**Ew biçûkê berî du deqîqa li vêrê yarî bi sîtafka xo dikir**
**Cigara kit kite difirûşît û**
**Rojê du pakêta dikêşît**

**Tiştekê seyre li vê kernevalê**
**Dem yê dibûrît**
**Car ez yê radibim û car dirûnim**
**Di nav şîşa wêskî da**
**Difna xo mizintir dibînim**
**Eve kernevala serxoşiyê ye**
**Ba yariya bi perdêt pencera diket**
**Sîbera tiblêt desta bi dîwara ve**
**Dibine tevinpîrkêt efsaneyî û**
**Hilbaskî leşê rwîsê van jinka dibin**
**Ez yê ji sîtafka xo ditirsim**
**Ez yê ji rengêt cilkêt ber xo ditirsim**
**Berçavkêt min dibine mîkroskopeka eliktironî**
**Ev hola mezin dibîte sebetkeka gilêşî**
**Ev mirove pîstirîn vayros in**
**Livîna desta axiftine**
**Ew keçka he ya wekî pişîka**
**Bi tenê li kujyê he rûniştî**
**Bi dûkêla cigara digel min diaxvît**
**Ji bawişkêt wê**
**ji bêhnijîna wî**
**Bêhna mêyatiyê jê difirît**
**Li vî kujyê dûr ji xodîka ez yê girovir bûym**
**Ji miyêt simbêl û qurmiçîkêt serûçavêt min**
**Bêhna dilrabûnê jê bilind dibît û**
**Di kuna kilîla dergehî ra derdikevît**
**Digel bêhna mirina wî zelamê berî du deqîqa**
**Ji dermanxanê valyom kirîn**
**Di nav kabîna telefonê da nivistî û**
**Berî du deqîqa li kolana beramber dêrê**
**Hatiye kuştin, têkel dibît...**

# LIVÎNÊT MÎRZOY DI ÇEND WÊNEKA DA

**(1)**

**Bîjinêt he li ber dîwarî di rûniştîne û**
**Yê cigarêt eşqê dikêşin**
**Di nav dûkêla cigara ra**
**Sîtafka Mîrzoy ya diyare û**
**Destekê wî yê di nav berîka wî ya diryay da û**
**Destê dî, golteye didete ber xo pê birê ve diçîtin**
**Mîrzo. Mîrzo**
**Rojê dêmî te yê bi rengêt xo boyaxkirî**
**Ger wênekêşekê romansî jî bêjîte te**
**Rengêt dêmê te di pêtîne**
**Xeyala wî ya nesaxe û direwa diket**

**(2)**

**Mîrzo evroke zava ye**
**Kevr û teraş xo dixemlînin da bibine bûk**
**Evroke Mîrzo aşiq e**
**Xodîk bi dîwara ve di rwîsin**
**Mîrzo xo bi cilik ve tê ra dibînît**
**Êvar e û demê veguhaztina bûkê ye**
**Di bin hetavzerkê ve**
**Kolana vî gundî leşekê nesax e**
**Mîrzo li ber dîwarê mizgeftê yê rûniştî ye**
**(Se) direwîtin. Mîrzo dûr dûr lê dinêrîtin**
**Li avabûnê, aso hovekê birsiye**
**Roja henê karwaniyekê çiyayî ye û**
**Di nav devekê xwînelo da berze dibît.**

**(3)**

**Şev e û…**

**Kolanêt vî gundî hinde ditengin**

**Cihê leşê taryê naket, xo lê rastket**

**Heyv di nav ewra ra tevinpîrkeka efsaneyî ye**

**Jor da bi werîsa ve tête xarê**

**Biçûk ji kuna kilîlêt dergeha ditirsin**

**Pîremêrê he, lixavêt wî ji devê ketin**

**Jinka he ya zikê wê pirr, ezmanê wê mî lê hatin**

**Hêşta Mîrzo di nav dûkêla cigara ra yê nivistiye û**

**Di nav ewrêt pîvazî da xewna dibînît**

**Bi tenê. Bi tenê seyê gundî yê hişyar e**

**Çavêt wî du pelêt geş in**

**Dengê rewîna wî hemî kolanêt gundî pirr diket**

**(4)**

**Spêde zû ye û befrê hemî keliştêt dîwara yêt pirrkirîn**

**Cîhan têk da ya bûye goyeka befrê**

**Gundê he, dilek e di nav befrê da xo diqutîtin**

**Wê he Mîrzoye yê xo di nav gulpîtkêt spîndarekê ra veşartî**

**Mî yêt leşê wî ji tirsa da xo têk werdiken**

**Li hindav serî Elhoyekê birsî ye û xo şûr diketê**

**Helma mirinê ji bin simbêla bilind dibît…**

**Digel hetavzerka êvara berze dibît**

**Evroke bêdengiyê ya xo di nav çavêt evê goyê da asê kirî**

**Bi tenê… Bi tenê dengê lêdana dilekê ya têt û**

**Hêşta dengê rewîna seyê gundî di nav guhêt min da**

**Deng veddet…**

# Hikmet Mehemed Hirorî

Di sala 1963'yan de, li gundê Çelkê ji dayik bûye. Seretayî li gundî, navîn û berhevî li Zaxoyê xwendiye û di sala 1983'yan de dest bi zanîngehê kiriye, lê ji ber terora faşîstên Iraqê, xwendin bi dawî neanî û gehişte rêzên şoreşa Kurdî. Di sala 1979'an de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di rojname û kovarên Kurdî de, belav kirine. Dîwanek bi navê (Adarîk û Sîme) çap kiriye. Niha jî li Swêdê ye.

# ŞEHÎD

Lat û teht
Bûne berperên dîroka te
Yê reşandî nexş û nîgarek
Xwîna te
Ey şehîd!
Gome xûna te bûye roj
Spêdeyek bo me helat
Çek û qelem me bi dest in
Şev reşa tarî herat
Ey şehîd!
Dê avakeyn kel û borca
Bi xûn û can û leşa
Siyarên rêka te ne em
Ha gurrî û agir ji gurzê me peşa
Ey şehîd!
Sozek e me bêt li rêka te
Em jî bibîn ava gola jînê
Ji buharê zîr û bê vejî
Ey şehîd!
Qibleya dilên bi hîvî
Pîroz e, ew rêka te ye
Hindî dîl û bindest bin em
Pêşayî qonaxa me ye
Ey şehîd!
Bîst hizar hizarin gelo
Rev bi rev îro diçin

**Can û leş gorî û diyarî**
**Ji Kurdistanê ra dibin**
**Ey şehîd!**
**Agirê zax û xebatê**
**Bi şefeq pirr ron û gurrî**
**Sitrana dayik dibêjît**
**Bo zarokê diket girî**

* * *

**Rabe dayik, welat daye**
**Xûn ya li cobara diçît**
**Karwanê bi rê ve direng e**
**Yê bi lez e li rojê şehîd!**
**Hûnê dijîn...**
**Ev lat û zinar şahid in**
**Hindî milet yê siyare**
**Hûn li meydanê egîd in**
**Ey şehîd!**

*Hîzava, 1984*

## SÊ GOTIN

(1)
Kekê mino, dibêjin salên xela
Ji bê avîne
Lê dibêjin, ne wenîne
Ewur hatin
Hindeka gotî: “Ewrên me, baran lêkir.”
Hindeka got: “Barana me, sikir û kevî danane ber
Li korka peng kirin.”
Lewra ma beyar û li ber germê
kuzirî zevîka me

(2)
Bi şev, gundên me
Serevraz li heyvê dinêrin
Ya ji wan ve nanek e
Li hîvyêne birsê bikujît…
Lê bi dirêjiya şeva
Dibîte şalok û dibîte tarî
Û dibîte birs!

(3)
Aveka bûş hat û pira Selewatê
Ligel xo rakir û bir!
Teraziya guneh û çakiya…
Gunehên min kirine layekê û
Layê dî, bo min rakir
Li wî demî, çakiyên min
Bone kotreka aştiyê…
Nava destên min yên peqî û
Binê yên rîs
Kevlê xo nû dikire ve
Leşê minê dî hemî pêkve
Dibû agir!

*Zaxo, 1985*

## KEÇ, ADARÎK Û POSTAL

**Spêde bû...**
**Roj ji bejna çiyay bilindtir bû**
**Li pişta têlekên sîmey**
**Lewendiyên xo hildikirin**
**Destek li ber xo ragirt û**
**Destê xo yê dî yê nazik**
**Di nav stiryên sîmey ra birin**
**Bi dizî cendirmey**
**Hêdî xo xişande wê adarîka**
**Li pişt hêla sor,**
**Virr li bay dikirin**
**Lê her zûka**
**Postalek kefte ser destî**
**Adarîk û dest, herdu pêkve**
**Bi erdî ve kirin!**

*Mardîn, 1990*

## ZEKYA

**Hemî êvariyên Nevrozê**
**Gurryeka geş**
**Ji ber kêleka kela Amedê bilind dibît**
**Li hemî mala digerît**
**Li hemî kolana diçît**
**Dibîte şewqek**
**Ji serê hemî xetîrên**
**Pêşya serhildana difirît**
**Demê berzebûna wê jî**
**Di nav dilê keç û xorta da dinişît**
**Dibîte vulkaneka bi kîn û tolxwaz**
**Li Nevroza bêt…**
**Li sîngê dagîrkera dipeqît…**

*1992*

# Kamîran Reşîd Berwarî

Di sala 1964'an de, li devera Berwarîbala hatiye dinê. Serî û navî xwendiye. Di sala 1977'an de dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine, lê çi dîwan çap nekirîne. Niha jî li Kurdistanê ye.

## BI BÎRHATINA KARESATA HELEBÇE

Li taxê me befra dibarît
Hê dadê hê temaşake
Li taxê me befra dibarît
Bişkurîna zaroyekê sava sava
Li ser destêt dayika xo yêt xendiqît
Ihê dadê temaşake
Jinka henê
Dikenyê xo da ya ji bîr ve diçît
Evî kalê heştê salî
Li ser sêpiya xo nagirît
Hê dadê hê
Hosa hosa li taxê me
Befra dibarît..
Hê dadê hê temaşake bêdengiyê
Du çavêt min tijî kirin
Befra evro..
Rêk û kolanêt gundê me
Xirr spî kirin
Hizar evîndar
Yê digevizin ho yê dimirin
Hê dadê hê temaşake
Pîrêt evro cadoker in
Bo cihêl û pîr û kala
Pêkêt meyê yê dadigirin
Hemî pêkve serxoş kirin
Li mizgeft û kolan û dewr û berêt
Evî gundî serxoş di pirr in
Bêhoş kirin.. Bêhoş kirin..

*1992*

## KEKO DIHÎ..!!

Navê min..
Di pên hespê wî digevizî..
Yê bi karê min xo kar kiriba
Rêka sê roja ji ber direvî..
Yê bi dengê min axiftiba
Ji zikê dayka xo
Ne derdiket û ne dilivlivî..
Keko dihî..
Hizir ne dikir ez mirov im
Lewma navê min ne dizanî
Ya ji xirra ve
Ez hovek im, ez dehbek im
Yê bêaqil û mejî..
Keko dihî..
Li taxê wan baran barî
Zevîka xemêt min ji têhna diqirqiçî..
Li wan roj bûn..
Hemî dîlan û govend bûn..
Kirêsmisa beref banê heyva diçûn..
Renge şevên reşên çirya
Min hizret bûn..
Keko evro
Xwîşka Zekya ya xo disojît
Bo agirê Newrozekê..
Û Helebçe xo dixemlînît
Bi karê bûkekê..
Lewma evro li qesra paşay
Li dewr û berên EtaTurkî
Qesem bi navê Kurdistan û
Kurdbwînekê..

*1993*

## XEWN

**Xewnêt min xirr dolar in**
**Û hêşta jî bazirganêt şevê direvin..**
**Hîvî di sîngê min da paryê nanî ne**
**Li kolana se bo direwun..**
**Xewnêt min xirr dîlan in**
**Dîn dileyzin**
**Diholqut û zirnabêjêt**
**Vê dîlanê qumarçî ne**
**Li ser pişta vê diholê**
**Şitrenceka duqoliye û**
**Rojê sê car paşay dikujin..**
**Xewnêt min xirr hozan in..**
**Û hozanvan kezya dibirrin**
**Li ser depê vê şanoyê**
**Û evroke beramber vê rastiyê**
**Hemî di lal in..**
**Ji difnêt wan efrît dibarin**
**Ji tirsa da..**
**Ji birsa da..**
**Zaro dimirin.. Zaro dimirin..**

*1993*

## BAJÊRÊ MIN Û GAZIYEK

**Evê spêdê li bajêrê min**
**Roj ava bû...**
**Kenî, girî û girî hişk bû..**
**Mij têkwer bû..**
**Tarîstanê bajêrê min dagir kiribû..**
**Heho gelo**
**Heta kengî li vî bajêrî dê se rewin!**
**Û kezyêt dîmokrasiyê ji binî birrin.**
**Bişkurîna li ser lêvêt min**
**Dê ji min dizin..**
**Heyho gelo**
**Li vî bajêrî rastî hemî di kulav xar in..**
**Yê bang bidet bi rastiya xirr neyar in..**
**Û Sîxurêt evî çaxî**
**Şoreşgêr in.. Xebatker in..**

*1993*

# Mehemedemîn Doskî

Di sala 1957'an de, li gundê Babgurya, qeza Amêdiyê ji dayik bûye. Xwendina seretayî li bajarê Mîsil, ya navîn li bajarê Sêmêlê û berheviya pêşesaziyê li Duhokê bi dawî aniye. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine, lê çi dîwan çap nekirîne. Niha jî li Kurdistanê ye.

## SITYA XEMA

Bayê omêda ez birim
Li ewra siyar
Bi dinya xem û xeyalan da
Sitya hejar
Wexerêt vîndara şev in
Rondikêt çava du rûbar in
Di behra eşqa min û te da
Dê vêk kevin
Berê xo bidê,
Li dûrêt kulkê car û bara
Tevinpîrkê, raçand tevin
Sitya xema
Darkêt keyfê hemî şev in
Li hewdêt dilî
Li ber çi ba na livlivin
Ji bilî bayê eşqa kevin
Nêzîk dinê, dê hêt buhar
Refêt qela nadadinê
Dê jê revin
Çinku dilêt me diberhev in
Ji ber wî çavî
Şev û roja bo te hişyar
Ew dê revin.
Ew dê revin.

*1980*

## MILLETÊ HILAWÎSTÎ

**Li bin çekoç û ser sindana**
**Li mabeyna erd û esmana**
**Hilawîstîn, hizar sala**
**Ne me kulkek bo ava kir**
**Ne me qesrek bo xo dana**
**Hijmara me ya bûye nîv**
**Hewara me dernaçîtin**
**Ji bilî awaz û sitrana**
**Ka zêr û zîv?**
**Dest vala bûn, ji av û dana**
**Hozanêt me yêt bûyne şîv**
**Kî dê xwînît van hozana?**
**Kî dê têrket gorristana?**
**Kuryêt xelkê,**
**Bûne ser û serêt wana**
**Yêt bûyne dwîv**
**Gelî zana**
**Eger hosan em bimînîn**
**Dijmin dê me bi şîvê xotin**
**Berî em wî bikeyne paşîv.!**
**Bikeyne paşîv.!**

*1992*

## HOZAN Û KELHA HIRRIFTÎ

Leşkerê Paşayê Kor e
Tariya dewrê dirêj e
Hate ser kelha Sêderkê
Çarkinar gotin ji mêj e
Ew kela qumrî ji zana
Çemya ber mîna nivêje
Taceka li babo nizim kir
Gotî: Fermana xo bêje
Koçikêt mêrxasa keftin
Li sengera keftin qirêj e
Şairê koçk û eywana
Peyveka eşqê nebêje
Berperêt dîwanê rake
Birînêt kelhê bimêje
Li ber nekey cejna buhara
Rondika ji çava birêje
Ew çira hizir û hozana
Şewq veda û giryê te hêj e
Leşkerê hatiye kelhê
Dana ber top û xedenge
Guryeka sora jê helbûy
Ji kuştiya kolana teng e
Hew hewa şêr û pilinga
Li sengera bo denge denge
Ji bûşiya leşkerê Kor e
Lê nema qet xulk û reng e
Şairo: Ji gora xo rabe
Rabe ve li kelhê direng e
Qumriyê ji esmana keftî
Girtiyê bê nikil û çeng e
Ew demê agir dibarin
Xewtina pîs û ne şeng e
Rabe ve kifnê xo pave
Rabe ve evroke ceng e
Herkesê ala xo raket
Mêrekê çak û çeleng e
Berperêt hozanê keftin
Şîr û şeşxana te jeng e
Nêzîk e li mêjûya cengê
Dê kevin jê nirx û seng e
Kaşûyê Xanê bide ser xo
Li meydana cengê ne ling e
Derfetê evroke tê da
Eriza dêm şox û şeng e
Gelekê tehl û ne xoş e
Gelekê tarî û teng e

* * *

Leşkerê Paşayê Kor e — Dewrana li kelha te girtî
Paytextê hizir û hozana — Esmanê ji heyva te girtî
Ewrekê ji burca wê rabûy — Aşkera yê firtî firtî
Dada nav koçk û eywana — Rakirin peyvêt hilgirtî
Burcek û dîwan û senger — Ji destê xo berdan herriftî
Û tu keftiye eşqa — Perwana li baxa te girtî
Ji kî ve bayê eşqê rabû — Bi avira çava bijartî
Pêle perwana qerala — Yan bide biryara bi kurtî
Kîş jina bi bêre tu kuştî — Şkestina eşqê ve girtî

* * *

Leşkerê Paşayê Kor e — Koçk û dîwan helgumandin
Çîrokêt dewr û zemana — Li ser binî xirr dana xandin
Sed hezar çavêt hozana — Li rex û dewrana niqandin
Sed hezar peyvêt we zana — Ji mêjûyê dane werandin
Li binêt dehl û kinêra — Nêrgiz û gul dana çandin
Nameka qêrî û hewara — Bo dila da bête xandin
Şairê dîwana boçî — Hozanêt eşqê vehandin
Nê şahê zûrdarê Kor e — Hestiyê mîra nimandin
Dane ber kêlba zemanî — Mêjûya wan da kirrandin

* * *

Evro fermana Began e — Bo nema hukim û mîratî
Nêzîk e li wana êvar e — Roja wan qenca dahatî
Ne ji ferman û biryara — Keftiye nîva welatî
Ne ji rabûna çokan e — Ne ji wê terrga lê hatî
Ne ji roja tu lê rabûy — Sehdikey roja helatî
Ne ji seyran û semaya — Ba û barove li te hatî
Ne ji wî dewarê tu çêkey — Bo şahî lê bikey xelatî

| | |
|---|---|
| Ne ji çav û girrnijîna | Naîla can û jêhatî |
| Ne ji dîtina Naîlayê | Ew roja ji balavê hatî |
| Ne ji wê taca hozana | Ne ji wê helbesta şewatî |
| Dê çêkey kelheka taze | Dê rakey taca jêhatî |
| Dê rakey şîr û Qurana | Da bijî bi hukim û mîratî |
| Rondika ji çava birêje | Evroke tu malmîratî |
| Rabe ve ji gora xo rabe | Boçî tu hinde nivistî? |
| Boçî goştê te cuda bû | Boçî xav bûn geh û hestî? |
| Kengê dewrana tu hêray | Kengî sermayê tu gestî! |
| Rabeve sehke Sêderkê | Koçk û dîwana ve bestî |
| Ji roja kelhê çira danay | Taca hozana êxistî |
| We kî ye li şwîna xo danay | Mîr kî ye bi rastî û diristî |
| Ka kî ye li danana kelhê | Nîne qet û xav û sistî |
| Ez dê hozana hinêrim | da dirêjkey ewî destî |
| Bo kesê şwîna te rabûy | Gotina hozana girtî |
| Ji dîndeha dola paqij | Kî ye rehwanî ji te girtî |
| Dîndeha Kora tu hêlay | Dîndeha kiça tu girtî |
| Nê ez im evroke rabûm | Şevçira te min hilgirtî |
| Alayê hozanê rakem | Hindavî kelha herriftî |

*Duhok, 1992*

# Salim Mustefa Ebdulezîz

Di sala 1957'an de, li bajarê Zaxoyê ji dayik bûye. Xwendina seretayî, navîn û berhevî li bajarê Duhok, Zaxo û pişka şerîetê li zanîngeha Bexdayê bi dawî aniye. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Di sala 1985'an de, dîwanek bi navê (Deme buhara te hil da) çap kiriye. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Niha jî li Kurdistanê ye.

## ŞEMALÊ

**Hindik hindik bisoje şekalê**
**Şeva reş e**
**Ya tilçav e şemala min**
**Ez dibêjim hindik**
**Çinkî rohniya te li min xoş e**
**Rêber e li rêkêt tarî**
**Xolî ye li çavêt neyarî**
**Hindik hindik bisoje şemalê**
**Ez dibêjim**
**Çi çek û şîr û xencer**
**Nînin wekî te şemalê**
**Çend tariya şeva**
**Ez dibînim ya li te xirr dibit**
**Neşên rohniya te vemirînin**
**Ez minêkar im şemalê**
**Dûr nekeve**
**Jîn bêy te her çi nîne**
**Ji evro pê ve navê te navek şirîn e**
**Azadi ye.. Ronahi ye**
**Hevala min..**

*Zaxo, 1979*

## GOTINÊT TE

Gotinêt te ronahî ne
Mîna çira li şevêt tarî
Gul û bişkoja dipeqînin
Mîna bayekê dijwarî
Yêt bîn egera mana min
Yêt bîn ferhenga jîna min
Ez jê dixum û jê vedixum
Bo min jînî bo min warî
Çawa qorbanî te nebim?
Çawa xo ji rêka te vedem?
Dê li gel te bim hindî heme
Yê li gel te bit her bêxem e
Gotinêt te xem revîn in
Wekî meyê, dûr neke ve mala te yê
Ez hogir im û tu heval î..

*Bexda, 1980*

## WELATÊ MIN

**Min tu divê viyaneka gelek**
**Viyaneka avê û çandinê**
**Wek viyana Mem û Zînê**
**Çunkî min tu divêy..**
**Divêt te biparêz im welatê min**
**Bi xwîna xo**
**Eve ye hêvênê evînê**
**Welatê min**
**Bi rastî tu hevalekî pirr giranî**
**Her min divêt te razîkem**
**Bes nizanim bi çi rengî**
**Ez çend bikem û ez çend bêjim**
**Qerê te li ser xo narakem**
**Welatê min li min bibûre**
**Min pavêje ji ser wan mila**
**Bes xo bi min ve biwestîne**
**Şehmizarê te me welat**
**Li min bibûre welatê min**
**Ez dê kem ya ji min tê..**

*Bexda, 1981*

## GELÎ BIRA

Gelî têhniya û birsiya
Ey têhniyêt evîniyê
Ez dibêjim
Ew ê têhnî li avê digerit
Kêm kes hene li ser vî demî
Devê mirovî têr biket
Heger hebin barekê giran e
Girantir e ji kul û jana
Ez dê çima barê xo giran kem?
Yan dê çima
Çikyêt biyaniya deme navçavêt xo?
Avê bila bi desta vexum
Ne bi tirarê xelkê vexum
Gelî bira bigehin serê kaniyê
Ava welatî şirîn e
Jê helînin çend we divêt
Ava we ye çu xem nîne..

*Bexda, 1983*

# Mehemed Ebdulla

Di sala 1964'an de, li gundê Harîka Jorî, nêzîk bajarê Amêdiyê ji dayik bûye. Serî li gundî, navî li Amêdiyê û berhevî jî li bajêrî Duhokê bi dawî aniye. Di sala 1979'an de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di rojmane û kovarên Kurdî de, di gel çendîn gotarên edebî jî, belav kirine. Endamê Yeketiya Nivîskarên Kurd e. Çi dîwanên xwe çap nekirine, lê dîwana helbestvanê şehîd Hemîd Emîn Mûsa, berhev kiriye û bi navê (Dastaneka Dî) çap kiriye. Niha jî li Kurdisanê ye.

## RÛBAR Û ÇIYA

**(1)**

**Rûbarek im..**
**Çima evro germehavîn li min mêvan e**
**Kunzirkêtka**
**Li hemî rexêt min hewdayne**
**Wesa bo xo texmîn diken**
**Dê serekaniyê li min kêm ken.**
**Avê li bejna min a zirav hişk ken**
**Ma nizanin evrê çirîska diketin**
**Ha nêzîk e, çi nema ye**
**Gorzê xo biweşînîtin**
**Dê bîte bilqêna**
**Kanî û coyêt avê**
**Li hemî rexa**
**Li her çar taxa hilavêtin..**

**(2)**

**Çiyayek im..**
**Heta darbrûyêt min jî li min xwîndar in**
**Gopkêt min jî**
**Direwa li gel min diken**
**Rast bilind nabin û her dixwar in**
**Şkeftêt min jî**
**Yê xo kiriye kuçik û telar**
**Zûrdar xo tê da vedişêrin**
**Rast e gelo..**
**Çiyayek im li nav welatî**
**Rihêt min erdê kelaştî**
**Bêxudan im, çima gelo?**
**Ger gopkêt min bigehine stêr û esmana**
**Mij û moran berze ken û**
**Lêde taviyêt barana**
**Her dê bêjin tu ne çiyayî**
**Bes warekê nizim û deştî**
**Çunkî gelo..**
**Nê darberû**
**Şkeft û nihal**
**Ax û kevî**
**Digel min neyarin!!..**

## SERHATIYA ZAROYEKÎ KURD

Dem havîn e
Em li qontara çiyayek
Xorristî di akincî ne
Évar e û li gundî nêram
Bêdengî ye
Hemî di kolkêt xo ve dirwîniştîne..
Spêdeka direng lê nêram
Zêrevanêt gundê me yêt barkirîn
Me hejara hay ji xo nîne
Dinivivstîne
Ji nişkekê ve min dî, min dî
Hatin.. Hatin
Li jêr û jor
Pêlêt ewrêt reş reş hatin
Hatin û li hawîr gundê me werhatin
Çi tov ewr in!!
Qêriyê jê bilind dibin
Agirê ji pêla dizêtin

**Hinda digot..**
**Netirsin mamo netirsin**
**Ev ewrêt he nîşanêt pêşemanan e**
**Hinda digot…**
**Helma berbest û deryan e**
**Hinda digot…**
**Tofan e, hinde dûmahîka zeman e**
**Hinda digot..**
**Nexêr.. Nexêr**
**Agirek gelek dijwar e**
**Agir jî her ji dehmana me hemyan e**
**Bapêrê min her gav digot**
**Baran aveka pîroz e li cem Xuday**
**Dilop dilop verê dibît**
**Her çipkekê Firîştek lê nobedar e**
**Dayek biyekê nekevît..**
**Lê pa min dî barana me barî agir**
**Firîşte revîn û barkir**
**Çipka çipik dibûn bizot û dibûne girr**
**Zaro wek tiya diketin**
**Bûne gizre û bûne gir..**
**Min dî min dî**
**Mencê revî û zaroyê di landikê da hêla**
**Cotyarêt gundê me kit kite**
**Dirêj bûn nav cot û kêla**
**Ehmûyê dîn li kolanêt gundê me har bibû**
**Mirov di xwarin**
**Car dikenî û car digirî**
**Car care jî siyê destê xo dikirrand**

**Û xwîn li ser lêva dimehî**
**Kes ne dişiya nêzîk bibît**
**Ji agir û dûkêla**
**Dîsa min dî**
**Dayika min xo ji min ra dikire çadir**
**Li ser pişta min bi hijî**
**Pirça wê ya wekî befrê**
**Bo pel û bo rejî..**
**Û min xo dî birim.. Birim**
**Li gelyêt kwîr vajî kirim**
**Li deşteka rwît**
**Bê av û qwît**
**Ez vekirim**
**Lê nezanî ew deşta rwît jî**
**Dê bo min bîte zozan**
**Bîte avahî û bîte ban**
**Û bîte nan**
**Ez namirim**
**Dê xo girim**

## DUHÎ GOTIN

Duhî gotin..
Dê Zê yê mezin sikir keyn!.
Berê wî deyn deştêt gerim
Bejna wî ya şeng û şepal
Ji dol û nihala ve pirr keyn
Duhî gotin..
Em nahêlîn li esmanekê lê nîv şev
Stêr serê xo bilind ken..
Li buhareka çirmisî
Kate sîngê xo bo veken..
Kaniyêt gelek gelek kêm
Bibine rûbar,
Limbîsa xo li min bilind ken
Lê negotin.. Zê yê mezin
Rêyeka dûr dûr ya birrî
Çiya û çilîxte yêt konkirin
Sikrê wan xo li ber nagirît
Sîpelêt wî herê dinirrin
Li nîva wî masî dipirr in
Lê negotin..
Li esmanê me yê tarî stêra zingêne
Li buhara çirmisî
Çima evro kata serê xo yê helday
Bulbula li ser şehyane
Ew ava gelek kêm
Evroke ya bûye lafaw
Li qontara çiyayêt befrîn
Li mêrg û çîmenêt xemlîn
Her nalêne..
Her wuşşêne..

# Hikmet Yasîn Akreyî

Di sala 1955'an de, li bajarê Akrê ji dayik bûye. Xwendina seretayî û navîn li Akrê û peymangeha mamostetiyê li bajarê Duhokê bi dawî aniye. Her ji sala 1974'an û vir de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di kovar û rojnamên Kurdî de belav kirine, lê çi dîwan çap nekirîne. Niha jî li Kurdistanê ye.

## DU DENG

*Dengê yekê:*

**Ger min zanîba**
**Axa**
**Dê her coxîna pîvin.**
**Cotyar**
**Zevî bernakevin.**
**Zarokên min**
**Bo nanekê bi dera kevin.**
**Bawer bike gelo**
**Reşewur min ne digivêşîn**
**Ku çipkên xwînê pêş baranê**
**Bi erdî bikevin.**
**Bi erdî bikevin.**

*Dengê duwê:*

**Her roj kulên dilê min da**
**Sed avizin**
**Hizar dizên**
**Ez şoxeka pirr tîz û fîz**
**Nav gundî da**
**Evro li bin reşmaleka kadî girtî**
**Li beryeka lal û bêçav**
**Kî ve biherim.**
**Kî ve biherim.**

## DASTANA DERYA REŞ

Roj. Heyv, stêr û fener
Li esmanê deryayê kirine der
Li çiwar ala tarîkê sîng qutan
Reş û moran xurrîn
Kîsel revîn
Ji bin pêla segav mulbîn bi tajî bera..
Didanên tatîkê husîn
Selemonê şepîlk qutan
Hîta qwîdan
Reş bûn dîlan. Neman semyan

* * *

A li wê demê Hespeav bûne cot
Dolfînê qeydar kirot
Avê veder bûn pêla birin
Hizar terz û terz
Çûn û çûn
Dastana derya reş
Zar li Dolfînê petî kir
Zirîna Hespeavê
Ji lêvan derbaz nebû.
Qirşe masî guhdar nebû.
Pêk ji lêvan ve nebû.
Diyar e vulkanê reşe bay

**Oqyanûs zuha kir**
**Hejiyên jiyanê kirine der**
**Daristan bûn sengeber.**
**Bûn sengeber.**
**Lê Dolfîn û Hespeav tev ra**
**Ji armîşî vehandin dav**
**Davek.. Du dav bûn kulav**
**Nexiş û çav. Xwîn û av**
**Bi hev ra bûn xelat**
**Zik li zemînê heldirrî**
**Helkêşa bîka deryayê**
**Bîk helat û nan pat**
**Memkê çepê lê givaşt**
**şîrê xoser lê qijî**
**Neman pejî, perde qetan**
**Her pişkek stêrek e..**
**Her stêrekê sed fener dan..**
**Sed fener dan..**

## WÊNEK

**Serdemê xo her Qesîm bû**
**Qesîm jî,**
**Birsê kiribû Qesîm**
**Reben Qesîm**
**Li kolanêt me evro**
**Qesîm dibêjte Qesîmî wê ve Qesîm**
**Mîr û amîr Qesîm in**
**Lîlka bo naket Qesîm**
**Yasa Qesîm e**
**Şaş û lef Qesîm e**
**Vêca her li ba xo bimîne Qesîm**
**Piştî heft baba**
**Beglerên me**
**Nasnavê te dizî Qesîm..**

## RAWESTANEK

**Ji Laleşînê kalekê pîr**
**Seferbelikê dihate ve**
**Hestame ve**
**Pêrveçûm wek harîkar**
**Tîq tîq bi min kire kenî**
**Gote min kal**
**Kerxa aşkera ye**
**Ez kulkê xo zanime ve**
**Vê dikevme ve!!**

# Mistefa Selim Akreyî

Di sala 1958'an de, li bajêrê Akrê ji dayik bûye. Sala 1977'an, dest bi nivîsînê kiriye û yekem helbest di sala 1982'an de, di rojnama Hawkarî de, belav kiriye. Endamê yekîtiya Nivîserên Kurd tayê Duhokê. Yek e ji damezrênerên bizava rewşenbîrî ya Akrê li sala 1991'ê. Nivîser û rojnamenivîs û helbestivan e. Damezrêner û serokê rêkixirawa Ayinde ye ji bo hişyarkirina civakî ku rêkixirawek sivîl e. Fakulta Şeriyetê li sala 1983'yan, li Zanîngeha Bexda bi dawî aniye. Bi dehan simînar di warên cuda da, pêşkêş kirine û çendîn vekolînên rexneyî, di kovar û rojnameyan da, belav kirine. Dîwaneka helbestan, bi şêwazê modêrin çap kiriye. Her çar zimanên Kurdî, Erebî, Farisî û Înglîzî dizane.

## MAÇEK JI BÎRDANKA MIN

**Ji bîra min dihêt...**
**Dema şeverokên payîza**
**Janên zivistana leşê te dixwarin...**
**Belg diweryan û**
**cade mest dibûn.**
**Bay xemên xo lwîl didan û**
**kezyên şevê vedikirine ve.**
**Didane ber xudîka tava heyvê**
**Rûbar... Daristan**
**Mirov û ajel**
**Kocber dibûn.**
**Li wextê revê**
**bi lezûbezî te digote min**
**Min tu divêy...**
**Sêtafkên me têkel dibûn**
**Maçên me çirîk dibûn**
**Verêja xuha**
**pencerên bajêrê me vedimalîn**
**Li wî parkî, cara yekê**
**destên min, yarî bi pirça te kirîn**
**Me serê xo pêk kirî**
**Dilopên keyfê**

**Ji hêmayên xudavendên eşqê**
**Dibarin.**
**Dema min tu maçîkirî û**
**Pirça te ji lêvên min aliyay**
**Bîvelerzkê hinavên min dikirtin û**
**Çiyayên mezin di leşê min da diherrftin**
**Li wê nîv şevê**
**Têhniya hemî iyabanan.**
**Ji biyavên leşê min da diçû**
**Borc û telar.**
**li ser sîngê te bilind dibûn**
**Paporeka bi lez dihat û**
**gerokên xo**
**li kinarên derya dihavêtin**
**Bê bilêt li havîna hesara çavên te.**
**derbaz dibûn**
**Xudavendên daristanan**
**Ji dozexa çavên te ditirsiyan**
**Bo dêmê te sucde diçûn…**

# XEWN DI SÊTAFKEKÊ DA

**Spêde bû...**
**Dema rojê xo dahêlaye**
**Di nav davên pirça te.**
**Ji xunava**
**lêvên te helmjî**
**Estîr.. Hêdî hêdî**
**Ber bi biyabanên şevê wexer dikirin**
**Her çi kîviyên bi rex derya**
**Di gel revînê berze dibûn**
**Ev bajêre ji mêje were**
**Di xewda bû...**
**Dema cadeyên me sade û**
**dîwarên taxa xilule.**
**Sufî li hîvya hetavzerkê**
**Da nivêja êvarî biken**
**Ji hîngî were te henek bi sêtafka**
**Xo dikirin...**
**Sitranên sinêleyî te digotin**
**Heta niho em hemî yê li hîviya**
**Xewnên zarokîniyê bi gehîn**
**Em hemî yê li ser seferê**
**Belkî li nîva riyê, pêşeman bîn**
**Yek û du bigehîn...**
**Ta teyr û tewalî jî, cih nema ye û**
**Neçar in hêlîna di nav**
**Ewran da çêdiken...**
**Lê avahî ji ewran bilindtir in**
**Evca were ji sêbera xo...**
**Baznekê mezin çêke**
**Xewnên bajêrê me...!!**
**Biyavên xewneka bê dîmahî ne**

## ŞEVBÊRÎ

Şevbêriya min.
Bêdengî ye û
Gilob hemî divemirandî ne
Demjimêr yek e û dergeh ditaq in! !
Du îşev mêhvanên min in
Mijeka sûr e di nav tîkên
Pençera ra dihête jûra min
Lêvên kiça he ya razay di kevalî da
Şehter diketin...! !
Di gel hûrebayekê dîn
Ji gelyê sîngê kiçka he ya
eşq varî da hatiye. .! !
Yan jî ji helma devê
Serxoşekê ezmansotî
Li bin stînka kolana he! !
Di nav sitraneka aşûpî da
Nivistiye û parê xo
ket kete disojît! !
Mêhvanê duyê, rêvîngek e
Ji nîşkekê bi jora min dikevît
Dev yê lê pirbûy ji kefa spî
Min digirît û min digivêşît.
Di gel orkistira ba yê he û
Zengila demjimêrê dimirît.! !

**Li vê nîvşevê. Xelk sivik**
**Yê diyar e. Livlivîna perda ye û**
**Dîwar jî bi guh in!**
**Li pişt perda pencera he jî**
**Du sîtafkên rwîs in**
**Car nizîkîyek û du dibin**
**Car jî. Ba. Nahêltin!**
**Ku ew dînê li gereka me**
**Çav vê dikevin. Di hijmeta da**
**Serê xo li estînka didet û**
**Bera li pencera he didet .! !**
**Ew pelatînka her roj sê car**
**Li roja min da di zivirî.**
**Bi tevnê dapîroşkê ve nisiya û**
**Li kujyê dîwarê jora min ve**
**Alizî û mirî…**
**Ji me çêtir jî. Bi pêlav ve**
**Bi jûra min dikevin! !**
**Vê pirsiyarê û. Pirsiyara he.**
**Lê bersiva min. Bêdengî ye û**
**Kiçka he jî. Di kevalê derdikevît û**
**Li ser termê wî zelamî.**
**dikete girî…**

## FORMEKA LÛLDAY

Min tu viyay…
Mîna payîzeka belig weryay
Li nav baxçekê hêj negehî
Dema ku bêhna te dikem
Li sulînekê
Xo di ditîşkê rojê dialînim
Hest bi veteziyanê dikem
Di qonaxa hizrên şevê da
Berze dibim
Heyv dibîte belemeka şkestî
Dema dikevîte ber pêlên pirça te
Min ber bi polekên
Masiyeka têhnî diben
Hindî ji te diyar kevim
Nêzkî dibîte gulesnêle û
Ji bêhna rûyê te mest dibim
Lew herdema lêvên min
Têhnî ne û siya min bi agirê
Çavên te.
Naşkêt û…
Di peykerê siha te da
Vediciniqim…
Min tu divêy
Mîna gencekê sinêle û
Di dûkêla cigara min da
Difirî…

**Dibiye evrekê damay**
**Di pêkê min da serda diçî**
**Car jî ji şeva pirça te yaxî dibim...**
**Mîna pêleka xurt...**
**Xo li rûbarê çavên te yên**
**Bi tirs didem...**
**Kinarê daristana sêva**
**Dideme ber xo**
**Êkyeke sêva leq didem û**
**Di havêjme pişt xo**
**Hinde ka jî**
**Di berîka xo da vedişêrim**
**Min tu divêy.**
**Li spêdeka elind di hinavên şevê da**
**Genî bî û**
**Bûye formeka lûlday**
**Elbomeka dirryay**
**Çîrokeka veqetyay**
**Wênên te tê da**
**Kîvî bûyin.**
**Li kolanên bajêrê me**
**Zarok li çîvanokên pîrheviya**
**Di bêzar in û...**
**Li ser roniya tîşkên hetavê**
**Dileyz in û...**
**Tirrana bi elboma me diken**
**Min tu divêy.**
**Lê te divêt mîna şengebiya**
**Naz û xûkî...**

**Tilên xo bi rondikên min…**
**Tafîl bikey.**
**Li êvariyeka zer û tawî**
**Min bikeye fîşekeka jengî û çirîk…**
**Li xaça sîngê xo berdey**
**Min bikeye soraveka beqem**
**Bo lêvên kiçkên he yên**
**vemay û saldaçûy**
**Evca tajî rava**
**Peyvên hozanên min biken**
**Şwîn maçên min li ser dêmê te**
**Bibine kevalekê helawîstî**
**Ba jî, yariya**
**Bi dehmenên min biken**
**Min tu divêy.**
**Mîna kajeka bijyay û helweryay**
**biye zivstaneka dagirtî û sar**
**Ez jî di nav demarên dilê te da**
**Bibime kelha havîneka germ û**
**feraşîneka vetezyay…**

# Xedîce Kitanî

Sala 1959'an, li bajaê Amêdiyê ji dayik bûye. Ji malbateke rewşenbîr e û keça Dr. Mesûd Kitanî ye, ku ew jî helbestvan e. Sala 1962'an û heta 1967'an, li bajarê Hanoverê, di gel malbata xwe jiya ye. Paşî zivriye ve welatî. Sala 1972'an, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û yayekem sala 1975'an, di rojnama Hawkarî de, belav kiriye. Helbestên xwe, di pirrniya rojname û kovarên Kurdî de, belav kirine. Sala 1983ê, Fakulta Çandiniyê bi dawî aniye.

Dîwaneka helbestan bi navê " Ji kela rastiyê", sala 2004'an, çap kiriye.

## LI MÎRGEHÎ ROJHELAT

*Ji helbestêt dîrokî, bo zarokan û pitir bêzanînan*

**Genca serdem û bîra, demê mîrgeh û mîra.**
**Mezintirîn malbata, bizav kir wek jivata.**
**Torevan û rewşenbîr, nevî biçîk û bapîr.**
**Osmanî bûn wî demî, ji Cizira bota bir gemî.**
**Ew palderê xudan soz, bi rê ve birin erk û doz.**
**Navê wî mîr Bedirxan, şoreşgêr û şîretivan.**
**Yekemîn komel dana, maka hemî şiyana.**
**Bo me bilind kir ala, piştî bizava sala.**
**Mîrgeh agehdar kirin, boyeketiyê karkirin.**
**Bo Kurdistanê bir rêk, lewa hemî kirineyek.**
**Rêk îxistina ramyarî, netewaw Kurdewarî.**
**Bedirxanî ne daner, rolê serekî û fener**
**Yekemîn rojname, Kurdistan e wan dame**
**Mîr Mîqdad nivîser, bi navê Kurdan îna der**
**Çaxê hejdê bi dumahî, ewê dîtî ronahî**
**Mala boş û prir tore, şaristan û sinûr e**
**Qinêta zana û resen, binyat mukum û vejen**
**Celadet û Kamîran, Sureya birayê wan**
**Ziryeta mîrê Botan, ziman nivîs û hisan**
**Ji ber bizav û xebata, dîrkrin çend welata**
**Belê karwan û gemî, berdewam bûn di gel demî**
**Dijî sitemkariyê, nezanînê û tariyê**
**Ji mama Miqdad û Medehet, rolê wan di rojnama ket**
**Rojanî umêd û stîr, nivîsivan û sergêr**
**Celadetî tîp înan, bo Latînî wergêran**
**Bo zimanekê xoşxwîn, rê ve biçît nivîsîn**
**Kamîranê Kurdperwer, di gel şoreşê bo çeper**
**Bîrhatina wan her dem, Kurdistana mezin cem**

*2006*

## WARÊ XO BINIYASE

Eger bibam firoke
Da gerim dûr welatî
Ev welate dîrok e
şaristan lê helatî
* * *
Eger bibam gemîvan
Da dem pêlêt rûbara
Com û celalêt ciwan
Avê diden ax û wara
* * *
Eger bibam belatîtik
Dûr helal û şilêra
Bişkojêt gula û gubîtik
Darêt kaju kinêra
* * *
Eger bibam siyarek da
Wek birîsyê bezim
Warê xo niyasim carek
hinde xerîb im bi lez im
* * *
Welatê min nav çiya
welatê min Kurdistan
Bo te min xebat viya
ew siruşt û darristan

*2004*

# EZ KIÇKEKA DELAL IM

*Helbstêt şîretkarî ye bo zarokan*

Ez kiçkeka delal im, pir hogir û heval im
Bo welatî şemal im, harî deyka xo li mal im
Hîvî me bo vî warî, destêt min biken karî
Çunkî min ya swîndxwarî, ez jî rakem vî barî
Dilxwazêt min biçîk in, şekirk û tepik û bûk in
Pirî reng û pîpîk in, kirasê bi xilif û berîk in
Subehî ez dê xwînim, rastiyê tê da bînim
Jiyanê pê  evînim, bo mirova gehînim
Alayê min rastiye, tenahî serbestî ye
Paqijî reng û rû ye, deybabin bawerî ye

*1992*

# XETÎRÊT KEVIN

Çira nêzîk û dîr in, bo te xemil û ronahî
Demêt xebatê li bîr in, war biriskî û avahî
Ciwaniya te da buharê, rêlo çema dixemlînî
Di gel kulîlkêt adarê, tox û ala dihejînî
Bo te dil evro şad in, cejin û şahî û seyran e
Çîçk in kewêt ribad in, qebqeb û dengê wane
Pêk ve li gerêt govendê, can û law û biçîka
Perkê zeriyê rendê, li nav siruştê wek bûka
Ala û nîşan agir e, zer û al in da xakî
Mêjûyeka nemir e, roja Kawe û Zuhakî
Çula rêk û berdera, agir û xetîre dihel in
Dil geş bûn wek fenera, soz û bawerî di gelin
Maf hat nema zurdarî, xelat e bo mirova
Guhrînek bo li rojgarî, dumahiya ne çi tova

*2003*

# Elind Akreyî

Di sala 1962'an, li bajarê Aakrê ji dayik bûye. Sala 1982'an, amadeyiya pîşesazî li Mûsil bi dawî aniye. Li sala 1987'an, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û ya yekê, di rojnama  Hawkarî de belav kiriye. Helbesta sitranê dinivîse û gelek hunermendên Kurdistanê, helbestên wî kirîne sitran. Wek ekter jî, beşdarî di karên mezin yên hunerî de kiriye. Endamê Bizava Rewşenbîrî li Akrê bûye û endamê rêkxirawa hunermenda ye. Endamê sendîka Rojnamevanên Kurdistanê ye. Endamêyeketiya Nivîserên Kurd e. Berhemên xwe di pirraniya rojname û kovarên Kurdî de belav kirine.

Berhemên wî:

1. Evraz û nişîv. Dîwana helbestan, sala 200'ê.
2. Êvar bû. Dîwana helbestan, sala 2010'î.

## LÊVÊN TE

**Erê dizanî**
**Di sihirgeha lêvên te da**
**Her roj**
**Sed tablokêş**
**Bi rîşên xo ve**
**Di xilweta xîvetgeha romansiyetê da**
**Dibine semaker**
**Û semakarên aşiq**
**Semayeka xudawendî nimayiş diken û**
**Te divêt ez jî**
**Nebime sofî û derwêş**
**A ha lêre**
**Dibêjme te**
**Tu yî  sofînizma serdem**
**Û li her peyveka diçînî**
**Sedan aşiq û meişûq**
**Hizareha adem kirnojê diben**
**Tu nabêjî lêvên te çi ne?**
**Erê dizanî li mîhraba lêvên te**
**Sedan şano û şanovan şîn dibin**
**Û li êvareka direng da**
**Berhemên xo difiroşin**
**Dikene bizmar**
**Ronahî û musîqa û dataşu**
**Da nêzîkî pitiriya ruha mirovayetiyê bin û**
**Rengên bêzariyê li serûçavan da**
**Şerim û zarken û**
**Navbera eland û şefeqê**

**Henaseya şadumaniyê û şanaziyê**
**Bi ax û fên xoş derbaz ken**
**Weyla li vê lezetê**
**Li vê tam û hez û nîmetê**
**Dibêjî lêvên te telîsma vî kewnî ne**
**Ez jî Kolumbus im û li dîf te me**
**Da ku nexiş û nîgarên te**
**Her roj**
**Bi ser lêvên deryayekê**
**Şîn dibime ve**
**Erê dizanî li cam cemala lêvên te da**
**Riha nabim**
**Bi Xudê kem ez bi ked û cefam e**
**Wesa diyar e divêtin ez**
**Bi beş halê xo razî bim**
**Vî zemenê**
**Bi rastî ez**
**Sermestekem di xirabata lêvên te da**
**Lêvên te jî xewda çûyne**
**Weku Xeyamî meyê dinûşî**
**Li dest meygêreka zend spî**
**Bi huş û cuş dihatme ve**
**Hindî te lêv qeşafî bin**
**Eve ez bendehê te me**
**Çunkî ew lêv**
**Ronahî û şefeqa rojê ne**
**Bo min esmer**

## MIN WELATEK DIVÊT

Min welatek divêt
Kes bi xwîna kesê nejît
Min welatek divêt
Gulên parkên wê
Nebes tinê bo sermêzên
Perleman û kabînênyek li dîfyek in
Hikumetê bin
Dîsan zîndan mala hîç kesekê nebît
Her kesek û narîna xo
Keyif û sema
Xoşî behra
Tev dost û yaweran bît
Min welatek divêt
Tê da yasa dadperwer bît
Tev da saman
Biyeksanî dabeş bibît
Dîsan tirs û birs tê da
Beş halê kesê nebît
Min welatek divêt
Tê da xwîndin biyeksanî
Bo kurê te û kiça min bît
Dîsan xoş viyana alayî
Di çêkiriya tev bawerên
Me hemiyan bît
Min welatek divêt
Eger du dilan hevdû viyan
Bila azadiya wan

**Di nav destên ewan bît**
**Neku dest giryê nehezan bît**
**Ma qeyî çi ye**
**Navê kurê min Kurd bît û**
**Navê kiça te jî Kurdistan bît**
**Min welatek divêt**
**Çê dî ne di wayek nav da**
**Bihête recmand û hetkirin**
**Ne Ehmedek û Muhemedek bihêne revandin**
**Belku mafên zarok û afretan**
**Di herûher parastî bîtin**
**Min welatek divêt**
**Mirovên di nav da bi xewin û xeyalan nejîn**
**Belku azadane bîr biken**
**Çendî bişên derbirînê**
**Li azarên xo bikene ve**
**Dîsan di nav misteka avê da**
**Melevaniya neken**
**Û li şaraya dunyayê xo bibînin**
**Min welatek divêt**
**Kes çi tîza bi kesê neket**
**Min welatek divêt**
**Serkirdê wê**
**Mîna Nilson Mandîla bîtin**
**Û hunermendê wê**
**Li rêza Şivan Perweran bîtin**

## JIYAN Û MIROV

Jiyan di çend gavên nivistî da
Hişyar dibît
Pêngavên here mezin
Let letkirina metirsiyan e
Û derbazbûn bi ser nexuşiyan e
Aha li van deman da
Gavên pirr seyir û entîke
Xuziyên zarokîniya mirovî
Dibine destpêka viyanê
Bo berqelemkirina jiyanê
Deng dibîte awazeka orkistirayî
Çaxê ku çi deng nebine mîlud
Reng jî dibîte pîşangeheka hefçerx
Çaxê ku çi reng nebe tablo
* * *
Jiyan li ser eniyeka bêguneh
Herûher gumana dinalît
Li windabûna davên rojê
Nebes roj dibine tarrîstan
Belku kes neşêt giriya dayikan
Ne li çavan
Ne li ruh û dilan da
Bo demekê giz biketin
Li van deman

**Sedan pirsiyar**
**Dê mînne ve bê bersiv û bê biryar**
**Gavên hesret û meynetan**
**Li gerden azadên dayikên şehîdan**
**Xo nakene**
**Tinê qurçek ji aveka sar**
**Nebû çare**
**Daku pê şil bibin demar**
*******
**Jiyan bi xuşkirina xeyalan**
**Tevlî aştiyê ji bo mirovan**
**Ev çi ma gelo?!**
**Berxikên me**
**Ji bo jînê**
**Tê serbirrandin**
**Gundiyên me yên pirr ciwan**
**Gurî soreta Enfala bin**
**Xudê mino**
**Tev dil dişewitîne pîçek baran**
**Bila bes bin roj tarrîstan**
**Ka ew kesê sêv di destan da**
**Ji bo pitir hevdu viyanê**
**Û tev hîvî di çavan da omêd**
**Û min û te rizgar biket Kurdistan**

# Seîd Şerîf Akreyî

Sala 1964'an, li bajarê Akrê ji dayik bûye. Heta şeşê amadeyî xwendiye. Ew wek nivîser, ekter û derhêner jî, hatiye qada hunerî. Bi dehan berhemên şanogerî û diramayî nivîsîne. Berhemên xwe, di rojname û kovarên Kurdî de, belav kirine. Sala 1984'an, yek ji damezrênerên tîpa Şanoya Akirê bûye. Di redaksiyona gelek kovaran de, kar kiriye û dike. Endamê Sendîka Hunermendên Kurdistanê ye. Endamê Sendîka Rojnamevanên Kurdistanê ye. Dîwaneka helbestan bi navê “Ma ve yadgar” 2009'an, çap kiriye. Û du berhem jî, “Giraroşk” ku komeka sînaryoyên şanogerî û diramayên zarokane û ”Renca cuxîna min” ku gotarên edebî ne, li ber çapê ne.

## EZBENÎ

Ezbenî.
Ew peyva sivik û nizim û genî
Yan wî dibîteve
Li vî çerxê niwî
Bab û kalan
Qurbanî dan bi hizaran
Ku nehêlin vê peyva
Bi zûrî hatiye nav ezmanî
Nexemxorên xugur
Bo destvehînana
Deskeftên nizim û bê sinûr
Divên renca bapîran bidene bay
Û pirkene ve zimanî
Li vê peyva bê rêz û genî, bi erzanî

## HELATIN

Evro li warê min
Du rojên helatîn
Rojek roja her roj
Li rojhelatê û
Li rojavayê jî
Hatin û helatina yara min
Rojhelatê subehî ne li benda te me
Heyve şevê ne li hîviya te me
Gelî stêran
Hembêz biken
Wan du çavên mêhvanên stêranî
Reng e!
Exterên Etard û Zehra
Li şermên çav stêra min
Li çû dera dernehên
Û elinda rojê hevber dêmgeşa min
Weke êvarzerkekê bi helêtin
Û heyve şev jî, li şerma sorgula min
Xu li pişt evra veşêrîtin

## ŞOXA NAVXOGIRTÎ

Ger ronahiya dêmê te ji tîşkê lîzerê bît
Dormandorên rîkên te
Hemî sîm û mîn bin
Biru mijîlankên te
Rim û tîrb in
Awirên çavên te
Ji awirên Selwaya melayê Cizîrî bin
Enya te panava cengê paşayê Kore bît
Soriya lêvên te
Ji xwîna zarokekî yan bêgunehekî bît
Bejna te ji stûna agirê voulkana Kutûyaksayê bît
Pêlên neviyana te, ji pêlên volkana Tisunamî bin
Ev tev sinûre nikarin
Min ji vîna te bê bar biken
Dê her hême tewafa
Wan çav û dêm û bejna

## JI DÛR

Dûr ji dûr
Dêmê te çavrakêş bûn
Çavên min pê ve hatin û
Giyan dîf xo rakêşa û
Beref tewafa ciwaniya te hatin
Ji heybeta nizîk şoxiya te
Wek peykerekî req rawstam
Çinkî ne dîrkuja nizîk xisarbûy
Li nizîk ciwantir bûy li dûr
Ji dûr dêmê te çav bi xo kêşan
Ji nizîk çavên te mîn bûn
Dil bijêkand
Dil bijêkand

## ÇÊRANIDIN

**Min çav bi dîmê te diçêrandin**
**Lê çavên te ne dibersiva**
**Çêrandina çavêt min da bûn**
**Min diviya têhna germa**
**Til û destên min**
**Ji husîna giyanê te ban**
**Lê giyanê tezî jî weke çavan**
**Ne di cihê bersivê da bûn**
**Min xo bi nêçîrivanê**
**Wan çavan dizanî**
**Lê ew çav ji dîmî da firî bûm**
**Di aşuba xo da**
**Bo nêçîrvanekê dî xo didada**
**Xo didada!**

*17.11.2010*

## CAXÊN QEWRANDÎ

**Min mirade**
**Wê eniya roj lêneday maçî bikem**
**Çinkî dizanim**
**Li rojê tafîltiru spîtir e**
**Diyar e ku neku**
**Bi endazyareka pirçê**
**Ev caxe hatîne xemlandin**
**Çinkî rakêşa min bo dêmê te**
**Rengdaneva nexişa caxan e**
**Serên rimên caxan**
**Dayine serên tîrên birûyan**
**Êdî kanê**
**Ew niçîrvanê wêrekê**
**Dibirît percanê rim û tîran**

# Selam Balayî

Ew di sala 1965'an de, li bajarê Duhokê, ji dayik bûye. Endamê desteka rêveber yayeketiya Nivîserên Kurd e. Liqê Duhokê. Endamê Sendîka Rojnamevanên Cîhanê û Kurdistanê ye. Peyamnêrê radyoya Dengê Emrîka ye li Duhokê. Sernivîserê kovara Sivore ye, ku li Duhokê, ji bo zarokan derdikeve. Helbest, pexşan û vekolînên edebî û zarokan dinivîse.

Ta niho ev pertûkên jêrî çap kirîne:

1) Li ber derazînka têkistan/ xwandinên wêjeyî, 2004.
2) Ey roj neçe ava/ pexşan, 2005.
3) Mixamiratên kabtin Rincl/ roman bo gencan, wergêran ji Erebî, 2005.
4) Henasek di perstgeha şirê da/xwandinên wêjeyî, 2006.
5) Leşê şevê/ helbest, 2007.

# NIHÊNIYEK AŞKIRA

Nihêniyên serûçavan
Peyvên şermîn. Nameyên mijewî
Xapandina dem, dê we hêl in
Di gel meşê naden rê...
Tirîfe û namûyeka jibîrkirinê û hevnasîna me di gel (Bîlî)
Dem ji bîr me çû. Şev nehate naskirin
Tilan semayeka bê wêne nimayşdkir.
Şiqê saluxetên xo ji dest dan
Ez neyê caranim xo nas nakim.
Awaza nîştîmanekem ya diguhên min da kehî bûy
Li min xoş dihên meşa li ber baranê û guhdana awaza
(Kê kiriye wa? Kê kiriye wa? Kirasekê sur li ber xo kiriye wa
Kirasê te serê te bixut.  Kurkê xelkê dîn kiriye wa)
Pêlin gilop bihên vemirandin
Heza min li ronahiya şemalkane
bihêlin dengê musîqê bilind bibît
Dilê min hawîş diket.
Musîqa nanê aşiqane.
Di gel weryana belgan û.
Serhildana kanî buharan.
Di gel sir û seqema zivistanan û.
Kele kela germatiyê û xuhdana serûçavan.
Dihête kirin...
Lew dibêjin:
Mirin di evînê da zîndîbûn e!!
Ey (Nîvada) ciwaniyê
Dê kengî ji asman hêye xwar
Dê kengî hîviyan danî ser masên vala

Were destên me di ser evraz in û.
Çavên me bi çaverêbûnê westiyan
Dilgiran im peyvekê ji ferhenga xo
Jûr da berde
Da vegirîn û bikeyin hêvênê
Tevnekê nû yî raçandî...!!

Ma tu ji ketinan têr nabî

Dibîrdanka şevek tirajî da.
Hestên min mest bûn!!
Bi mestiya hestan.
Ez li ser perên spî hatim gêrandin.!!
Wêneyên bi nihênî hatîn helawîstin
Divî bajêrê jibîrveçûyî da nahên nasîn.
Eve rojek...
Eve salek...
Eve şemalk û eve agir.!!
Were şevê bikeyin şemalk!!
Rojê bikeyin gul..!!
Li ber ronahiya kiz...
Di gel bêhna sîs in û binefişokan
Li min bigere.
Qulaç.  Qulaç
Mêze.  Mêze
Di nav semayek azirandî da
Nêzîk te me. Lê tu min nas nakî.!!
Ne bêhin û ne ser û sîmayên min li bîra te ne
Ne jî pirça min wek caran maye.

**Ne jî êdî dişêm te bikem helbest**
**Ew çi nuşe tu kiriye gêjevank..!!**
**Ew çi sema ye tu ji bîr ve birî...!!**
**Ew kîjan jor û text in tu lê kupî biyî û te hemî rabirdû hingaftî..!!**
**Li xo bigere her pirteka te bo xo ya çiyî**
**Ji min vebe hêş ez wek te nebûme pirt.!!!**
**Min tu dihebûnê da nasandî tu bûye tişt..!!**
**Min tu di oqyanûs û deryayan da gêrandî**
**Tu bûye qubîtan.**
**Min tu di hembêza xo da hewandî**
**Tu bûye misafir û li pişt dergehên kilîlday nazandî..!!**
**Ez li çi bigerim!!**
**Li te..!!**
**Li xo..!!**
**Li yê dî..!!**
**Yan jî li me hemiyan..!!**
**Di mîhraba xudawendiyê da nebûy xudana çi ol û mezheban..!!**
**Di demî da hatî xapandin**
**Di kolan û cadeyan da winda bûyî**
**Di semaya şevên haronî da li belgan digeriyay**
**Madê çendcar kevî ma tu ji ketinan têr nabî.!!**
**Ne şihîna hespan te vedigerînin.!!**
**Ne jî çiya papora nuhî dubare radigirin. .!!**
**Evcar here...!!**
**Eve dumahî wexere ez te tê da dibînim.!!**

# XEWN

*Xewn (1)*

**Ez di nav rengê binefişî da hatim hilandin**
**Li bin pên min**
**Binefşok şîn bûn û ser hildan!**
**Li rexên min**
**Ya pirr bû ji kiçên binefşî**
**Ez derkeftim**
**Yê di sorî hatîm hilandin!!**

*Xewn (2)*

**Rojekê ez çûm**
**Min du kes dîtin**
**Yekê diçît li ser pişta kerî!!**
**Yê dî li pişt kumpoterî!!**
**Herdûyan diviyan pêguhorkanê biken.**
**Ez mame hêbetî**
**Min guh dayê**
**Xudanê kerî qayil nabît**
**Herdu jêk verrevîn**
**Ker neda bi kumpoter.**

*Xewn (3)*

**Dukêla cigara yê bi rex min ve**
**Çavên min kore kirin**
**Bêyî lê bizivirrim min berçavik kire çavên xo**
**Dukêl hemî vejenî bo wî**
**Ji hîngê were,**
**Cigare bi rex min ve nahên kêşan.**

*Xewn (4)*

**Ji serma da min doxîna xo baş şidand**
**Kale bapîrê min serê xo hijand û got:**
**Kirîvo...**
**Diyar e tinê di nav derpêyî da te sar dibît!!**

*Xewn (5)*

**Hûn hemî îro mêhvanên min in**
**Lê bê mize bît**
**Da gelek mey bi lêvên we da nerrjît**
**Çunke dê mize maç bin!!**

*Xewn (6)*

**Min ji ber xodîkên şofêrê teksiyê**
**Xo vedişart**
**Da çavên wî min nehingêvin**
**Min berovajî xwastên wî**
**Bersiva axftinên wî didan**
**Lê dema ez hatîme xwar,**
**Pare ji min nehate wergirtin**
**Dehmana min, ma di ber dergihê teksiyê ra.**

*Xewn (7)*

**Min dûmahî forim pirr nekir**
**Ji welatê formstanê hez nakem**
**Heta nihu nasnavê min bi guman e!!**
**Çi mûçên rêzgirtinê jî, wernagirim!!**

*Xewn (8)*

**Van tesan zik bi me ve nehêlan**
**Xirxalên tirumbêlan jî,**
**Yên bûyne heşe û mehleke**
**Di van gazindan da**
**Hevalê min got:**
**Hûnê li bajêrekî dibêjnê tesestan!!**

*Xewn (9)*

**Ew sitranên li guhê min xweş dihên**
**Ew in yên behsê hemî rûsatiyê diken**
**Mêyên li min bi baweş dihên**
**Ew in yên rojê pênc caran**
**Perda namûsê ji dest diden.**

*Xewn (10)*

**Depo mezintirîn nûxwaz bû**
**Di hiş û hizir û mêşkê xo da**
**Lê dema bi peyiskên otêlê da dihate xwar**
**Min xo ji civatê vedidizî**
**Da nezanin ez û ewyek şand în!!**

*Xewn (11)*

**Ez mirovek ser zelut im**
**Xudan zikek şorr im**
**Min tivengek ya di hirçekê werkirî**
**Di van helbjartinan da**
**Dê bime şaliyarê deriyayê!!**

*Xewn (12)*

**Min di koşa ewran da**

**Baran dibarand**

**Roj jî li milê min ava dibû!!**

*Xewn (13)*

**Di tevnek alizî da**

**Hemî demê me hate xwarin**

**Lewra ez mirîdê demî me.**

*Xewn (14)*

**Leyiztoka te li ser depê şanoyê kirî**

**Bîrhatina min bû!!**

**Lê ew jî, ji min hate standin.**

# Selwa Gulî

Ew di 1966'an de, li Duhokê ji dayîk bûye. Wê ji navê xwe qet hes nekiriye, ji ber ko Erebî ye, lê ji bo xatira Melaê Cizîrî ew nav parastiye. Hê ew zarok, babê wê ji aliyê faşistên beis ve, dihê girtin û winda dibe. Ji ber hindê jî, her zû dikeve nav xebata siyasî. Piştî serhildana pîroz, dihête welatê Swêd. Li der ve jî, li ser xebata xwe ya siyasî û edebî berdewam dibe. Endamayeketiya Nivîskarên Kurd e li Duhokê. Endama Komela çandina organên mirovan e û nûnera PEN a Kurd e li Skandinavyayê. Helbestên wê yên hatîne wergerandinî zimanên, Erebî, Înglîzî, Swêdî û Elmanî.

Berhemên wê:

1- Dîwaneka helbestan, bi navê “Sefera xewnêt xema min.” Sala 2000'an, li Almanya çap kiriye. Her ew pirtûk li Kurdistanê bi pîtên aramî ji aliyê weşanxana Spîrêz û bi harîkariya Wezareta Perwerdê çap dibe û di heman demê de, ew pirtûk nivîskarek ereb bi navê Kerîm Hedad Elsemawî werdigerîne Erebî.
2- Dîwaneka helbestan, bi navê, “Sore birîna şeva min.” Sala 2007'an, ji aliyê yeketiya Nivîskarên Kurd li Duhokê dihê çap kirin.
3- Dîwaneka helbestan, bi navê, “Şev şahid e.” Sala 2008'an, ji aliyê Avestayê ve li Istanbulê dihê çap kirin.
4- Dîwaneka helbestan, bi navê, ”Xewnêt helawîstî.” Sala 2010'an, ji weşanên yeketiya Nivîskarên Kurd li Duhokê dihê çap kirin.

# XAL-XALOK

Ez îro çend li benda te bûm
Çend cara min destên xwe vekirin û
berev esmanî ve birin. Min got dibe tu li gel wan
dindikêt baranê bikevî.
Li derdûra bejna min reqasê bikî.
Barana evînê li min dijwar dikir û tu nehatî.
Êvarê ez dîn kirim û tu nehatî
Şev ez mest kirim û tu nehatî
Dav dav, roj bi ser germa dilê min ket
Ez li gel xwe dikêşam,
û berev welatê
Xal-xaloka ve birim,
Ka wer bibîne çend ciwan in?
Eşqa wan ji gunehêt min û te ne
Bêdengiya wan?
Ji kêlîkêt dînatiya min û te ne
Rasatiya wan ji rengê şeva min û te ne
Min ji wan xiwast
Rêkê bû min vekin,
Da te li nav wan gulistana da, bibînim
Min hemû corêt gula li werzê baxê
Dilî çandin
Hemû xal-xalok li ser firrandin
Min çend cara got,
Xal-xalokê mala lawê min li kî ve ye?
Her bilind, bilind dibûn û berev dûriya te ve hatin
Wek te soza xwe bi min li ser perêt van gula hêlay
Heta carek din tu vegerî
Li ser çeqêt bejna min reqasê bikî
Her roj ez li welatê xal-xaloka bêriya te dikim

# EY DIL

**Ka were,**
**Were ey dil**
**Min fêrî şiriniya rojê bike**
**Ka çawa pêlêt mest ji çavêt xwe**
**Bişom!**
**Çawa bêhna te ji ber û bersingêt xwe**
**Bifirrînim!**
**Ey dil were**
**Min fêr bike**
**Fêrî şevê û dînatiyê**
**Hozan û hesreta wê**
**Axînk û omêda wê**
**Çawa navê te**
**Ji demsala xwe bidizim**
**Kenê te li ser keziyêt xwe daweşînim...**
**Maçêt te çawa li ser tiblêt xwe veşêrim**
**Ka were. Were ey dil**
**Min fêrî êvareka bêdeng bike**
**Bêdil bike.**
**Bê Perperîk û Xalxalok bike**
**Da li xunava xewnêt dilketî vegerim**
**Asoyêt şikestî bejna min pir dêşîne**
**Min fêrî sebra sipêdê bike**
**Da nebêjîn direng e ey dil**
**Yek çarêk maye wê temenê me bifirit**
**Yek maç maye wê cihê sed maçan bigrit**
**Yek gav maye, wê roja me ji kiçîniya xwe bikevit**
**Ey dil were. Sebra min bûye Mayistro**
**Li ber dergehê dil**
**Awazêt hezar çîrok distire**
**Lê tenê li ser yek not**
**R-S dijenit**
**Req bûn çavêt min**
**Sot sebra min ey dil**

## XWÎŞKA TE

**Neviya Qazî me û tîrêjka berxwedanê**
**Temenê min tenê welatek e**
**Bila bimînim pîroz, neke porê min li bin solêt**
**Cendirman heram bibît, bila giyanê min gurg bixwin**
**Neke birayê min çavêt xwe kor bikit û xwîna min**
**Bi tiliyên wî ve sor bikît**
**Xwîşka te me Kurdo**
**Neviya Riza me**
**Hêviya Şêxê Pîran im**
**Kulîlka berfîn im li devê sirûda çiyayê Qendîlê serî hildidim**
**Xilas nabim, bermaya talanêt Eskender û Teymûr Lengî me**
**Her dê bijîm û her dê bimînim Kurdo**
**Erê Kurdo**
**Keça babê mezin Barzanî me**
**Dengê azadiyê me, tevnê dewletekê me**
**Soza Ehrîmen û Ahûra Mezda me**
**Çawa du Xweda bûn yek û dîrokek li paş xwe çand**
**Were ez û tu sosa**
**Ahûra û pênûseke roniyê li dîroka zarokêt xwe**
**Çap bikin, xwîşka te me**
**Bila têkçûna jiyana me ne bi bahoza neyaran be**
**Nebîn nalîn û li xopana Imraliyê**
**Wenda bibe.**
**Bila nifşê me xewnêt keviran nebînin**
**Bila xiyanet ji çavêt me şerim bikit**
**Were Kurdo**
**Şoreşa yekbûnê biparêzin**
**Dereng e, bila siwarê dîrokê bin**
**Da careke din nehêne jibîrkirin**
**Min bixemilîne Kurdistan im**
**Kurdo  xwîşka te me**
**Kurdooooooo**

## QENDÎL DI DILÊ SALÊ DA

Li welatên xelkê,
Sal bi mey, gul û çira dixemilînin,
Li welatê min sal bi salgerdên talan
û kovana digerînin.
Li kê pîroz bikim, vê pîresalê?
Rondikêt kîjan dayikê bi lifka lewendiya xwe
ya peritî ziwa bikim?
Qêrînêt kîjan çiyayî li xwe û we kom bikim?
Kîjan zarokê bê xwedî hembêz bikim?
Li kê pîroz bikim vê kalesalê?
Li Şengalê yan li Çiyayê Qendîlê.
Min got tenê li bihara temenê me,
dikujin û carek din şîn dibît.
Min got, li payîza em dastanêt zêmarê
Bi nalêt hespan dadêxîn.
Min got, li kanûna tenê em
çîrok û çîvanokêt serwera guhdar dikin.
Û dayik li ber landarê lorîka vedihunin...
Lê, bi dudengiya birîna Qendîlê
Felek  xezeba xwe li serê bê welatiya me dibarîne.
Nehêla kulikêt adarê
Li çiyayê Qendîlê ser helbidît.
Nehêla zaro bi şivaniya karikan dilxweş bibe.
Ev çi reng e salê?

**Ku dihêle zilam giriyê zarokan jê bidize.!**
**Da rondikêt xwe pê biweşînît,**
**Erê Qendîla berxwedanê.**
**Dizanim çendî bihêz î.**
**Bi rojên jan, min ji te hez kir.**
**Li ber navê te, hesretên lawa diveşartin,**
**Bi kenê xwe yê çilmisî, min navê te hezar hezaran car dubarê dikir.**
**Bi rengê te, tenê carek kirasê sor**
**min li bejan xwe kiriye.**
**Dizanim bi xavî tu ji bin lingêt**
**Têmûr Lingî azad bûyî.**
**Te ser hilda.**
**Careke din. Siwar fêrî nêçerê kirin,**
**û li himbêza xwe ya germ xwedî kirin.**
**Qendîla şevçira min.**
**Nema dikarim vê sersalê bistrêm**
**Xwe ji xewnêt te xlas bikim.**
**Nema dikarim, vê kale salê li**
**kesê pîroz bikim.**
**Li min bibore Qendîla birînkûr,**
**ger nikarim te birînpeç bikim.**
**Li min bibore dûr im lê pir nêzîk im…**

# Dirbas Mistefa Silêman

Di sala 1969'an de, li gundê Sertenga ser bi qeza Sêmêlê ve, ji dayik bûye. Xana mamostayan li sala 1987'an, li bajêrê Duhokê bi dawî aniye. Niha jî, li Zanîngeha Duhokê / pişka adabê, xwendkarê masterê ye. Endamê yeketiya Nivîserên Kurd e. Endamê Sendîka Rojnamevanên Kurdistanê ye. Li naverasta salên heştiyan, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Di redaksiyona gelek rojname û kovarên Kurdî de, kar kiriye. Niha jî, cêgirê sernivîskarê rojnama Evro ye li Duhokê.

Heta niha ev berhem hene:

1- Wêneyên kûvî ji elboma bîrhatinên te. Helbest, sala 1999'an.
2- Pelên eşqê. Helbest, sala 2006'an.
3- Komeleka postere helbestan, ji bo çapê berhev kiriye.
4- Komeke helbestên Nalbendî, yên ne belavkirî. Ji bo çapê di berhev kirîne.

## TU YA FIRÎŞTE Û EZ LI BIN ALAYÊ DEWLETÊ KIRNOŞ DIBIN

Tu di bîrdanka min da firîşteyî û
Divêt her bimînî weha
Her ya di kiçîniyê da û
Divêt her bimînî weha
Guleka nazik û bêhin xweş î
Di nêv baxê eşqa min da.
Dê te hilmirwîsim
Herro spêdehiya
Keresteya avakirin û nijandina şiirê
Ewên bosî di eşqa te da hemiya
Tu henaseya min î.
Ya dilqutka min radigirt û
pê radibim.
Dirûnim.
Dibizivim.
Vînê dikim
Rojê bo Xudayî pênc caran
Kirinoş dibim û
Di xwediyê te da dibuhijim
Tu pelatînkekî û
ez şemalkek im
Agirê ji min dipeşit
Gelekî dijwar e
Ditirsim pêta wî
Çengokên te yên bajarî
Biqemînit!

Tu têkelekî Xuday afirandî ji:
Agirî. ..
Eşqê...
Viyanê...
Dilovaniyê. .
Dojeheka bê serûbinî
Divêt kûnê xwe ji zozanên te bar bikim
Dem hatiye, bibim rêvîng û qonaxa dawiyê bajom
Kûrheka dijwar î divêt pitir te nehilêvirrim
Di ferhenga min da.
Peyveka pîroz î
Nabit di nêv baxê sîngê te da biçerim
Leşê te ji pembî nerimtir e
Lêvên te yên hingivînî binoşim
Gerdena te ya kêl bi lêvên pêtî bi ramûsim
Di baweşa te da bibime zaroyekê sêwî û
Serê xwe bi wî sîngê germê
Tijî bizeyî venim
Tu weku ez di te digehim
Bînahiya du çavên min î
Bo dîtina rastiyê û
Dîmenên ciwanên welatê me
Bi şev û roj dinalîn in
Bo çiyayên bilind û rûbarên kûrên eşqa me
Tu alayê dewletê yî
Spêde û êvariyan li bin saya te dirrûnim
Şanaziyê bi te dibim
Bi şehîdên te dibim
Zaroyên me

**Li baxesîngê te yê pawankî**
**Yariya dikin**
**Vînê... Dimijin**
**Kînê... Dikujin**
**Tu dê her mînî gulnesrîna min**
**Ewa Şêxoy naziktirîn peyv û**
**awaz jêr ra sitrandîn û**
**Kiriye ciwantirîn navgîn di nêvbera min û te da.**
**Tu dê her mînî tu**
**Ewa min weku xwe viyay**
**Dîwarê eşqa te di vî canî da ava kirî û**
**Libin libin bi dilovanî nijyayîn**
**Dê mînî xweziyek û**
**Xewnek û xeyal**
**Mehale ji min ra bibiye**
**Berdilk û xatûna li ber mal**

*15.6.2005/çarşemb/kiwêsnceq*

# BÊZARÎ

Hevbendiya me
Li sêdare nede
Tu ya bi şermî paşkişanê dikî
Bi bihaneya bê desthelî
Hemû tayên bi tinê
Weku te ne
Sinûrên wan
Dibê pejan û perde ne
Lê bi bawerî li ser soza xwe ne
Ev dinya çerx û felek e
Deryayeka kûr e
Pirî zivrok û pêl e
Bo têda jiyan
Û...
Bersîng girtina xeman
Berxwedan divêt
Serreqî û rikoyî divêt
Qurbanî û rondik divêt
(Kes bi pilekê naçite serê milekê)
* * *
Nameyên te yên eliktirîkî
Bêzariyê di canê min da diçînin
Li binê çaleka kûr dinivînin
Xewnên nexweş bi te ve dibînim
Şevê hemiyê sed tevna radiçînim
Di gel zengla telefonê
Dibêjî her evîndara canim!

**Xwedan suz û peymanim**
**Tu. …**
**Direwekî lê niza**
**Rengê te çawane?**
**Zû bi demî ra dêye guhartin**
**(Te kew jî divêt û xew jî divêt)**
*** * ***
**Carekê bi kerratî serê xwe**
**Bi sîngê min ve ne û**
**Pirsiyareka bê guneh jê bike!**
**Da ku bizanî ew dile**
**Çendê kovandar e**
**Di eşqa te da**
**Carekê bi tinê xwe di gerdena**
**Min bi alîne**
**Da bizanî her şaneka leşê min**
**Her çipkeka xwîna min**
**Her demarek û geheka min**
**Çend bo te difîdayî ne**
**Carekê ho bi lez**
**Destê xwe dane ser dilê min**
**Çendê kiz û ketî bit.**
**Çendê melûl û xemgîn bit**
**Demê te dibînit**
**Li cihê xwe namîne**
**(Serên keçela diçine paxlên gerdenzera)**

*28.1.2006 / Sêmêl*

# BI GERMATIYA HESTAN XAÇ DAM

1

Di xendeka çavên te da
Hemû nihênî xuya dibin
Awirên te yên pilingî.
Mîna tavzerka payîzê yên lêhatîn.
Êdî gilîzanka bi laşê min da naynin
Nawiskên zerdeştî.
Zikrê eşqa me nahewînin!
Te rûgeha xwe ya guhartî!
Ezê sofî.
Di mîhraba perstina Xuday da.
Mestane me û
Te destnivêja xwe ya şkandî
Demê te û êlçiyê sultanî
Destên yekdu hejandî!

2

Ji xemên piştdana rojê û
Zîzbûna heyvê
Nîşanên êvariyeka zû
Li canê min hildan!
Dêmciwana dilî.
Te hestên min yên fîriyay
Cemidandin û.
Soz û peymanên me yên firîşteyî
Sergon kirin.
Deşta berîna Dubanê.
Ya ji piyasên min û te xerîb bûy!

3

Hêdî hêdî ya hî dibiye fêlbaziya.
Xwe vedidizî ji refa zeriya û
Volkana dilê şaryay
Li gel heziyên min
Te dane bay!
Sûnda nexwe.
Te ya pê li hemû pîroziyan nay
Di navçavên min ra çîkanê dikî
Li ser sîngê min.
Hezên xwe yên sinêleyî.
Xîç didî
Bese. Te ev cane
Yê bi destên pîroz xaç day!
Kiryarên te.
Gotinên te.
Hezên te.
Li nik min rondikên tîmsaha ne
Peqîşkên baranên bihara ne
Falkên pîrekên qereça ne!

4

Min di çavên te ra dinya didît
Sîngê te ji min ra baxê Êrem bû
Jiyan dida min.
Gencatî dida min.
Xwîna germ dida canê min.
Te xwe li ber bakuzîrkekê negirt û
Ne da binkefşê min yê germ

**Weku caran.**
**Serê xwe nedana ser sîngê min yê nerm!**
**Her li despêkê te xaç dam û**
**Kirime terim, terim, terim...**

**5**
**(Serên keçela, diçine paxlên kezîzera)**
**Êdî tu ne mayî ji min ra**
**Lew hero**
**Spêde û êvaran**
**Hestîkên min dihêrî,**
**Goştê laşê min didiye ber bera**
**Te karwan heta nîvê hajot**
**Bijyên te.**
**Tilyên te.**
**Kêlbên te.**
**Yên bûyne bizot**
**Hestiyên min verot**
**Canê min ji xweşiyê dot**

**6**
**Min kenîşte nefirotine**
**Dêr nesotîne**
**Mizgefit wêran nekirine**
**Pirtûkên pîroz.**
**Çakên Xuday**
**Kiçên destveneday**
**Li felaqe nedayine!**

**7**

**Dilê min şaneşîna te bû**

**Tu jî, ji min ra kozeka pawan kirî bûy!**

**Mêrgeka bê perjan bûy**

**Pirtûkeka pîroza vekirî bûy**

**Xweşî ji paxlên te diza.**

**Jîn û jiyar ji hembêza te dibarî**

**Lê.**

**Ji xweziya**

**Me radihşte cotê keziya**

**Îro me çav maye li serê riyan**

**Tu li xerîbiyan**

**Hera haviy û**

**Dil jî xalî nabit**

**Ji hîviyan. . Ji hîviyan. ..!!**

*27.11.2007 / Sêmêl*

## ŞILOVE

**Baraneka hûra kehî ya bi şilove.**
**Ya dibarit**
**Ji aronkên te.**
**Dilê min yê difûrit!**
**Rojgarên dema yên xwe di xeyla min dalînin!**
**Ayetên eşqê çep û rast.**
**Ji min ra dixwînin**
**Ev barane ya bo me bûye hevalcêmik.**
**Hemû deman min û te digehînteyek.**
**Ka dê were da nivêja baranê bikin**
**Nemaza rihabûnê bikin û.**
**Li ber şirrka sivanda kolkê jivanên me**
**Serên xwe pêkve nin**
**Bikevne di baweşa felekê da.**
**Da ji germa leşê me,**
**Gulên jiyanê şîn bibin û**
**Li hindav serê me refên newresan**
**Semaya domandinê bi nexşînin**
**Destênyekdu bigirin,**
**Ber bi kavle warên gundên xwe bimeşin**
**Ew kolanên min û te.**
**Bi caran tê ra berdaye hev**
**Birranê û çîkanê lê kirî**
**Dîwar dîwar pişta xwe.**
**Pê ve morkirî**
**Hîşta wê he pateyê sorê.**
**Gulîkên te ye**
**Bi libnên kolana mala me ve.!**

*15.3.2007 / Sêmêl*

# Aştî Germavî

Di sala 1969'an de, li kundê Germava, nêzîk Duhokê, ji dayik bûye. Sala 1987'an, di naf şoreşa Kurdî de, dest bi nivêsîna helbestan kiriye. Di Enfalên 1988'an de, derbiderî welatê turkiyeyê bûye û li kempa Mêrdînê, akincî bûye û her li wêrê bûye endamê Tîpa Helebce. Çend helbestên wî bûyne sitran. Serhildana 1991'ê, zivirriye Kurdistanê û li bajêrê Duhokê dijî. Herwesa li fîsteval û senterên rewşenbîrî, helbest xwendine û di kovar û rojnamên Kurdî de belav kirine. Di van dezgehan de, kar kiriye: Kenalê Kurdistan TV, kenalê esmanî Sehir, Duhok TV, Radyoya Duhok û Radyoya Azadî. Sala 2000'î, bûye endamê Yeketiya Nivîserên Kurd tayê Duhokê.

Du pirtûkên helbestan, çap kirîne:

1. Min habîl nekuştiye.
2. Eşq di xilwedgeha mirinê da.

# NEVYÊN ME LI ŞEVÊN SOR
# DÊ KEVRAN DI GURRÊN ME WER KEN

Xo bi gehên axê ve bigivêşe
Çinku çi gulberoj di gel edetên mirovên vêrî şîn nebûyne
Azadî û serçeqên welatên felîte
Li ser zimanê zaroyên me, ne bûne sitran
Û çi bajêr mîna bajêrê me yê milpan û guhgiran nîne
Ey bajêr
Li nav werzê fitnê
Dehmenên xo bigire û xo li ser keskesorê bihavêje
Gazî bike
Bila şehîdên me, ji wê hebûna berze bizivirin
Da li pîtên bihara eşqa me
Rihêt civakî bihên givaştin, nêr bibarît nêr
Da li vê cîhana berteng
Zimanê me bi peyva
şermîn nemînit
Te digot: Di gel hizirên pîr bûy û
Xameyên dehmenpîs xewa min nahêt
Di çilxaneya helbestên xo da
Dê gilîzankên tembeliyê vekeyin
Te digot: Nevyên me
Dê bi sitranên derdora ên hajotin
Nevyên me, li şevên sor kevra dê di gorên me werken
Evca bo nahêy?
Yek berî li wê xiror û heşameta kursîka bideyin
Kiyanê me
Ji çîroka babê Siloy û evroya bermaya Enfalan kata bidet
Heku ji nû rûyê me

**Li bin piyên siwarên Silêmanî**
**Bi rondikên mêriyan ter ter bûyin**
**Enyên me**
**Ewên ji mêje li ber Berê Reş**
**Mîna welatê me, ker ker bûyin**
**Çiyayên me**
**Li ber kepiya dolarî hilweryayin**
**Piyasên viyanê**
**Di destên me da dimelisîn**
**Her ji nazikiya te**
**Roj li berîkên kevrên hilkolayin dihelat**
**Hunerê min û te**
**Di gel şerefa xameyê spî petrome dibû**
**Ay ji bo tembeliya girnijîna min û te**
**Ya li civakê serjêkirî berze bûy**
**Ji vegeryanê şermîn im ez**
**Car şoreş û doz**
**Civat û kevnesoz**
**Li bin pên min dibine gulolik**
**Car tîpên navê te**
**Ewên bîrhatinên min pê ve dizîq**
**Di nav xwîna min da, xo diqursînin**
**Car hestîkên di gora da, li mijûlankên min siwar dibin û**
**Ava gula lê dikem…**

# EM JI SÎNÛRAN DITIRSIN

Çinku em ji sinûran ditirsîn
Hind nemabû dergehên dinyayê taq bihêlim
Li ber kejatiya kivanê heyvê
Doxîna civakî bigirim û di gel xewnên xwe bihinêrim
Xwe tu li nav çinîna jiyê min newenda bûye
Hîze paqên te ewên li nav hêlên sor niqubûyin
Di gel zîzbûna me ya katî diaxivin
Car ji varêbûna jiyara daristanê xirr ve dibîn û
Siwarî zewqê firrînê dibîn
Car ezmanê me di gel rêbazên deverê
Di zikê şeverokên gereka me da dibine cot
Car ji recivkên melkemûtên siyasetê jî diweryên
Bêyî gorristan
Dema roj henasê dihilkêşît,
nivêjên me bawer ji ezmanê me naken
Di qafkên gula dan
Namûs şûnpên pîroz yên dinyayê xwîs dibît û berî nagirît
Spêdê nihîniyên viyanê ji qanqanên lêvên me
diweryên û xo naragirin
Bêyî gorristan
Ne sinûr û hêlên sor
Ne dozex
Ne berpirs û ne jî fîrdews
Şerim ji qêrêyin hestîkên zarokên li bin erdî
Yên di zikên xwîşkên me da naken
Ji ber ku takên nêrgizan li ser gorên wan nameşin
Divêt li ser bilindiya kîjan çiyay destên ewran bigirim
Divêt bi dengê kîjan hewarê

**Perasiyên dinyayê bigivêşim**
**Li hindav biyabanên bi xwîn**
**Dema ewir digirîn**
**Da gorên bikomên hêj ji cih ne rabûyn**
**Bi tîve rêzikên rondikên eşqa me bihên şûştin**
**Da bêhna sêvan**
**Di ximximkên ademî da cidîdanê neken**
**Û çi adem û gulên viyanê di berêkên şoreşan da**
**Nehên riştin**
**Ey pistala dîroka duhî û evro**
**Ma şoreş ne ji bo şûştina her tiştê reş bû.?**
**Ma çiyayên me li pişt me ne di mukumbûn.?**
**Da firşkê di wangeha gîrobûna kodetaya me da bi zulqutin**
**Li ber têhna zikrê axê**
**Belkî destên xwe li pişta me da bihênexar û**
**Ademek dî bi afiryêt.**

*5.8.2010*

## XO LI EWRÊN BARANÎ BÊYÎ MIN GÎRO NEKE

Ji wê memleket û vehandina dunyayê û mest
Barîneka ebedî ya xalî ji eşqê tu ya vepeşî
Di gel çav hinîna werzên lêgeryanê
Heku dîndariya stukira te ya wêvetir ji (Mirîxê)
Ji bo viyanê givşik dihênê
Bi gulbarîneka mereqane, gazî dikem lezet e henasa te
Tu çêbûyeka jiyaryê yî
Li nav pîrozî û yariyên çi yasayên ademan dan
te nabînim
Çunku yasa di livok in
Çunku adem di gerok in
Civatên wan li nav bayê xwîna xo da nûsek dibin
Di gel xolîkî û bê nivêjiya esmanî xilwe diçin û
Dihên hêlan
Te li bîre?
Li wî demê xirr firîşte dibûyne gok di posîdeyên xo di helingivtin
Hizirkirîn jiyê kewnî dê bîte kîn
Di gunehên ademan da barîtin xwîn
Ez û tu bi zimanê destan ji bo ramanê lêk digeryayin
Li nav qerqodê dunyayê çavên te dilukizîn û
dadida hêlîna ser sîngê min
Tu barîna jiyarê yî
Jiyar bêyî te destpêkirina zerbûnê ye
Dê kengî li nav rojên xo yên birisî sunneta ji
Xewrabûnê key?
Em dê kengî dûr ji perstgehên siyasetê
Bi firmêskên (Duayê) ve xema xo keyin?
Bêyî şerim

Di demên vîn û guldanan da milên asoyê bigirîn
Bêyî şerim
Li nav dûmahiya birînê
Ji ketinê kom ve bibîn û herêmek dî ji xo nû keyin
Mîna pesna berhesteya naz û nazikiya te
Hemû tiştên min bi jivan in
Di gel refên stêr stêrûka
Xo li ewrên baranî bêyî min gîro neke û li semta min were
Bila di gel êvariyên direng bigehî
Bila ji bayehînê perên bilibil û pelatînka nevecinqî
Da jora min ji dêmê te bo duquliyê roj lê bidet
Belku li nav pirs û gelta bêhinên gulava pirça te
Riko bibim
Belku bigehî bi ser lêvên min ve bibiye lolav
Nêzîk li xo geryana bin êşîkên guharên te
Tejî ber milên me viyan bibît

## SITRANEK JI LÊGERYANÊ

Sirte birhên te ne bûyin kangeha akincîbûnê
Di gel verêja renga û sema ciwaniya te ya siruştî
Bicûktirîn peşkên sozên min in li kinarê te dimînin
Ji xunava gula û hilma nêzîkbûnê
Berî serokaniya hebûnê û
Destpêkirina yariyên berspêdeyeka rasteqîne
Hilbaskî sertiblên te û laşê rojê dibûm
Belku ewir bigirîn
Tîrên aziryana jiyanê
Bi lêvên te yên bîtanokî ve bên raêxistin
Belku li bin pên toze axa hewayê û
Parvebûna ferşê sefereka eşqa min û te
Li nav zaxa sala û hizrên meyên bijyayî
Mîna hez û bîrkinên min pirs lê bibarin
Xewnên te û şîre tama viyanê
Li bin kepenê min û zêmara şînwaran ve
Sinûrbez bibît
Ez dibînim
Şermîniya te û dîmenên bin girtiyên qederê û
Ji westana wan bîrokyên mêjûya qeyrebûyî û
Marekirina bajêrê bê bereket û mirovên zirre
Tenîşt termên helbesta bi eşq û aşqên zirre
Û hêj tu li nav sirûda axê xewneka vebûna gurray û
Ez bi tarîstana pirça te ve
Bûyim ji şeveka ciwaniya nuvarê
Li nav kelîna sîngê te da hişyar dibim
Tu dizanî?
Eve min tu di gel serweriya dilovaniyê hembêz kirî

**Di gel bêhna te**
**Rengên bûnê**
**Rengên çûnê**
**Li yek vavêrkirîn**
**Tev endamên berdestên laşên te û**
**Xwîna hara di havirrê jiyanê da**
**Niza bo çî navegerne cihên hoz û kilêsa xo?**
**Lamên te**
**Di gel gulçinên biharê terr bibin**
**Ji ava navdestên me ev axe aviz bibît**
**Dûr ji tîre dûgiyaniya gîrivana siyasetê û**
**Hemî tame sifra evîna me ya xitim kirî**
**Bi çemên te da bihên**
**Min gelek ji dave bisikên teyên pert û belav hez dikir**
**Dema bi yarî ve**
**Di gel zendên te şûr dihên û dibin serê min lîs dibûn**
**Bi hingavtineka sinêleyî**
**Bîr li ariyan û nihêniyên weryay dikir**
**Li nav vê cîhana veşartî da**
**Êvariyên werzên me pê reng dibûn**
**Tu tiştek ji ramana rengan dizanî?**
**Tu tiştek ji êşana merga û mirina tola dizanî?**
**Noke bi sêdareya dunyay ve**
**Bermayê tîşkên teyên sozanî me**
**Belku bihêyî**
**Berev esman û stêran bifrrîn**
**Bêyî enqest bilind bibîn**
**Taku destên xwe li milê Yezdanî bideyin**

# Ebdulrehman Bamernî

Sala 1970'î, li gundê Bamernê ji dayik bûye.yekem helbesta xwe, di sala 1987'an de, di rojnama Hawkarî de, belav kiriye. Di gelek rojname û kovarên Kurdî de, berhem belav kirine. Beşdarî çendîn fêstîvalan bûye. Sernivîskarê rojnama Çavdêr e ku li Duhokê derdikeve. Endamêyeketiya Nivîskarên Kurd e li Duhokê. Endamê sendîka Rojnamevanên Kurdistanê ye. Heta niha neh pirtûkên çap irî hene û du jî, li ber çap ne.

# HÊJ XEWNÊN MIN JI PIYASAN NEZÎVRÎNE!

**Piyase yên bê zewq bûyin û her kevalê temaşe dikem,
Rengên wî yên qeşavî dibin!
Çavên min ji rengan direvin
Pên min û piyase yên bûyine du cemserên dijîkirinê
Hemî tiştê te ez hîkirîmê, yê dibîte helm û bi destan nahête girtin
Her û her gaveka min viyayî,
di gel xwe mijîlî xilwetgeha xwe bibim û
her gava destê min çûye ser qelemê,
tu ya dibiye berperekê spî û li bilindahiya esmanan,
tu ya dibiye ewrekê kîvî
û neşêm stêran di gel te bihejmêrim.
Ev şeve şîirek ya min dinivîsît!.
Pêkek, min di nav şehweta xwe da, dikete mêhvanê xemekê
Balindeyên aşiq, dê di gel min seferê ken
Çinarên bilind, dê bejna xwe bo lêborîna min çemînin!...
Piyase yên bê zewq bûyin û
min çend ji te berze kir û min çi li şwînê nedît!?
Kevalekê bê reng e û ez dizanim di bêdera peyvên min yên aryayî da,
eşqeka zîz e û tu di gel min nadeye bay!
Te çend da min û min li cih hêla
Ne min tê da xewnên xwe nivîsîn û
ne te ev xewne di gel min kirine rastî
Te çi gotiye stêran?
Payîzê yên ramalîn, yan jî xwe bo kî ve vedizîne û
te çi zû xwe radestî qederê kir
Hêj şirîniya navê min ya bi lêvên te ve û
hêj dêmê min di nav deftera bîrhatinên te da ye
Her kevalê min deravê hizrên xwe darêtê û berî hizrên hilawîstin û
berçavkirina wan bikem, hizrên dwîrbûna te, rengên kevalî têk diden
û hêj di çavên te da, ezê xwe dibînim û tu ya ristên gula dikeye
stivankê gerdena xwe û rengê wan gula dibişêviye kevalê min.**

## BÊDENGIYA TE BI ŞÎIREKA MIN VE DIÇÎT

**Berî belg biweryên**
**jiyan semaya dûmahiyê bi min diket,**
**şevên dirêj min di gel avabûna xwe diben û**
**pîrtir lê diken!**
**Şîirên min di gel te semayê diken û**
**Di gel çûna te dê seferê ken.**
**Di cadeyên yeksayidiyên bajêrê min da**
**nihêniyên maçên te**
**kolanên berteng yên nixaftî**
**yên tijî kirîn**
**Payîz werzê jiyanê di gel xwe radimalît û**
**werzê eşqê diwerînî.**
**Şeveka aşiqan e li bin piya diket û**
**bêdengiya te komepisyarên bêbersiv in**
**Ji bêdengiya nivîsîna şîireka min ve diçin.**
**Bi sedan deq min nivîsîn**
**hemiyan jî maçên te lê deqdayî ne**
**Tu bêjî piştî nivîsîna van rêzan**
**jiyan li def min bi çi rengî bît**
**Hêj cade hesûdiyan bi me diben**
**hebûna xwe di gel şîirên min têkel diken**
**Di gel tarîşevan**
**di nav birîsqe stêran da**
**risteya maçan hêj bi stûyê te ve şor e û**
**her roj li kolanekê**
**xewnên maçeka te lê dibînim!**
**Eve tu yî li bilindahiya esmanan**

stêran di gel min dihelçinî
Di xudîkê ra temaşeyî xo bike û
eşqa me beheşt e, beheşt!
Herdem teqwayê bo dikeyin
Şîir ayetên aşiqan e û
defterên eşqê bi dehmenên te ve dixişyên
Tu ya di bêdengiyê da û di şevên dirêj da
di xeyalê da, deh caran min dikeye
êxsîrê şeve piyaseyên xo û
Ji noke wê ve
ez şîiran ji te pê ve bo kê binivîsim
Hêj xewnên min yên di gel beraeta te
ez û tu diyek defter da dinivîn, dijîn, xewnên xwe
dikeyne deqekê nû yê şîirî û
navê cadeyekê lê dadinîn
Spêdehiyan jî, te ji ser çavên xo radikem
kî dê hêt vê şîirê ji min wergirît û dirînît
Min pêdivî bi nivîsîna şîiran nema
Her roj ez û tu li ser mêzekê ne, bi tinê û
pêkên xwe lêk dideyn

## EW KIÇA NEGEHIŞTÎ LI BER XUDÎKÊ PIRÇA XWE ŞEKET

*"Parçek e ji çîroka kiçeka Helebçeyî, bi mezinbûna xwe şad nebûy û xewnên wê mayne helawîstî"*

*Têbînî: Eve dûmahîka çîroka wê nîne.*

**Ew dê çi ken!**
**Yê rojgarên min diben**
**Rawestin,**
**rojgarên min nivîsîn, dê bo kî ve ben?**
**Hêj negehiştîme ber xudîkê û**
**min rwîsatiya xwe têr nedîtiye**
**Hêj pirça min kehî nebûye şeyî.**
**Bo bi lez destên min radkêşin?**
**Hêj min eşq nekiriye û**
**Ji bilî maçên zarokîniyê û dilovaniyê**
**dibêjin lezeta maçan heye**
**min ev lezete nedîtiye**
**Min arezû bo maçan heye**
**Bo eşqê**
**Bo ez mezin nebim, bibime ciwantirîn kiç**
**Bo genc ciwaniya min nebînin**
**Di gel mezinbûna sîngê min û**
**dirêjbûna pirça min**
**şaîr, nivîsînên xwe tam biden!**
**Dê min kî ve ben, rawestin!**
**Ew çi ewr in, we xelk tê da berzekirî**
**min nevêt şwî bi ewran bikem!**
**Hwîn di seyr in**
**Bo min jî, piyase li cadeyên dirêj nabin**

**Bo xewnên min, dê bo ewran bin**
**Min bêdengî nevêt**
**Min semaya di gel bêdengiyê jî nevêt.**
**Ev mirove di seyr in**
**niza dê min ber bi kî ve ben!**
**Ewr...**
**Ewr...**
**Ewr...**
**Rojê ronahiya xwe kî ve biriye?!**
**Ji bilî mijatiyê çi nabînim.**
**Ka ew zelamên pesna ciwaniya min dikir?**
**Ka... Ka ewên digotine min**
**çend mezin dibî, ciwantir lêdihêy?**
**Ka... ka ciwaniya min**
**Ka xewnên min**
**Bêdeng... Hemî tişt bêdeng**

## SEMFUNIYA PEYVAN

Di berperên şaîran da
yarî û tebelanê bi peyvan dihête kirin û
di ezel da hemî dixirur û mexrur in.
Di serdemê eşqê û nivîsîna peyvan da
dibîte tofana mirovîbûnê û
yarî bi pîroziyên wan dihête kirin!
Hemî semayê li ber peyvan dikin,
    heku ji tariyê dirijiyên
şabaşan diden!
Hemî xwe li ber têhna peyvan germ diken
heku disojin û dibine rejî yan xuliyê li cêh xwe dihêlin
Nebûye, carekê îşq li cadeyan hatibîte ji bîr kirin û
şaîran bo qelemê xwe tîj nekiribît.
Yan aşiqekî pîrozî li bin piya kiribin
Herdem eşq û gunehî pêk ve dihêne hilawîstin
herdu dibine xiyanet
çinku ji devê şaîrî dihête bihîstin.
Peyv dihêne nivîsîn û dihêne gotin û di kufkan ra
    dihêne gazîkirin
Di ezel da divêt şaîr nehatibane xulqkirin
Şaîr in, betaltirîn atafa li vî erdî hatîne dîtin
Şaîr in, xewnan dibînin
di xewnan da azadiyê rwîs dihêlin çiblaq
Şaîr in, di nav kelturê işqê da dimirin
dirizin û peyvên wan hefnukî dibin
-Peregraf-
Tu, dumahî peregafî
li ser textereşî dihête nivîsîn!
Hemî şûmatiyên di mêşkê min da rabûne semayê
    dadirêjme ser berpera û

hêvênê şîirekê ye di serê min da
ya, di nav demarên leşê min da awazekê dijenît
Çend diçime ber xudîkê,
wênê min berûvajî dihête pêş çavên min!
Xu bo dideme niyasîn
carekê û du cara û deh caran.
Xu bo carayekê nîne
wênê min di xudîkan ra dihête berûvajîkirin!
Ez û şîir
ji paşmawê eşqeka nezok în
Ji paşmawê kelturê tirsê û
kelturekê nefretê ji bîr kirî, xu eger jê biveresiyên jî
belku bibîne ciwanî û yekemîn
peregrafê şîiriyê ji textereşî, nehête jibîrkirin!
Di gel berperên xwe bi tinê
heku tabot hemî tiştan bi guman diêxît
Şîir çend bi taboteka daxistî ve diçin!
Belgên weryay yên payizeka ji bîr kirî û peyvên
şaîrekê pence murkirî
peyv bersivek in ji rengê şerabê ve diçin û belg
di nav dûkêla cigarekê da
semfoniya payizekê vedigêrin
Ne işqa ji nav dûkêla cigarê
dumê dikêşît
ne hizra, ji pêkê şerabê derdikevît!
Jiyan sîdiyekê betal e û
şaîr semfoniya payizekê li ser tomar diken
Êk peregraf,yek tirak û yek pêkenîn

# Kemal Silêvanî

Sala 1971ê, li Silêvaneyê ji dayik bûye. Derçûyê fakulta yasayê ye li Duhokê. Endamêyeketiya Nivîserên Kurd / Duhok û endamê sendîka Rojnamevanên Kurdistanê ye.

## LÊGERIBAN LI ŞEVEKA TAVE HEYIVÎ DA

Bi çavên xwe şev maç dikir,
Bêhna axê piştî nermebaraneka dereng,
Tijî canê wî yê havî leylan dikir.
Rojên emrê xwe yên mijdar,
Di bîrdanka berzebûnê de,
didan bay û peşêmanî dibû bakuzîrkeka xwîsarî.
Difna demî zuha dikir.
Qupçeyên şevê vedikirin û xwe di nav tariyê de diberda.
Berperên pêtî, manşêtên tozgirtî bê raman dihêlan.
Hestên qeyre û qermî, di bendmana qedereka tawî de diçirmisîn,
Henaseyên herriftî hîviyên hilawîstî, hêdî hêdî hinda dikirin.
Pêlên pijale, peyvên pertî pêxwas li ser pelan dimeşandin.
Hizirên xilole, peykerên sor dinijandin,
Li cadeyan wekî zarokan fêrî parsê dikirin.
Sar e jiyan, stewr in xwezî, çîplaq in hez û musafir im ez.
Li êzgehên biyanîbûnê bênavnîşan,
teniyatê hêlîna xwe bêdestûorî di canî da dinijand.
Salên rebeq, derzên ruhê xwînelo dikirin,
Guneh, sinûr û dîwar, çavên rojgarê bi direwan kil dabûn.
Tirsa rastiyê û rastiya tirsê,
pirs û bersivan li ser qeraxên pîroziyan rwîs dikirin.
Sorîlankên bê semyan,
ji bedena birsîbûnê hêvênê berxwedanê vedixwarin.
Xewnên tirşbûy, di çavên xemgirtî de,
dukêla agirek dûr wekî rondikan diherkandin.
Denkên şêlî û berî lalbûnê, rengên zelal divavartin,
Lêvên qurmiçî, peyvên zîndankirî ji nav keliştên xwe azad dikirin.

**Kerbeka sar û derdên kevnar,**
**heker derbûn hûn bêjin pê bi xemil bikevit bihar?**
**Revîn rêk e û man viyane û viyan hilbijatine û**
**hilbijartin ezmûne û ezmûn serkeftin û şkestin in.**
**Di qulaçkên tariyê de, pirtên me yên bê têhin û bêhişkirî,**
**Bi dirêjiya emrê gencatyê dibûn ezeka har û**
**kirask ji bêdengiyê li bejna rehabûnê dikir.**
**Birînên daketinê di kunêleyên ruhê de, jangirtî bibûn.**
**Dilopên damay, xirşe xewnên payizî diribisandin.**
**Di xodîka werzên yaxî de, rastî bi gumanê tafîl dibûn.**
**Çirakên dagirsandî, şûna perwaneyên ji nû bi firêketîn digêran.**
**Gulîgenimên suhay û rwîs, li ser zevên hişik û hula rûyê tavê maç dikirin.**
**Nêrînên kwîvî, ayetên zindî bûnê dihildêran.**
**Di navbera kenî û keseran de, dêmek dî bo jiyanê di afirand.**
**Bê destnivêj û mest,yekem nivêj li ser termê bêdengiyê dikir.**
**Paşî bejna xwe, bo cara dumahiyê bo xwe ditewand,**
**sîngê xwe dida rojê,**
**Ber bi tavesorkê, sîfira li xwe geriyanê dest pêdikir. ..**

## EŞQEKA BÊ MEWDA

Heyamên berê:
Tinê rondikên te rast bûn,
Xemên te, bibûn gemî û di nav golên mirî de,
rawestiyayî çaverê firek bay bûn,
wekî şervanekî di şerekê nehemwar de dûray.
Hêdî... Hêdî rwîs, şkestî û pêxwas ber bi min dihatî û
min tu di nav xwe de dihewandî.
Bi destên xwe min rondikên te vemalîn,
bi henaseyên xwe min xemên te,
li ser qeraxên peşêmaniyê qefandin,
bi eşqa xwe min tu ji hemî gunehan tafêl kirî,
bila bêjin eşq gunehan naxefirînit,
parçên te yên ji hev veqetiyayî min lêkdan,
tinê da tu bibî tu û ji te naveşêrim li gel te ez jî dibim ez.
Mergê xwe rojê sed car min gorî te dikir û
eger bizanî min bi canê xwe canê te kirî û kême bûte.
Heyamên dawiyê:
Basariyê şakên xwe, takên xwe di nav canê min de belavekirîne,
qulaç qulaç min vedigirt,
Pê dihesim,
Dîsan birînên kevnar bijan dijenin,
dizanim mizgînên nexweş nêzîke bigehin
Wey... Li te û qedera min, diyar e li welatê direwan eşiq jî lê direwe
Li hemî cih û deman min li te digera,
lê berdewam te xwe hinda dikir,
min diviya gaziyên te hemû esmanan biçirînin û
stêran vêdî û bikî ristkek û gerdena ehrîmenî pê bi xemlînî,

pêş hemî bê helwîstan ve bêjî:
Li min bibore afirînerê yaxîbûnê, tinê yaxîbûn û helwîst li te pîroz bin.
Min diviya te bo xwe bikim qiblegeh,
lê te wekî mirîdekê dilisoz û wefadar xwe nîşan dida
Di xewnên min de herdem tu serkêş bûy,
lê li ser sinûrên rastiyê tu jî dibûy xewn
Min kes ji te bilindtir ne didît, lê te xwe bi destên xwe di herafit.
Te digot:
Heku demê borî hatiba kirîn, da bi girantirîn buha kirim,
lê dîsan bi erzanî te xwe firot.
Here yar, lê şîreta min bo te, min di nav xwe de ji bîr bike,
çunku ez dê hewil dim te ji dervey xwe ji bîr bikim.
Here, lê bizane êdî nema ez bibim êstgeh bo bihinvedana te,
hemû jivan min reş kirin, da nemînim li hîviya jivanê te.
Yadgarên te di xwe yê xilmaşbûy de min vemirandin.
Ez dikarim bibim welatek tijî kerb û kîn,
welatek tijî êş û azar, welatek tijî xwîn û tijî guneh,
lê min biryar da yar herdem welatek tijî eşiq bim...
Berî ez jî biçim û xatir xwaztina dawiyê li te bikim
Tinê dê bêjim:
Heku rojekê ji rojan pirsiyara min ji te hate kirin,
destê xwe dane ser wijdana xwe û bêje:
Belê, hez ji min dikir

## HEGER HATÎ

*Hevtêkstî li gel helbesta "Hindek ji te û hindek ji min"*

**Heger hatî
Dê hemû emrê xwe bo te raêxim.
Davên pirça xwe ji bo te dê kim perjan û
bînahiya çavên xwe dê bo te kim oqyanûsek aram.
Di nav de...
Hemû salên çaverwaniyê bibire,
li jivanên borî bi vegere û tijî paxlên xwe eşiq bike û were,
kelişteyên cesteyê min dagire û bi davên rojê bidurî.
Tu bêjî eşiqa te, têhna te, leşê min yê zemherîrî bi vejînit?
Te digot: "Em hemû bê guneh ji dayik bûne,
û hêviyên me gelek ji me biçûktir bûn,
lê di nav rûbarê gunehan de, kê em fêrî melevaniyan kirin?"
û min ne dizanî guneh çi ye!
Min dizanî, eşqa me ji hemû tiştan mezntir e.
Li bîra min e,
Dema te ez dayim bersîngê xwe û em bilind û bilind firîn
Destên me di destên hev de bûn û li ser ewran me piyase dikir
Te...
Ez hembêz dikirim û dilop dilop em dihiliyan û
di hirkîn nav mereqên xwe de
Bi meya lêvên min,
Tu mest dibûy û
Ez bi maçên te!
Min diviya bibim ba û tu min hilkêşî
Û caran jî min dixwazt bibam hilim û ji naxê te derketbam û
bibam zengilork û bi hezên te ve nûsabam.**

**Te digot: "Tu bêjî heyvê em ne dîtibin û stêr bişên nihêniyan bi veşêrin?"**
**Ez, li gel bêdengiya xwe kûr diçûm,**
**henaseyên min ewên tijî maç li hindavî min wekî pelatînkan difirîn,**
**min pirtên ewran vêddan û xwe pê dinixavit,**
**niza min ji rûsatiya xwe şerim dikir yan ji azadiyê,**
**Min xwe di nav dwîkêla çigareya te de,**
**Di nav pêkê te de mest didît, lewra min jî mestane dihizirand:**
**Tu bêjî carek dî jî em bijîn?**
**Û niha…**
**Li demek havî, deryayek tijî maç im ez**
**Noteyek har ji simfoniyek bêdeng im ez**
**Selîlê rêbazek bê dawî û berdewam im ez**
**Çirkeyek berze ji demek winida me ez**
**Ruhek yaxî li cesteyê mirovek yaxî digerim ez**
**Kevalek bi dûmahî nehatî me û bi dûmahîk nahêm ez!**
**Ji pirsiyaran netirse, çunkî pirsên bê bersiv ji temenê min û te pitir in,**
**bike stûyê demî û bila li gel xwe bibit,**
**belku malwêranî biwestit û carcar li xwe bizivirt,**
**da bizanit çi li pişt xwe hêlaye.**
**Û tu jî li bîrhatinên xwe bi vegerî, çunkî tinê hingê dê bêjim te:**
**Rêber û refîq û reşîdê rêka rêbaza min bûy tu**
**Xwaz û xwazit û xwazyarê xweziyên min bûy tu**
**Ba û bêhna beheşta berîna bendemana min bûy tu**
**Merg û mirad û mewla û mewtinê min bûy tu**
**Ked û ketwar û kesir û kilê çavê min bûy tu**
**Leyil û leylan û lehîbê hestên min bûy tu**
**Gazî û germ û goriya hezên min bûy tu**

**Selwa û sitrana sihara sermestiya min bûy tu**
**Bêhna bayê xerîbî û xurbeta min bûy tu**
**Xemdar û xemrevînê xem û xiyalên min bûy tu**
**Sîh û sîbera siharên serberdayên min bûy tu**
**Dengê bêdengiya dengvedana dilê min bûy tu**
**Xame û xelîlê xelwetgeha min bûy tu**
**Dîl û dilîl û dildarê dêmê min bûy tu**
**Şêt û şeydayê şeraba lêvîn min bûy tu**
**Merîd û meişûq û miştaqê çot memkên min bûy tu**
**Siyar û semyan û sultanê serdustê mêyatiya min bûy tu**
**Dîn û dinya û derd û dermanê birînên min bûy tu**
**Reng û ronahiya rêka min bûy tu**
**Lê, qurbana qeder û qerar qetlê xwe bûm ez...**

# Sabir Sindî

Di sala 1971'ê de, li gundê Boselê, nêzîk bajarê Zaxoyê ji dayik bûye. Her ji zaroktiya xwe, derbider bûye û pirraniya jiyana xwe, li Îranê bûye. Sala 1990'î, dest bi nivîsîna helbestan kiriye. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de belav kirine. Karê wegerê jî dike. Sala 1990'î, xwe gehandiye welatê Elmanyayê.

Heta niha ev berhemên jêrî çap kirîne:

1. Bûka xewnan. Helbest, 2002'an.
2. Sed û hevde. Helbest, 2004'an.
3. Kurte şanoya evînê. Helbest, 2008'an.
4. Pênaseka şewitî. Helbest, 2010'î.
5. Darriştin. Çîrokên Antonyo Skarmêta, ji bo zarokan.Wergera ji Elmanî, 2006'an.

Çendîn berhemên din jî, ji bo çapê amadene.

## EWRÊN BEROVAJÎ

Di nav xewnên me yên rîs
Û di paxla hizrên me yên çîplaq
Û di naxê hebûna me ya bê sinûr da
Ez û tu li xwe digerîn.
Ez li ser kursiyeka xemokî
Û tu li ser kursiyeka tirsinok.
Ez li bin dareka bêber
Û tu li ser dareka bêser
Dideyneyek jivanên berze.
Di salên bê werz
Û di rojên bênav
Û di demjimêrên bê jimare da
Û ava dikîn avahiyên bê binyat.
Bi gotinan
Û jibîr dikîn hebûna
Ewrên berovajî...

## BÛKA XEWNAN

Bûka xewnan
Hebûna te kovanek e.
Û nebûna te, hizar jan in.
Rojên bêy te, hemî stewr in.
Berî spêdehî silavê bidit
Rojava ye.
Berî êvarî, xatira bixwazit
Şev winda ye.
Gelek caran xeyalên xav
Serleşker in.
Girrnijîn yên bûyne masî
Û di binê derya da digerrin.
Ser sîngê min
Ji kovanên eşqa duhî...
Eşqa evro...
Eşqa subehî
Dibêjî bêder in...

Mirovekê kevnar

Derbaz kirin
Dengê te, sinûrên bêdengiyê
Rizgar kirin
Rengê te, çavên girtiyên xewtoyî
Ji xewa girana
Bêbextiyê.
Duhî tu di mala te da

**Kirî diz!**
**Di nav xewnên şirînên jiyanê da**
**Kirî kabûs!**
**Di nav mêşkê te da**
**Didan ber guleyan**
**Rexên xweragiriyê.**
**Ji ber te dikirin**
**Kirasên azadiyê.**
**Di şehyanên dilan da**
**Ji nav çavên te**
**Derdiêxistin**
**Rengên jiyan pê hatî efrandin**
**Dişewitandin**
**Kevlên hebûna mirovekê kevnar**
**Zincîr dikirin**
**Henaseyên bê dawî**
**Dibirrîn rihên dara**
**Pirç lê xena kirî**
**Nedizanî min di çavên te da**
**Nas kir roj.**
**Di lêvên te da**
**Paşeroj.**
**Di pirça te da**
**Xweragirî.**
**Û di himbêza te da Yezdan...**

## EV SAL NEÇE

**Dê tu neçe!**
**Berî bideye min sêva behiştê**
**Û helmekê ji bo jiyê dirêj bihêle!**
**Ayeta eşqê**
**Ser ji nû ve, ji dayik bibît.**
**Û li ser lêvên min te bi tinê**
**Bibîte nivêj.**
**Hefsarê xewnên min berde!**
**Bila ev (raze) çi cara**
**Bibêjin, lê nehêt.**
**Da ez û tu**
**Her roj**
**Ser ji nû ve**
**Henasayekê bihelmijîn.**
**Bi qêriyayekê**
**Ji dayik bibîn.**
**Û bi dîtinayekê**
**Lêk binêrîn.**
**Dê tu neçe!**
**Tu bi Xwedê key**
**Buhara ev sale**
**Ji tev buharan bi barantir e.**
**Têr gultir e.**
**Bi xunavtir e.**
**Fêniktir e.**
**Bibe xora vê buharê**
**Û dergehê dilê xwe veke**
**Û çi cara li min negire**

**Tu bi xwedê key ev sale neçe!**
**Ez ji bê welatiyê bêzar im.**
**Were bibe (welat)**
**Bibe Heyranoka**
**Koçka min ya sirewî**
**Û bibe dîwana**
**Sitranên şaryayî**
**Bibe darsêveka**
**Bi rewş**
**Di buharan da**
**Gula birêjît**
**Di havînan da**
**Sêvan bavêjît**
**Di payîzan da**
**Bibîte nîgarkêşeka bi hinêr**
**Û di zivistanan da**
**Di gel min û bextê min**
**Yê nediyar birazît**
**Dê tu neçe!**
**Ji min ra bibe**
**Baweşînka girrnijîna.**
**Baran û rondika**
**Jêk vavêre**
**bêjînka hizra**
**Ji destê min wergire**
**Berî bideye bay**
**Tu bi Xwedê key**
**Bes carekê lê binêre!**

## DEWLET

Demê şer
Dibîte wate
Tu dihêy bîra min
Demê dibêjin rondik
Tu dibiye çav
Demê birsîbûn dipeyivît
Te di rûyê
Şewkeka tenûra şewitî da dibînim
Demê şîn û tazî ji dayik dibît
Li koçka te dinêrim
Demê bêdadî dibîte deng
Hemî giyanê te dibîte erdhej
Demê dewlet xwe pênase diket
Welatê min
Li ser nexşê
Cîhaneka hov
Li te digerrim…

# Beyar Zawiteyî

Sala 1973’ê, li bajêrê Duhokê ji dayik bûye. Di dumahiya salên notan de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û li destpêka sala 2001ê, yekem helbesta xwe di rojnameya Peyman de, belav kiriye. Li sala 2001'ê, dest bi karê ragehandinê, li telefizyona Duhokê kiriye û li sala 2004'an, weku peyamnêr li rojnameya Evro xebitiye û niha jî, nivîsserekê berdewam e. Endamê Yekêtiya Nivîserên Kurd e û endamê Sendîka Rojnamevanên Kurdistanê ye. Dîwaneka helbestan bi navê “Min nevêt ji leşê te bibarim” çap kiriye.

## BEHEŞTA BÊ OMÊDIYÊ

Di êvara jiyê xo da
Dê xo di elinda çavên te da
Nixêvim
Xoşyên dilî diqersîne
Da bi tîrojkên dêmê te
Germ bibin
Min hembêz bike
Maçî bike
Da ez jî bin guharên te bêhin bikem û
Karwanê xema
Li ser pişta Taytanîkê rewane bikem û
Di hembêza te da bimirim...!!
Min di bin kerrkên sîngê xo da
Bi veşêre
Di nav şevreşa pirça xo da
Berzeke
Da lêv û limtorên felekê
Nebînim û
Bi terratiya lêvên te
Pêta kadînê bi tezînim
Ezê ji civakê niznizî têrbûyim û
Bi direwa ve hulî bûm
Neşêm êdî

**Nanê tirra bi xom û**
**Semaya gurga bikem**
**Min di qorneteka dilê xo da**
**Bi hewîne**
**Da di aşopa dilê te da**
**Ber bi gizîrteka ji aşopê**
**Dûrtir biçim û**
**Li ser stêreka bê hevsu**
**Azad bijîm**
**Nexşeyê Dîcle û Firata**
**Di çavên te da**
**Kopî bikem**
**Da di behşta bê omêdiya xo da**
**Mey û şîra jê vexom**

## SÊDAREDAN BI ŞEMALKEKA EVÎNÊ

**Ji nişkekê ve
Hezeka bawî
Hizreka tawî
Viyaneka havî
Mêşkê min dûrpêçkir
Da bi tinêskê
Di nav kore rêkên bijîniya xo da
Derkevme nav xewna û
Li kabîsekî bibime mêvan
Tu bêjî
Li nêzîkî ramana bêdengiyê
Çi reng hejî termê minê sare?!!!!
Ma tu dibêjî
Ez cilên bê famiyê
Li ber xo bikem
Yan
Kevlê bilîsiyê?!!
Demê
Cilên efsaneyê
Hêşta nehatiye
Çunku
Rehên şilêra
Li ser erdê gunneha
Hêşta şîn nebûyne
Dibît
Ez weku şemalkekê
Di cejne bûnekê da bihême sotin
Da dumahîk bêzarî bi vemirînim û
Bigehime Xuday
An**

**Dibît**
**Ez weku xuliyekê**
**Bi temirim**
**Da gurriya agirê kîvîbûna jiyanê**
**Xoş bikem**
**An dibît**
**Hindek hezên bawî**
**Min bigirin**
**Da qîzeka hest çîvanokî û**
**Evîn bi sehim**
**Bi afirînim**
**Dengê wê**
**Weku babelîska di nav gula da**
**Di rêya ji bîrkirinê ra**
**Xo ji rehên min**
**Diçinît**
**Ez**
**Çend pêdivî vê qîzê me?**
**Ez**
**Gelek pêdivî vê qêzê me!!**
**Da xo tê da helgirim û**
**Giyanê xo yê pîselo**
**Pê tafîl bikem..!**
**Min divêt**
**Awaza pîroziya jivanê jiyanekê**
**Di kuna bilwîleka tozkewî ra**
**Bijenim**
**Bo dumahîk rastiya hebûnê**
**Pirtên min yên bijale**
**Li ser şusteyên vala**

**Lêk bide û**
**Min ser û ji nû bi pêk ve ne**
**Da ji hezên dîtina te û**
**Nerimatiya xo di amadebûna te da**
**Pitir hez ji te bikem..!!**
**Hez ji min bike…**
**Ez çend pêdivî**
**Pêçulkekê me**
**Du çîvanokên berze**
**Tê da lîs bibin..?**
**Ez**
**Çend pêdivî me**
**Kelexê xo bideme destê bay…?**
**Hez ji min bike**
**Nema êdî em bişêyin**
**Ji rahêlana revdên gurga**
**Birevîn**
**Bo min**
**Hestê xo bijene**
**Ezê li ser şemalkeka evînê**
**Dihême sêdaredan**
**Min**
**Ji çivêliya vala bike**
**Ewên herdem berîkên min**
**Pê tijî dibin**
**Min**
**Li ser lêvên enfalkirî**
**Bi germatiyeka qemyay**
**Bileyzîne**
**Da di nav kefa destên te da**

**Mîna çwîçkekê di xew biçim û**
**Bihêle te hembêz bikem**
**Bihêle…**
**Şanên leşê min**
**Hestê bi te biken**
**Da xo di xarûvîçiya rûbarê evîna te da**
**Biparêzim**
**Qefeskên pelatînka vekem û**
**Di gel evîneka hatiye dizîn**
**Di nav rehên te da**
**Bifirim**
**Min maçî ke**
**Bihelmirîse**
**Da di giyan û henaseyên te da**
**Weku genimokeka bay ya sinêle**
**Berze bibim**
**Min wêneke**
**Nîgar bike**
**Ez çend pêdivî me**
**Ser û sîmayê xo di çavên te da**
**Bibînim..?**
**Ey**
**Sekerata mirina jiyanê**
**Tenktirîn deryaya esmanî**
**Ciwantirîn rengê reşatiyê**
**Nûrha di neqeba bêzariyê û xiyanetê da**
**Xo nîşa min bide**
**Da bi ciwantirîn sirûda biharî**
**Hez ji te bikem**
**Bihêle**

**Weku zaroyan di evînê da**
**Bifirrîn**
**Da destê xo**
**Bi serê kula da bînim**
**Bîrhatin**
**Yê yariya bi giyanê min diken**
**Hez**
**Yê tirrana bi kelexê min diken**
**Sêrbendî**
**Bes e…**
**Bes e em bi xo ji xo bi revîn û**
**Hezê li xema bikeyin**
**Bihêle**
**Bi tinê spêdehiyekê**
**Li ser lêvên te yên bêsîre**
**Ji xew rabibim**
**Bihêle…**
**Ezê di rûberên te da**
**Dibuhjim û**
**Çi berî nadem**
**Di volkana te da dikelim û**
**Nasojim**
**Nalîna**
**Di nav qedera esmanî da**
**Bipêçe**
**Ey**
**Bilindtirîn pila pakiyê û**
**Beheşta giyanê bê hevjîn**
**Diwa nivêja baranê neke**
**Min nevêt ji leşê te bibarim**

**Hez ji min bike**
**Da xewn vejîn**
**Ey**
**Firîşteya dînatiya min û**
**Bilîsa aramiyê**
**Tu teslîmbûna dumahîkê yî**
**Bo hezkirina qederê**
**Bila**
**Xo qutanên dilê te**
**Di rehên min da**
**Pîroz bibin**
**Bihêle**
**Pêkekê meyê**
**Ji qinêta mercanên çavên te**
**Vexom**
**Da semayeka felîte**
**Di gel termê şevê bikem**
**Min helgire**
**Nema êdî ez pêdivî keyfê me**
**Da ji xo pitir hej te bikem**
**Dê xo li ser sozên zoriyê**
**Piştерê kem**
**Ezê gaziya te vedigirim û**
**Bi mirinê têrr nabim**
**Ezê**
**Bi tirs û bê aramî gazî te dikem**
**Tu bo xendiqandina min**
**Çenda pehlewanî**
**Ey**
**Şoreşa xuliyê**

Di navbera nûrh û agiran da
Ez
Ji nivîsînên ser kaxeza
Têr nabim!
Têr nabim!
Heke xo tu bibiye baran û
Li min bibarî
Yan di gel bêhna barwîtê
Têkel bibim
Têr nabim
Heta di nav birîn û nalînên
(Qoçan) î da
Dibuhjim
Dibime dwîkêl
Dibime helim
Dibime bahoz û
Te bi serê stûnê ve
Rakeme sema serbestiyê û
Bikeme
Ziman
Nasnav
Azadî
Serxobûn
Welat
Paseport
Dewlet
Têr nabim...
Têr nabim...

# TERQE MÊW

*Diyarî ye bo Mihsin Qoçanî*

Çavê min û xew
Du peyv in
Nêzîkî hev nabin
Dilê min û ew
Du mexloq in ji hev nabin
Evîna te
Kirim şair
Kirim gawir
Li nîv şeva di meyxana ve
Dibime ginêwir
Ezê hêlayme serkûl û
Gundê minê maye kavil
Ne di layê germê bajêrî da
(Qoçan) li ser fîstanê te bûye zava û
Ez jî
Yê di çarquliya yariya te da
Bûyme çokerê zirr.
Piştî...
Sertiblên te
Wekî xo nemayne di nerim
Di hizwîra te da
Peyv di asêne û
Tîtal têk da dibine şerim
Demê
Ez pirçên zer dibînim
Gilîzankên min vedibin û
Ez bi xo
Li ser hêla naverast
Gumtilekê zer im
Çi bikem...?
Urta alay û
Hevrrka şevê û

Pirça te
Di mêşkê min da
Hevkêşên bê ser û
Şoreşên bê sîber in
Şeva şev asêkirin û
Xewnên min
Di nivînka te da westiyan
Bihêle
Sertiblên min
Bêhnekê
Di paxlên te da biçerin...
Sertiblên te wekî xo
Nemayne digerim
Nihêniya eşqa min
Ya di sîngê te da nixaftî ye û
Ezê lê digerim
Min li çaryana sîngê xo
Sêdare nede
Siyaseta eşqa te
Ya bûye cemserê siyê
Di cenga sar da
Şoreşa min sinêle diket
Kiryarên min bê sêre diket
Çavên min felîte diket û
Bi davên pirça te ve dihelawîsîtin û
Li hewalên qesra belave diket
Bihêle da
Di navê te da bibuhjim
Ji çavên te bibarim
Li ser rêkên te bitehisim û
Li ber derazînka lêvên te
Bi... Mi... Ri... M

# Gulnar Elî Baleteyî

Di sala 1974'an de, li bajarê Êsifnê, ji dayîk bûye. Sala 1993'yan, dibloma zimanê ingilîzî, li Duhokê wergirt. Di sala 2009'an de, pişka edebê ingilîzî, li zanîngeheka Emerîka bi dawî aniye. Helbestên xwe di rojname, kovar û malperên Kurdî de, belav kirine.

Berhemên wê:

1. Heyv û duwazde heyv. Helbest 2006'an.
2. Lavja kevnewarekê xembar. Helbest 2008'an.
3. Ruha min hêj keç e. (My Soul Still a Virgin) Helbest 2010'î.
4. Henaseyek ji tîpên xewna sinûran. Helbest li ber çapê ye.

   Piştî çarde salên xerîbiyê, li Emerîka, dîsan vegeriya welatê xwe Kurdistanê.

## CEJNA POŞMANIYÊ

Roj gehand dava dirêj
Bê hedar
Di vê şeva ker de
di xew de ye
Her tişt bêrih maye
bi kirasê rebenan pêçayî
heyv li pişta ewran lavêjên xeydê dibêje
Silavê li ...
dastana bêriyan dike
li kevnewarê
venesînê kotirek spî bû.
Di êşa xewnan de
pirs ji pencera bendemaniyê dibarin
Di darbesta toqîn de,
Nalenala ahîna..,
zarokên durkirî ji hembêza Le'lîxana goveyî ne
Konê reş ji bêxunaviyê xemilî
Di dengê poşmaniya ewrekî de
silavên hûrbaranê bêjivan zivrîne,.
Dîlan e, di berpela dil de, jivan e
Dûkêl e henesgeha
hest
bêrî
lerzîn
bêdengî
şahî
xem
ken
û gi...
... rî
ye
Gulan bişkoj vedan

**Gulav gehişt asoyên..**
**berxemên min**
**Rondik di kolanên sorgulan de**
**Bêsiûdiya xwe nijinand**
**Kelha Amedê ya dêrîn e**
**Dibe**
**şevnem**
**kezîzer...**
**gulgenim**
**di kirasê şepilî de**
**Ewra buharî**
**xemla xwe veneda**
**nebarî**
**Xewna tazî**
**lêborîn**
**bişkorîn**
**gulbuharê nazivirînin**
**dikenim**
**difirim**
**dileyîzim**
**dilerizim**
**Dûrtir çûm digel bêriyên xwe**
**ji asoyên lêborînê**
**gehiştim bajarê bendemaniyê**
**duhî**
**evro**
**û**
**sibe.**
**Bazinek bêder e**
**Gulan...**
**ji rengê guleyan diçîne.**
**Bibore....**
**nema arezû ahînga digêrîne**

**Hizir teng e**
**xewin efsane ye**
**can kavilekî ji dumanê ye**
**Rê di hêza pelatînkê de nivist**
**rê aloz e.**
**Nerevîn reviya**
**zarok reviya**
**Min gazî te kir**
**Te guh neda min**
**Min ji te xwest**
**Tu bi xweliyê dilê min bisojî**
**te dêm tenî kir**
**Te eniya xwe venekir**
**Girnijîn...**
**di nav bajêr de berbi ba bû,**
**Tu dibêjî bigirnije...?!**
**hey ho, hey ho....**
**Eve....**
**Sih sal in warê min maye bindest.**
**Sih sal in girnijîna min li bin pê nerevînê têşiya**
**Sih sal in zarokên sêwî di hundirê**
**xwe de nazdar dikim.**
**Sih sal in bihar bi zerebelgan dixemilî.**
**Sih sal in keziyên xwe di taristana rojê de vedihînim.**
**Sih sal in di nav sûlava ji çavên min herikî, melevan im.**
**Sih sal in ristika keseran li dor qirika min badayî**
**Sih sal in du peyvan, ezman li min girêdayîn**
**Sih sal in tihna xweşiyan qirqiçandim ez**
**Birsa girnijînê xwarim ez**
**Dê ka bibêje dê ka çawa bigirnijim ez!?**
**Zarokên duhî şekirokên cejnê nexwarin**
**yarî nekirin**
**ji bêrîkirina bêdawî,**

heza nejibîrkirî
bişkoj neçirmisî li beyaran
xwîna dilekî vedixwar
Zarok mezin nebûn
bişkoj jî ne bûn Gul
Jivan bêjivan e
Xewna min westiya
Xewnerojek e,
mêvanê şeva xewna min e
Bi dest û çavên tejî girî,
kevnebirîna pencerê dinale.
Ev çi zivistan e
zerebelgên dirextan,
li bin befra xwe ...
bi keskê pox reng vedide
Rê li ber pê heyvê xweş dike
çîçikên nivistî, di hêlîna dagîrkirî de...
hoşeng dibin
Bê ezman mayîne !
digirnijin
dikenin
digirîn.
Hest
kelekek e ji pêlên
hêvî
xwezî
bêrî
bendemanî
êş
Tu bibêje û kela dil xwe birêje
Kî dê
tola min
û te

**ji nerevînê bistîne..!?**
**Li pişt perda reş**
**ronahiya stêra**
**- De bêje…**
**li çavê heyvê binêre**
**min bibîne**
**te dibînim!**
**Bi hev re sema cana ye**
**kew hişyar bûn ji xew**
**Dar dilîzin**
**Werîsê xeman, kevnesalan**
**ji esmanê heftan hildiweşînin,**
**li stoyê matmayînê dialînîn**
**Bi sirûda birûskê hebûna min vediqetînin**
**û diçin…..**
**Derya ji çavên min difûre**
**asê dikim.. û diçim..**
**bêmiradan**
**pê bişemitînim û diçim**
**gulek mor, dikim peykerê girnijînê**
**bi sînga te ve dikim**
**dikim û nakim**
**te ji vê xewê**
**hişyar nakim**
**û diiiii**
**çiiiiiiiii**
**mmmmmm…**

## PHOENIX LI ŞEVEKA ŞEYDA

**Canê min:**
**Silavên spêdeyan gazî te dikin**
**gaziyên êvariyan hawarî jana min dikin**
**Şevînek ji hespê xewa xwe hatiye xwar**
**li nav bîhokên awirên me, heliza xwe dilorîne**
**çavên te êtûna şerekê bêdawî ye, ji xweşbûnê**
**min tu divêyî.**
**Ji kubariya birûskên çavên te**
**xewnê hêviyên min şiyar kirin**
**hedana**
**dengê te nayê**
**te bi çirîskên henasa xwe hêlan dikim**
**têla zirav,**
**bayê ji pencera te xwe azad kirî alîst,**
**gilop,**
**dida şopa ronahiya kolanê**
**dibûm rêwiyê şemendefereka şevlêgeryayî.**
**Çavên pirşeng**
**dengê ceng û bilûra hizra min,**
**gavên xwe**
**di rêya tîpan de winda kir**
**nalîna strana, li dawiya şevê**
**şêrbaz rakir semayê**
**bask û perên xwe,**
**li ber bayî dike.**
**Bi darê ve çeqek şîn heye**
**sîdara çîçikan e**
**maçên xwe li ser lêvên ava heyatê dirêje**

hevrist vedide
dilê xwe di nav de vedşêrî
dê bî viyan û strana vê şevê
dê bî xewna laşekê serxweş
silavên eşqê dê bi havênê stranekê tirş bikim,
bi mestbûna te, şevê ber bi kovanên derwêşî ve velorînim
"Aşiqê mest-i bi 'işqê niye hacet bi meyê
Waridê warid û ehwal-i bi ewrad-i çi kit
Te xered vêkketina yek weliyek murşid-i bit
Salik û talib-i irşad-i bi Bexdad-i çi kit"
Te di nav çavên xwe de nîgar bikim
bikim
çiyayekê ji semfoniyan
wêneyekê hermayî,
di çavên wêneyî de, ruha xwe sermest bikim
Keskesor
dibe nasnameya
tîrêjên çavên min,
çibkên dilên min
tu şevên min bi tinê nehêle, wan gulav bide
min tu divêy
Tu di dilê min de têhna windakiriyekê nûdîtî yî
li xweşiyê, agirê girnijîna min î
li girnijîna min, xunava spêdeyan î
li spêdeyan, awaza dengvedana çar hêlên min yê birîndar î
li nexweşiyê, befra nalîna min î
li xewnan, sirûda hebûna min î
li hebûnê, tu heyîna roniyê di çavên rojê de yî.
Tu ez im û ez tu yim

**“Dil yek e dê işq-i yek bit 'aşiqan yek yar-i bes**
**Qible dê yek bit qulûban dilberek dildar-i bes**
**Min di benda zulfekê dil da bi destê pîrê işq**
**Lew di işqê da ko best ihram û yek zunnar-i bes”**
**Dihingivim henasa te û sermest dibim**
**bi agirê derdên te pîroz disojim**
**dibim şewat, dibim xwelî**
**ji xweliyê dibim**
**Phoenix-ekê nûjen**
**ji nû ve, min tu divêyî**
**mîna te**
**mîna xwe**
**mîna evîna me**
**mîna wê kêliya herî xweş ko tu pê hest dikî,**
**mîna sirûdeke rûhanî di tevzînokên laşê min de,**
**dema min tu niyasî**
**mîna wê baweriya ko ji rehên hemî daran pêk ve,**
**hemî çiyayan pêkve qayîmtir, bihêztir û**
**“Qedehek bade bi destê xwe li qelbê me birêj**
**'Aşiqê sûxite bê ateşê seyyal-i çi hez**
**Neko wek teyr ji mijên te bibarin peykan**
**Ji birînên di dilî şubhetê xirbal-i çi hez”**

## XEWN Û RASTÎ

Ev çi xewn e ji rastiyê xweştir!
Yan rastî ye, ji xewnê bihêztir!
Ev çi derman e kûrebirîn derkirîn!
Çi sirûdên pêşxeman e!
Tîran ji çavan dihavêjim,
li te digerim
li te digerim
awirên te ji windahiyê tên.
Digel tîrêjên rojê, henasên xwe diçemînî, te dibînim
Şevên dirêj li kenarê xelwetgehên heyvê dinivînî
Bermaya şevên min tu dixemilînî
Tu kî yî?
Çavek te derya evînê hilgavt
Çavê dî derya xema ye
Pesarê bilind di nav diqetîne
Xezaleke çiyayî me
Pasewanê rêkên winda me
Dilê pesarî şikefta tenahiyê ye,
ji sar û germê,
ji tirs û sehwê,
min diparêze
Kevoka evîndar im
Xemdar im,
carinan ji bo dixwînim,
carinan bê ezman dimînim
Têhniyê têhna deryayên te me

**Carinan vedixwim**
**ji vînê**
**ji şînê**
**ji kînê**
**ji meya jînê**
**Çi deryayek bê dawî ye ketim tê da**
**Ne melevan im, ditirsim**
**Li ber pêlên xwe min bixeniqîne**
**Carinan min serav dihêle**
**Carinan jî min binav dike**
**Ev çi hembêz e hembêza sêwî**
**sêwîtir kirî**
**Ev çi helbest e can dagir kir**
**Ev çi rondik e di çav de mayî**
**Hemî rondik ji çav sil kirin**

## VALENTÎNE

Semyana dil
evîn, xwezî,
roniya pêngavên rojan e
keservedanên demê gêj
bişkujşilêra dilsoj
şev
şiyarmestî
siwarên valentîne
rehwanê xwe li pêşiya min xist.
Buraqê çerxê yekûbîstê
gehandin hev.
Roj, heyv
reşdav li geştê
navbera dest û dilan
şûşeper  ji belgên şînahiyê,
pêlên sinoran
demên serxweş, ji qedexeyên çavên vê şevê
ax bi ax,
av bi av,
bi tilîliyên dîtina yekemîn,
birîskên bêdengiyê
taviyek hûr
şevnema şana min.
Valentîne evro
Cane xwe di ruhaniya ruhê min de faramoş bike
Ji bîr bike.

**“ENE EL HEQ”**

**pîroziya zayîna min**
**pîroziya şilêra vejiyay ser dêmê min**
**pîroziya dilêrê efsaneya evînê min**
**asîman mişt ji semayê kir,**
**ji stêrên keyf û kenînê.**
**Navê te di gulwaza işqê de xweştirîn deng e.**
**Hedar, roniya şevbendemanê**
**xogirê li ber reşbayên kelha evê şevê**
**hogirê xewn û bêriyan**
**“Delalê min, eve**
**çendikî çend salan”**
**di nav cejin û şahiyan**
**ferzindeka mişext bûm!**
**Hizar pelatînk hêlîna dil dagîr bikin,**
**hizar hezar awaz li ser serên min bibarin**
**hizar wêne di paxila min bizên,**
**dê pêkve gorî girnijîneke te bikim.**
**Di henasa min de,**
**Tu, sorgul, dil, asîman, dar û ber,**
**dîwar û qedereka xwedayî sermest î.**
**Trafîk kesk in,**
**“homeless” im,**
**bi qefta gulê belengaziya xwe û te dinuxumînim**
**şagul,**
**serkêşa govenda vê şahiyê me,**
**di nav çavên te de.**
**Tu, Evra û ez**

# Tirîfe Doskî

Di sala 1974'an de, li bajêrê Duhokê ji dayik bûye. Niha wek mamosta kar dike. Di dawiya salên 1990' î de, dest bi nivîsînê kiriye. Endama yeketiya Nivîskarên Kurd e li Duhokê. Nivîs û helbestên xwe, di kovar û rojnamên Kurdî de belav kirine.

Berhemên wê:

1. Êvariyeka kesk. Duhok, 2005.
2. Payîzeka şîn. Duhok, 2008.

# TU Û EZ

**(1)**

**Tu û ez**
**Yan ez û tu**
**Em**
**Şiirek in.**

**(2)**

**Hej te dikem, hej min dikey?**
**Xoşimdewêy xoşitdewêm?**
**Pisyarek e demê ça vexwarinê**
**Her roj spêdê.**
**Li ser laperêt rojijmîrê dihête nivîsîn**
**Li ser xwarinê dihête kirin**
**Li ser mêsincerî bo hevdu sênd dikeyin**
**Bi nama mobayilî boyekudu dihinêrîn**
**Bi şiiran**
**Bi çavan**
**Bi birijang û mijolankan**
**Bi maçên serê tiblan**
**Bi gulava spêdê**
**Bi piiyasa êvariyan**
**Bi cigareka nîv şev**
**Bi awazeka kamkaran**
**Bi dengek hînik**
**Bi qeftek kenî û girnijînan**
**Awriyeka tijî maç**
**Bê bersiv pisyar dikeyine ve**
**Xoşimdewêy... Xoşitdewêm?!**

(3)
Jûr
Textek
Berçavkek
Pirtûkek
Maçeka ser lêva komedînê bo te diyarî ne.
Ji bîr neke

(4)
Demeke min tu nedîtî
Çaxek e
Salek e
Heyvek e
Heftiyek e
Rojek e
Demjimêrek e
Çirkek e?
Ka tu?

(5)
Tu û spêde
Tu neçe, bila spêde biçît
Çûy
Tiştên te vêk didem
Pirtûkên helbesta
Gulava te ji hinasên jûrê distînim
Centikê reş
Bêhna kirasê te dihilkêşim
Şînpêt te di dengê jûrê da vedişêrim

(6)

Ji bîr neke
Rondika te di çavê min da ye
Henasa te di berîka bay da ye û
ba jî li ber pençera min rawesta ye
Ruhê te di sebetek hewran da ye û
hewir di gel pirtûka min da cût bûye...

(7)

Şevê dî
Her tişt nivîst
Ez
Jûr
Esman
Gul
Eywank
Darên ser cada
Çûçik
Baxçe
Tinê tu mabûy
Te jî di henasa min da
Maç diçinîn.

(8)

Qehwe
Were qehweka tehil
Di gel şiireka şirîn vê spêdî vexoyin

# HEYRAN

Ez...

xerîbiya bêhna te dikim

xwezî min têr têr bêhn kiriba te

ta bêhna te ez girtibam.

Xwezî ji xêra Xwedê û mîrê miradan re, min kunîleyên laşê xwe yê zuha, ji bêhna xwêdana bedena te dagirtiban. Li gel her dilopekê, hizrek min ji hêlîna xwe, ber bi sinûrên keskesora bilind ji bilindiya tîpên navê te li sahiya asmanan, firîba. Çunkî tu merd î û ez merd im. Ez dê firek ji bayê bêhna bedena te bidim gulan, da ku bejnên xwe pê bixemlînin û dezgirên xwe pê binazelînin demê ku pelatînkên çengsotî li hawîrdor sema eşqek sermedî li gel bijkujan saz dikin. Ez dê firek ji bêhna bedena te bidim sitêrkan da ku xwe pê tahêr bikin û li şev nîvên şevan, di hembêzên mêrên xwe de bêhtir şewq bidin.

Bîra te dihê; demê ku çavên te û çavên min car dibûn gilop bi dîwarên sipî ve, car jî dibûn sitêr li şevistana wî bajêrê germ ji germa hinavên me?

Ez dê firek bayê bêhna bedena te bidim darkajan, da ku çavên xwe pê kil bikin û li benda dû aşiqên wek me bimînin, gava ku li jêr sîbera wan damanê bi peyvan û maçan dikin... Na na! Gava ku biryar didin, ku gunehek xweş û rewa bikin.

Ez dê firek ji bêhna bedena te bidim deryayê, da ku xwe pê bişû berî henaseya xwe bike di guhê oqyanûsî de û hizar hizar deravên zelal bizên, berî ku kefa sipî beravên bendeman û bêrîkirinê binixêve. Ez dê firek ji bêhna bedena te bidim baranê, da ku şerm ji xwe neke katê ku xezelê bi axê dike, da ku cihên pên te herdem terr û kesk bimînin û yêdî xelk qesta serên milan neke ji bo nivêja baranê (Qurbana erdê tu lê).

Ez dê... Û dê... Û dê...!

Ez dê firek bayê bêhna bedena te bidim dûkêla sedsala bîstûyekê, demê ku li gel ewran dibe cot. Ez dê firek bayê bêhna bedena te, bi

agirê dîrokê de bikim, ji bo ku bivemire û yêdî aştî bibe sitran li ser devê zarok û pîr û kalan, seranser hêlên pan û dirêj.

Ax...

Bêhna te çend xweş e!

Sûr e, wek xwêdana eniya rezvanên gundê me, berî enfalê

Rohn e, wek şîrê dayika min, berî ku birêje ser axê

terr e, wek wan şikeftên hêj kes bi ser hilnebûyî

Wek perrên nîsanokan,

Ez te di bêhna te de dibînim

Çavan li min diniqînî

û dibêjî: Ez heyranî kê bim? Ez gorî kê bim?

Ez dibêjm: Heyranî min!

Tu dibêjî: Û kî din?

Ez dibêjim: Dîsan min!

Bermayikên xewna xwe ji bêdera sîngê te vêdidim

gumanan berba dikim.

Hezên tozgirtî bi bêhna bedena te terr dikim û

di baxçeyên dilê te de diçûnim.

Berî ku tu av bidî,

Ebrûyên xwe digehînî hev û li min dinêrî

Ji çavên xwe awiran diweşînî kelexê min

û berî ku min biêşînî

dibêjî: Ez heyranî kê bim?

Bi avek şîn,

Û hezên şîn,

Maçên şîn,

Em çûn û çûn...

**Gehiştin derazînka behiştek şîn!**

**Pêk ve, wek rêvingekê û sîbera wî, bi roj xwe ji rojê vedidizin û bi şev jî xwe bi danga heyvê ve digirin, ji bo ku serê rêkan winda nekin. Car bi gavan, car jî bi maçan sîmên sinûran li dûv xwe dihêlin û digehin cihên dûr dûr... Kes lê nîne, belê hindek caran ez û tu... û hindek caran tu û ez.**

**Ez, bi davên xwe yên hevrûşmî û tu jî bi belgên payiza xwe ya dawiyê, gilwazeyek şîn çêdikin û bi ser banê asmanî ve dihilawîsin, ji bêhna te aviz dibim û meha min li çavên te dikeve, tinê cavên te ji ber ku hemûyê dibêjin. Belê, çavên te jî wek dû Hacîreşkan difirin... Difirin, hêlîna xwe li nav tevnê gilwazî ava dikin, hîngê vediciniqî û wek zarokekê li roja cejnê bê cil mayî, li ber sîha min xwe diqurisînî û dibêjî: Ez heyranî kê bim?**

**Û ez, vî hestê kesk bi giyayek zer dinixêvim û şerî li gel dîwaran û qulaçkên tarî, li gel hez û hesretên xwe dikim. Ser û sîma ji wêneyên bizmardayî direvin û bi leqan dihêne min û pisyara êvara direng ji min dikin. Pirtûk, rûpel rûpel ji min dipirsin û hemî bersivên pêşwext amade disojin, weku dilkê min, diqerqiçin weku çiq û takên min, dikuzirin wek mûyên laşê min, dibuhijin wek henaseyên min, hemû têk de dibin xweliyek reş û ez bi serê xwenên xwe werdikim.**

**Wî demî tu li kûderê yî?**

**Xerîb im ... Xerîb**

**De were û bibêje: Ez heyranî kê bim?**

**Zalim...**

**Serê çend salan e**

**Tu gulên min li baxçeyek din diçûnî**

**Bi herdu lepan av didî**

**Û di navbera (Sefa û Merwe) de ez li benda te dimînim**

**Zallim...**

**Nizan li peristgehan dikim**

**ey Xweda, ma qey demsalên buharê nayê?**

**Ez têhnî me... Dişehitim**

û tu jî di xewnên xwe de

Li bin baranê heldiperî û hêj dibêjî: Ez heyranî kê bim?

Hestên min yên azirî, bi xwarina laşê min yê qûtîkirî û tavnedîtî, tenah dikin. Lavjên tijî henase û bêhna bedena te, berdidin sîngê min yê pawankirî. Henaseyê, kerbê, eşqê, jiyan û bendemanê dikim bûk, bûka baranê û zavayekê ji berzexî dihînim, da ku hîzara wî bike şemilk û nivêjan bike û bi dengê ku hez dikim bibihîsim bibêje: Ez heyranî kê bim?

Li êstgehek sahî, seqaqûş û kevokên şîn şaperên xwe dikin kiras û elho jî li hindav birînên min difire, dizvire, bi zimanê Feqê Teyran dibêje, here û li pey bigere:

Nihal bi nihal

Çiya bi çiya

Pencer bi pencer.

Wek bîjinek bedbext û bendemayî, ku tavsork mêrê wê li gel xwe ji cengek şkestî bizivirîne, bêdeng bike hawar û mereqên xwe bike qeftek yan tancek bo serê çinarekê yan zinarekê yan bajarekê, eger hat da bizane ku dewsa te gul in, mereq in, maç in, li cihê her pêngavekê maçekê dabihîne...

Bike nav, bike nîşan.

Û li êstgeha tavê lê dayî û zeratî daye gulan, hêj ez çaverê me. Xanîkê ku me bi kevran çêkirî dibînim û dem bo demî lê mexel dihêm. Ez dizanim li pişt dîwarê pêncê te xwe veşartiye da ku min bitirsînî, yan bilerzînî, yan jî hinarkên rûyê min sor bikî.

Li bîra te dihê... Te nedihêla ez li gel kuran yariyan bikim, da ku min maçî nekin?

Te digot: Bi tinê, ez dê te maçî bikim!

Û pêncokên destê min te maçî kirin!

Ji hîngê de, ez hez ji maçan û pêncokanê dikim

Ji hîngê de, ez dixwazim dîsan bibim zarok û zarok bimînim.

Belê, hindî hind tu mezin î

Dibêjim qey dê niho bizivirî û dîsan bibêjî: Ez heyranî kê bim?

# Cule Hacî Omer

Di sala 1974'an de li bajarê Sêmêlê ji dayik bûye. Sala 1997'an fakulta Perwerdê li Zanîngeha Selahedîn wergirtiye. Di gelek rojname û kovarên Kurdî de, berhemên xwe belav kirine. Di gelek fêstîvalan de, helbest xwendine. Di rêkxistinên sivîl de, jineke çalak û jîr e. Endamayeketiya Nivîserên Kurd e û her wesa endama Sendîka Rojnamevanên Kurdistanê ye. Endama perlementoya Iraqê ye.

## KASEKA NÎVÎ

Destên xwe tejî îşiq bike û
Li derazwînka min û xwe bike ketîreka bê subat
Di hembêzeka zelal da
Min li bejna xwe bike.
Êvariyên nêrgzî, gerdenên sinêl...
Ji viyana te têr naxom,
hembêza te ballinde ye
Şiwîn pên te bi dar beriyan ve pirteqal in
Bi perrên kotirên şîn ve kezî ne
Di xewê jî da min maç bike!
Sîngê wî kevalê he
Piştiyek e û min nas nakit
Tu ji kerema xwe kî, li kêleka min riwîne û postê xwe
yê elîktironî veke
Di xewê jî da min maç bike
Ew şiirên demeke pirça xwe şe nekirîn
(Mestûreka hestî sivik e)
Li rex dara gundî, dindikên eşqa min vêde
Û
Di sebeta xwe da tejî maçên min bi helêvirre
Gurriya min bike gul
Jivanên kenîzeka têr xwe nedîtî
Di sîngê stêra he ya yaxî da
Bike qefteka keniyê û
Bo mosîkeka her û her nerim
kaseka şerabê
Di hembêz min û xwe da serxweş bike!

**Hêy...**
**Berê xwe bide wan şiwîmatiyên he**
**Pelîtank in, duhiya me pê ve riwîs e**
**Baran bo ramûsana te**
**Bi alekên min ve xwe xûl dikit!**
**Ez ya bi cantikê te ve**
**Bîme medalî**
**Spêdê**
**Çavên xwe bi aramiya min bişo**
**Di xewê jî da min maç bike.**
**Dûr,**
**Wekî caran dûr nekeve**
**Bila**
**Bila tinê û tinê viyan pêxembera min û te bit**
**Bila**
**Tinê şiir falçiya min û te bit**
**Dê were**
**Tu ji kerema xwe kî**
**Vê carê jî**
**Bergwîza li ber xwe bike û li jivanê min nenêre bay!.**

## DÎMENEKÊ ÎFLÎCGIRTÎ

Hewir bo çî xwe danaqutin?
Di nav baxçên vî kavlî da
Direw dibine rastî
Îblîseke û xwe di çavên periyeka serjêkirî da nivandiye
Hêza ehrîmenî jî nikart xwe li benda bi hilavêt
Bîrhatinên kîfkoyî
Çinîkên beheşteka rehayî
Çip çip ji bin kefşê baranê dibine tirraş
Dengê min.
Perde parçe kiriye
Li berdergehê Xuday asê bûye
Ekter semayî li ber musîka efyon kirî geş dikin,
Vî dergehê zerkî nequtin
Çi dergehan nequtin!
Mouşek in
Bi guhan ve dipeqin û
Çavan dihêlne birisî, tirsî
hewir; hêzeka tirsnok e
Şev tê da kuh dibit
Xweya min çi ji min çêkiriye?!
Peqîşkeka hestîgiran im û
Di devê erdî da nanivim
Mirov bi carekê dimirin?!
Gazî min neke
Berê xwe bide elindeka nerim û
Dest bide milên rêyan
Xewa caran

**Bêhna dewsa dewaran**
**Ji bitir bike.**
**Demê ballinde dûr difirrin**
**Bûneka berze vedixom**
**Perrên weryay,**
**Tijî ber hiçkên min dibin**
**Stêr ezmanê reşekên şevan e**
**Ji bilî kehîkirina hezên sotî**
**Berîkên min**
**Çi dî bêhn nakin,**
**Awirrên Xecê, min biçiwîk dikin**
**Peqîşkeka hestîgiran im û**
**Di devê erdî da nanivim.**
**Xanîkê he…**
**yê herrifî**
**Xewa min tê ve nahêt**
**Min û dîwaran çîrokeka efsaneyî di çavên xwe da tomar kiriye**
**Ne ji min dihêt canekî kerkim**
**Û**
**Ne hewrekî bi rateqînim!**

## JI PIŞT DERÎ WERE DER!

Şeveka direng e
hemî tişt di namon e
Gilopa li hindav min, defterka şiirên min…
Hemî di namo ne!
Destên min girrê rûgeha xwe di asoyê xurbeta te da
vemirandiye.
Çî ye?
Xerîke bêhna te xwe
Ji gulav û
Lewendî û mercanên min bi vedzit!

Tîşêrtê te yê pirteqalî
Gizîlankên min vedikit
Hêşta otiyê wî têk neçûye
Tibil
Û desmala min
Pelatînkekeka nehecmtî ne
Ne Xanî û ne jî Cizîr î
Bo stirîne
Buxwîra çi xêvzanka hêşta dest bo neweşandiye
Çend sar e
warê qama te lê neçemiyay!!.
Mêyatiya min bo te digerrit,
Hewceyiya min bi gerdena te ve ya çeqa digirt,
Min di gel seferên xwe yên kurtxayen; bigêrrîne.
Dilê min, bi lojîka eşqa xwe bisoje;
Di karîzma şevên xwe yên tenk da,
di gel Vînosê binivîne
Buharê di me bialîne
Tu bêjî baranê tama piyasên me firr nekirbit?! ,
Ji pişt derî were der,
Tiblên min bila çînganê li bin guhên te bikin

**Maçên me li ser beyiskên heza; dila biwerînin**
**Baxçevanên lêvên min; bila**
**Tiryê rezên lêvên te biçinin!**
**Çavên min,**
**Şajna rûbarên te yên namo**
**Di xew bibin!**
**Şivêdî bû, min û te û sînahiya momeka**
**Werîsê mirinê li hefkê,**
**Bo agirekê serxweş dikirin pabus! .**
**Noş bo hatina te**
**Noş bo mana min**
**Pêlên xurbeteka asê,**
**Bila te ne hingêvin,**
**Min jî di gel xwe bibe**
**ez ya li ber derî û stovanka te;**
**ewa hêşta demê ez û tu bo hembêza enahîtayê di sotîn**
**Mora li min dikit!**
**Min ji xwe re bibe Laliş,**
**Di ava qudretê da,**
**Bi rêxe,**
**Şehdeya min bistîne.**
**Li rex dareka mirada**
**Mohra dezgiriya me çêke**
**Biskên min veke û**
**Bi viyna xwe terr bike,**
**Rûyê min bide bay!**
**Her şev were pişt kavilkê me û sîbera**
**Xwe bike elind,**
**Bo hevsoyên me bêje,**
**Yara te me!.**
**Navê min,**
**Li ser dîwarên hewşa xwe û di gel şitla biçîne,**
**Di gel nêzîkbûna rîtma te**

**Dê xunavê ji xo vemalim!**
**Ji pişt derî were der**
**Min ji xwe re bibe navdanga kêliya Şedayê,**
**Patê heyê kesk ji min veke,**
**Min zîndî bike,**
**Tara hinarka hil bide**
**Û min bê mirad neke!.**
**Min ji xwe re bibe Hewreman**
**Bi Siyaçemana ve min skêç bike,**
**Miska pirça min ya dirêj di dest xwe bigire!**
**Nextekî li ba min pal bide,**
**Sîngê gyay bi sema xelweta me bi gevizîne,**
**Ta elemka ji min bibe!**
**kesek maye te negotiyê tu hez ji min dikî?!**
**Roj çend di kûr in**
**Nagehim davên xwezîka bigirim.**
**Xenda di vewejêrim**
**Hewceyî te me...**
**Ji pişt derî were der,**
**Û**
**Nehêle xewnên min bigenin;**
**Bo têhneka pîvaziya çavên te**
**Ezmansork;**
**Min li pişt çavên xwe siwar dikin;**
**Nahêlin çîtir xewna bibînim**
**Stêra bi hejmêrim**
**Wênên te yên di buxçika min da**
**wexmê girtîn maç bikim**
**Bêjim...**
**Ya te me!.**

# Layiq Kurêmeyî

Sala 1974'an, li gundê Berê Buhar, nêzîk bajarê Duhokê, ji dayik bûye. Lê ew xelkê gundê Kurêmê ye. Sala 1993'yan, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di festîvalan de, xwendine. Li sala 1994'an, berhemên xwe di nav kovar û rojnaman de, belav kirine. Endamêyeketiya Nivîserên Kurd e/ tayê Duhokê.

Dîwaneka helbestan, bi navê "Şeveka bê nivêj" çap kiriye.

## JI BO WÊ ZÎNA ZÎNDAN KIRÎ

Çavêt Zîneka zîndan kirî
Di alozbûneka girê girê
da mefel dibûn.
Hember verêja pênûsê
Ne cinqî, li ber tîjka vê şemalkê
gurî kerbûn.
Di nav destên Şahsiwarêt gelek gerim
berev bilindahiya çiyayê Mîtaniya
û zinarên Kardoxiya
ji bo pêşiya wan, xirr sengerbûn.
Di gel fîrinêt şûpa Ariyay
ya ji bo heza min
ya şariyay
Bi dilê kef girtî
Dibûn mirîd
Karwan dihajot
Di şerenîxa vê dastanê
Di vê şevê
Ji bê wijdanî, bê hirmet dibû
Pehlewanên evê kêşê
reşe hov bûn
Pîroziya memkên henê û
Çuka sîngê şerefê
Di nav lewtîna wan lepan da
Bê hirmet kir
Û didanên çav şûriyê
Wek exlaqê ewê rojê

**Ji bilindahiyê xo şûr dikir**
**Ji spiyatiyê xo diguhurî**
**Divnav xulyê da leyzok dikir**
**Lewma gelyê camêrî nû**
**Pêwisê we**
**Li ser dîndeha ciwan binyatê**
**Şerefa spî**
**Bi serbilind lê nexiş dikir**
**Girinjîna nîrha şemalka gurîker**
**Tevnêt şevê**
**Jêk çirrçirr dikir**
**Lewma li hember xo gorîkirina vê dozê**
**Xo ji bo dilsozî û**
**Dilêriya we şûr dikir**
**Ala nexşa xo şerefê**
**Li bejna çiya xo dihejand û**
**Di gel bûka azadiyê**
**Leyzok dikir**
**Leyzok dikir**

## SÎNARYO

**Bo çî li hemî sînaryoyên**
**Mêrga peyvên nazik û terr**
**Qehremanên xweş bikirêt**
**Xefkên maça pitir li hev in**
**Dastan bi şev in**
**Da ew xweşî û**
**Dil xav kirin**
**Nebît şaşî û Dudil kirin**
**Di nav beyna dêmê gûzê**
**Dêmê rojê**
**Tîjkên rojê xencer in**
**Sîxme kevir in**
**Ji bo dûrhêlî**
**Baş siwar in**
**Di perên birîsiya ra bez in**
**Perdê li çavên tev bêbexta**
**Didirrînin**
**Şewqa dêmê evê gûza destê min li ser**
**Ax gezink e û çenda nerm e**
**Hilmek germ e**
**Hilma dêmê evê rendê**
**Dilê minê sar û qerisî**
**dişarînin**
**Ji mûyê serî**
**Heta tilên piya**
**Herdu pêk ve xo dalînin**

**Pûrê te yê reşê tarî**
**Bîreka kûre û ez lê niqo dibim**
**Li wê derazînka telara razînê**
**Ew dilên**
**Bi dîtina hev du bûyin biloxe**
**Daneweryên**
**Hêdî hêdî,yek dûr terrken**
**Çirayekê geş tir helken**
**Jînê li tewrê avizbûnê**
**Baş li berken**
**Baş li berken**
**Xo neker ken**

*2005*

## MIRÎD IM

Ax Sîma xan
Bûm behîme û keftim dinê
Li gorrepana eşqa te
Ez nebûyme
Da ez bimirim
Ez bûm mirîd
Mirîd im yê terîqeta
koza evîna tey bê bext
Hey bê dilê
Helde ala tev dildara
Sax ke kula birîndara
Da vedeyin reşmala jînê
Da mêhvan keyin
ewan hîviyên
Hatîn gevaztin li nav xwînê
Bikevîn bajarê evînê
Li kêlek
Govenda Ferhadî û Şirînê
Lewra ji te ra
Dibêjim vê dastana jînê
Da biçîn bixwînîn
Tev serhatiyên
Serkêşên me
Li xwendingeha nav lê danay
Ji êşên Zînê
Da bikeyin serbor
Ji bo tewafa çavê rojê
Da bideyne bor
Ji bo hizrên jeng û genî û
tev nezana
Da bikeyne gorr
Da bikeyne gorr
Da bikeyne gorr

*2004*

# EZ XERÎB IM

**Ez xerîb im**
**Gelek ji te dûr**
**Ger çavên te**
**Xo ne kilden**
**Her demekê**
**Sozê di sîngê te hilneden**
**Li dilî dikevin**
**Birînên kûr**
**Ez xerîb im. Gelek ji te dûr**
**Çav li ber jînê**
**Bê zar dibin**
**Xuşî li def min gunehkar dibin**
**Lew be dilikê xerîbiya te**
**Bakuzîrk e û cerg û hinava diguvêzît**
**Ez xerîb im. Gelek ji te dûr**
**Hindek janên**
**Min daneyî û evê canî**
**Hêş nedîtîn**
**Bi min da dirêjît**
**Ne dîtina te agirek e**
**Ew agirê xo nenyase**
**Di sîngê min da qêrî û tev gefên wî**
**Jana dizên**
**Bextî li hedara min dikên**
**Ez xerîb im. Gelek ji te dûr**
**Lew ev gaziye**
**Diyarî ye ji bo dîtina te**
**Pêşkêşî ye**
**Ji dûratiya te**

**Me xem xarin**

**Lewma yarê**

**Rojê şewqa**

**Xo ji min revand**

**Li min peydakir rojeka reş**

**Ez xerîb im. Gelek ji te dûr**

**Şevê jî xew ji min dizî**

**Heta spêdê wê dane min**

**Du çavên geş**

**Ne bi rojê şewqê pêdibînim**

**Ne bi şevê xewê di hewînim**

**Te nabînim ey xuşkokê**

**Dê sebra xo bi kê dî înim**

**Ji ber te ezê pirr xemgînim**

**Te nabînim**

**Te nabînim**

**Dê sebra xo bi kê dî înim**

**Ez xerîb im. Gelek ji te dûr…**

*2000 76.*

# Qedrî Osman Şêro

Sala 1974'an, li bajêrê Duhokê, ji dayik bûye. Heta bi berheviyê xwendiye. Helbestên xwe di rojname û kovarên Kurdî de, belav kirine. Her çend berhemên wî pirr in, lê heta niha çi dîwan çap nekirîne.

## LI KINARÊN CIWANIYA TE

Şînwarên evînê dibûne yarigehên zarokan
Li kinarên ciwaniya te
Zarok dibûne sinêle û dibûne genc
Ez dibûme zarokekê pîr
Di pencera payîza rondikên te, dibûne lehî
Salên jiyê min li ber pêlên xo dibirin
Di zivroka agirê hezên te da
Ez dibûme belgekê wê bîhoka li ber derî
Rojê neilet lê kirîn
Çirayê hîviyên te
Li bin xirxalên tirumbêleka superge
Dibûne sêpêka erşê rîh gevozekê fêlbaz
Dîwarên habatên te xem pê ve didîtin
Ehrîmen in werzên xoşiya ji buhara te dirrevînin
Li kinarên ciwaniya te
Ne mirî dizivrrine jiyanê
Ne belatînk semayê diken li ber bayê zivistanê.
Ez dibê dengiya eşqeka pîroz da dixendiqîm
Û jiyê min dibû demê novlêtekê
Li dûv rûdana bi lez diçû
Li kinarên ciwaniya te
Ez dihatime xacdan û tu
Dibûye êxsîra dahatiyekê xirş ji xoşiya
Hîviyên min dibûme du çavên zîq
Li hindavî Hişkerûy
Bi cilkên balaviyekê ve.
Li kinarên ciwaniya te
Di nav laperên hizrê da

**Bîrhatin di azirîn û**
**Hemî tişt dibûne bîrhatin**
**Mêjûyê, şemendefirra ayindey radiwestand û**
**Xoşyiyên posîde siwarî fargona xeman dibûn**
**Û xemên te di nav çarçûvê spiyatî û**
**Bêgunehiya kevalê min da, sema dikir.**
**Li kinarên ciwaniya te**
**Demê şev bi tariyatiya xo ve diwestît**
**Baweşkên xewê dibine tonên aramiyê**
**Were guhdariya dengê saza min.**
**Da xemên me bibine ristên awaza û**
**Serborên me bo bêdengiyê vegêrin.**
**Li kinarê ciwaniya te**
**Were li bin sîbera wê bîhoka xemla xo ji dest day**
**Ew parzînka xemên em beref êvarî ve**
**Dayine rê daqutîn**
**Ew buhara hinde vemay**
**Careka dî**
**Bikeyne yarvehên zaroka û**
**Romana xo serjinû dest pê bikeyin.**

## FURMUTKIRINA BÎRHATINA

Şîrha kelhên bîrhatinên ez tê da hatîme kuştin
Dê herrêfim
Eger bo mirina her ciwaniyekê
Çirkeka demî xo vehêlît,
Qiyamet ranabît
Heta xoşiyê û evînê
Diyek gorr da veşêrin.
Di çiwargoşeka berteng û sinûrdar da
Pêşangeh di hevpişk in
Hinda nexiş yê bo danay û
Hind li ser renga mayîne aloz.
Dê pêguhurkana girrinjîn û hizra
Di gel nûyatiyê kem.
Hemî tişt di yotubiyayê da
Êkspayir bûn
Hemî hizir di kolankên bîrhatina da
Bûne vayros
Qerqodê minê kopî kirî
Di arînin.
Ev pêkê vala bû
Di gel xemên min, şermezar bû.
Her çirkekê

**Hizar hizir di serê min da dizên**
**Tinê hizrek mêşkê min dişêlît.**
**Hemî çavpoşa dê şkênim**
**Çinku ez hişyar yê bûyim da**
**Di gel vî çiyay bimînme sax**
**Dengî ji giriya min neyne**
**Da li beramber wê he neşkêm**
**Pêle da rondikên xo daîrim**
**Xo di xew da ez şerim ji kêliyên te dikem**
**Ezê dimirim da bibime bûneka nû û**
**Hindek bo mirina min dinal in**
**Hemî xewna dê keme xewnek**
**Tev hîviya li ber piya raêxim û**
**Xilfên sêdarê keme**
**Piyankên alay.**

# BIBORE. EZ NEŞÊM..!!

**Segorga spêdê**
**Şevbest lê dibûne mêvan**
**Çivata firîştan ji dûr kuçkê paşmayê pelên xewna**
**Direvandin.**
**Kebara mizgefta û dengê naqosa di zikmak da, lal dikirin.!**
**Cengê bê deng dest pê dikir! !**
**Yê kes nekevîte desta, xo dikujît**
**Bêhna genî qulaçik tijî kirin**
**Darristan jî ya vedigirît.**
**Da wê xewna nazik li kinarê xeweka dî akincî ken**
**Tu yariyê nizanî. Têk nede û**
**Yariya bi hestên min neke**
**Dema em zarok, me yarî dikirin**
**Niha te jiyê min yê kiriye yarî**
**Dê berdewam jîn, wekî momê**
**Dê ji bejna xo helînim û pêşkêşî bejna te kim**
**Ew bejna xo xwîs dikir û**
**Ew peyvên pena bo evîna min dibir**
**Dê bine yadgar**
**Di nav ristên helbesta min da**
**Dibin wan davên pirça xo ve bes awriyan biweşîne**
**Hestê min yê nazik e, xo li ber nagirît.**
**Tu ya nezan û şermînî yan qedera min dixapînî...?**
**Pihêle li bêdera gerdena te xoşiya bideme bay û**
**Li bin davên pirça te, rîsê xewna bivehînim û**
**Lêvîn qeşavî li dîmê te geş bikem û**
**Hespê heza li mêrga bejna te av bidem.**
**Da bes çavên te diziya ji dîtinên min biken û**
**Dîtinên min bibine hêvênê pêguhurkana hesta.**
**Ciwaniya te bibîte sifra çivata xewna**
**Rêvîng lexrîniya xo lê bişkênin.**
**Tu ya ji kerba çendîn sala çêbûy .!**

Xo tûrre neke.
Were li saytekî ji saytên dilê min bibe mêvan
Demê pîroztirîn eşq bi rêvingî jî tê ra diborît
Da rojê sê cara xo bo bejna te biçemînît.
Serkeftina welatan li ser destê genca ye û
Serkeftina mirova bi hesta ye…
Hestên min hemî êxsîrên hezên te ne.
Nebêje ez wekî te nînim, pa bo cî ez wekî te me
Tu ya bûye dadwer û ez zîndaniyê peyveka te me:
(Bila)
Çavên min bîsa bo dîtinên te didanin
Navê te rengek e di kevalên pêşangeha peyvên min da zalbûy.
Xewnên mirî. Hizrên posîde. Hîviyên direw.
Armanca vedihêlin.
Soz û peyman û eşqa te ya pîroz
Bi dehmena te ve sotin.
Gunehên serşiwa bûne gorzên oldaran.
Ger te bivêt dilovaniyê bi min bibey
Zû min bikuje.
Rûdan paşmaya dihêlin û serbora te birînên hêlayin.
Gurriya derê tivengê bîra min li te dînît û
Derê birînî, ji rengê lêvên te ye, lew ez dialîsim.
Ey ciwantirîn rengê kevalên min
Di cengî da çek yan pesen parêzer in û
Yê dixenqît… Kesê qurtal naket
Xilfa sêdarê ya bê dil e, rondika bo kesê na barînît û
Şerim ji gerdena bêguneha naket.
Bîr li tolvekirinê ezelî ye.
Hez ew dehbê têr nebît, ciwaniya te pawan kiriye
Borîna çirka, dûmahiya jî nêzîk diket.
Dibêjin (yê berek bivêt dê di paxla xo da hilgirît û
Te pişta xo ya daye wî dilê tu viyay.)
Çend bêhna deryay tenik dibît

Kerba wî dibîte şilqav û pêl
Kevne lata diherrêfît...
Roja aryay û sîbera te ya belav e
Parçên leşê min hêlayne, ne nixaftî.
Ez balefirr im û tu masî
Pêk ve jiyana me qetlazî ye
Ne ez dibinê deryay da dijîm, ne tu di sîngê bay da.
Jiyê min şeveka dirêj e li jivanê tîrojkekê girrinjîna lê peyda diket
Gerimatiya tîjkên eşqa min miyekî li te şaş naken.
Demê bersiva ne hatiye, bes pisyara ji min bike.!
Li şeveka ji vê kirêttir û hêş tarîtir
Li ser çar lepka dê qesta min key
Qaremanê xewna û dîvelankên karwanî
Dê li yêxên kelegurî bine xodan.
Bi zimanê gula min ne axêve
Tu ya pêdivî min î.!
Destên min bike bazine bi xo ve,
Da germatiya himbêza min sinûrên taya te bibirin.
Ez nojdar im... Û nojdar yê birînên min dikewînin
Eşq ey pîroztirîn nihênî, ey ciwantirîn huner
Dê tolên xo li te vekem
Demê li payiza jiyê xo li te diborim.
Bê dilovaniyê bi kolanên jiyê min da berde,
Da şair kerba wê bikene rêzik û bi coka dîrokê da berden û
Li nav xemla baxê te bilbil bistir in û
Sêwiyên wekî min, xewna bi kursîka bêkesî ve bibînin.
Ew nihêniya xoş
Çava dixapînît û dila kore diket
Sikrên pengiyay diherrêfît.
Hevsarê hezên zarokîniyê berdet
Tev aşiqa li kebara berebeyaniya kom diket.

## LI WÊ ŞEVA HEYV GIRRINJÎ

Demê xem dibine rondikên pengiyayî
Girî fihêtî ye.!
Peyv kêr in hesta dibirrin
Hez dibine marên zivistana heşk dibin
Min li bîra xwe bîne...
Demê xoşiya hevsarê xwe diqetand.
Pêlên he dîdevanên sozên te ne
Bera ne weşînê
Şêteşeydayên eşqê
Di sîngê vî deryay da berze bûne
Min tu ji jiyana xwe laday û
Di aşopa xo da bingorr kirî
Te bo zengila bîrhatina lêda.?
Here min bihêle û dûr bikeve...
Destên min yên pak dinivêsî
Te bi guneha lewitandin.
Bes e hevrrikî bes e kerb
Bihêle hestê xwe biguhurim û
Bibime hunermend.
Da helametê bejna te bikeme zimanê renga
Di posterê pêşangeha xwe da
Tonên dengê te yê bi şanên mêşkê min ve
Bûne şîşiltok
Bikeme meneloceka wêna di aşopa xwe da risêz kem
Peykerê helbestekê bo zêmarê
Jê binexşînim.
Li buhara jî, tu nêrgizek bûyî
Bay bejna te dihejand û
Xema xwe bo dicemand
Li mezargeha eşqa te û di mîhraba çavên te da

**Sofiya sucde bo evînê dibir.**
**Eve ne ew dile yê tu viyay û xwe bo evîna te diqutît**
**Careka dî çi biguhurim**
**Navê xwe. Hizra xwe**
**Çi bguhurim**
**Rengê xwe. Dengê xwe**
**Pirsyar ji wê gula di pencerê da bike**
**Da bersiva pêş min ve bidet.**
**Yê dûr bivên derya dibirît û**
**Yê ji agirî bitirsît**
**Xarinê xav dixut**
**Belatînk bihayê şemalkê dizanin**
**Lew xwe di agirê wê da disojin.**
**Eşq, ey xilfa pîroza ez pê ve hilawîstî**
**Min biêşîne**
**Da mîna zivrokeka aryay**
**Bibime awazeka bêdeng**
**Te di nav xwe da veşêrim.**
**Ezê bûme mom**
**Germa eşqa te min dihelînît.**
**Ez hatim agirê te bi vemirînim**
**Te ez di agirê xwe da sotim.**
**Ew pîriya gefa li min diket**
**Te bi dîtina xwe ya kuştî.**
**Pêkekê vala û aşiqekê pîr**
**Dibine tîksên helbestekê**
**Govenda xwe girê diden**
**Hêzeka nepen li şeveka tarî**
**Di gel pêlên bayekê hîn**
**Li kinarê deryayekê aram xwe diguncînin.**

# Şehab Akreyî

Sala 1976'an, li bajêrê Mûsil ji dayik bûye. Derçûyê fakulta kargêrî û abûrî ye. Di destpêka sala 1994'an de dest bi nivîsîna helbestê kiriye. Di redaksiyona çendîn kovaran de kar kiriye. Di televizyon û radyoyên Kurdî xebitiye. Mişe gotar di rojname û kovarên Kurdî û Erebî de, belav kirine. Dîwaneka helbestan ji bo çapê berhev e.

## ADARA MIN

**Sîpe* di xew da ye**
**Baran ji deştê dizîz in.**
**Stêrên esmanê birîndar**
**Li gel erd û zarok û genc û pîran bi jivan in.**
**Sîpe û stêr**
**Çaverrêyî hatina buharê ne**
**Hîviyên berze û xuya**
**Di leşê adarê de ne.**
**Agirê adara dilê min**
**Di kûratiya xemên min da**
**Girnjîna xemeka mezintir**
**Ji (11) ?e û (5) ê adarê dibînît.**
**Adar dengê aşiqên gul û**
**Sitrana man û evîndaran e,**
**Berxodana kulîlkên hîzarên bûka ye û**
**Tev şeyda semayê li ber diken.**
**Tukê kemana min**
**Ziwî bi ziwî**
**Di nav tilên min yên xwînelo da**
**Awaza werzê nehatî**
**Li ser rûyê buharan**
**Biryaran dijenît.**

*17.3.2009*

* sîpe: Tavgeha dêrîna Akrê ye

## RINDA XEMGÎN

**Rinda xemgîn û birh û kevan**
**Gelek xewna dibînît û**
**Gava radibîti ve**
**Asman tarî û**
**Bê stêr e.**
**Dema hêlînên şalîlan digerim**
**Dil bi evînê dixendqît û**
**Dema belav dibît di nihayê te da**
**Evrên giranên kovanan xo lêk diden.**
**Tîşk wek dizan hêdî**
**Lis erê tûşî derdikevin**
**Çavreş ziwî û bi ziwî**
**Hîvî û hezên xo**
**Di çavên rojê da vedişêrît.**
**Hergav pêl û muzîk**
**Wê heldgirin**
**Ber bi elindên birîndar û**
**Spêdeyên nû diben.**
**Xişîna rondikan**
**Li ser rûyên te**
**Agirek e**
**Hemî gulên baxî**
**Diçirmsînît.**

*29/3/2009*

## DU DILÎ

**Xemgînî di rondkên te da**
**Xodîkeka mijdar e**
**Du diliya te jî**
**Sirûdeka bi rehend û têhne.**
**Di bîrhatina stêrên leyzî û...**
**Rojên geşên nehatî da**
**Ji biyavekê navîn digerrêm**
**Da di çavên reş da geşbîniyê bibînim.**
**Ey dil û hişê azad**
**Kengî bi bêdengî dê nivî?**
**Di çav û birûyan da nihêniya veşêrî?**
**Keniyê jî, ji min pirt pirt key.**
**Di baxçeyê gulên pîroz da**
**Çîroka ser devê civatê**
**Derya û xewn**
**Hertim em bûn.**

*28/4/2009*

# HAYKO

1

Piştî îşiq ji dayik bûy
Janek nû
Ji hîviya
Helat.

2

Ez yê li rojgarê dinêrrim
Bêhna nihêniyên
Bajêrekê namo û
Henaseyeka şkestî dikem.

3

Nerme bayekê hîn dihêt
Ji xemên min ra hêvên e
Karwanê dilê mandî û
Xemgîn e.

4

Her şev nexeşeyê
Stêra dikêşim û
Sîngê hîviyên
Ne gehî dikelêşim.

5

Me dixewnan da
Di ruha xo da
Sitran bi wê yotupiyayê ve digotin
Ya me di xewnan da dirust kirî

6

Ruha pişkojan
Di baxçên êvaran da
Bi pêkenîn û semane
Lê di civata xeyala min da xuzî ne.

*6 /6/2010*

## RÊK

**Ez dê berev bajêr û**
**Cade û kolan û rêkeka dî û**
**Îşqeka hêş roj nedîtî çim**
**Heya kes min bi dilê xo ne hajot.**
**Dê hemî nihêniyên**
**Peregirafên îşiq û**
**Bexteweriyê vexwînim**
**Daku çi xewnên me ne rizin.**
**Dê zemenî ragirim û**
**Mirin û jînê jî**
**Di ilê zemenî da**
**Dê veşêrim.**
**Dê di êvareka bê sinûr da**
**Kêş û serwaya**
**Hemî pend û hozanan**
**Herrfînim.**
**Dê hemî xem û**
**Demjimêrên veqetyanê û**
**Dergehên werzên weryanê**
**Di baltûyekê reş da pêçim.**
**Daku çi caran ji dûr ya**
**Rêka dîdarê nenivim û**
**Hergav û dem**
**Li dev te bim.**

*21 /6/2010*

# Xalib Cemîl

Sala 1976'an, li bajarê Duhokê ji dayik bûye. Sala 1995'an, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û yayekê, di sala 1998'an de, di rojnama Peyman de, belav kiriye. Di sala 2000' î de, bûye endamê Yeketiya Nivîserên Kurd, liqê Duhokê. Di sala 2006'an de, bûye endamê Sendîka Rojnamevanên Kurdistanê û di sala 2008'an de, bûye endamê Sendîka Rojnamevanên Cîhanê. Di piraniya kovar û rojnamên Herêma Kurdistanê û parçên din yên Kurdistanê de, babetên edebî û rojnamevanî belav kirine. Beşdarî di çendîn fîstevalên edebî de kiriye û 2 caran xelatêyekê yê fîstevala Gelawêj, bi dest ve înaye. Xelatê rêkxirawa (Goteborgis) ya nêv-dewletî ya Swêdî wergitiye û beşdarî çendîn xulên civakê medenî kûye. Pirtûkeka helbestan ya çapkirî heye bi navzê (Xilfên dersoka te, xefk in) li 2004'an, û yeka din jî, li jêr çapê ye.

## BÛN, MIRINEKA NÛ YE

Heku
Li wê şeva
Serma bûye desthelatayekê
Sirê ev bajêre sêdare da
Hemî tişt diberzebûnê da bûn
Esman kevalekê nivistî bû
Bi tinê stêra gazî min dikir
Birînên min
Di nav leşê tariyê da diêşan
Çewa
Bo cê jivana birrevim
Da penayê bo te bînim
Ez ne dişiyam
Min diviya ez
Hewarên xwe bigehînime te
Ez ji weriyana belga ditirsiyam
Dan pêdanê bi hemî gunehên te bikem
Li wê cada
Min êvara xewnên xwe yên mirî
Lê vetişarîn
Min hest pê dikir
Jiyan, janeka berdewam e û
Bûn, mirineka nû ye! !
Lewma bîrhatinên te
Ez di gel xwe niqom kirim û
Hemî tişt min ji dest da bûn
Di nav mija eşqa te da

**Ez li xwe digeriyam**
**Da sîmayê dêmê te û**
**Helbestên xwe**
**Jêk vavêrim**
**Ji reşatiya çavên te birevim û**
**Semayê bo eşqa te bikem**
**Penayê bo rojê bibem**
**Bîra te dihêt?!!**
**Di himbêza leşê te yê rûs da**
**Ez dibuhjîm**
**Min reftarên sinêla dikirin û**
**Axivtênên vala digotin**
**Mîkyacê te li ser lêvên min**
**Bibû bûyax**
**Te hest bi peqînekê dikir û**
**Min jî**
**Şerim ji miyên spî yên serê xwe dikir**
**Te digote min: Eve dest pêka dînatiya te ye.**
**Min digote te: Ez ji mêj e yê dîn bûyim.**

*13/12/2005*

## JIVANÊ NÊRGIZEKÊ

**Heku**
**Pêlên dengê te yê.!!**
**Diguhên min da**
**Dibûne muzîka hestê,**
**Janên eşqê**
**Giyanê min dikire volkan û**
**Dibuhjî**
**Tiblên min**
**Ajelên qaçax bûn**
**Xwe di nav pirça te da vedişartin**
**Destên te du tevnipîrk bûn**
**Li ser singê min yarî dikirin**
**Li wê şeva sar**
**Ewa heyvê**
**Li pişt ewra**
**Xwe di gel stêra daye revan,**
**Çipkên baraneka zivistanê**
**Bê destûrî**
**Nameyên rêvinga**
**Bi şemendefira eşqê dibirin û**
**Li wîstgeha min nedirawistiya**
**Çinku êvarên min**
**Nihêniyên girinjîna**
**Bejna nêrgizekê bûn**
**Helbestên min har dikirin**
**Xem durîşmê berzebûnê bûn**
**Li ser dêmê tariyê**

**Bibûne kevalên mirinê**
**Bi dîwarên jora min ve**
**Sema dikirin**
**Hemî hezên min jar dikirin**
**Lewra leşê min**
**Payizeka rûs bû**
**Di himbêza jiyê xwe da**
**Niqom bibûûûû.**
**Li wê şevê.**
**Bitinê çavên te bûn**
**Di cîhana min da**
**Bûyne şaaaaaaaaah h h h h h h h.**

## JIYAN PÎREJNEKA WESTIYA YE

Di êvara xewnên xwe da
Min jivanê çûnê hebû
Berî nama dumahîkê bo te virêkem
Hestên min bûne guneh
Tiblên min xame sêdare da
Hemî bîrhatin
Bi dîwarên jora min ve
Bûne kevalên tirajîdî
Germatiya xwîna bajêrî
Bê dengiya volkanekî bû
Pêlên demî
Bibûne deryayeka har
Paporên heza dadwîran
Min çend tu divêyî
Were
Da di gel rûsatiya payizê
Semayê bo mirinê bikeyin
Eşqê bo bûnê nû bikeyin
Ev hebûne
Biyavekê kurt e û
Rêkeka dirêj
Jiyan
Pîrejneka westiyaye
Nifirînan li dizên dozê diket
Ji xwe varê dibît
Û dibîte qereçeka (elmode)
Li filkeyên cada dirawistît

**Hero çend caran ji dayik dibît**
**Hind caran dimirît**
**Heku peqîşkên barana**
**Li kolana dibine gêleşûk**
**Janên xirşbûnê dihêne bajêrî**
**Ne çi dibît û ne çi dimirît**
**Ne tu dihêy û ne ez diçim**
**Ez çend heş te û mirinê dikem! !**
**Heku tirsê**
**Gehên eşqa me girtîn**
**Li zivstana min û te**
**Birînên xwe yên sar**
**Bi leşên darên rûs gerim dikirin**
**Di himbêza şevê da**
**Ber bi asoyên cîhaneka dî diçûn.**

*19/ 10/2010 Duhok*

## RÛSATIYA RENGA

**Li wê êvara dêmê te**
**Di çavên min da digirinjî**
**Bajêrî henase dikêşan**
**Hemî tişt daviz bûn û**
**Janên bûne kanû dihatinê**
**Cada**
**Tengatiya kolanan didizî**
**Leşê zivistanê**
**Rûs radihêla renga**
**Xewnên min ji renga havîbûn**
**Dem**
**Keşiteyeka bêwexer bû**
**Di nav pêlên hişkatiyê da dixendiqî**
**Giyanê min**
**Gorstaneka hezên veşartî bû**
**Heku**
**Çavên te li nav gurên heza**
**Bûne nêrgiz!**
**Kelexê min**
**Şkestiyê cengekê bû**
**Alayek di nav destên min da pêtî bibû**
**Ez lawaz bibûm**
**Lewa dihatina te da**
**Bergirî ji min nedihat**
**Li wê êvara**
**Roj di nav ewrad a nivstî**
**Min tiblên xwe dabûne bay**

**Bo baranê**
**Min navê xwe dabû bi nan**
**Bo manê**
**Heku cadûya keniya te**
**Li min bûy**
**Hemî erşê min hejiya û**
**Eşiq jê zay**
**Tu bûye mezntirîn guneha kewnî**
**Di min aliyay.**
**Li ber spêdehiya**
**Payizeka sar**
**Ewa hêşta xewê**
**Gehên leşê bajêrî neberdayin**
**Hêşta şevê**
**Bi durstahî**
**Dehmenên xwe nehildayin**
**Bîvelerza qederê**
**Ez ji himêza te birim**
**Ji hingî were**
**Ezê li te digeryêm.**

# Xalid Elî Slêvanî

Di sala 1976'an de, li gundê Çemziravî, ji dayik bûye. Li fakulteya adabê xandiye, lê ji ber çend egeran bi dawî ne anî. Heta niha du pirtûk çap kirine:

1. Dergehê mijê. Dîwaneka helbestan.
2. Daketinek ji rojavaya peyvan. Hayko helbest.
3. Komelek helbestên sitrankî, li jêr çapê ne. Gelek helbestên wî bûne sitran û bi dengên sitranbêjên cuda hatîne gotin.

## HÎVIYA PÎR

Ez yê dibînim
Kalekî pîr
Cegera xwe kure dikit
Xwîna xwe bi destên xwe dişot
Tijî mistek xwê
Bi ser birînên xwe de dikit
Ser tiblên xwe dikit bizot...
Bi çavekê mandîbûyî
Tariya rêka xwe dihajot
Li hindavî kendalekî
Bermayiyên jiyana xwe
Bi kevran ve dihesînit
Gopalê xwe radikêşt.
Diyar e roj û sala
Gelek ji hêza wî dot
Lew eviroke bêzar e û
Hîviya xwe li bazarî
Erzaniyê zû firot...!!

## ŞEVEKA GERM

**Bi çepî te ez pêçam**
**Di qulaçan re henasên min pîrbûn**
**Nebûm ba...**
**Di gewriya sîh texarên buharî de**
**Hewara min neza**
**Min di ezmûna te de**
**Hemî geşt û girnijîn**
**Ji pêla bilind di pêkan de asêkirin...**
**Xew revîn e. Pêk revîn e**
**Dest perê li bin şirrka qulaçê de revîn e...**
**Û te... Ax bo te.. Te çi digot**
**Nê te ronahî ji çavên gavên min bosîkir**
**Û çaxê da gul bişkivin ve**
**Te pasteportek sor ji xwîna min dot...**
**Her gavekê li ser davekê**
**Tu ya kelexê min dihelawîsî...**
**Erê hîşta bêhna (Pira Delal) ji lêvên te dêt.?**
**Ez dê li bîra te înim**
**Her maçek min bi sêla sor venay**
**Bin ve di danga xewnek pivday...**
**Şermê edrêsê xwe guhurî**
**Wek çewa kiras bi ser çuka dikeve**
**Bê ku yasa (uff sayid) biçespit**
**Wesa ez dê ji aliy çepê ve**
**Tola hemî kula vekim**
**Û navekê nû ji te re çînim**
**Li ser textê min yê yek kesî...**
**Bakûr here... Başûr here**
**Tu ji hilma min napeşî ...**
**Ha. Bêhna sûtina te ya dêt!!!**
**Û rojekê dê li ber destê min**
**Rawestî bi dil mandî.**
**Û daxwaza şevekê kî**
**Min di gelyeka ji te mê tir**
**Meyandî!**

## BANGÊ TÊHELANDINÎ

Were û xewnê û bêhna xewna
Bo balgehê xwe bi hêle
Çavên şevê kil bide
Bi rejiya hestiyên
Ezmûneka xilole...
Eve tuxîbên navê min
Yên têhna te dimêjin
Dengê min yê rêka te
Bi hedarî boyax dikit.
Rûs were û cilên penaberiyê
Di nav tabîta xerîbiyê li sinûrî
Bin ax bike.
Û hemî gunehên te heyin
Bi gulava hembêzbûna lêvên min bişû.
Bi lez were
Du çengên elhûyekî qer bike
Çunke dem yê diqurmçit
Û benkê daverrasta vegeryanê
Hêdî hêdî yê dibiçit...
Û ez. Ax ez.
Yê li ser çavên du gunehan
Nivêja xwe ya nexirî û dumahiyê dipêçin...
Û ji bîr nekî berî tu bêy
Şûna hemî maçên hîz
Ji herdu lîvên xwe daqute.....!!!!

## XEWNÊN KIRÊGIRTÎ

Jivanê me û xewnek nû ye
Di gel rojavayek pelxî
Rengê me perdek revînî
Ji dêmê tariyê didizit...
Wekhevî ye
Di navbera me û reşbîniyê de
Herriftin bi pistokên me ve
Nexişê têhnê pejan dikit...
Ezmûnik bê dest û pê ye
Çûna me ya bi qonxişkî...
Tarî ye û fanosa jengî
Paşayê ronahyê ye...
Danga şevê devên beş
Tijî zîzbûnkir...
Şebengên dêmên ne niyas
Bi dîwarên jorê ve dirûs in
Tama xewê û bêhna xewnan
Ji nav mijîlankên me dimêjin...
Em û gazinde bi jivan in
Hemî şevan
Wek şîjna di guhên me de
Vila dibin
Û her rengê me yê hevîrê hevrikiyê
Bi du destên bênivêj dikit...
Şahperên navdariya me
Bi agirê xobayî sot
Lew evroke xewnên me jî
Reşek û kirêgirtî ne...
Sehma dilopên gêjbûnê
Davek zirav dikit werîs
Û rêka rêvngên wekî me
Boyax dibit bi dûrbûnê...

# Dilbirîn Halo

Sala 1977'an, li gundê Boselê, nêzîk bajarê Zaxoyê, ji dayik bûye. Li Enfala reşa sala 1988'an, di gel malbata xwe, derbeder bûye û li kempa Diyarbekirê jiyayne. Di sala 1993'yan de, vegerane û li Zaxo akincî bune. Li sala 1995'an, dest bi nivêsîna helbestê kiriye. Li sala 2000'î, bûye endamê Yeketiya Nivêserên Kurd / Duhok. Karê rewşenbîrî û ragehandinê li bajêrê Zaxoyê kiri ye. Dîwanek helbestan bi navê “Demê mirî” çap kiriye. Dîwanek jî, ji bo çapê amade ye.

## ÇEND HAÎKO

*Hejêkirin*
**Min hez ji te kir**
**Hemiyan ez hêlam**
**Min tu hêlay**
**Hemiyan ez maçî kirim**

*Aşûpe*
**Di aşûpa min da**
**Tu werzek bûy**
**Newroz tê da**
**Ev çi ba ye**
**Xendiqandim**

*Şehîd*
**Navê te hebûna min e**
**Xwîna te**
**Paşeroja nevyên min e**

*Xwezî*
**Xwezî tenê şevekê**
**Çavên dewletê biban**
**Tirafîklayta gundekî**
**Belkî zanîba**
**Dubey hêşta xewn e**

*Serxwebûn*
**Ew şeva**
**Ez xewnên serxwebûnê**
**Dibînim**
**Spêdê forma azûqey**
**Ji min dixwazin**

*Jin*

**Gelek dibêjin**
**Jin nîva jiyanê ye**
**Ez dibêjim**
**Jin jiyan e**
**Lê tu bawer neke**
**Bihêlin jiyan**
**Di jinê da ava bibît**

*Gendelî*

**Ger siyasî gendel bin**
**Vî navî dê li welatê me**
**Qedexe kin**

*Dia*

**Tu li xala sinûrî**
**Derbaz bûy**
**Min dua kir baranek bêt**
**Da hêstirên min veşêrît**

*Navê min*

**Bes navê min**
**Li ber lêva xabîrî binivêsin**
**Ez ditirsim**
**Ev zivistane jî**
**Min bişût**

*Tirs*

**Min welatek çêkir**
**Ji tirsê**
**Hemiyan divêt**
**Min bitirsînin**

## HEBÛNEKA ZER

**Her roj**
**Ez di hebûna te ya zer da**
**Hizar cara li xwe dinêrim**
**Bêyî ku bizanim ka çi me.?!**
**Tu û ev zeratî ye**
**Yên bûyne**
**Manşêtê mirineka bi lez**
**Xodîk**
**Guneheka veşartî ye…**
**Di hebûna werzê bahîvan da**
**Xwe dinixêvit**
**Pasporta eşqa min**
**Ya di paxla te da**
**Bêzar bûyî**
**Kolan hemî yên pêçayin**
**Da xwe di xewnên nêrgizî da hawîş biket**
**Hê dem**
**Bes xwe di bîvelerzên reş wer bike**
**Wer di baweşa xwe da**
**Min kehî bike**
**Sinûra bipejne**
**Da têr xwe li ber xodîka te maçî bikem…**

## EZ DIXEWNAN DA

**Çavên te yên şermîn**
**Heza min têr naken!**
**Were bi kenî ve**
**Şerma xwe veşêre**
**Bo demê çûyî**
**Da li me bêt barana eşqê û**
**Ez û tu…**
**Aşiq bibin.**
**Jiyan guleka sor e**
**Dê were…**
**Da ez û tu bi destên xwe av bidîn.**
**Ewên çûyin û ewên dihên**
**Da fêrî xemokiya min û**
**Şerma te nebin**
**Dê were…**
**Hêşta didanên min**
**Zer nebûyin**
**Ez dixewnan da bimînim sax**
**Bêje min…**
**Te divêtin dîn bibim û li êvariyeka heynê,**
**li (Ezmerr) xwe rûs bikim û hîviyên min di pêkê**
**serxoşan da bibin şabaş?**

## DILÊ BÊ WELAT

**Min bihêle...**
**Bila xemên min, li te nebarin...**
**Min bihêle**
**Ewî dilê te bi jiyanê avdayî**
**Di payza jiyê min da, neke birîn**
**Min bihêle...**
**Bila çavên te bi hêstirên**
**Eşqeka bênav şil nebin**
**Bila hîviyên te**
**Di welatê min**
**Yê parçekirî da, têhin nebin...**
**Ne cano ne.**
**Ez di wênekê direwîn da**
**Eviro dibînim**
**Duhî ez di hebûneka**
**Damayî da yêt gevastîm**
**Erê cano**
**Tu dizanî?**
**Li kolanên welatê te**
**Şermînok im**
**Ha nêzîk e ez dê girîm**
**Heta niha welatê min**
**Ewê hêşta nebûyî yê min**
**Bo dewletbûnê dinalît**
**Bibore can bibore**
**Ez nema dikarim**
**Te di dilekê bê welat da**
**Hembêz bikim**

# ŞEVÊN XABÛRÎ

(1)
Di girêbesta viyanê da
Ew kaxeza bi îmza min û te şîn bûyî
Maçên qeçax, qedexe ne
Kî dê min şot
Ji serbora demên bûrî û pêkên direw
Ewên hemî şevan
Li Xabûrî dibûn qirral

(2)
Xeyalên mestiyê xweş in
Mirov di mestiyê da mirov e û
Xwe dibînit
Evî demî
Di hembêza Xabûrî da
Girrinjînên serxweşiyê
Bo jiyanê geş dibin
Azadî di pêlan da
Ya hemer bûyî
Çend ciwan e
Mirov hest bi firrînê bikit!

(3)
Şev nîvî bû
Ha nêzîk e
Dûkêla cigara min vemirîtin
Ez neçar im
Di bendên girêbesta te da
Hezên xwe
Bo dumahîk car bisojim!

## TO DI HEBÛNA MIN DA

Dema ku ez ji te hez dikim
Tu li wêrê dimirî
Dema ku ez bêjim xilas
Eha tu ji were dest pê dikî
Di sihariyeka baranî da
Tu li birînên min dibarî
Tu dihêy û ez direvim
Ne ez dişêm te di henasa xwe da ragirim
Ne jî, di hozana xwe da bikujim
Tu di hebûna min da tiştekî
Çi bê bersiv e...?!
Hemî deman
Ez lêdigerrim
Lê... Ez dizanim subehî
Her wekî duhî
Dê hej te kim
Ma tu bêjî direwîn bim...
Û ji navê te bitirrsim

# Amîna Zikrî Seîd

Sala 1979, li welatê Îranê ji dayik bûye. Xelkê dera Nêrwe, gundê Şîvî ye. Her li Îranê, xwendiye û dîplom wergirtiye. Paşî fakulta edeb û zimanê Kurdî, li Zanîngeha Duhokê bi dawî aniye. Dedamezrêner ya rêkxirawa Mafên Menî û rêkxirawa Badînan, bo rojnamevaniya azad bûye. E Yeketiya Nivîserên Kurd tayê Duhokê ye. Di redaksiyona gelek kovaran de, kar kiriye. Nivîsînên xwe di rojname û kovarên kurî de, belav kirine. Dîwaneka helbestan, bi navê “Di bazgehên demî da” çap kiriye. Serokatiya Yeketiya Afretên Kurdistanê de kar kiriye û niha jî endama Perlemanê Kurdistanê ye.

## BIYAVÊN RADAY

**Di şev gerokên xewnên şevên kambax de**
**Neynika çavan, pirsa te ji min kirin...**
**Û te çavên xwe ji leşkerên xewê re terxan kiribûn!**
**Hemî spêdeyan:**
**Dengê te yê lerzok,**
**Ramûsan li ber cîngeha dilê min wer dikirin û ji xew radibûm**
**Te digot: Kiçê şînwarên maçên te li ser dêmê min buharistan e!**
**Tu dizanî, helma te hin min bi germî dûrpêç dikit,**
**Bi nazdariya pirsa tilên te di giyanê xewnan de cih digirin?**
**Ez ji xeberdana te,**
**Ji xweşke xewnan,**
**Ji hesteka nediyar û**
**Ji xwe ditirsiyam**
**Ez: Ditirsim.**
**Tilên te ên qerîsûk li bin guharên min,**
**Di nav poura min ya bijale de, matanê dikin,**
**bang dikin:**
**Kiçê dînê ji te hez dikem.**
**Min bi xwêdana leşê xwe gulav bike,**
**Bi şev, bi pora xwe min binixêve...**
**Zaroyekê evîndar im, ma qey tu pirsa wî nakî?**
**Zaroyekê nazdar im, ma qey tu hizra xema wî nakî?**
**Ka bêje, tu çi qas ji min hez dikî?**
**Li penageheka aram,**
**Ez li xwedawendekê digeriyam ku bikarit min ji bo te bidit naskirin.**
**Min li ber destên te pîroz bikit û di baweşa te de birazînit.**
**Ji hesteka nediyar ditirsiyam...**
**Û te tirs ji mexmeliya rûkên min nas kiribû.**
**Hestên min di nazdariya destên te de bûn, te digot:**
**"Demê min tu dîtî nesrîn**

**Herdu çavên reş digirîn**
**Ewan çavan digote min**
**Careka dî tu min nabîn"**
**Na... Na**
**Pirr carên dî, dê min bibînî**
**Nesrîn her rondikan dibarînit**
**Nesrîn girnijîna dibişkurînit**
**Nesrîn semayeka sermedî li ber bejna te bikit**
**Nesrîn canek e û jînê dibexşit!**
**Sîlava rojê û vînê di gundên dilê min de,**
**Bi piyadene û te welatek pirr dînatî ji min re çêkiriye.**
**Xwezî bihost bihost giyanê te ez dagîr kiribam.**
**Xwezî di hundirê te de zîndanî bam.**
**Bo dîtina te, bo maçên te, bo destgirtinên te,**
**Lavlavê dikim ez vedpejim**
**Ez şevgerdeka evîndar im!**
**Ma tu dizanî:**
**Bi pirsa "Tu çi qas ji min hez dikî "ez dêşim?!**
**Min xwe ji ber te divêt**
**Hemiya min tûy**
**Di bahozên hindabûna te de xwe dibînim**
**Pirr im ji negotinê, pirr im ji xerîbiyê**
**Di xemuşiya min de, te digot:**
**Sotina dawiya tirsê di hundirê me de, ji hemû yezdanan Xwedatir e...!**
**Dê giyanê xwe wekî soravên ser lêvên te, ser lêvên xwe çêbikim**
**Li bin lingê te nivêja evînê kim!**
**Kiçê dîna dilê min, ji te hez dikem...**
**Bi zîndana bîranîna te ser mest im**
**Sofiyeka bendewar im**
**Te ez ji min dizîme**

**Di xema evîna te de digevzim**
**Çav ji ber dûriya te di bê reng in**
**Di cejna vî bajêrkî de,**
**Fîstanê min bê aramgeh e**
**Eza vala, şêt, hinda û rwîs**
**Û tu xewistana xewnên minî...**

**Di qerqodê odeka qerisî de,**
**bê meyî, bi bîrhatinên te gerim û serxweş dibim.**
**Hemî êvaran di mîhrabên bendemanên me de,**
**Li rex mizgefit û dêrê, gundî bi şirşira sitranên rûbaran û dilopên baranê digirinjin.**
**Zaroyên pêxwas şemalka evîna me hel dikin...**
**Çêroka te ya bê dumahî me ez**
**Hemiya min te poşandî ye**
**Neşêm te jibîr bikim**
**Were pirtên leşê min jêk vavêre**
**Çeq û takan bi dara mala xwe ve şor bike**
**Kevalekê rwîs ji min û xwe nîgar bike û**
**li ser taqiçkê dîdaran bi helawîse!**
**Canê min,**
**Gundê bapîrê min bê xwedawend e,**
**Xwedawendên şerxwaz nihêniyên evîndariyê kifiş nakin!**
**Ji xema dûriya te, bi agirê rondikên veşartiyên dîroka evîneka qedexekirî dagîrsaw im!**
**Li ber destê te şagirdeka debeng im,**
**Min fêrî evînê bike**
**Di dîdeyên te de rêvîng im**
**Min fêrî şevînê bike**
**Bulbulek bê deng im**

**Min fêrî fîxanê bike**
**Di baxçeyê sîngê te de, gulek bê reng im**
**Min fêrî revînê bike!**
**Li her rexekê vî bajêrê jibîrkirî ez dinêrim,**
**Yadgarên te dibînim**
**Li ber dergehên hetikberên vî bajêrî,**
**Meya evîna te dinûşim**
**Ez ji te hez dikim!**
**Hemî spêdeyan, bi bêhna yasemîn û bi qehwa helbestê**
**Bi ramûsanên te di min werkirîn**
**Li gel te, bi rex te ve ji xew radibim**
**Hemî kujyên jiyana min ya mirî, te kirine nîlufer**
**Dengê pên te ji dûr dûr li pişt sînoran semfoniya Valêntaynê,**
**di guhên min de dijenin**
**Min di tûrkê viyana xwe de, di xemuşiya sitranên xwe de,**
**bisteh bike û jenîna bê dengiya min, rîtmên evîna me bike helbest**
**"Eman dilo eman dilo,**
**Derdê yarê dil bi kulo,**
**Canê eşqê havêt dilo"**
**Di naxê xwe de distirim!**
**Were bi mora lêvên xwe, dubarebûna me kesk bike!**
**Ez heyran: Tu çi dibêjî heker em bi roj binivin û bi şev zengla bangî**
**bo fincaneka qehweyê kubar bikin?**
**Di hundirê min de,**
**Hesteka nediyar xuryaneke.**
**Evîna te ya bê reng durryanek e!**
**Car ji biyabanekê,**
**Car ji sîbera xwe û te diborim**
**Pirtek ji esmanî di çavên te de,**
**Qurçek ji deryayê di destên min de,**

**Li welatê rojê,**
**Me bi viyan dikit.**
**Eza bijale û bêmerêz, di navbera te û xwe de berz û hinda dibim…**
**"Mestane te bêhin dikim, mestane te peyrew dikim"**
**Were bi şevnaziyên dengê xwe gorristana vê şeva kembax pîroz bike.**
**Her çirkeyekê di nav xwe da vala dibim, dibime tu, dibime ez!**
**Di demarên min de yariyan dikî,**
**Dibezî**
**Dijenî**
**Dibî çînut**
**Xwezî ev hesta nediyar min nas kiriba…**
**Demê tu digirinjî, qehwa helbesta min û xwe dinoşî**
**Giyan: Tu çaxek pirr alozî.**
**Nîgahên te yên efsaneyî, di cama vala ya xeyalên min de tijî nabin,**
**Bê te hedara min nahêt,**
**Firek ji evîna min binoşe û balava min û xwe bike.**

*17/12/2006, Duhok*

## ŞAYISTEYÊN KÛR

**Ji mêje ye,  xewnên rizî, di êtînên welatî da her diçerin.**
**Sazivan li danga kurbeqê, sitraneka lalute bo qereçeka birsî dijenît!**
**Wêvetir, kernevalek ji kuştina jin û xwîn mêtina hejaran,**
**serjêkirina azadiyê li ser cadan difîrhin û mêraniyê pê dişidînît?!**
**Berxê min:**
**Kiçên vî welatî sêwî ne**
**Senewber û çinarok sêwî ne**
**Delingên dayikan di girtîgehên jandar da, kelamçe dayîne**
**Pirteka aştiyê ker bike!**
**Wijdanên qurbacegirtî, di tabloyeka efyonger da, xwe dipengînin**
**Di şevistanên goristanên bikom da,**
**Nehengên şehwetbaz, bîjinên pak bi quruçkan li ber ba diken**
**Û xelwetgeha kiçîniyê li ser sîvandên zirbaban rêz diken**
**Reşebayên kujek birînan dikewînin,**
**Kelha di herrfînin!**
**Li ber dangê sînemayên bajêrî mutirbek gazî diket:**
**"Nûtirîn fîlim, nûtirîn tablo,**
**werin kuştina dehmenpîsan vekirina dergehên beheştê ye...**
**Werin enfalkirina yasemînan çakî ye...**
**Werin kelexên kevzgirtî yên bikom nûtirîn film e!"**
**Li memleketa tevnpîrkan,**
**Simbêl û tizbî, xewnên şehgirtî, tirsiyan, qebatî, kuştin**
**Xewnên gulan dibizdînin**
**Bêhna sêvên rizî û şeraba genî, sîbera xwe li ser rihana dadikêşin**
**Li ser çokên pîrekan,**
**Xeman pîstê leşê wan de rizandiye!**
**Li rojên wan şev balolkin, girinjîn xendqîn e!**

**Lezet,**

**Sebet... Sebet**

**Digezît, dibîte qereç**

**Tawisên memkên Xecê jî çend şembiya ji daykbûna xwe ji bîr kiriye!**

**Di gizîrta payîzê da,**

**Jiyan bê evîn na meşît**

**Pirteka aştiyê ker bike û li bin zenda neynika gulan, evînê bi xêv bike û**

**Kernevalek ji mirovatiyê, ji ramûsan û aştiyê,**

**Bo min û xwe**

**Tilove bike.**

*26/1/2007*

---

*Kurbe: Aveka mirî ye ku bi tinê beq tê da dijîn*

*Qurbace girtî: Êşekegewriyan digirît*

# LÎLOZ

**Şahzadeyê min**
**Bê xatirxwaztin**
**Bê dest givaştin,**
**Ber bi kîjan welatî diçî?**
**Ji bil î min, çi dest in dê eşqa te li bin hiçkên xwe veşêrît?**
**Tiştekî bêje**
**Di nav bajêrkên bê kolan da**
**Piyaseyan neke**
**Dûr ji te rawestiyayî me,**
**Li rex te me û te di xew da dibînim,**
**Bê te qameteka çemyayî me**
**Di ferhenga te da,**
**Jiyan kiçeka pêxwas e**
**Bihêle heyv etekê şevê bît!**
**Rûkên min, têra maçên te hene**
**Xwe nêzîk min bike û**
**Li ber sîngê xwe min bigivêşe**
**Zaroyeka livok im, bi çarlepkan li te digerim**
**Ew roja da çî,**
**Lêvên te di lerzîn!**
**Çavên min li her rexekî, tu mêze dikirî**
**Belkî bêjî, çend ji te hez dikim!**
**Gidî...**
**Dibêjin eşqa te bertîlê di xwazît**
**Bibore,**
**Ji bil î dilê xwe min çi nîne li bin pên te raêxim!**
**Bertîla ji min nexwaze**
**Pêkekê maçan binoşe!**
**Ma bîra te nahêt,**
**Destên me di navyek da xuh didan**
**Me pêk ve pivdanik di peqandin**
**Kaxez difirrandin**
**Wekî du zarokan me baz dida**

**Te diviya xişokê bikey, heza min di çerx û felekê da bizivirrim**
**Te hez dikir li gel zaroyên şûm civînan bêjî**
**Beran bihavêjî**
**Bibî qirral**
**Xwezî şûmatiya te, hemûya te, ya min ba, bo min ba**
**Xwezî min şiyaba te ji te bidizim û bikem giyanek di leşê xwe da**
**Nêzîktir be**
**Ji bîra te çû**
**Hemû êvaran zarokên gundî baz didan û kolanik tijî deng dibûn?**
**Şahzadeyê min**
**Yaryokên me di damayî ne**
**Ez û tu hevpişk în**
**Dê çîne daran û**
**hemû tişt di bin sîbera giyanê min da, tu yî**
**Hemû tişt di bin sîbera giyanê te da, ez im**
**Xirîqên li sîngê me diden**
**Lêvên me dilerzin!**
**Şermê em veşartine**
**Şermê em jiyek dûr kirine**
**Çend sar e, gerdîleyên befrê dibarin**
**Çend sar e, nêrîn agirbar in**
**Min bêhn kire henasên te, belkî bêjî xatûna min çend ji te hez dikim!**
**Li min mêze bike**
**Viyana te dilê min bend kiriye**
**Binêre, çewan rişik xwe li ber bisikên jinên sîng vekirî şûr diken û dibine eşq**
**Şahzadeyê min,**
**Şevên min bike lîloz**
**Nameyên pirr soz**
**Bike umêd û li min bivegere.**

*11/9/2006*

# ÇILORE

Li welatê sîberan,
Çirkeyek ji bîranîna te,
Canê min bê hiş diket
Destên min bigire
Di xeyala min da,
Tu, her mezin dibî
Ez, her biçûk dibim
Te bêhn dikim, mest dibim
Xweyeka şêt...!
Giyan, biyabanên li vêre bê baran in
Welatekê sar, bijaleya me têr naket
Hemî êvaran,
Zengilên esmanî hişyar dikem
Da xwedê eşqa te di canê min da zîval biket
Girrinjînên te hêv bikem.
Di xewnên dûr dûr da,
Mijgulik di kevçkê kewnî da awêz dibin
Xweyeka şêt,
Di gundê çavên te da
Aram giryam
Tu henaseyeka li bawî û
tilên te, li her qulaçkeka jiyê min,
dastanek tomar kiriye
Pirr im ji te.
çend caran, nivêjê li ser te bikim?
Çend caran,
Xeyala xwe bi piyasên me yên bê deng, reng bikem?
Min nevêt xewnan bibînim

Zulîlbilîlkana tizbiyên dapîra xwe bihijmêrim
Çêroka dê bo xwe vehînim
Destên min bigire,
Da pirr bibî ji min, ji eşqê
Cezmeyên xwe tijî stêr bikeyin
Renga têkel bikeyin
Eşqê bidizîn û di berîkên xwe da veşêrîn
Gemyekê çêbikeyin û
Ji welatê sîberan biçîn
Were,
Arda* bidizîn
Û rajêrka wî li ser sîngê Arşo* dirêj bikeyin
Li ser milên baranê muzîkê bijenîn û di xew biçîn!

*30-31/3/2006*

*Arda: Firîşteyeke di ayinê Zeredeştî da.*
*Arşo: Yek ji serkrdên dewleta Madî bû.*

# Ferhengok

## – A –

**Asan** : Hêsan, sanahî
**Akam** : Kar, tesîr
**Asihê** : Bajarokeke nêzîk Zaxoyê ye
**Aso** : Elind, berê spêdê
**Aşûp** : Xeyal
**Awêne** : Xwedîk
**Avêsta** : Pirtûka Zeradeştî ye
**Ayin** : Ol, dîn

## – B –

**Baban** : Di sala 1686'an de, Feqe Ehmedê Baban, Mêrnişîna Baban damezrand û li devera Silêmaniyê hukim dijî Osmaniya dikir. Hîngê paytextê wê gundê Qela çiwalan bû. Paşî li sala 1784'an de, Silêm Paşay dest bi avakirina bajêrekî kir û navê wî kire Silêmanî, di dwîf ra ew kire paytextê mîrnişîna Baban. (Kurte mêjoy Kurd û Kurdistan, Aso germiyanî û Amed Tigrîs, 1992, Stokholim, Siwêd.)
**Bala** : Bilind
**Bender** : Kendaw, xelîc
**Bendewar** : Bê xanî mal
**Berhavêj** : Xelatek e, li demê bûkguhaztinê, xelkê zavay didene zarokan.
**Berhingar** : Li dij rawestan, berevanî ji xwe kirin
**Berdî Qareman :** Berekê mezin e li derbendî baziyan, nêzîk bajêrê Silêmaniyê. Dema şêx Mehmudê Hefîd şer digel Ingilîzî kirî, li ber wî berî birîndar bû.
**Beref** : Ber bi
**Berrî** : Deşt, biyaban, çol
**Betsin** : Girêdan
**Bêgar** : Ezyet, zehmet

**Bêkes** : Helbestvanekê bi nav û deng e, li Kurdistana Başûr
**Bêston** : Ew çiya ye, yê ku Ferhadê aşiqê Şirînî, diviya kon bike
**Bijwîn** : Paqij, pakij
**Bikirr** : Yê ku tiştî dikire
**Bilêse** : Kovarek bû li bajêrê Silêmaniyê derdiket
**Binoş** : Vexwarin bi xweşya yekî
**Birrîn** : Jêkirin, Darî bibire
**Bistirin** : Sitrana bêjin
**Bizav** : Xebat, têkoşîn
**Biyanoya** : Hêceta
**Bîse** : Bûse, rê girtin
**Biyaban** : Çol, sehra
**Bûrî** : Xurtum, demar

## – C –

**Cebilxane** : Cihê çek tê da
**Cinîk** : Baxçe, bîstan
**Cîn** : Beş, pişk, cor
**Com** : Cobar
**Coxîn** : Bêder, bênder

## – Ç –

**Çarlepk** : Dema zaro li ser dest û pên xwe diçin
**Çarok** : Pêçe, patekê reş e, jin bi ser ser û çavên xwe da dikin
**Çeng** : Dest, lep, mist
**Çekçekîle** : şemşemekore
**Çerê** : Çerandina pezî
**Çetok** : Caş, kirêgirte
**Çeveng** : Sîmbol, remz
**Çewsêner** : Yê ku zulmê dike
**Çewsawe** : Yê ku zulm lê diête kirin

**Çikî** : Tehin
**Çinyên nanî**: Parçên nanî
**Çirkek** : Saniyek, demekê pir kurt
**Çîplaq** : Rût, tazî
**Çirr çirr** : Parçe parçe kirin, perritandin
**Çixandin** : Bi paş da birin, tirsandin

– D –

**Dabêş** : Belave kirin
**Dalxe** : Hizir, texmîn, aşûp (Bi Turki ye)
**Dalehî** : Gilî, gazinde
**Dahînan** : Efrandin
**Danîşgah** : Zanko, camîe
**Dehbe** : Hov, dirrinde
**Deroz** : Xazker
**Deq** : Xalên reş, nîşan
**Dezgir** : Dezgirtî, xwastî
**Dilbirîn** : Helbestvanekê millî ye, xelkê zaxo ye
**Divên** : Yên ku me dixazin, hej me dikin
**Dixurin** : Hewar dikin, wek şêra dixurin
**Dî** : Din
**Dîmahî** : Dawî
**Dîmen** : Wêne, şikil
**Dozex** : Dojeh, cehenem
**Dorik** : Nan e, ji yê tenikî biçûktir û nerimtir e

– E –

**Ebû Xirêb** : Zîndaneka pir mezin û binavûdeng e di Iraqa faşîstên Bexda da. Berdewam pirre ji girtiyan.
**Ecna** : Yê ji me çêtir, ercine
**Efleqiya** : Mebest Mîşêl Efleq e, damezrînerê Parta Be'isa faşî.

**Efrît** : Dêw, helametê tirsê
**Eger** : Sedem, ho, sebeb
**Ehrîmen** : Xudê xirabiyê, di ayînê Zerdeştî da
**Elho** : Baz, nesir, teyrekê bi hêz e
**Elind** : Berî spêdê
**Errinî** : xeyidî, sil bû, aciz bû
**Erk** : Pêdivî, kar, Wezîfe
**Evir** : Ewir
**Ezmon** : Serbûr, serpêhatî, tecrube
**Eyaz** : Sitranbêjekî binav û deng bû, li Kurdistana Iraqê. Mixabin hêj xurt mir.

## – F –

**Fener** : Şemalk, çira, find
**Fengenûs** : Mirovê dirrinde, dêw, ejdeha
**Fer** : Pêwîst, pêdivî
**Feramoş** : Ji bîrkirin
**Firîzî** : Giyayekê pirr nerme, hindî bibirrî, şwîn dibîteve.
**Firîşte** : Melaîket
**Fîşek** : Gulle

## – G –

**Gare** : Çiyayekê pir asê û bilind e, Dikevîte hindav havîngeha Sersingê, devera Duhokê
**Gawirbaxî** : Taxekê bajêrê Kerkûkê ye, li wî cihî hizaran karkeran xwe pêşandan, dijî hukumetê kirin, lê leşkerê hov bi sedan ji wan kuştin.
**Geh** : Rihên xwînê, demar
**Gemşû** : Bêaqil, çi nezan, helhele
**Geşte** : Geha
**Gilêş** : Pîsatî, bermayî
**Gilop** : Lampe

**Girtîxane** : Zîndan
**Gîvir** : Pişîka mezin û bi kelex
**Gord** : Leheng, qareman
**Guftar** : Peyvîn, suhbet, qisekirin
**Gumlek** : Kiras, qemîs
**Guyîn** : Tewalek e, berdewam bi şev dinale

## – H –

**Hacî** : Hacî Qadirê Koyî, Helbestvanekê bi nav û deng yê Kurdistana Başûr e.
**Hefk** : Qirrik, gewrî
**Hejî** : Hêja
**Helgurd** : Bilindtirîn çiyayê Kurdistana Başûr ye, Dikeve nêzîk bajêrê Çûman ê wêrankirî.
**Hemîşe** : Berdewam,hemî dema
**Henase** : Bêhin helkêşan
**Herra** : Qerebalix,şêl û bêl
**Hestin** : Rabin
**Hevsoy** : Dirawsê, cîran, cînar
**Holako** : Serkidekê dirrinde û hovê Mexolî bû, hêrriş bire ser bajêrê Bexda û wêrankir.
**Hozanvan** : Helbestvan,şair
**Huseyn** : Kurê îmam Elî ye ku, li Karbela hate kuştin.
**Huşên** : Dengê belgên dara,

## – I –

**Izzet, Xeyrî, Qudsî û Mistefa :** Çar efserên komara Mihabadê bûn, dema têk çûy, li ser soz û bextê hikumeta Melikê Iraqê, vegeryaneve, lê wan bi sêdarêve kirin.

## – J –

**Jivan** : Li bendê man, Li hîviyê man, rendewû

## – K –

**Kanya Sincê :** Aveka tezî û zelal jê derdikeve. Li Sîlavê, li bin kela Amêdiyê ye.

**Karesat** : Derdên giran,Nexweşiyên mezin

**Kawdan** : Dest û dar,rewş

**Karxane** : Fabrîk

**Kaşî** : Erdê pê dixemlînin.

**Keçkir** : Vê neket, di berra çû

**Kehî** : Kedî

**Kelex** : Term

**Kelêşît** : Dikete du parçe, dilê min dikelêşît

**Kerrift** : Wek dia bi kar tê. Te di pozê xwe da anî.

**Keştî** : Gemî

**Ket ket** : Yak yek,kit kit

**Keval** : Lewhe, tablo

**Kinif** : Ji werîsî ziravtire

**Kiz** : Bêhêz, kêm

**Kulb** : Xela, pirr birsîbûn

**Kulox** : Qafkê serî

**Kumt** : Serê çiyay, kopê bilind

**Kut** : Ne tîj, nikarît tiştî bibirrît

**Kwîstan** : Zozan (Koyistan)

## – L –

**Laliş** : Gorra Şêx Adî li wê derê ye û cihê heca Êzdiyan e. Dikeve nêzîk bajêrê Êsifnê, li devera Duhokê.

**Lewa** : Lewra

**Lêhbûk** : Pêtirrnk, qeşmer

**Lok** : Pile, derece

## – M –

**Mandî** : Westiyay
**Melevanî** : Avjenî
**Merem** : Merx, timoh
**Mereq** : Mirad, tiştê dil dixwaze
**Mesîh** : Îsa pêxember
**Metîn** : Çiyayekê asê ê bilinde, dikeve hindav gundê Bamernê, devera Amêdiyê. (Metîna)
**Mîjû** : Dîrok
**Mêrser** : Mirovê pir xurt û zîrek
**Mifa** : Wic, fayde, sod
**Mijgan** : Mijîlankên çava
**Mirîte** : Dilmayî, posîde
**Mişext** : Sirgûn, derbeder
**Mit** : Bêdeng
**Mita** : Deramet, erzaq, kel û pel
**Mitewekil** : Serkirdekê ereba bû
**Mizda** : Xudêyê xêrê di ayînê Zerdeştî da
**Mîrî** : Hikumet
**Moçe** : Perên karê mirovî, meaş
**Musteşar** : Serokê caşan

## – N –

**Napalm** : Topek mezin e ku terr û hişkî dişewitîne
**Necax** : Nalcix, çekekê kevn e, mîna bivriye, lê serê wî berovajî şalokê ye û tûj e
**Nehing** : Hov, dirrinde
**Nihal** : Dol, gelî
**Nihênî** : Nepenî,sirr
**Nitirandin** : Nehit, peyker çêkirin

**Nîl** : Rûbarekê dirêj û mezin e li welatê Misrê, ji jêr ber bi jor diêt.

**Nîsyay** : Pêvemay

**Nûros** : Teyrek e. Balindeyek e.

## – P –

**Pale** : Karker

**Perêsin** : Mirovên musilman xudê diperêsin, ibadet

**Perr** : Rûpel, şaperên teyran

**Perraşût** : Mirov xwe ji esmana pê dihavête xwarê.

**Perçan** : Dîwar, tian

**Pesar** : Serevraz, jêheliyê bi çep û çîrr

**Perwe** : bêbiha, herwe, belaş

**Perwer** : di perêsît, dixwazît

**Peyker** : Helamet, timsal

**Peymangeh** : Pileya xwendina diplomê jê werdigirin, berî danîşgahê

**Pêjin** : Dengê livînê

**Pêhel** : Ber bi jor, biserketin

**Pênivîs** : Qelem, xame

**Pêstûr** : Peyîsk, pêpelîsk, peyje

**Pêtivî** : Pêwîst, pêdivî

**Pilîpt** : Xwehilavêtin, sema bi tenê

**Piştên** : şîtika piştê, şal

## – Q –

**Qela** : Kel

**Qemer** : Heyv(Erebî ye)

**Qemî** : Da ku, belku

**Qend** : şekira hişk, Dîşleme

**Qer** : Qerz, deyn

**Qeşmer** : Lêbûk, pêtirrnk, bêbiha

**Qewim** : Millet
**Qişle** : Cihê Polîsa, qereqol
**Qîvar** : Giyayekê buharê ye û diête xwarin

### – R –

**Raman** : Mebest, fikir
**Ramyarî** : Siyasî
**Regez** : Rih û rîşalên tiştî
**Reqîb û riqabe :** Sansor, çavdêrî
**Rewa** : Rast û dirust, adil
**Rêbaz** : Rê, rêyên bîrkirinê
**Riste** : Hevoka di nivîsînê da
**Riswa** : Hetik, kirêt
**Rîs** : Tazî, rût
**Rîşal** : Rih, reg, demar
**Roxsar** : Form
**Rûşîn** : Rûbarekê mezin e, di geliyê Balinda ra dihêt. Di ber gundê Şêladizî ra dibore li devera Amêdiyê.

### – S –

**Sakar** : Kalfam, sade
**Sako** : Qapot, çakêt
**Sawîlk** : Nezan
**Sebetan** : Lîlya tivengê
**Sehim** : Tirs
**Senger** : Çeper, Kuzk
**Seqem** : Serma giran
**Serdab** : Binbîv, jêrzemîn
**Sergûm** : Sirgûn, mişext
**Sexmeret** : Ji bona, ji bo, ji ber
**Sext** : Asê, dijwar

| | | |
|---|---|---|
| **Sêpêk** | : | Sêdar, Qinare |
| **Sikir** | : | Bendav, sedde |
| **Simko** | : | Pêşmergeyekê qareman bû, berî çend sala şedîd bû |
| **Sine** | : | Bajêrekê mezinê Kurdistana îranêye |
| **Sirt** | : | Kopê çiyay, serê çiyay |
| **Sîç** | : | Gunneh, sedem, sûc |
| **Sîme** | : | Têla sinûran pê digirin |
| **Sîtafk** | : | Sîber, sih |
| **Sîxurr** | : | Casos, muxbirçî, kirêgirtî |
| **Solîn** | : | Bişkoj, bişkov |
| **Soreşeva** | : | Şevên bi xweşî derbaz dibin |
| **Spane** | : | Amîretekî mîkanîkê ye |
| **Stewir** | : | Heywanê nezêt |
| **Steyrok** | : | Stêr |

**– Ş –**

| | | |
|---|---|---|
| **Şane şane** | : | Cih cih, la la |
| **Şar** | : | Bajar |
| **Şebleban** | : | Ginawerekê çîvanokiye, zaroka pê ditirsînin. |
| **Şemilk** | : | Li ser nivêjê dikin |
| **Şepilî** | : | Bêser û ber, têkçûyî |
| **Şerrenîx** | : | Kêşe, şer û xwelêkdan |
| **Şirove** | : | Mana kirin, şerih kirin |
| **Şehmizar** | : | Ez gunehkar im beramber te, min kêmasî kiriye |
| **Şet** | : | Rûbar, çem (Erebî ye) |
| **Şingar** | : | Bajêrekê Kurdistana Başûr e. |
| **Şirîfî** | : | Pareyekê kevn e. |

**– T –**

| | | |
|---|---|---|
| **Tanê** | : | Hewarê, alîkariyê |
| **Taqî** | : | Ciribandin |

**Tavge** : Sîlav
**Tax** : Gerrek, mehel
**Tehre** : Pirr Germ, kelegerim
**Telar** : Eywana bilind, cihê bilind
**Temet** : Hindî, Bi qasî
**Tenîn** : Giyandarekî çîvanokiye
**Teriqî** : Revî, li wî cihî nema
**Teslîm** : Paşgez, peşîman,
**Teşene** : Ber bi pêş de, pêşketin
**Tex** : Cîn, çîn
**Teyisî** : Birisqî
**Tir kir** : Diber ra çû, jê negirt
**Tîk** : Derz
**Tolaz** : Xurt, geng
**Tond** : Giran, bi hêz, mukum
**Torbe** : Telîsê biçûk, kîs
**Tore** : Edeb
**Torevan** : Edîb, nivîskar

### – V –

**Vantom** : Firokeka bombe havêje
**Vebeyî** : Jê çû
**Vegest** : Pêve da, hingaft
**Verenî** : Binê mencelê verenî
**Volkan** : Dema çiya diteqe û agirî dihavêje

### – W –

**Werar** : Pêçveçûn, geşekirin
**Wexer** : Çûn, mir û ji vê dinê wexer kir
**Wêne** : Şikil, resim

## – X –


| | | |
|---|---|---|
| **Xapandin** | : | Di ser da birin, fêl lê kirin |
| **Xin** | : | Ciwan, delal, taze, şirîn |
| **Xirr** | : | Girovir, gilovir |
| **Xerîqênk** | : | Dema mirov ji dil digirît |
| **Xirş** | : | Heywanê ne zêt |
| **Xîvet** | : | Çadir, kon |
| **Xorrit** | : | Siroşt, tebîet |
| **Xoşînk** | : | Rind, xuşkok, ciwan |
| **Xurrim** | : | Pesnin dayîn |

## – Y –

| | | |
|---|---|---|
| **Yadgar** | : | Bîrhatin |
| **Yasa** | : | Qanûn |
| **Yaxîbûn** | : | Lasarî, li dij rawestan |


## – Z –

| | | |
|---|---|---|
| **Zehak** | : | Ew Melikê dirride, yê ku hemî rojê mejyê du xurta dixwar. Paşî bi destê Kaweyê asinger hate kuştin. (Dehaq) |
| **Zemawend** | : | Dîlan, dawet, Govend, şahî |
| **Zemîn** | : | Erd, dinya |
| **Zê** | : | Çemekê mezin e, di nav gelyê Reşava da diêt, di nîva gundê Dîralokê ra diçe, nêzîk Amêdiyê. |
| **Zincî** | : | Mirovê reş, efrîkayî |
| **Zîvar** | : | Jar, destteng, hejar |





**FERHENGA GOTINÊN PÊŞÎYAN**
**Çiya Mazî**
Weşanxaneya Spîrêz
2006, Dûhok - Kurdistan

500 rûpel e û ji pirtûka Latînî (Ferhenga Gotinên Pêşiyan Çiya Mazî) hatiye veguheztin.




**“BAHOL”**
**Çîrok - Çiya Mazî**
**Weşanxaneya Evrensel 2011 Stenbol**




## MIJARÊN MÎQRO

"Mijarên Mîqro", pirtûka Çiya Mazî ya çîrokan e. Di sala 2009'an de ji alî weşanxaneya 'Do' yê li Stenbolê hatiye çapkirin. Ji 14 çîrokan pêk tê û 96 rûpel e.

# THE KURDISH CONTEMPORARY POETRY

BY

KHALIL DUHOKI

2013